

K. T.
ZANÎNGEHA VAN YÛZÛNCÛ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE HÊMANÊN FOLKLORÊ

TEZA LÎSANS A BILIND

AMADEKAR

Yahya YAVUZ

ŞÊWIRMEND

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

VAN - 2020

T. C.
VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE HÊMANÊN FOLKLORE

YÜKSEK LİSANS TEZİ

HAZIRLAYAN

Yahya YAVUZ

DANIŞMAN

Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU

VAN - 2020

(Teza Lîsansa Bilind)

Yahya YAVUZ

ZANÎNGEHA VAN YÜZÜNCÜ YILÊ
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ
Tîrmeh, 2020

DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE HÊMANÊN FOLKLORÊ

KURTE

Folklor û edebiyat du qadên cuda lê di navbera hev de di nava danustendineke xurt de ne. Lew di navenda her duwan de jî mirov heye û her yek bi awayekî tesîrê li jiyana mirovan dîkin, tesîrê jî wan digrin. Folklor bi cureyên xwe yên vegotinên gelêrî, destan, çîrok, efsane, kilam, stran û gotinên pêşyan bo edebiyatê dibe çavkanî. Bi destpêkirina proseya netewetiyê re folklor û roman dibin du qadên sereke di çêkirina nasnameyên neteweyî de.

Romana kurdî ya ku di sedsala bîstan de berhemên xwe yên destpêkê dide bi giştî ji ber nebûna kevneşopeke nivîskî xwe sipartîye vegotinên gelêrî. Sedema bingeşê ewe ku roman cureyeke nû û xerîb e. Ev yek dike ku nivîskar di romanên xwe de ji derfet û teknîkên berhemên çanda devkî sûd werbigrin. Sedemeke din jî serdestiya çanda gundewar ya civaka kurda ye, lewre nivîskar dema romanên xwe dinivîsin cih didin hêmanên folklorê ango çanda ku lehengên romanê tê de dijîn.

Mehmed Uzun (1953-2007) weke romannûsekî ku piştî salên 1980yî berheftan dide, sûd ji folklorê wergirtiye. Bi taybetî di romanên wî yên weke *Tu, Rojek ji Rojên Evdalê Zeynîkê û Hawara Dîcleyê* de vegotinên gelêrî di nava peywendekê de bi zanetî tên bikaranîn. Uzun bi vê yekê re kevneşopa vegotinên gelêrî digihîne romanê û bi şêwazeke ku hêza xwe ji zimanê folklorîk digre romanên modern dinivîse.

Di vê xebatê de di hemû romanên Mehmed Uzun de li ser hêmanên folklorê kurdî hate sekinîn. Têkiliya wan ya bi ziman, çîroksazî û lehengên romanê re hate nîqaş kirin. Xebat ji bilî destpêk û encamê jî sê beşan pêk tê. Di beşa ewil de folklor û çanda devkî, têkiliya folklor û edebiyatê, têkiliya edebiyata kurdî û folklorê hate nîqaşkirin. Beşa duyem di derbarê jiyana, berhem û romannûsiya nivîskarî de ye. Beşa sêyem bingeha lêkolînê ye û hêmanên folklorê yên di romanên Uzun de vedikole.

Peyvên Sereke : Mehmed Uzun, folklor, çanda devkî, roman, kevneşop

Hejmara Rûpelan : 145 + XI

Şêwirmendê : Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU



(Yüksek Lisans Tezi)

Yahya YAVUZ

VAN YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ
Temmuz, 2020

MEHMED UZUN’UN ROMANLARINDA FOLKLOR ÖĞELERİ

ÖZET

Folklor ve edebiyat iki farklı alan olmakla beraber sıkı bir alışveriş içerisindeyler. Çünkü her ikisi de insanı merkez alır ve insan hayatıyla etkileşimdedirler. Destan, masal, efsane, şarkı, türkü, atasözleri gibi anonim ifade biçimleriyle folklor, edebiyata kaynaklık etmektedir. Milliyetçilik süreciyle beraber ulusal kimliklerin inşasında folklor ve roman başlıca iki alan olarak öne çıkarlar.

XX. yüzyılda ilk ürünlerini veren Kürt romanı yazılı bir geleneğin yokluğundan dolayı daha çok halk edebiyatına sırtını dayar. Esas neden romanın yeni ve yabancı bir tür olmasıdır. Bundan olarak yazarlar romanlarında sözlü kültürün teknik ve imkânlarından yararlanma yoluna gitmişlerdir. Bir diğer neden ise Kürt toplumunda geleneksel kültürün egemenliğidir. Bundan dolayı yazarlar roman kahramanlarının yabancıları olmadıkları ve içinde yaşadıkları kültürün folklorik unsurlarına yer vermeyi tercih etmişlerdir.

Mehmed Uzun (1953-2007) folklorik unsurlardan yararlanarak 1980 sonrasında eser veren bir yazardır. Özellikle *Tu, Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* ve *Hawara Dicleyê* gibi romanlarında sözlü kültüre ait türler belli bir bağlamda bilinçli olarak kullanılmıştır. Uzun bu sayede sözlü kültür geleneğini romanla buluşturup gücünü folklorik dilden alan bir üslupla modern tarzda romanlar yazmıştır.

Bu çalışmada Mehmed Uzun’un romanlarındaki folklorik unsurlar üzerinde durulmuştur. Bu unsurların romanların dili, kurgusu ve kahramanlarıyla olan ilişkisi araştırılmıştır. Bu çalışma giriş ve sonuç dışında üç bölümden oluşmaktadır: İlk bölümde folklor ve sözlü kültür, folklor ve edebiyat ve sonrasında Kürt edebiyatı ve folklor ilişkisi incelendi. İkinci bölümde Mehmed Uzun’un hayatı, eserleri ve yazarlığı

üzerinde duruldu. Üçüncü bölümde ise çalışmamızın da temeli olan Uzun'un romanlarındaki folklor unsurları araştırıldı.

Anahtar Kelimeler : Mehmed Uzun, folklor, sözlü kültür, roman, gelenek

Sayfa Sayısı : 145 + XI

Tez Danışmanı : Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU



(M.Sc. Thesis)

Yahya YAVUZ

VAN YÜZÜNCÜ YIL UNIVERSITY
INSTITUTE OF LIVING LANGUAGES
July, 2020

FOLKLORE ELEMENTS IN NOVELS OF MEHMED UZUN

ABSTRACT

Folklore and literature are two separate fields but they have a strong interaction. Therefore, the human is between of them, also and each one impresses the life of people somehow, also affected by them. Folklore is a source for literature with varieties such as anonymous narrations, epics, stories, myths, songs, and proverbs. Folklore and novel are two major areas for establishing national identities with the start of the nationalization process.

The Kurdish novel that produces literal works in the twentieth century, in general, due to lack of a written tradition is based upon the anonymous narrations. The main reason for that, the novel is a new and unfamiliar type for Kurdish literature. Because of that, the writers have utilized the facilities and techniques of oral cultural works. Another reason for that is the dominance of the rural culture in Kurdish society, hence when the authors write their novels, they involve the folkloric factors or the culture in which the heroes of the novel live.

Mehmed Uzun (1953-2007) an author who produced literary works after the 1980s, made use of the folklore. Especially, anonymous narratives were used wittingly in context in novels like *Tu, Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* and *Hawara Dîcleyê*. Uzun with this transmitted the tradition of anonymous narrations to novel and with a style that gets strength from the folkloric language has written modern novels.

This thesis focuses on all novels of Mehmed Uzun which include factors of Kurdish folklore. In this the relationships between language, fiction, and heroes are discussed. The study is composed of three chapters except for the introduction and conclusion. The first chapter discusses the folklore and oral culture, relation of folklore

and literature, relation of Kurdish literature, and folklore. The second chapter is about his life, literary works and authorship of the writer. The final chapter is the main study and it looks for folklore factors in Uzun's novels.

Key Words : Mehmed Uzun, folklore, oral culture, novel, tradition.

Quantity of Page : 145 + XI

Supervisor : Doç. Dr. Seyit Battal UĞURLU



KURTEBÊJE

hwd.	her wekî din
vgh.	veguhêzer
wer.	werger
amd.	amadekar
dnd.	di nav de
bnr.	binere
r.	rupel



NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	III
ABSTRACT	V
KURTEBÊJE	VII
NAVEROK	VIII
PÊŞGOTIN	XI
DESTPÊK	1
1. BEŞA YEKEM: FOLKLOR: PÊNASE Û DÎROK.....	6
1.1. Çanda Devkî	15
1.2. Têkiliya Folklor û Edebiyatê	16
1.3. Têkiliya Edebiyata Kurdî û Folklorê	28
2. BEŞA DUYEM: JIYAN, HUNER Û BERHEMÊN MEHMED UZUN	31
2.1. Jiyana Wî	31
2.2. Hunera Wî	35
2.3. Berhemên Wî	50
2.3.1. Romanên Wî	50
2.3.2. Ceribandî û Hevpeyvînên Wî	50
2.3.3. Hevpeyvînên Wî	51
2.3.4. Lêkolîn û Antolojiyên Wî	52
2.3.5. Berhemên Wî yên Din	52
3. BEŞA SÊYEM: DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE HÊMANÊN FOLKLORÊ	53
3.1. Edebiyata Gelerî	53
3.1.1. Şevbuhêrk	54
3.1.2. Awirek li ser Dengbêj û Dengbêjiyê	55
3.1.3.1. Ehmedê Fermanê Kîkî	58
3.1.3.2. Evdalê Zeynikê	61
3.1.3.3. Gulê	65
3.1.3.4. Şêx Silê	67
3.1.3.5. Dengbêj Biro	68
3.1.3.6. Apê Xelef	73
3.1.4. Destan	74

3.1.4.1. Destana Memê Alan.....	77
3.1.4.2. Destana Siyabend û Xecê.....	79
3.1.5. Çîrokên Gelêrî	82
3.1.6. Çîrok	85
3.1.7. Efsane	89
3.1.8. Pêkenok.....	91
3.1.9. Kilam	92
3.1.10. Stran.....	96
3.1.11. Zûgotinok.....	101
3.1.12. Mamik.....	102
3.1.13. Gotinên Qalibî	103
3.1.13.1. Gotinên Pêşîyan	103
3.1.13.2. Biwêj	106
3.1.13.3. Dia û Nîfir	108
3.1.13.4. Dijûn.....	109
3.1.13.5. Navnûçîk/Leqeb	110
3.1.13.6. Jimareyên Formel.....	111
3.13.6.1. Jimareya Sê	112
2.13.6.2. Jimareya Heft	112
3.2. Hêmanên Çanda Civakî.....	114
3.2.1. Adet.....	114
3.2.2. Reml.....	115
3.2.3. Mîmarî	116
3.2.4. Cil û Berg.....	118
3.2.5. Amûrên Muzîkê	120
3.2.5.1. Bilûr	120
3.2.5.2. Erbane	122
3.2.6. Zewac.....	122
3.2.7. Cejn.....	123
3.2.8. Navên Stêrkan.....	125
3.2.9. Xwarin	127
3.2.10. Ajal	128
3.2.11. Riwêk.....	131
ENCAM Ê NIRXANDIN.....	133

ÇAVKANÎ	137
JÎNENÎGARÎ	145



PÊŞGOTIN

Mehmed Uzun yek ji wan nivîskarên kurd yê herî berhemdar e. Him bi romanên xwe û him jî bi berhemên xwe yên wekî antolojî, ceribandî û hevpeyvînan xwedî cihekî taybet e di edebiyata kurdî de. Di vê xebatê de wekî çavkaniyeke romanên Mehmed Uzun em li ser hêmanên folklorîk yên di romanên wî de cih digrin, xebitîn. Çi di serdema klasîk de çi jî di serdema modern de nivîskarên kurd weke çavkaniyeke berdewam sûdê ji folklorê kurdî werdigrin û li ser bingeha wê berhemên xwe diafirînin.

Ta niha di derbarê romanên Uzun de gelek xebat hatine kirin. Di van xebatan de axlebe li ser teknîk, ziman û hin temayên romanên wî tê sekinîn. Her çiqas di gelek xebatan de nivîskar balê bikişînin ser tîkiliya berhemên Uzun û folklorê jî, ev hêla romanên wî weke xebateke serbixwe nehatiye xebitîn. Ekin Bodur di teza xwe ya bi navê “Modern Kürt Romanında Bir Kurucu Yazar: Mehmed Uzun” (Mehmed Uzun: Nivîskarekî Avakar di Romana Modern ya Kurdî de) de di beşeke bi navê “Sözlü Gelenek” (Kevneşopiya Devkî) de li ser tîkiliya kevneşopa devkî û romanên Uzun hindê nirxandînan dike lê ev nirxandînan bi romanên wî *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dicleyê* ve sîno dar e lewre wêneyekî giştî yê mijarê nade. Ji bilî Bodur di çend tez û gotaran de jî nivîskar bi kurtî nêzî vê mijarê dibin. Her ji ber vê yekê me di xebata xwe de di peywenda folklor û edebiyatê de hemû romanên Uzun nirxand û hewl da vê hêla romanên wî bi qasî ku ji me tê ronî bikin.

Her cure xebatên akademîk an jî serbixwe tevî ku gelek caran li bin navê kesekî tenê ve werin berpêş kirin jî ew bi awayekî encama hevkarî û mesaiyên kollektîf in. Ev xebat jî bi moral, motîvasyon û alîkariya gelek kesên hêja ve çû serî ku bîyî spasiya wan xebatê kulek û natemam bimîne.

Her ji ber vê yekê, di serî de, bo xwendin, pêşniyar û hebûna wî spasiyên xwe yên taybet pêşkêşî şewirmend û mamosteyê xwe Doç. Dr. Seyit Battal Uğurlu dikim. Yüksel Çakmakê heval û dostê min yê salan di maweya vê xebatê de him deriyê mala xwe ji min re vekir û him jî di warê pêdekirina çavkaniyan de gelek alîkarî li min kir lewre gelek spasiya wî dikim. Hevalê min Ömer Orhan jî demekê mazûvaniya min kir û bû şîrîkê xem û stresa min a tezê, spasiyên xwe pêşkêşî wî jî dikim. Mehmet Emin

Aslan ê hevalê min jî teza min ji hêla şikl û naverokê ve sererast kir lewre gelek gelek spasiya wî dikim. Spasiya hevalên xwe, İzzet Arslan, Ömer Sontur, Muhammet Şafi Beyazpolat, Tofan Sünbül, Esmâ İleri, Mevlüt Oğuz û hemû heval û kesên ku bi awayekî beşdarî li teza min kirine, dikim.

Spasiya mamosteyên xwe yê beşê û malbata xwe jî dikim ku hebûna wan moral û hêz da min û kir û ez bi cidîyet li ser xebata xwe hûr bibim.



DESTPÊK

Folklor ji destpêkê û ta niha ve çavkaniyeke gelekî girîng e bo hemû huneran. Lew ew pêkhateyeke girîng ya çandî û civakî ye ku di encama serborî û tecrubeyên bi salan yê komên mirovan de çê bûye. Edebiyat jî yek ji wan huneran e ku di destpêkê de bi devkî dihat afirandin û wekî beşek folklorê dihat qebul kirin. Bi taybet edebiyata gelêrî her wekî destpêkê niha jî weke beşeke folklorê tê qebul kirin. Ji ber taybetmendiya xwe yê awayê afirandinê ve edebiyata gelêrî balê dîkşîne ser berhemên ku bi taybet bi devkî tînin afirandin û dîsa bi devkî bo nîfşên din tînin veguhestin. Bi dîtin û belavbûna nivîsê re edebiyata gelêrî derbasî ser qaxizê dibe û bi awayekî radîkal ji folklorê cuda dibe û weke qadeke xweser ya çalakiya mirovan tê qebul kirin. Lew bi nivîsê re teknîkên afirandin û veguhastina berhemên jî bi awayekî nû ji binî ve tê guherîn.

Ji hêla din ve folklor bi taybetî jî edebiyata devkî bi berhemên xwe yê ku ji zimanê gel ji bîra kollektîf hatiye afirîn cewhera saf a neteweyî jî di xwe de dihevin. Lew folklor beşeke zindî ye ji çanda neteweyan û di hemû qadên jiyanê de mirov rastî nîşaneyên wê tê. Ji pratîkên jiyanê rojane heta berhemên encama karesat û serkeftinên mezin ên neteweyî her cure afirînên gelêrî yê maddî-manewî dikeve nava vê hewzê. Ji ber vê taybetmendiya xwe, folklor derfetên baş dide wan nivîskarên ku dikevin hewla edebiyateke neteweyî ya ku xwe dispêre çavkaniyên xwemalî. Divê neyê ji bîr kirin ku folklor di demên ewil de ne bi xemên îdeolojîk lê bi awayekî xwezayî ji berhemên edebî re dibe çavkanî. Lê belê di sedsala 18 û 19an de, bi xurtbûna pêla hereketên gelêrî yê ku çanda gelêrî dixin navenda armancên xwe yê polîtîk ve, folklor êdî li gor hinek plansazî û bernameyan weke amûr di qadên weke huner û edebiyatê de tê bikaranîn.

Ji nav cureyên edebiyatê herî zêde roman sûd ji gêncîneya folklorê werdigre. Sedema vê yekê ew e ku sînorên romanê nerm e û qaideyên wê yê teqez nîne lewre derfeta romanê heye ku gelek cureyên edebî û needebî bigre nava xwe. Berhemên kevneşopîya devkî yê wek çîrok, destan, kilam û efsane bi rêya jinûvenivîsandin û montaj kirinê tevî romanê dibin, derfetên vegotinê dewlemendtir dikin.

Ji ber ku di çanda kurdan de gotin an jî deng serdest e danûstendin û afirandin ji nivîsê zêdetir bi gotinê û derfetên gotinê derdikevin holê. Her ji ber vê yekê mirov dikare bibêje ku têkiliyeke xurt di navbera folklor û edebiyata kurdî de heye. Lew piraniya berhemên edebî yên nivîskî ji çîrokên folklorîk hatine girtin. Mem û Zîna Ehmedê Xanî, Dimdim û Zembîlfroşa Feqiyê Teyran îlhama xwe ji destanan ango ji folklorê girtine û hatine nivîsîn. Dîsa şanoya ewwîl a kurdî Memê Alan jî bi awayekî jinûvenivîsandina çîrokeke gelêrî ye. Herwiha em di romanên ewwîl yên kurdî de jî rastî sûdwegirtinên ji folklorê tên, romanên Erebe Şemo, Xatê Xanima Eliyê Evdirehman û romana Hewarî ya Heciyê Cindî hinek ji wan romanên e. Romana kurdî ya ku di sedsala bîstan de berhemên xwe yên ewwîl da bi giştî ji ber nebûna kevneşopeke nivîskî ya kurdî û bi taybetî jî ji ber nebûna kevneşopeke romannivîsînê ya bi kurdî bi awayekî ji mecbûrî li ser hîmên folklorê berhemên dide. Lew ev cureya nû ya xwe dispêre pexşanê û li ser têkiliya nivîsê û derfetên nivîskî tê afirandin, biyan e bo nivîskarên kurdan. Di vira de folklor û vegotinên gelêrî dikevin dewrê, beşdariyê li avakirina zimanê romanê, bûyersazî û lehengan dikan. Dema em li romanên ewwîl ên kurdî dinêrin em dibînin ku ji destanan bigre heta çîrokan ji adetên bigre heta baweriyên batil her cure hêmanên folklorîk di romanên kurdî yên ewwîl de cih girtine.

Ji ber kêmasiyên li jor hatine diyar kirin vegotinên gelêrî yên kurdî hem di avakirina cîhana romanê û hem jî di bikaranîna ziman û avakirina lehengan de bandora xwe li nivîskariya Mehmed Uzun (1953-2007) dike. Lê belê Uzun vê yekê bi zanistî dike, di piraniya hevpeyvînên xwe de vê taybetmendiyê xwe li gel sebeb û paşxaneyê wê îfade dike. Uzun him di hîlbijartina mijaran, him di bikaranîna ziman û teknîkên vegotinê romanên xwe de bi folklorê re dikeve têkiliyê û di naveroka wan de hêmanên wek gotinê pêşyan, biwêj, dua, nîfir, kevneşopên civakî, stran, çîrok, destan û hwd. bikartîne. Li hêla din ew vê bi alîkariya teknîkên modern yên romanê dike û bi vî awayî romanê û kevneşopê nêzî hev dike.

Armanca vê tezê ewe ku hêmanên folklorê kurdî ku yek ji wan hîmên xurt ên romannûsiya Mehmed Uzun e, bi lêkolîneke berfireh derxe holê. Uzun ji romana xwe ya ewwîl a bi navê *Tu* heta bi romana xwe ya dawî *Hawara Dicleyê* hema bêje di hemû romanên xwe de cih dayê hêmanên folklorîk. Bi taybetî di berhemên xwe yên bi navê *Tu*, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, *Hawara Dicleyê* de gelek nimuneyên folklorê kurdî

hene. Di romanên wî yên din de ne bi qasî van çar romanên be jî em rastî nimûneyên folklorê tên. Resenîya vê mijarê ew e ku cara ewwîl dê hemû romanên Mehmed Uzun ji hêlên xwe yên hêmanên folklorê ve were xebitîn. Herwiha girîngiya vê xebatê di tespîtîkirin û diyarkirina cihê taybet yê folklorê di berhemên Mehmed Uzun de ye. Ev yek dê di fêmkirin û naskirina romanên romannûsekî kurd ê girîng de jî karîger be.

Herçiqas beriya niha di çend tez û gotaran de têkiliya folklorê kurdî bi romanên Uzun re bi awayekî hatibe destnîşankirin jî bes ev yek ne mijara bingehîn a wan xebatan e lewre nivîskarên wan ji nêz ve û bi kurahî nêzî mijarê nebûne. Xebata ku dê bi perspektîfa têkiliyên di navbera folklorê kurdî û edebiyata kurdî were nivîsîn dê balê bikêşe ser xemên avakirina neteweyê di romanên Mehmed Uzun de. Ev lêkolîn di heman demê de dê tesîra folklorê kurdî di romana kurdî de nîşan bide û hewl bide sebebên vê tesîrê hinekî be jî zelal bike.

Ev xebat dê bi lêkolîna li ser romanên Mehmed Uzun re hêleke romanên wî yên ku zêde xebat li ser nehatiye kirin bîne rojeva xwe û dê hewl bide girîngiya folklorê kurdî ya ku hîmeke xurt ya romannûsiya Mehmed Uzunî ye diyar bike. Hemû romanên Uzun ji bo vê xebatê kereste ne. Xebatên wî yên din li derveyê lêkolînê ne lê ji bo têgihiştina fikrên Uzun yên di derbarê roman, folklor û dengbêjiyê de dê berhemên wî yên wek lêkolîn, ceribandî û hevpeyvîn jî di ber çav re werin girtin û wek çavkanî werin bikaranîn.

Di encama lêkolînên bo xebatê de hindek xebatên ku li ser Uzun hatine nivîsîn hatin tespît kirin. Hindek ji wan pirtûk, beşên pirtûkan, gotar û tez in. Ömer Uluçay di 2005an de bi navê “Mehmed Uzun Kitabı” (Pirtûka Mehmed Uzun) pirtûkekê li ser berhemên Uzun dinivîse ku ji ceribandînan pêk tê û ne xwedî şêwazeke zanistî ye. Ferzende Kaya bi navê “Uzun Roman: Mehmed Uzun Portresi” (Romana Dirêj: Portreya Mehmed Uzun) pirtûkeke ku ji hevpeyvîn û nivîsên ku bi Mehmed Uzun re û di derbarê wî de hatine kirin, pêk tê amade dike. Nivîsa Abidin Pariltı ya bi navê “Üç Eseriyle Uzun” (Bi Sê Berhemên Xwe Uzun) û ya Selim Temo ya bi navê “Mehmed Uzun Romanlarında Anlatıcılar” (Vegêr di Romanên Mehmed Uzun de) bi nirxandin û tespîtên xwe ve ji nivîsên din cihê ne lew zêdetir bi çavekî rexneyî û dahûrîner hatine nivîsin. Ji ber vê yekê me di xebata xwe de bi awayekî sûd ji wan wergirt. Di pirtûka “Kürt Romanı Okuma Klavuzu” (Rêbernameya Xwendina

Romanên Kurdî) ya ku Abidin Pariltî û Özlem Galipê di 2010an de çap kirin, beşek di derbarê romannûsiya Uzun de ye. Di pirtûka “Guman 2” ya Îbrahim Seydo Aydoğan de jî gotarek bi navê “Romanên Mehmed Uzun: Avakarina Lehengan û Tevna Vegotinê” cih digre.

Di zanîngehên Tirkîyeyê de yek jê bi kurdî û yek jî bi tirkî û 3 heb ji wan bi îngilîzî 5 tez di derbarê romanên Mehmed Uzun de hatine nivîsîn ku her yek ji hêleke cuda ve nêzî berhemên wî bûne. Ekin Bodur di sala 2009an de li Zanîngeha Bilgiyê ya Stenbolê de di teza xwe ya “Modern Kürt Romanında Kurucu Bir Yazar: Mehmed Uzun” (Mehmed Uzun: Nivîskarekî Avakar di Romana Modern ya Kurdî de) de wek avakarê romana modern a kurdî li ser sê hîmên romanên Uzun dixebite: “Kevneşopiya Devkî”, “Edebiyata Sirgunê”, “Modernizm”. Nivîskar di beşa ewwîl de hewl dide têkiliya romanên Mehmed Uzun bi folklorê kurdî re deyne bes vê tenê di romanên wî yên wek *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dîcleyê* de destnîşankirina kevneşopiya dengbêjiyê û hindek destanên kurdî yên ku di van romanên de derbas dibin sînordar dike. Alparslan Nas di 2011an de li Zanîngeha Sabancıyê teza xwe ya bi navê “Between National and Minor Literature in Turkey: Modes of Resistance in the Works of Mehmed Uzun and Mıgırdiç Margosyan” (Li Tirkîyeyê di Navbera Edebiyatên Neteweyî û Mînor de: Modelên Berxwedanê di Berhemên Mehmed Uzun û Mıgırdiç Margosyan de) temam dike. Tez di peywendîya edebiyata neteweyî û mînorê de berhemên her du nivîskarn berawird dike. Canan Bolel di 2013an de teza xwe ya bi navê “Analysis of Kurdish Nationalist Discourse In Mehmed Uzun’s Literature Through The Ethno-Symbolist Approach” (Di Romanên Mehmed Uzun de Nirxandina Gotara Neteweperweriyê ji Hêla Etno-sembolîst ve) li Zanîngeha Sabancıyê amade dike.

Burhan Işık di 2015an de li Zanîngeha Muş Alparslanê di teza xwe ya “Berhema Mehmed Uzun a bi Navê Hawara Dîcleyê de Jiyana Kurdan a Civakî” de li ser hêmanên çanda kurdî ya di romana navborî de disekine, wan tespît dike û disenifîne. Di tezê de nîqaşên kûr yên li ser têkiliya roman û folklorê nîne, ji hêla teknîkên nivîsandina tezê ve qels xuya dibe.

Ümran Roda Kavak teza xwe ya bi navê “A Narratological Analysis Of ‘Mirina Kalekî Rınd’ (The Death Of Elderly Rınd) And ‘Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê’ (A

Day From The Days Of Evdalê Zeynikê) By Mehmed Uzun” (Nirxandineke Vegêrannasiyê li ser Romanên Mehmed Uzun, Mirina Kalekî Rind û Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê) di 2019an de li Îstanbul Şehir Üniversitesiê tamam dike.¹

Tezên li jor hatine destnîşan kirin li ser têkiliya folklorê bi romanên Uzun re bi kûrahî nêzî mijarê nabin û hemû romanên wî di vê çarçoveyê de nayên nirxandin. Xebata ku ji hêla me ve dê were kirin dê bi taybetî li ser têkiliya folklorê di hemû romanên Mehmed Uzun de were sekinîn lew romanên wî heta niha bi vê perspektîfê nehatine nirxandin. Weke çavkaniyeke edebîyata modern hêmanên folklorê yên di romanên de cih girtine werin tespît kirin û têkiliya wan a bi roman, zimanê romanê û lehengan re were tespît kirin.

Di warê lêkolînên li ser folklor û edebiyata kurdî de xebatên bi vî rengî gelekî kêr in. Ev xebat dê bibe yek ji wan lêkolînên destpêkê di vî warê de. Têkiliya romana kurdî bi folklor û nasnameya neteweyî re dê di çarçoveya romanên Mehmed Uzun de were vekolan. Xebat dê bi rêbaza nêz-xwendinê, tespîtîkirin û şîrovekirina hêmanên folklorê di romanên Uzun de were kirin. Xebat ji bilî destpêk û encamê ji sê beşên bingehîn pêk tê. Di beşa ewil de li ser têgeha folklorê, xebatên li ser folklorê kurdî, çanda devkî, têkiliya edebiyat û folklorê û têkiliya edebiyata kurdî bi folklorê re hate sekinîn. Beşa duyem li ser jiyana Mehmed Uzun, berhemên û romannûsiya wî ye. Beşa dawî jî hêmanên folklorê yên ku di romanên Uzun de derbas dibin hatine tespîtîkirin û bi şîrove û nirxandin li gor peywenda folklor û romanê li ser wan hatine kirin.

¹ Li gel balkêşiya mijarên van tezên bi îngilîzî hatine nivîsîn, ji ber kêmasiya me ya di vê mijarê de me nekarî bi awayekî xurt sêdê ji wan bigrin.

1. BEŞA YEKEM: FOLKLOR: PÊNASE Û DÎROK

Di vê beşê de dê li ser pênaseya folklorê, dîroka wê û di nava kurdan xebatên li ser folklorê hatine kirin, were rawestan.

Folklor yek ji wan zanisten herî ciwan e ku di encama humanîzm û ronakgeriya li ewrupayê derdikeve holê û di maweyeke gelekî kurt de ji edebiyatê bigre heta bi siyasete tesîrê li ser gelek qadan dike. Boratav di pênaseya xwe ya vê zanista nû de balê dikşîne ser têkiliya wê ya bi zanistên din re: “Folklor, zanisteka ku li xaçerêya gelek zanistên disekine an jî bi wan re gelek mijaran parve dike” (1995: 6).

Bi kurdî bêjeya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Li gorî Celadet Bedirxan “folklor, zanîn an zanistiya xelkê ye”. Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî “zargotin” û “zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanistiya şarî” tê gotin (Yıldırım û yên din, 2013: 12). Herwiha bo vê têgehê peyva zargotin jî tê bikaranîn ku ji hêla folklornasên kurd ên sovyetê ve hatiye bikaranîn. Bo nimune Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl di sala 1978an de berhevokeke folklorê ku ji du cildan pêk tê diweşînin ku navê wê *Zargotina Kurdan* e. Lê belê divê were gotin ku peyva zargotinê teng e û nikare şûna peyva folklorê ku hem navê zanistê ye û hem jî balê dikşîne ser hemû cure afirandinên gelêrî, bigre. Ji hêla din ve peyva zargotinê dîsa û bi tenê balê dikşîne ser afirandinên gelêrî yên devkî ango bale dikşîne ser berhemên edebiyata gelêrî.

Di derbarê pênaseya folklorê û fehma wê de gelek nihêrînên cihê hene ku vê yekê tesîra xwe li pênaseyên wê qadê jî kiriye. Folklornasê kurd Izzeddîn Mistefa Resul di derbarê folklorê û pênaseya wê de wiha dibêje: “Di demên ku di wateya îroyin de zanistî pêş neketibû, yanî zanyariyên pozîtîf derneketibûn; mirovên û baweriyên xwe, tesewirên xwe yên der bareyê paşeroj û pêşeroja dinyayê de, li dû şertên çandî-bawerî yên wê demê bi rêya hin formên vegotinê dianîn ziman. Em îro ji wan formên vegotinê re, ku di encama afirîneriya hevpar a civakê de derketine; mîtos, efsane, destan, çîrok, çîrokên gelêrî, pêkenok, tiştanok, stran, gotinên pêşyan, mersiye, lorîn û hwd. dibêjin. Folklor jî, ji wê zanyariyê pêşin raman re tê gotin ku; van hemî cureyan li gorî prensîbên zanyariyê tesnîf dike û li ser wan tehlîlan dike” (Vgh. ji Resul, Attî, 2013:

3). Li gor vê yekê folklor hê beriya ku wek zanistêke serbixwe û sînorên wê diyar derkeve holê jî karîgeriyeke xwe ya mezin hebû li ser jiyana civakan.

Folklornas Ramazan Pertev di pirtûka xwe ya bi navê *Folklor û Nasnameya Neteweyî Ya Kurdî* de piştî ku ji folklornasên biyanî û kurdan pênaseyên folklorê neqil dike, bi xwe pênaseyeke din dike; “Folklor, zanistêke mirovî û civakî ye ku berhem û keresteyên li ser zemîna çanda maddî û manewî yên gelêrî li gorî metodên xwe yên zanistî, vedikole, tomar dike, polîn dike û dinirxîne” (2019: 28).

Li gorî folklornasê tirk Erman Artun, Folklor; “ji zayinê heya mirinê, hemî hêmanên çanda maddî-manewî yên di jiyana mirovan de, bi rengê zanistî berhev dike, li ser wan lêkolînan dike, wan dinirxîne û bi rengê sistematîk şîrove dike û bi vî rengî serencama pêşketina çanda gel nîşan dide û di navbera çandên di de cudahî û hevbeşiyên dibîne” (Vgh. ji Artun, Attî, 2013: 4).

Li gor pênaseya Artun dikare were gotin ku folklor ew zanist e ku her cure afirandinên gelêrî di nava xwe de dihevine, wan li gor hin regezan disenifîne û lêkolînan li ser wan dike. Folklor di heman demê de şîroveyan jî li ser keresteyên folklorê dike û bi vî awayî derbarê guherîn û geşedanên wê civakê û berhemên wê de digihêje hin encamên karîger bo nasîn û fêmkirina wê. Berhemên folklorê anonîm in ango afrînerê wan ne diyar in û ew berhemên kollektîf yên civakên xwe ne ku bi dirêjahiya demên dirêj teşe girtine û bi vî awayî bûne mîrasya hevpar a wê civakê. Divê were destnîşankirin ku ti berhem nîne ku cara ewil ji hêla kesekî diyar ve nehatibe afirandin. Lê belê di demên ku ji nivîsê zêdetir gotin li pêş bû, berhemeke devkî dema ji hêla kesekî diyar ve dihat afirîn û bi devkî derbasî kes û komên din dibû, navê afrîner û hindek caran hin beşên wê berhemê diguherî, hindek tişt lê zêde dibûn an jî jê kêmkirî dibû.

Antropolog Jack Goody di pirtûka xwe ya li ser mît, rîtuêl û gotinê de, di derbarê vê mijarê de wiha dinivîse: “Mirov nikare bibêje ku di çandên devkî de nivîskar bi giştî tê ji bîr kirin lê belê bi piranî girîngiya wan zêde nîne. Di hindek stran û kêmanîyan jî di destanan de nivîskar diyar e bes di mît û çîrokan de nivîskar anonîm e. Helbet ev nayê wê wateyê ku ev cure ne tabîê fikra mafên milkî ne. Stran bi hin

klanan re, vegotinên devkî bi hin komên spesifik ve tên naskirin” (Goody, 2018: 58-59).

Di derbarê kollektîfbûna berheman de Yıldırım û yên din balê dikşînin ser ecibandina berheman û wiha dibêjin:

Bi gotineke din di zanista folklorê de peyva “kollektîf” ji bo berhemên ku ji aliyê temamê civakê ve hatin qebûlkirin tê bikaranîn. Yanî kollektîfî ne di afirandinê de, lê belê di ecibandinê de ye. Ji aliyekî din ve dema ku em bala xwe didin strîna dengbêjekî em dibînin ku afirîneriyeke taybet, şiyana jiberkirinê, hiş û rewşa rihî ya kesîni çiqas girîng in (Yıldırım û yên din, 2013: 12).

Li gor vê yekê li gel berhemên gelêrî an jî kollektîf taybetmendiyeke xweser yên her îcrakerî ji hev cudaye û berhema ku tê îcrakirin li dor van xalan teşe digre, ji yên din cuda dibe.

Her çiqas dema folklorê tê gotin zêdetir berhemên edebiyata gelêrî were fêmkirin jî sînore folklorê berfirehtir e ku adet û tore, bîr û baweriyên gelêrî û zanyariyên gelêrî yên beşên din ên folklorê ne ku her yek ji van beşan di nava xwe de gelek beşên din dihewîne. Folklor pêkhatiya herî muhîm ya çanda civakan e ku di avakirina taybetmendiyeke ji milletên cudatir de xwedî roleke mezin e. Ango folklor bi berhemên xwe ve, parçeyeke girîng ya nasnameyên milletan e. Folklor herwiha bo lêkolînê qadên din ên zanistî yên wek dîrok, sosyolojî, antropolojî û edebiyatê keresteyên girîng dide lêkolîneran.

Li gor gelek qadên zanistê folklor ne xwedî dîrokeke kevn e. Her çiqas di gelek qadên din ên wek edebiyat, dîrok, ol û hwd. de em rastî keresteyên folklorê werin jî heta sedsala 19em folklor wek qadeke serbixwe nebibû mijara xebatên zanistî. Lew heta wê sedsalê afirandinê gelêrî yên ku dê paşê têketana nav qada folklorê ji hêla bajariyan ve ti qîmet nedidîtin û gelek caran ew wek malê gundiyeke cahil dihatin dîtin (Attı, 2015: 38-40). Lê belê bi belavbûna matbayê re û pê re jî bi destpêkirina proseya netewetiyê re afirandinê gelêrî bi taybet jî yên devkî weke nirxên herî saf û orjînal ên neteweyan hate dîtin û bûn mijara gelek lêkolînan ku vê pêvajoyê wek qadeke nû ya zanistên mirovî, zanista folklorê derxiste holê.

Di derbarê peyva folklorê de hindek angaşt hene, tevî ku cara ewwil bi wateya xwe ya îro ev peyv ji hêla nivîskarê îngîlîz William John Thoms ve di hejmareke kovara Atheneumê de hatibe bikaranîn jî lêkolînên îro nişan dide ku Thoms di sazkirina vê têgehê de îlhama xwe ji *volkskundeya* almanî ya ku cara ewwil ji hêla Johann Felix Kneffel ve di sala 1813an de hatibû bikaranîn, sitendiye (Gözüyayın, 1991: 9-14).

Divê were gotin ku xebatên li ser folklorê beriya ku zanista folklorê derkeve holê jî dihatin kirin, ji demên ewwil yê dîtina nivîsê ve nivîskaran an jî bi giştî kesên ku bi lêkera nivîsandinê re eleqedar bûn dema li ser ol, dîrok an jî nasandina milletekî dinivîsandin bi awayekî cih didan hêmanên çanda wan jî ku gelek caran ji keresteyên folklorê pêk dihatin. Di derbarê vê yekê de Boratav van agahiyan neqil dike:

Di yunana kevn de Pausanias (Beriya mîladê sedsala duyem) bi qalkirina jiyan û baweriyên çînên jêr yê welatê xwe re wek nivîskarê ewil ê li ser folklorê xebat kiriye tê dîtin. Di berhemên hindek dîroknasên kevn yê wek Herodot (mirina wî beriya mîladê 425) û Strabon (Beriya mîladê sedsala yekem) jî em di derbarê jiyan û milletên din de rastî agahiyan tên. Lê belê guman jê nîne ku ev weke xebatên zanista folklorê yê mistaqil jî nayên dîtin (2000: 7-8).

Li gorî Özkul Çobanoğlu folklor bi tesîra bizava felsefî, romantîzmê û bizava siyasî neteweperweriya romantîk ya ku îlhama xwe ji bizava felsefî stendibû, digre. Fikrên filozofên wek Schelling, Hegel û bi taybetî yê Johann Gottfried Von Herderî li ser belavbûn û xurtbûna xebatên folklorê çêdibe. Herder bi xebata xwe ya navdar a li ser stranên gelêrî yê almanî berê edebiyatvan û lêkolîneran dide folklorê, nexasim jî edebiyata gelêrî (Çobanoğlu, 2005: 18).

Necat Keskîn di derbarê fikrên Herder yê li ser gel û edebiyata gelêrî de wiha dibêje:

Li gorî Herder her kom an jî gel xwedî “rih”ekî ye ku ew vê yekê wek “volksgeist” (rihê gel) bi nav dike. Ev “rih”e tiştê ku koman ji hev cuda dike an jî wan digihîne hevûdu. Li gorî Herder ev “rih” di nava “edebiyata gel” de heye û ji ber vê yekê jî ew giraniyê dide edebiyata gelêrî. Bi wî re û piştî wî xebatên li ser edebiyata

“gel” zêde dibin ku mînakên herî navdar Brayên Grimm û xebatên wan in (2019: 26-27).

Piştî xebatên Herder, xebatên Birayên Grimm dibin pêngaveke mezin di warê xebatên li ser folklorê de. Di sala 1812an de cilda ewwil ya pirtûka çîrokên gelêrî bi navê *Kinder und Hausmarchen* (*Çîrokên Zarokan û Malê*) diweşînin. Birayên Grimm bi awayekî zanistî li ser devok û awayên wan jî radiwestin. Kesên ku yekem car li ser xeberoşkan lêkolîn kirin ew in. Herwiha wan pêşengiya teoriyên Zimanên Hînd-Ewropî jî kirin. Ji bo birayên Grimm, çîrok û efsaneyên gelêrî bermayeyên mîtolojiyê hepar û şertên taybet ji bo famkirina pêkhatina cudayiya di nav gelan de ne (Yıldırım û yê din, 2013: 20).

Li hêleke din Birayên Grimm bi xebatên xwe yê li ser folklorê balê dikşînin ser çavkanî û taybetmendiya berhemên devkî jî:

Ji ber vê bi piranî ew li ser berhemên çandî yê devkî sekinîne. Li gorî wan ev berhemên folklorî, berhemên mîrasa çanda hepar in. Berhemên devkî, di demên pir kevin de ji aliyê bavûkalên hepar ve derketine holê. Mirov dikare bi rêya wan têkilî û pêwendiyên neteweyên niha derxîne holê. Lewma di xebatên wan ên li ser zimanê elmanî de armanca wan ew bû ku “zimanê hepar ê malbatê” derxin holê (Yıldırım û yê din, 2013: 20).

Weke ku li jor jî amaje pê hatiye kirin motîvasyona herî mezin a van kesên ku berê xwe dane folklorê ew bû ku bi rêya folklorê xwe bigihînin rihê saf ê gel an jî zimanê hepar ê ku gel pê diaxive. Lew heta wê serdemê zimanê ku gel pê diaxivî û yê rêvebiran ji hev cuda bû. Bi pêla xebatên li ser folklorê re di pozîsyona zimanê gel de jî bi awayekî erênî guherîn çêdibe û zimanê ku gel pê diaxive dibe amraza herî xurt ya sazkirina yekîtiyên neteweyî.

Piştî xebatên Birayên Grimm li seranserê ewrupayê û paşê jî li asyayê her milletekî berê xwe dan folklorê xwe, bi çapkirina pirtûkên berhevokên folklorê, derxistina kovaran û avakirina sazî û dezgehên ku focusa wan bi taybet li ser berhevkirin, arşîvkirin û lêkolînên li ser vê mîrasa neteweyî bû, folklor weke zanistekê nû û ciwan tê qebûl kirin (Keskin, 2019: 36-41).

Li Fînlandiyayê di sala 1828an ji hêla bijîjk E. Lönnrot ve xebateke berhevkirina destana neteweyî ya milletê finî dest pê dike. Lönnrot vê destanê 1849an de diweşîne. Di sala 1811an de ji hêla ciwanên swêdî ve bi heman armancê komeleyek tê ava kirin û dikevin hewldanên berhevkirina kevneşopiyên gelerî. Bi pêşengiya komeleyê kesên wekî Geïger, Afzelius û Tegner stranên gelêrî berhev dikin û diweşînin (Çobanoğlu, 2005: 29).

Li Îngîltireyê xebatên folklorê xwedî du serdeman e. Ji van ya ewil, serdema ku bi rabûna pêla romantîzmê re dest pê dike. Di vê serdemê de folklornasên îngîlîz bi tesîra entîkevanên alman û danîmarkî yên ku berhemên kevn yên gelêrî berhev dikirin, berê xwe didin alav û keresteyên gelêrî yên wek stranên gelêrî, destan, çîrok û adet û baweriyên batil û van berhev dikin. Serdema duyem jî bi weşandina gotara William J. Thoms ku tê de bo ev ilmê nû peyva folklorê pêşniyar dikir. Ev nivîs di sala 1846an de di kovara *Athenaeum* de çap dibe. Piştî vê yekê li Îngîltireyê xebatên li ser folklorê zêdetir dibin û di sala 1878an de di cîhanê de yekemîn komeleya lêkolînên folklorê ya bi navê the *Folklore Society* tê avakirin. Ev komele paşê bi navê *Folklore* kovarekê jî diweşînin (Çobanoğlu, 2005: 34-35).

Xebatên li ser folklora kurdî heta sedsala 19an bi pirranî ji hêla dîroknas, gerok, misyoner û nivîskarên mêvan tê kirin. Di berhemên li ser dîrok û corafiyayên cîhana misliman de yên ku ji hêla nivîskarên ereb ve hatine nivîsîn em rastî hindek agahiyên di derbarê kurdan de tên. Di van pirtûkan de di derbarê bawerî, adet û toreyan kurdan de agahiyên balkêş hene. Gerokê tirk yê navdar Evliya Çelebî (1611-1684) di pirtûka xwe ya bi navê *Seyahatnameyê* (1938) de ji stranan, heta bi efsaneyan, ji navê hindek xwarinan heta bi baweriyên batil di derbarê folklora kurdî de cih dide gelek tiştan.

Di sedsala 18em de mîsyonerê îtalî Maurizio Garzonî (1734-1804) weke mîsyoner maweyeke dirêj li amêdiyê dimîne, hînî kurdî dibe û xebata xwe ya bi navê *Grammatica E Vocabolario Della Lingua Kurda (Gramer û Ferhenga Zimanê Kurdî)* amade dike ku tê de cih dide du duayên kurmancî. Ev pirtûk di sala 1787an de li romayê tê çapkirin û ji hêla lêkolînerên kurd ve weke destpêka xebatên kurdolojiyê tê qebul kirin. Di serê sedsala 19an de mîsyonerekî din yê îtalyan, R. P. Giuseppe Campanile (1762-1835) di pirtûka xwe ya bi navê *Storia della Regione del Kurdistan e delle sette di religione ivi esistenti* (1818) (*Dîroka Herêma Kurdistanê û Mezhebên*

li *Wê Derê*) de di derbarê adet, bawerî û jiyana kurdan de agahiyên balkêş dide (Campanile, 2013: 36). Herwiha nivîskarê ermen Xaçatur Abovyan (1805-1848) di kovara Kafkazê de li ser dîrok, ziman û etnografyaya kurdan disekine (Alakom, 100: 1991).

Di sedsala 19an de gelek gerok û rojhilatnasên emerîkî, elman û îngîlîz di Kurdistanê re derbas dibin û paşê tecrubeyên xwe weke pirtûk çap dikin. Di van berhemana de bo folklor û çanda kurdan gelek kereste tên qeyd kirin. Li gor ku Yıldırım û yê din radigihînin yek ji wan kesan jî Horatio Southgate (1812-1894) ê ku di salên navbera 1834-1839an de weke mîsyoner li gelek herêmên kurdnişîn û rojhilata navîn digere. Southgate di sala 1840an de tecrûbe û bîrhatinên xwe bi navê *Narrative of a Tour through Armenia, Kurdistan, Persia, and Mesopotamia (Vegêra Geşteke li Ermenistan, Kurdistan, Îran û Mezopotamyayê)* li new yorkê çap dike ku pirtûkê de ji erf û adetan heta cil û bergan, ji stranên gelêrî heta bi cureyên xwarin û vexwarinan, di der bareyê civaka kurdî de gelek agahî hene (2013: 53).

Di van salan de em rastî xebatên alimên kurdan bixwe jî tên. Di sedsala 18an de Melayê Erwasî bi kurmançî pirtûkekê li ser bijîjkiya gelêrî dinivîse. Erwasî di vê pirtûkê de navên nexweşîyan, sedema derketina wan û dermanên wan dinivîse (Çiftçi, 2019: 26).²

Li gorî Celîl û Celîl, Peter Lerch (1828-1884) yekemîn ewrûpî ye ku li ser dîrok, ziman, etnografya û folklorê kurdan dixebite. Bi kurmançî û zazakî hindêk nimûneyên folklorê berhev dike (2012: 12-13). Piştî wî di sala 1858an de wan wekî pirtûk, bi navê *Forschungen über die Kurden und die Iranischen Nord-Chaldäer (Lêkolînên li ser Kurdan û Îranîyên Keldaniyên Bakur)* li petersbûrgê weşandiye. Ev xebat nemaze jî bo zaravayê zazakî gelekî gîrîng e. Lewra ev yekem metnên zazakî ne ku hatine tomarkirin (Yıldırım, Pertev, Arslan, 2013: 53).

Tam di van salan de Alexander Jabayê (1801-1894) polonî ku konsolosê Çarîtiya Rusyayê yê erzurimê bû, têkiliyê bi alim û melayên kurd yê ku li medreseyan

² Pirtûk cara pêşî jî hêla M. Reşit Irgat ve bo çapê tê amade kirin û ji nava Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve di sala 2000î de tê weşandin. Herî dawî Kadri Yıldırım di sala 2014an de li gel wergera wê ya tirkî, ji nava Weşanên Zanîngeha Mardîn Artukluyê dide weşandin (Çiftçi, 2019: 26).

erzurimê ders didan re datîne û bi motîvasyon û handana wî gelek xebat li ser folklorê kurdî tê kirin. Bi taybet xebatên Mela Mahmudê Bazîdî (1797-1867) di vê qonaxê de gelekî girîng in. Bazîdî çîrokên kurdî, stran, klam, gotinên pêşyan û adet û baweriyên gelêrî weke pirtûk amade dike û teslîmî Jaba dike (Celalî, 2016: 30-31). Piştî xebatên Jaba yê bi Bazîdî re gelek rojhilatnasên din ên wek Albert Socin (1844-1899)³, Eugen Prym (1843-1913), Oskar Mann (1867-1917)⁴, A. Von le Coq (1860-1930)⁵, Roger Lescot (1914-1975)⁶, Basil Nikitin (1885-1960)⁷ û gelek kesên din xebatên hêja li ser folklorê kurdî dikin. Van kesan li gel xebatên berhevkarîya keresteyên folklorê, di derbarê kurdan û folklorê wan de pirtûk û gotarên kêrhatî jî nivîsin. .

Di nav kurdan bixwe xebatên berhevkarîna folklorê kurdî di sere sedsalê 20an de li Stenbolê ku wê demê navenda rewşenbîriya kurdî û gelek milletên din ên osmanî bû, dest pê dike. Rewşenbîrên kurdan yê wê serdemê hindekî jî bi tesîra tirkî girîngiya folklorê fêhmî dikin û di kovar û rojnameyên wek *Rojî Kurd* (1913, 4 hejmar), *Hetawî Kurd* (1913-1914, 10 hejmar) û *Jînê* (1918-1919, 25 hejmar) de di derbarê girîngiya folklorê de nîqaşan dikin. Herwiha di van weşanan de hindek çîrok, stran û gotinên pêşyan jî tên weşandin. Piştî avabûna Komara Tirkîyeyê, rê li ber xebatên kurdan tê girtin. Rewşenbîrên kurd yê ku ji neçarî derbasî Suriyeyê dibin li wira piştî demekê dîsa organîze dibin û bi pêşengiya Celadet Alî Bedirxan (1893-1951) ve kovara *Hawarê* (1932-1943, 57 hejmar) derdikeve ku ev kovar di warê berhevkarîna folklorê kurdî de gelekî girîng e. Di *Hawarê* de gelek stran, çîrok, destan, klam,

³ Rojhilatnasê Swîsreyî, li gel erebî û aramî, kurdî jî hîn dibe û li gel Eugen Prym, xebateke du cildî amade dike. Cîlde yekem ya bi navê *Kurdische Sammlungen: Erzählungen und Lieder (Koleksiyonên Kurdî: Çîrok û Stran)*, çîrok û stranên kurdî yê ku ji derdora mêrdinê berhevkarîbûn, di sala 1887an de li Petersburgê diweşîne. Dîsa li gel Prym, di sala 1890î de Cîlde duyem ya vê xebatê ya ji beyt, destan û stranên kurdî yê herêma botanê pêk tê, li gel nîşeyên kêrhatî çap dikin. Di vê berhevokê de varyanteke destana *Mem û Zînê*, *Zembîlfroş*, *Qewlê Hespê Reş*, *Ferx û Stî* û *Yusiv û Zuleyhayê* heye ku bo lêkolînên folklorê kurdî gelekî girîng in.

⁴ Rojhilatnasê elman, di destpêka salên 1900î de li nav kurdan lêkolîn dibe, berhemên folklorê û destxetên kurdî berhev dike. Li ser mukriyanî û zazakî lêkolîn dibe. Di pirtûka xwe ya bi navê *Die Mundart der Mukri-Kurden* (1906) (Kurdên Mukrî) de gelek beyt û destanên bi zaraveyê mukriyanî diweşîne ku di nav wan de varyanteke destana *Mem û Zîn*, *Dimdim* û *Zembîlfroşê* jî hene.

⁵ Arkeolog û rojhilatnasê elman, bi navê *Kurdische Texte (Tekstên Kurdî)* xebateke wî heye ku ji stran û çîrokên kurdiya kurdî û zazakî pêk tên. Coq vê xebatê di sala 1903an de diweşîne.

⁶ Rojhilatnas û diplomatê frensî, li nava kurdên Suriyeyê û li gel Celadet Alî Bedirxan xebatên folklorê, rêzimanî dike. Lescot herwiha li ser êzîdîyan jî xebateke qadî dike. Varyanteke tekûz ya destana *Memê Alan* berhev dike û tevî wergera wê ya frensî diweşîne. Di sala 1945an de li Zanîngeha Sorbonne'yê beşa kurdî vedike (Lescot, 2013: 3).

⁷ Konsolosê Rus û rojhilatnas, di sala 1915an de dibe konsolosê Urmiyeyê û dest pê dike li ser kurdan û dîroka wan dixebite. Gelek stran û çîrokên kurdî berhev dike. Pirtûka wî ya bi navê *Les Kurdes: Etude Sociologique et Historique* (1956) (Kurd: Lêkolîneke Sosyolojîk û Dîrokî) bo lêkolînên kurdî girîng e.

gotinên pêşyan û hwd. tên berhevkerin û weşandin. Piştî kovara *Hawarê* ji hêla Kamiran Alî Bedirxan (1895-1978) ve kovarek bi navê *Roja Nû* (1943-1946, 73 hejmar) li Beyrûdê tê derxistin ku ew jî her wekî *Hawarê* bi peywira berhevkerina folklorê radibe û di hemû hejmarên xwe de gelek keresteyên folklorê kurdî diweşîne (Pertev, 2019: 273-286)

Li Ermenîstana sovyetê di sala 1930an de jî rojnameyek kurdî bi navê *Riya Teze* (1930) ji hêla kurdên sovyetê ve tê derxistin. Kurdên sovyetê yên ku xwedî azadiyeke qismî bûn, vê yekê kir ku bo kurdî têkevin nava hewildanan û dest pê kirin di rojnameyê de di derbarê gelek tiştan de nivîsîn. Pişt re gelek xebatên folklorê ji hêla kesên wek Heciyê Cindî (1908-1990)⁸, Emînê Evdal⁹ (1906-1964), Xelîlê Çaçan¹⁰ (1924-1981), Celîlê Celîl (1936) û Ordîxanê Celîl (1932-2007) hatin kirin. Bi taybet xebatên Heciyê Cindî û Celîlê Celîl gelekî girîng in. Di sala 1936an de ji hêla Heciyê Cindî û Emînê Evdal ve pirtûka *Folklorê Kurmanca* tê weşandin. Tê de li gel destanên wek *Kerr û Kulik*¹¹, *Memê Alan*, *Dota Gurca*, *Zembîlfroş*, *Dimdim* û gelek çîrok, kilam û stran tevî agahiyên gotoxên wan cih digrin. (Cindî, Evdal, 2008: 32). Li gor lêkolîneran peyva folklorê cara ewil bi vê pirtûkê re dikeve nava zimanê kurdî. Cindî herwiha xebateke berfireh di warê berhevkerina çîrokan de dike. Xebata wî ya bi sernavê *Hîkayatê Cimeta Kurdan* (1961-1988) weke 6 cildan çap dibe (Cindî, 2014-9). Celîlê Celîl him bi xebatê bi birayê xwe Ordîxan re him jî bi tena serê xwe li erdnigariyeke fireh ya kurd lê dijîn nimûneyên folklorê berhev dike. Ji bilî kurdên kafkasyayê Celîl, di salên destpêka 1980yî de li nav kurdên Suriyeyê çîrok, serpêhatî, destan, kilam û gotinên pêşyan berhev dike. Di sala 2011an de jî li Îranê, li nava kurdên xorasanê sêxiştîyan berhev dike (Celîl û Şadkam, 2018-12).

⁸ Folkloras Heciyê Cindî bi tenê serê xwe weke enstîtuyekê xebitî û gelek berhemên berevokî da çap kirin. Hin ji wan ev in: *Kilamê Cimeta Kurmanca* (1936), *Şaxêd Eposa Koroxlî* (1953), *Meselok û Xeberokêd Cimeta Kurda* (1985), *Ûsiv û Zelîxe* (2003).

⁹ Etnograf Emînê Evdal di warê pedagojî, etnografya û folklorê kurdî de xebatan dike. Doktoraya xwe li ser jinên kurdan di peywenda “netewzanî” û “folklorzanîyê” de dike (Boyik, 2012: 148-149).

¹⁰ Xelîlê Çaçan li gel karê berhevkarî û edebiyatê 24 salan serokatiya beşa kurdî Ya radyoya erîvanê dike û arşîveke mezin ya muzîka kurdî tomar dike. Hindek ji berhemên wî ev in: *Kilamên Cimeta Kurdan* (1963), *Du Poem* (1965), *Qisên Cimaetê* (1969) (Boyik, 2012: 344-347).

¹¹ Di vê pirtûkê de 30 varyantên vê destanê cih digre. Bnr. Heman berhem r. 47-303. Herwiha, Cindî teza xwe ya doktorayê jî li ser vê destanê dike. Bo agahiyên zêdetir bnr: Boyik, Eskerê, Çanda Kurdên Sovyetê, Weşanên Deng, 2012: Stenbol.

1.1. Çanda Devkî

Çand, her cure nîrxên maddî û manewî yê neteweyan in ku ev nîrx regekî û nasnameyek xweser dide wan ku ev yek wan jî neteweyên din cuda dike. Ango her milletek xwedî çandekê ye jî çandên milletên cudatir. Tam di derbarê vê yekê de Dursun Yıldırım wiha balê dîkşîne ser ev taybetmendiya cudaker a çandê: “Çanda ku neteweyan jî hevdu cuda dike û têkiliyên wan ên di navbera hev de sererast dike, bi taybetmendiya xwe xwedî wesfeke netewî ye” (1998: 37).

Christine Allison çanda devkî wek kevneşopa devkî bi nav dike û pênaseya wê wiha dide; “kevneşopa devkî, berhemên çandî yê ku bi devkî tîne îfadekirin û jî kesekî bo kesekî din bêtî bikaranîna nivîsê tîne veguhaztin” (2008: 52). Di encama vê veguhastinê de berhemên devkî li gorî veguhêzer guherînên mezin derbas dike, taybetmendiyan zimanî û çandî yê nû li xwe zêde dike.

M. Emir İlhan di peywendiya têkilî/ragihandinê de nêzî meselê dibe û têgehê wiha rave dike: “Çanda devkî, serdemên ku ragihandin bi piranî girêdayî gotinê ye, îfade dike. Çanda devkî ya ku xweîfadekirin, şayesandina xwezayê û derxwezayê angî fikra edebî ya ku bi bingeha gotinê rû dide, li gorî xwezaya gotinê pêşve diçe” (2018: 110).

Abidin Pariltı di pirtûka *Dengbejler Sözü'nün Yazgısı* de bo çanda devkî wiha dibêje: “çanda devkî, ew çandên ku têkilî bi tenê zimanê axaftinê û bîra dîrokî pêk tîne, hebûna nivîs û matbayê nizanin, heke bizanibin jî wê bikarnaynin an jî di jiyana xwe de zêde cih nadinê” (2005: 18). Bi gotineke din li cihê ku çanda devkî an jî gotin serdest be, li wira nivîs çanda nivîskî qels û ne berbelav e.

Di van hemû pênaseyan de eşkere dibe ku di çanda devkî de deng angî gotin li pêş û serdest e, dan û sitandin bi derfetên gotinê çê dibe û ev serdestiya gotinê ya ku hukmê xwe li hemû qadên jiyanê dike çandekê pêk tîne. Di vê çandê de berhemhênan bi devkî ye ku jî bo di bîrê de bimînin xwedî rîtmê xurt in û gelek caran xwedî îfadeyên qalibgirtî ne ku jî encama tecrîbe û bikaranînên dîr û dirêj pêk tîne. Necat Keskin di derbarê çanda devkî de balê dîkşîne ser bîrê û wiha berdewam dike:

Di çanda devkî de tiştên ku nayên dubarekirin û di bîrê de namînin wînda dibin an jî civak tişteki din ê ku cihê wan bigire dixê dewsa wan hêmanan de. Gotin, çalakî an jî tevgera ku jê re pêwîst e dubare dibe û dibe kevneşopîyek; ên ku dubare nabin jî wînda dibin an jî diguherin. Loma di çanda devkî de guhartoyên (varyant/versiyon) hêmanên çandê zêde ne (2019: 140).

Walter J. Ong di pirtûka xwe ya bi navê *Sözlü Kültür ve Yazılı Kültür: Sözlü Teknolojileşmesi* de çanda devkî û taybetmendiyên wê bi xalên li jêr, wîha teswîr dike:

1. Lêzêdekirina li Şûna Hevoka Rexî. 2. Li Şûna Çareserkerinê Komkirin.
3. Tekrara Zêde yan jî bi Bereket. 4. Muhafazakar an jî Kevneopparêz. 5. Nêzikbûna Jiyana Mirovan. 6. Şêwaza Têkoşîner. 7. Li Şûna Mesafeyê Hemhestbûn û Beşdarvanî. 8. Dengiya Hawîra Neguherbar. 9. Ne Razber, Girêdayî Rewşê (2007: 53-78).

Ev hemû xal bi awayekî taybetmendiyên çanda devkî dinimîn û kêr zêde di gelek çandên devkî de tên dîtin.

1.2. Têkiliya Folklor û Edebiyatê

Folklor beşeke mezin e ji çandê û li gel gelek hêlên xwe folklor û çand, li gor pêdiviyên xwe dikevin nava danûstendinan. Edebiyata ku berhema çandê ye jî di destpêkê de xwe dispêre hindek hêmanên çandî û civakî. Lewre têkiliyeke xurt û bîvê nevê di navbera folklor û edebiyatê de heye. Lew heta xurtbûn û belavbûna nivîsê edebiyata gelêrî ya ku di roja îro de beşa herî girîng ya folklorê tê hesabandin herwîha bi giştî bo edebiyatê jî dihate bikaranîn. Di serdemên ku nivîs hê nehatibû îcad kirin de, çanda devkî an jî edebiyata devkî bi berhemên xwe pêdiviyên estetîk yê civakî û şexsî yê mirovan dabûn dike. Mît, destan, stran, şîn, efsane û hwd. ew berhemên devkî ne ku di heman demê de weke edebiyata tebeqa jêr û heta ya jor jî dihate qebul kirin. Lew di serdemên dêrîn de desthilatdaran di heman demê de xwedîtî li helbestkarekî dikir. Di derbarê vê yekê de di dest me de zêde agahî nînin, lê belê ji destana Homeros

ya bi navê *Odyseiyê* de em dibînin ku qralekî xwedî dengbêj heye. Di destana *Odyseiyê* de dema Odyseus dibe mêvanê qralekî li wira ozanekî¹² qrêl bi navê Demodokos xuya dibe û ew li gel Odyseus şerê troyayê û hindek stranên din bi saza xwe bo guhdêrên li dîwana qrêl vedigêre (Homeros, 2019: 134-143).

Dikare were texmîn kirin ku ev kevneşop li nav gelek çandên din jî tê dîtin. Ev yek li ba kurdan heta dawîya sedsala borî jî bi awayekî gelekî xurt berdewam dike. Ango her mîr an jî serokeşîrekî kurd xwedî dengbêjekî bûn ku van dengbêjan li ser wan hem kilam derdxistin hem jî her şev di dîwanên wan de ji çîrokan heta bi destanan jî destanan heta bi stranên gelek cureyên edebiyata devkî îcra dikirin. Ji xebatên Ahmet Aras (2018: 19) û Mehmet Gültekin (2013: 21) tê zanîn ku mîrên kurdan xwedî dengbêj bûn û heta weke ku di mînaka Sürmeli Mehmed Paşa¹³ de jî diyar dibe, ev dengbêj gelek caran bi mîr re diçûn şer, da ku bûyer û qewimînên şer bikin kilam û bi vî awayî pesnê piştevanê xwe bikin.

Li gorî pirtûka *Ji Destpêkê Heta Niha folklorê Kurdî* “keresteyên folklorê ji bo edebiyatzanan çavkaniyeke sereke û dewamî ne. Berhemên mezin û girîng ên gelan pêşî nenivîsandî bûn, ew hemû piştî hatine nivîsîn “(Yıldırım û yêl din, 2013: 38). Lew vegêran angî hemû berhemên edebî di destpêkê de bi awayekî devkî û ji hêla kesekî diyar ve tîlberîn, heta demeke dirêj jî wisa dimînin ta ku helbestkarek an jî nivîskarek wan dinivîse. Di derbarê vê yekê de, di edebiyata cîhanê de mînaka herî navdar destanên Homeros in ku îro bi saya xebatên folklornas Milman Parry baş tê zanîn ku ew her du destan cara ewwîl bi devkî hatine afîrandin û paşê derbasî nivîsê bûne ku ew jî taybetmendiyeke devkî yêl wekî tekrar, rengdêr û gotinên qalibî ku bo temamkirina risteyên bikêş pêwîst in, pêk tîl. (Ong, 2018: 34-36).

Folklornasê kurd Remezan Pertev, li ser pêwendîya folklor û edebiyatê di pirtûka xwe ya bi navê *Folklor û Nasnameya Neteweyî ya Kurdî (1898-1946)* de wiha dibêje; “pêwendîyeke xurt di navbera folklor û edebiyatê de heye. Lewra wek çîrok,

¹² Di wergera destanê ya tirkî de ozan derbas dibe lê di çanda yunanan de bo helbestkarên gelêrî peyva rapsod dihat bi kar anîn.

¹³ Li gorî Ulugana, Sürmeli Mehmed Paşa bi eslê xwe jî nesla İshak Paşa bû ku ew malbat li Bazîde desthilatdar bûn. Piştî ku Bazîd di sala 1828an de ji hêla rûsan ve tê dagîr kirin, Sürmeli Mehmed Paşa tê li elejgir (eleşkirt)ê bi cih dibe. Bo agahiyên zêdetir bnr. Ulugana, Sedat, Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê.

efsane, destan, stran, xebatên folklorî yên pêşî bi piranî li ser berhemên edebiyata gelêrî ne. Gelek caran zaraveyên folklor û edebiyata gelêrî an edebiyata devkî di şûna hev de tên bikaranîn” (2018: 32).

Di derbarê têkiliya folklor û edebiyatê de folklornasê rus Vladimir Propp di *Folklor, Teori ve Tarihê* de wiha dibêje;

Folklor berhemêke taybet ya hunerên devkî ye. Edebiyat jî hunereke devkî ye û folklor û edebiyat, ango çavkaniya têkiliyên xurt yên di navbera zanista folklorê û rexneya edebiyatê de ev e. Folklor û edebiyat di cureyên menzûm (poetîk) de bi awayekî qismî hev du digrin. Tevî ku hindêk cureyên bi taybet bo edebiyatê (roman), û bi tenê xweserî folklorê (sêhr) hene jî, hem edebiyat hem jî folklor dikarin di cureyeke hevpar de werin senifandin; ev cure jî menzûm e. Li gel vê di navbera armanc û rêbazên folklor û edebiyatê de şibandinên teqez hene (1998: 13).

Li gor Propp ji ber ku edebiyat hunereke devkî û folklor ku wisa xuyaye qesta wî ji folklorê edebiyata gelêrî an jî ew berhemên edebî ku bi devkî tên îcrakirin û dîsa bi devkî belav dibin e, di vê meselê de xwedî xalên hevpar in. Lew bingeha wan li ser deng an jî gotinê ye. Folklornas Yuri M. Sokolov jî folklorê weke beşeke taybet ya edebiyatê dibîne û dibêje “em dikarin bibêjin ku zanista gelêrî beşeke zanista edebiyatê ye” (2018: 12).

Propp di berdewama nivîsa xwe de amaje bi vê yekê dike ku edebiyata destpêkê ango berhemên edebî yên ku bi rêya nivîsê ghiştfîne vê serdemê, folklor bi xwe bûn. Lê belê ev ne folklora saf û sade ye, ev hatiye şikestin û guhertin. Ji ber vê yekê folklor malzaroka edebiyatê ye; edebiyat jî folklorê zaye. Folklor beriya dîrokê ya edebiyatê ye. Edebiyata hemû neteweyên di vê astê de divê li gor vê bingehe were nirxandin. Edebiyata ku ji folklorê welidî ye di dawiya dawî de dê folklorê biterikîne. Lew edebiyat berhema şeweya hişmendiyeke din e (1998: 26-27). Li gor vê hişmendiye edebiyat teşe digre û bi îlhama wê li xwe zêde dike, herwiha awa û taybetiyên nû li xwe bar dike û ji çavkaniya xwe dûr dikeve. Berê dema ku ew hilberîna devkî derbasî ser kaxizê bibe tê de şopên hişmendiya civakî zêdetir beloq in, hin beş hevdu nagirin û di navbera hin bûyeran de hevnegirtin an jî nakokî xuya dibe. Piştî ku derbasî nivîsê dibe, ew berhem ji hêla nivîskar ve ji nû ve tê sererastkirin, zimanê wê û pîvana wê li

gor zanîn û hosteyiya ew kesê han tê sazkirin. Di vira de dîsa divê serî li destanên Homeros were dayîn. Çiku li gor ku Walter J. Ong ji Pary neqil dike, ew hemû rengdêrên ku Homeros bi kar tîne ku gelek caran ti tiştî li metnê zêde nakin û her car tekrar dibin, bi tenê bo sazkirin û diristkirina pîvana destanê ye û ew bi rehetî dikarin li derine din yê destanan werin bi cih kirin (2018: 76-77). Dengbêj Fadilê Kufragî jî dema ku di hevpeyvîneke xwe de digot ez hin çîrokan sererast dikim û wilo distrêm, behsa vê taybetmendiya berhemên devkî û şarezaiya dengbêjan dike (Berbir, 2007: 5-8).

David Damrosch di pirtûka xwe ya bi navê *Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı?* (*Edebiyata Cihanê Divê Çawa Were Xwendin*) de balê dikêşe ser ku beriya nivîsê gotin hebû û edebiyat heta demeke dirêj edebiyata devkî bi xwe bû;

Di fetloneka dirêj ya ku jê re jiyanî civakî ya benîademî tê gotin de nivîs îcadeke gelekî nû ye: beriya ku kesek derkeve û rêya qeydkirina gotinan bibîne, mirovan bi hezaran salan stran gotin, çîrok vegêran. Îro em hîre bûne ku edebiyatê weke tiştekî ku nivîskarekî li qelemê daye bibînin lê belê berhemên nivîskî yê kevn bi piranî lêanîna ew stran û çîrokan in ku bi devkî hatibûn afirandin. Berhemên devkî bi piranî ji ew berhemên ku bi tenê bi rêya nivîsê hatine îfade kirin, xwedî binyadeke cuda ne. Helbestkaran piştî ku bi pênûsên xwe yê serê wan tuj yê bi perîk dest bi berhemadayîna nivîskî kirin jî gelek caran teknîkên kevn yê devkî li bikaranînên nû anîn û bo têgihiştina hêmanên bingeîn yê van berheman rêya herî baş ew e mirov wan weke berdewamiya teknîkên taybet an jî awayên wan ên bi şeweyekî afrînerî hatine veguherîn bibîne. Helbestên epîk bikaranîna kubar ya rêyên devkî nîşan didin û piraniya vana bo wê yekê hatine bipêşxistin ku helbestkar bikaribin risteyên çîrokên ku bi dirêjahî diherikin bibîr bînin û îcarakerên ku xwendin û nivîsandina wan nîne vegêranên dirêj bibîr bînin (2016: 33).

Li gor Damrosch piştî ku nivîs û berhemên edebî yê nivîskî bipêş ketin jî folklorê an jî edebiyata devkî tesîra xwe ya li ser edebiyatê berdewam kir. Lew awayên vegotina edebî û teknîkên vegêranê her ji mîrasiya çanda devkî ya ku bi hezaran salan berdewam kir, sitendibûn. Efsane û mîten ku paşê bûn mijara epîkên dirêj û tragediyayên mezin jî herwiha berhemên edebiyata devkî ne. Lê belê bi domana demê

re ev teknîkên ku bingeha xwe ji berhemên devkî werdigrin guherînên mezin derbas dikin û rengekî xweser werdigrin.

Walter J. Ong, di berhema xwe de dema behsê tîne ser derketin û belavbûna romanê, diyar dike ku heta demeke dirêj roman weke bermayîyeke çanda devkî, li civatan ji hêla kesekî ve bo guhdarvanan bi dengekî bilind dihate xwendin. Civak hê fêrî ev cureya nû û şexsî li cihekî bêdeng û di hundirê xwe diviyabû bixwenda nebûbû, lewre kesek xwende radibû romanê, her wekî ew serpêhatiyên berê bi deng dixwend (2018: 184-185). Di vîra de her çiqas hewla berdewamkirin û parastina çanda devkî an jî gelêrî were dîtin jî, bi min sedemek jî ew e ku di serdema ku roman derket û nimûneyên xwe yên ewwîl da, xwendin kêr bû û hê nebibû çalakiyeke girseyî lewre gelek caran pêdivî bi xwendina kesekî xwende dihate dîtin. Hin caran vê yekê fikir ku ew berhemên hatî xwendin tesîrê li ser folklorê bike û di nava gel de hindê guhertoyên wê berhemê derkeve.

Di pirtûka *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî* de bo têkiliya folklor û edebiyatê giradêyî vê mijarê wiha tê gotin:

Ji aliyê edebiyata cihanê ve mirov dikare helbestên Pûşkîn jî wekî mînaka vê yekê bide. Bi taybetî helbesta wî ya bi navê Siwar mînakeke pir balkêş e. Ev helbest bi awayekî zelal dide ber çavan bê çawa teşeyên hunerî karbendiya xwe diguherin û ji folklorî dibin edebî; bi heman şêweyî ku ji edebî dibin folklorî. Helbesta Siwar ji forma edebî derbasî folklorê bû û bi sernavê lîstika şanoya gelêrî ya bi navê Qeyzer Maximilian bû lîstika şanoya Rûsî ya herî binavûdeng (Yıldırım û yên din. 2013: 40).

Vladimir Propp di pirtûka xwe de hindê mînakên ji edebiyata rusî û Mark Twainê nivîskarê emerîkî dide; di edebiyata kurdî de hindê mînakên bi vî rengî hene ku pêwîst e li ser wan were sekinîn.

Di edebiyata kurdiya kurmancî de jî hindê nimûneyên balkêş hene di derbarê vê yekê de ku yek ji wan jî Elî Herîrî ye (sedsala 16em) yê ku weke helbestkarê ewwîl ê edebiyata klasîk a kurmancî tê zanîn. Herîrî berhema xwe ya menzûm ya bi navê *Qewlê Hespê Reş* jî çîrok an jî efsaneyêke folklorî digre. LAYhan Yıldızê ku tezek li ser vê berhemê nivîsî ye di derbarê vê yekê de wiha dibêje:

Ev xezaname, li ser kevneşopiya helbesta gelêrî hatiye hûnandin. Hem awayê komrêzên wê, hem awayê pergala wê ya qafiyeyê, hem rewşa kêşa wê, hem jî zimanê helbestê, gelek zêde li ser şopa helbesta gelêrî ye. Heta, bi aliyên xwe yên mîna wezn, hejmara rêzikên komên beşan, pergala qafiyeyê û zimanê derbirînê, gelek zêde dişibe Qewlên Êzdiyan jî (2015: 152).

Dema em berê xwe didin folklorê kurdî mirov rastî gelek varyantên vê çîrokê tê ku ne dîr e Elî Herîrî bo berhema xwe sud ji wan wernegirtibe. Varyanteke gelêrî ya vê destanê di nava berhevoka Yaşar Kaplan de jî cih digre (2019: 213-248).

Herwiha Mela Mehmûdê Bazîdî di pirtûka xwe ya bi navê *Camiê Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* de, ku ji sê risale û çil çîrokên ku wî bi xwe berhevkeriye û nivîsî ye pêk tê, di çîroka bi navê “Hikayeta Sî û Çaran” de piştî ku destana *Dimdimê* bi forma pexşanê û bi kurtî neqil dike, diyar dike ku ev çîrok ji hêla Melayê Bateyî ve weke destan jî hatiye nivîsîn ku li dîwanan tê xwendin û bi taybet bo destana *dimdimê* millet, li ber xwendina wê zehf digirîn û fatîhayan li ser şehîdên *dimdimê* dixwînin (Bazîdî, 2010: 117). Helbet tê zanîn ku Melayê Bateyî destaneke bi vî navî nenivîsîye. Ev berhem aidê Feqiyê Teyran e (Sadî, 2017 : 55).

Feqiyê Teyran yek ji wan helbestkarên kurdan yê klasîk e ku bîngeh û îlhama hindek berhemên xwe ji folklorê kurdî werdigre û piştî ku ew berhemên wî di nava gel de her wekî di mînakên jor de hatî nivîsîn, bi deng tene xwendin vê carê ew berhem tesîrê li varyantên devkî dikin û ji hindek hêlan ve wan diguherînin. *Zembîlfroş*, çîrokeke Feqiyê Teyran e ku bi şeweya helbestê û bi çarînan hatiye nivîsîn. Feqî vê çîrokê li ser destana *Zembîlfroş* ku di nava kurdan de berbelavbû, diafirîn e, lê bi demê re ji ber xwendin û hezkirina zêde ya gel, ew berhema Feqî tesîrê li varyantên gelêrî dike. Ev tesîr bi duawayan tê dîtin. Ya yekem ew e ku bi texmîna me forma vê destanê ji forma xwe ya ewil ku bi ihtimaleke mezin ji sêrêziyan pêk dihat, vediguhere forma çarînan. Ya duyem jî ji naverokê û destpêka çîrokê diyar dibe ku varyanta gelêrî hin awayên vegotinê û hin motîfan ji ya Feqiyê Teyran werdigre.

Lê tesîra Feqiyê Teyran ya li ser edebiyata devkî ne tenê ew e. Bi qasî ku me xwe gihandê hindek xebat li ser helbestên Feqiyê Teyran yên ku di nava gel de belavbûne û varyantên wan derketine, hatine kirin. Bi taybet li nav kurdên sovyetê du

xebatên bi vî rengî hene ku tesîra Feqiyê Teyran ya li ser edebiyata gelêrî bi eşkere nîşan didin. Yek ji wan ya Aramê Çaçan e ku di sala 1974an de bi navê *Tembûrê* çap bûye. Ya din jî ya Etarê Şero ye. Li gor Eskerê Boyîk ku bo berhevoka Aramê Çaçan dibêje, gelek qewlên êzdî jî ketine nava van helbest/stranên li ser navê Feqiyê Teyran têne îcra kirin (Boyîk, 2019: 26). Ji bilî van di *Folklorê Kurmanca* ya Heciyê Cindî/Emînê Evdal de destanek bi navê *Dota Gurcan* heye ku varyanteke Şêxê Senan ya Feqiyê Teyran e. Di heman pirtûkê de du stranên din jî heye ku varyantên helbestên Feqiyê Teyran in û ji nava gel hatine berhev kirin. Di pirtûka Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl, *Zargotina Kurdan* de 33 helbestên Feqî hene ku di salên cuda cuda de hatine berhevkirin. Hindek ji van helbestan guhertoyên helbestên wî ne ku ew weke destnivîs jî çap bûne, hindekên din jî weke şewaz dişibin helbestên Feqî lê metnên wan ê resen nîn in (Celîl, 2013: 59-90). Axir belkî qet tunebin jî lê gel ji ber hezkirina xwe ya zêde hindek stranên li ba xwe îsnadî Feqî dike.

Beşdariya folklorê bo edebiyatê di destpêkê de bi rêya helbestê çê dibe lew sazkirina berhemên bi kêş û qafiye zûtir tesîrê li gel dîkin û belav dibin. Lê bi vî re folklor bi rêya dîlîndêzên Dionysosî beşdariyê li şanoyê jî dike. Lew bi awayê îro em dizanin şano cara ewwîl di wan dîlîndêzan de bîyî metn û amadekariyên li ser sehneyê tê pêşkêşkirin.

Beriya herkesî Aristoteles di berhema xwe ya navdar *Poetikayê* de ku sînorê cureyên edebî xêzkiriye û bi vî awayî bingeheke zexm daniye, rehên tragedya û komedyayê digihîne stranên ku bi awayê jixweberî dihatin gotin:

Tragedyaya ku ji jixweberiyên zaye (ev him bo tragedyayê, him jî bo komedyayê derbasdar e; rabirdûya ewwîl digihê afrînerên dithyrambos'an, ya din jî digihê stranên phallos'an ku îro jî li gelek bajaran tîndîrandin) hêdî hêdî belav bû; çikû hemû hêman di wê de bînavber dihatin bipêş ve birin; piştî birrek guherînan jî giha forma xwe ya xweser û paşê hew guherî. Aiskhylos bû helbestkarê ewwîl ku hejmara lîstîkvana jî yekê rakir dudiwa, yê girîngiya koroyê kêmkir. Sophokles hejmara lîstîkvana rakir sisya û dekorên biboyax anî dikê. Herwiha tragedya jî hêla dirêjahiyê ve jî pêşve çû; ji çîrokên kurt dûr ket, ji lîstîkên satyrosî yê vegotina çors ku ji rehên wê dihat xelas bû û bi demê re giha giraniya xwe (2016: 25-26).

Hîn di destpêka derketina romanê de tesîra folklorê an jî tesîra çanda devkî xwe dide der. Romannusên ewwil yên wek Rabelias, Cervantes, Defoe û Fielding di berhemên de li gel bikaranîna hin teknîkên vegêranê û hin hêmanên folklorîk yên weke gotinên pêşîyan, biwêj, gotinên qalibî û bikaranîna zêde ya rengdêran ku ev taybetmendiya berhemên devkî ye, gelek caran gazî xwîneran dikin: “xwînerên delal”. Li gorî Ong ev yek ji hînbûna çanda devkî ye ku di vê çandê de vegêran bi devkî dihat îcra kirin. Ong diyar dike ku nivîskar hê hînî cihê xwe nebûye (2018: 175). Di çanda devkî ya kurdî de jî vegêr dema berhema xwe îcra dike bo bala guhdaran bikêşîne û tevlêbûyîna wan a bo vegêrê çêbike carê dibêje gelî guhdaran an jî guhdarên hêja. Bi vî awayî guhdar ji çîrokê bi dû nakevin û motîvasyona vegêr jî têk naçe.

Tesîra folklorê helbet ne tenê ev e di romanên ewwil de mirov rastî lehengên duz tê ku ev bermaya berhemên devkî ne, li gorî Ong. Defoe, Richardson, Fielding û hindek nivîskarên romanê yên serdema destpêkê û hetta Jane Austenê jî navên ku wan dikirin tîp didan lehengên romanên xwe (Ong, 2018: 180). Di romanên ewwil yên kurdî yên weke *Pêşmerge*, *Jana Gel*, *Xatê Xanim*, *Morof* û *Dimdimê* de jî mirov rastî vê yekê tê. Di van berheman de leheng her wekî lehengên çîrokên gelêrî bi awayekî ku qet neguherin tîp afirandin. Ji hêla din ve ev berhem gelek caran îlhama xwe ji stran, çîrok û destanên kurdî werdigirin. Bo nimûne romana Eliyê Evdîrehman, *Xatê Xanim* îlhama xwe ji kilamekê digre ku her bi heman navî tê zanîn. Varyanteke vê kilamê di berhema *Folklorê Kurmanciyê* ya Heciyê Cindî de cih digre (2016: 149-154). Di *Kürt Romanî Okuma Klavuzuyê* de jî nivîskar diyar dikin ku hindek lehengên romanên kurdî tîp in û ev yek taybetmendiyeke edebiyata milletên ku di hewla avakirina neteweyê de ne (Galip û Parlüt, 2010: 202).

Li gel van tesîrên normal û mesûm bi derbasbûna demê re folklor bi hindek armanc û awayên nû beşdariyê li edebiyatê dike. Lê belê beriya vê yekê pêwîst e em berê xwe bidin nîşane û tovên vê meyla nû. Lew hê piştî îcada matbayê, ne demeke zêde dirêj, încîl li zimanên neteweyî tîp wergerandin û ew pirtûk ango ew ziman cara ewwil digihêjin girseyên mezin ku ev yek dibe destpêka şikestina zimanê latînî jî. Her di vê serdemê de girêdayî vê yekê, neteweyên ewrupî, îngîlîz, fransî û elman hay ji cudahiyan xwe dibin û berê xwe didin çanda xwe ango xalên ku wan ji cîranên wan cuda dike.

Pêla romantîzma ku di salên 1760î de ji Skotlandê û bi îlhama berhemên helbestkar James Macphersonê ku hindek destan bi xwe nivîsî bû lê wekî ku pêşiyên skotiyan ango pêşiyên qedîm ew nivîsandibin ragihandibû ji nişkêve bala neteweyên ku bi derfetên çapxane û rojnameyan nû nû li zimanê xwe germ dibûn û dil dibijandin dîrok û pêşiyên xwe yên qedîm dikşîne. Li gorî Macpherson ev destan, “*Fingal*” û “*Temora*” du berhemên hêja yên helbestkar Ossian bû ku bêtir ku reseniya van destanan were nîqaş kirin, li zimanên temamê ewrupayê tên wergerandin û rastî piştgiriyê mezin tên ku ev eleqe û tesîra mezin bala rewşenbîrên ewrupî dikşîne ser berhemên çanda gelêrî, bi taybetî jî bala wan diçe ser stranan û dest bi berhevkirin, weşandin û şîrovekirina stranan tê kirin. Ev yek bi taybet li Elmanyayê bi xebat û fikrên Johann-Gottfried Herderî (1744-1803) yên li ser çanda gelêrî re xurt dibe. Herder gelekî di bin tesîra Ossian de dimîne û yekser focusa xwe dide ser çanda gelêrî û herwiha gazî hemwelatîyên xwe û rewşenbîrên ewrupî dike da ku esasên çanda xwe derxin holê (Thiesse, 2018: 157-158).

Herder ji gaziya xwe zêdetir bi xebatên xwe yên li ser vê mijarê, li Elmanyayê dibe pêşengê vegera li gel, ku dê piştî wî gelek kesan berê xwe bida vê qada ku ji bo yekîtiyê neteweyî hemû tiştên pêwîst dikaribû dabîn bikira. Rewşenbîrên ku li pey xewnên mezin ên yekîtiya ziman, çand û edebiyatê bûn, dihatin ji milkê gel, ji gundiyan ku hema bêje qet neguherîbûn û hemû cewherê neteweyî di jiyana xwe de parastibûn, turê xwe tije dikirin û ew bi şîrove û kirasên nû pêşkêşî hemwelatîyên xwe dikirin. Çanda gelêrî ya ku ji hêla tovrind û bajariyan biçûk û bêqîmet dihate dîtin, êdî bi dibû derfet bo avakirina ziman û edebiyatên neteweyî. Zimanên neteweyî yên ku ev demeke zêde ne dirêj e desthilatdariya zimanê latînî têkberibûn, bi vê derfeta nû ya ku folklorê an jî zimanê gundiyan û bi şiyana hunermendên neteweperwer xwe hêzdartir dike û digihêje derfetên mezintir bo xwe nûkirinê. “Piraniya zimanên neteweyî yên ku îro li ser zeviyên çandî yên ewrupî bi awayekî xurt rehberdane, heta sedsala 19em standardîze nebibûn, ango ji kurahiyên xumam yên zimanên axaftinî nehatibûn derxistin, ji hêla gramerê ve bo zimanekî edebiyatê nehatibûn veguhaztin û ji hin hêlan ve jinûve nehatibûn îcadkirin. Ya ku filologan nekarîbûn miyêser bikirina, helbestkaran miyêser kiribûn. Çi ku yên ku bawer kiribûn ku dê bikaribin ruhên neteweyan di destan, çîrok û stranên gelêrî de bibînin, helbestkar bûn” (Schulze, 2005: 160).

Terry Eagleton di pirtûka xwe ya bi navê *Kültür* de piştî ku fikrên Herderî yên li ser ziman, folklor û hunerê nîqaş dike digihêje vê encamê: Dêmeg stran û çîrokên berê dê esasên paşerojê pêkbînin. Huner careke din divê veguhere diyardeyeke civakî, divê ji hengeke vala derkeve û veguhere têkoşîneke civakî (2019: 78). Lew edebiyateke neteweyî divê li ser zemîneke neteweyî ava bibe ango xwe bispêre rabirdûya mezin, çanda gundewar, volkgeist an jî ruhê gel di wan berhemên de ye. Hindek caran dewlet bi xwe bo pêkanîna vê yekê destkarî li van berhemên gelêrî dike û bi guherînên biçûk lê gelekî girîng peyva û peyvenda wan bi awayekî ku bi kêrî armancên wê were, diguherîne. Eric Hobsbawm û Terence Ranger di pirtûka xwe ya bi navê *Geleneğin İcadı* de mînakên ev cure desttêwerdan an jî midaxeleyan didin ku gelekî balkêş in. Lew li Swîsreyê mamosteyên dibistanan bi şewaza stranên gelêrî hindek stranên nû dinivîsînin ku naveroka wan li ser neteweperwerî û pêşketinê ye. Li hêlêke din li vî welatî festîvala stranan ya federal jî tê li darxistin û di rêzîknameya wan dide pêşxistin û çakkirina strangotinê ya gel û hestên berz yên bo welat, azadî û xwedê weke armancên wan xuya dibe (2005: 8). Bi rêya stranan hestên neteweyî û bi awayekî balkêş yên olî tên xurt kirin.

Di dewra Yekîtiya Sovyetan de, sosyalîstan jî bo xurtkirina îdeolojiya dewletê, berê xwe didan berhemên folklorîk û hewl didan ku wan ji nû ve û bi awayê ku xemên çîna karkeran li dijî çîna burjuwayan derdibibirin destkarî li wan dikirin. Carna jî destkariyê zêdetir çîrok, blîny û zêmarên nû diafirandin da ku prensîbên şoreşê zûtir û baştir li nav gel belav bibe. “Li Yekîtiya Sovyetan weke beşên din ên zanistê, folklor jî bo pêkanîna sosyalîzm û komunîzmê weke kereste hate qebul kirin. Folklor nêzî dilên girseyan bû û bi taybet bo ku xwedî nirxekî mezin yê propagandayê bû di encamê bi gelemperî bo vê yekê hate bikaranîn” (Oinas, 2003:3-12). Ev meyla han helbet tesîra xwe li ser kurdên sovyetê jî dike lewre dema em li berhevkerinên wan dinêrin em rastî stranan karkeran tên ku tê de pesnê sosyalîzmê bi xurtî xwe dide der. Herwiha em rastî stranan li ser Marks û Lenin jî tên ku bi minnet û hezkirineke bêpayan behsa wan dibe (Cindî, 2016: 503-528). Alan jî mînaka destana *Xanê Lepzêrîn* dide ku her di vê peywendê de weke serhildaneke kurdan ya li hember feodalan tê destnîşan kirin (2013: 34).

Serdema Herder ku weke romantîzmê tê binavkirin serdema sazkarin û îcadkirina neteweyan e ku di vê babetê de karê herî girîng dikeve ser milê nivîskar û helbestkaran, ew jî bo pêkanîna vê sparteka neteweyî bi zimanên gel, hêmanên çandî/folklorî, destan, mît, çîrok, stran û adetên gelêrî dikin kana berhemên xwe. Di van berheman de her tişt îdealîzekirî ne û ew serdema berê weke serdemeke baş, bi serkeftin û dewlemendiyan mişt e tîrî şayesandin. Pascale Casanova jî di derbarê vê yekê de di xebateke xwe de balê dikêşe ser pêşengiya Herder:

Piştî ku Herder têgehên “gel” û “netewe” yê îcad dike û ev yek jî hêla avakarin ewwîl yê edebiyatê “neteweyî” tîrî şrovekirin, çîrok, vegêran, helbest û efsaneyên gelêrî yê ku jî hêla nivîskarên neteweyî hatin komkirin û berhevkirin, weke bijarteyan hatin weşandin, veguhaztin û jinûve nivîsandin, bûn wusateke edebiyateke nû ya dikaribû bihata pîvandin (2010: 244-245).

Roman, şano û helbest sê cureyên bingeîn in di pêkanîna vê yekê de, di vê serdemê de roman û şanoyên vê serdemê de nivîskar, gelek caran li ser demeke dîrokî vegêranên xwe bi hêmanên neteweyî dixemilînin û pêşkêşî xwîneran dikin. Walter Scott, Gogol û Manzoni hindek jî van nivîskaran in. (Thiesse, 2018: 164). Ji van, bi taybet Walter Scott romana xwe ya navdar Ivanhoe bi îlhama Robin Hoodê lehengê efsanewî yê îngîlîz digire. Herwiha Scott bi xwe jî çîrokên gelêrî berhev dike û çap dike. Manzoni jî bi romana we ya dîrokî, *Destgirtî* re beşdariyeke mezin li netewesaziya îtalyanan dike. Vê yekê li gel atmosfer û bûyera dîrokî ya romana xwe, bi zimanê romanê jî dike (Schulze, 2005: 159). Lew berê hemû romantîkan her li dîrok û çanda gelêrî ya îdeal e ku derfetên dabînkirina kêşeyên serdema xwe di wira de didîtin. Ji vê zêdetir jinûvenivîsandina van berheman bi zimanekî bilind, motîvasyoneke mezin dide endamên neteweyên ku di lêgerînê de ne, bo avakirina îro û paşerojeke baş. Di van berheman de, tevî ku carna têkçûn hebe jî rabirdû tê îdealîzekirin û bi hestên nostaljîk tê şayesandin.

Toomy Kuusela di gotara xwe ya bi navê “In Search of a National Epic”ê (Di Lêgerîna Destaneke Neteweyî de) de balê dikêşe ser vê mîsyona romantîkan û wiha dewam dike:

Xeyalên neteweperwerî yên rabirdûyeke bihtîşam teyisî temenên keresteyên folklorê jî; çi qasî kevn be û çi qasî li pêş were şopandin, ew qasî biqîmet û perêşîner dibe. Romantîk wiha difikirîn ku kevneşopên kevn yên weke dêrisan razane û pêdiviya wan bi restorasyon û jinûveavakirinê ve heye. Ew gelek caran li benda zilamekî rast (kêm caran jinek bû) dima da ku ji nû ve wan revîze bike û wan çap bike bo girseyan ku bi gelemperî di wateya bûrjûwayê de bû (2014: 28).

Di destpêka sedsala 19em de ev yek bi xurtî dest pê dike û ji bo wan nivîskarên ku Kuusela behs dike, kereste tîr berhev kirin, yên heyî tîr çap kirin. Li Elmanyayê ev yek bi rêberiya Herder û Birayên Grimm çê dibe. Herder stranên gelêrî, Grimm jî çîrok û mîtolojiya elmanan berhev dikin û çap dikin. Li Finlandiyayê jî xebatên Doktor Elias Lönnrot û hevalên wî pêk tê.

Li gorî ku Sokolov diyar dike, Gogol, Gorkî, Puşkîn û gelek nivîskarên din ên jî di roman û çîrokên xwe de cih didin gelek hêmanên gelêrî yên herêma xwe. Herwiha helbestkrên weke Mayakovski û Yesenin jî bo fikr û dorhêla şoreşa bolşevîkan serî li folklorê didin (2018: 26-27). Helbestkar Lermontov jî her ji ber vê meyla serdema xwe berê xwe dide folklorê. Lê divê were gotin ku sîdwergirtina folklorê, her dem ne ji ber xemên sazkirina paşerojeke pak û îdeal e. Lew dema mirov berê xwe dide Lermontov, mirov dibîne ku wî, di dema xwe de çîrokeke gelêrî ya tîrkan, *Aşiq Garib*, ji hindekan bihîstîye û ji nû ve, bi formeke çîrokê ew nivîsî ye (Lermontov, 2014: 205-214). Herwiha di helbestên pexşan yên Arthur Rimbaud jî ku bi navê *Birqên Direxşan* li kurdî hate wergerandin, mirov rastî gelek hêman û heyînen folklorîk ji çandên cuda tê lê ne di peywenda neteweperweriya romantîk hatine bikaranîn. Rimbaud bi rêya van hêmanan helbesta xwe tîrtir û xumamtir dike (Rimbud, 2019: 135-142). Ev yek dibe ji bo neteweyên bindest cuda be, di berhemên William Butler Yeats û hevalên wî de, em dibînin ku wan her di peywendeke neteweyî de berê xwe dane çanda gelêrî û mîtosên îrlandiyan ku serdema wan weke vejîna keltîk tê pênasekirin. Ne li welatên dût, li Tirkîyeyê jî ev yek bi vî awayî çêdibe: “Di pêvajoya avabûna Komara Tirkîyeyê de, xwedîlêderketina li çanda gelêrî weke cewherê çanda neteweyî, di têgihiştina edebî ya wê serdemê de rasterast tê dîtin” (Çamkara, 2010: 86). Li gor ku Çamkara

radigihîne, helbestkarên wê serdemê di bin tesîra ossiyanîzmê¹⁴ de dimînin û helbesten fakelore ango folklorê sexte dinivîsînin ku bi vê yekê hewl didin çanda gelêrî li gor regezên dewleta nû, nû bikin û beşdariyê li avakirina edebiyateke neteweyî bikin.

1.3. Têkiliya Edebiyata Kurdî û Folklorê

Edebiyata kurdî di destpêkê de bi devkî berhemana dide. Cureyên wek destan, çîrok, efsane, stran û hwd. berhemên bingeîn yê de dewrê ne. Bi belavbûna nivîsê di nav kurdan re ev berhemên devkî dibin bingeha edebiyata nivîskî jî. Form û zimanê ku di berhemên devkî de berbelav in beşdariyê mezin di afirandina berhemên destpêkê yê edebiyata klasîk ya kurdî de dikin. Elî Herîrî, çîroka xwe ya menzûm ya bi navê *Qewlê Hespê Reş* bi formeke edebiyata devkî dinivîse. Zimanê berhema navborî jî taybetmendiya berhemên devkî di xwe de diheve. Melayê Bateyî (sedsala 17em) jî di helbestên xwe de cih dide hêmanên gelêrî. Di vê dewrê de folklor ne bi xemên îdeolojîk beşdariyê li edebiyatê dikin. Bi tenê di warê çîrok, ziman û di hin berhemên de jî bi formên xwe weke çavkanî xuya dibin. Bo nimûne Miradxanê Bazidî (1737-1784) *Zembîlfrûşa* xwe de him sûde ji varyantên gelêrî yê de destanê digre, him jî di warê ziman de mirov rastî hin taybetmendiya edebiyata gelêrî tî. Di hinek helbestên Melayê Bateyî de jî mirov rastî bikaranîna folklorîk tî. Helbesteke wî bi formeke folklorîk, sêrêziyan hatiye nivîsîn ku tê de bi zimanê gelêrî behsa kewgîriya xwe û serpêhatiya xwe ya li gel pisîka ku kewa wî xwariye, dike (Doskî, 2018: 26-28).

Tehsîn Îbrahîm Doskî di pirtûka xwe ya bi navê *Baxê Îrem: Geştek li Nav Şi'ra Kurmanciya Klasîk* de di peywendê helbesteke Yûsifê Terxan de, di derbarê bikaranîna forma sêrêziyê de wiha dibêje: “Tiştê berçav di vê beytê da ew e ku ew li ser binaxê û şeweyê klasîkî nehatiye vehandin, belkî ew pitir nêzîkî beytên folklorî ye. Eger em berê xwe bideyan wan qewlên li nîk Êzîdiyan heyîn ji layê rûxsarî ve, em dê bibînin ew jî bi vî rengî ne” (2020:173). Li vîra pêdivî bi şerheke heye lew li gel ku qewlên êzîdiyan bi sêrêziyan tîne afirandin zehmet e mirov vî formê bi tenê bi wan ve girêbide. Lew ev form di nava kurdên misilman de jî tî bikaranîn. Di pirtûka *Beyt û*

¹⁴ Ossianizm ew êkol an jî bizava ku xwe li ser bingeha çand û edebiyata gelêrî saz dike ku îlhama xwe ji berhemên James Macpherson digre. Bo agahiyên zêdetir bnr: Pehlivanoğlu, Emrah: Ossianizm ve Beş Hececiler, kovara Milli Folklor, hejmar 75, 2007.

Destanên Kurdî ya Yaşar Kaplan de beşên menzûm yê piraniya berhemên bi sê rêziyan hatine afirîn.¹⁵ Herwiha, di *Folklorê Kurmanciyê* (1957) ya Heciyê Cindî û *Folklorê Kurmanca* (1936) ya ku Cindî û Emînê Evdal bi hev re amadekirin de gelek berhemên ku formên çarîn û sêrêziyan di nav de hatine bikaranîn, cih digrin.

Piştî ku pêlên neteweperweriyê li nava dewleta osmanî belav dibe, vegêranên gelêrî û zimanê gelêrî rewacê dibîne û dibe bingeş bo berhemên edebî. Em di nimûneyên ewwîl yê edebiyata modern a kurdî de jî rastî folklorê tên ku ew jî gelek caran di peywenda avakirina netewetîya kurdî hatine bikaranîn. Şanoya ewwîl a kurdî ku ji hêla Ebdurrehîm Rehmî Hekarî (1890-1958) ve hatiye nivîsîn û di *Kovara Jinê* de weke tefrîqa hatiye weşandin nimûneya herî balkêş e di vê mijarê de. Lew li gel ku ti peywendîya vegêra Hekarî bi destana *Memê Alan* re nîne jî, ew navê şanoya xwe dike *Memê Alan* û çîroka xwe di atmosfereke dîrokî û bi sembola û peyamên neteweyî vedigêre (Hekarî, 2017:25-41). Bo Hekarî hîlbijartina navê *Memê Alan* ne tesaduf e helbet, lew *Memê Alan* navê destana herî berbelav ya kurda ye ku Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî bi îlhama wê hatiye nivîsîn. Şanomeya Pîremêrd (1867-1950), Mem û Zîn (1934) jî herwekî ya Hekarî, bi xemeke neteweyî jinûve tê nivîsîn (Raşîdîrostanî, 2015: 72-75).

Nivîskarên kurd li gel jinûnevivîsandina berhemên gelêrî, di berhemên xwe de cih didin gelek hêmanên folklorîk. Hesênê Dewrêş di gotara xwe ya “Di Hin Berhemên Kurdî de Şopên Çanda Devkî” de diyar dike ku nivîskarên kurdan berhemên gelêrî bêtî ku fonksiyoneke wan bo honaka romanê hebe wan derbasî metnên xwe dikin (2014:68). Bi bawerîya me bikaranîna berhemên edebiyata gelêrî di romanên de normal e lew gelek caran mekanên romanên kurdî gund an jî bajarokên ku adet û çanda gundîtiyê li wan serdest in, lewre nivîskar dema civakê teswîr dikin sîd ji çand, folklor û bîr û baweriyên wê werdigrin. Sedemeke din a vê yekê jî nebûna kevneşopeke xurt ya nivîskî ye bêguman. Ev kêmasî folklorê weke çavkaniyeke edebî li nivîskaran ferz dike. Ev awayê bikaranînê herî zêde di roman û çîrokên kurdên sovyetê de xwe dide der. Di mînakê romanên Erebe Şemo (1897-1978) de em bi vê yekê bi awayekî eşkere dibînin. Hêmanên folklorî di nava peywenda civakî de, bêtî destkariyên îdeolojîk

¹⁵ Di vê berhemê de bi giştî 12 beyt û destan cig digrin. Bo agahiyên zêdetir bnr. : Kaplan, Yaşar, Beyt û Destanên Kurdî, Weşanên Nûbihar, 2019.

derbasî nava romanên dibin.¹⁶ Di romanên Eliyê Evdirehman û tekane romana Heciyê Cindî, *Hewariyê* de bikaranîna zêde ya folklorê balê dikşîne.

Helbestkarên kurd jî di berhemên xwe de sûtê ji folklorê werdigrin. Ev sût wergirtin carna bi xemên neteweyî û hindek caran jî bi xema estetîka edebî xwe dide der. Helbestkar berevajî romannûsan bo berhemên xwe bi piranî berê xwe didin mît, destan û çîrokên gelêrî. Fêrikê Êsiv (1934-1997) bi jinûnevîsandina berhemên gelêrî yên weke *Mîrmih*, *Zembîlfroş* û *Êsivê Neviya* ve, di vî warî de zêdetir derdikeve pêş. Di van destanên Êsiv de mirov rastî xemên îdeolojîk nayê, ew li gor reseniya wan destanên xwe li ser zemîneke edebî û estetîk saz dike (Êsiv, 2011: 465-495).

Remezan Alan di teza xwe ya masterê ya ku li ser hindek romanên kurdî yên îlhama xwe ji folklorê kurdî, bi taybet jî ji destan û çîrokên gelêrî sitendine balê dikşîne ser anakronîzma van berhemên, lew dema folklor bo kêşê û “endîşeyên îroyîn” were bikaranîn ne pêkan e ku xwe ji anakronîzmê rizgar bike. Ji ber vê yekê Alan van berhemên wekî epîromanê¹⁷ pênase dike (Alan, 2013: 149-158). Ev romanên ku Alan bo teza xwe hilbijartine bi piranî di sih salên dawîn de hatine nivîsîn. Ev yek vê nîşan dide, folklorê ku ji ber gelek sedeman nekariye di dewra xwe yanî di sedsalên 19-20an de beşdariyê li edebiyat û netewsaziya kurdan bike, hê nû nû, bi sistbûna zextên li ser kurdî û lêkolînên li ser kurdan re, xwe nîşan dide, sîrayetî berhemên wan ên edebî dibe.

¹⁶ Di derbarê tîkiliya folklorê di romanên de Erebê Şemo de tezeke masterê hatiye amde kirin. Bo zêdetir agahiyên bnr. Gören, Ebubekir, *Di Romanên Erebê Şemo de Folklorê Kurdî*, Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî Mardin Artuklu Üniversitesi, 2013.

¹⁷ Epîroman, li gorî Remezan Alan epîromanê weke berhemên edebî yên ku di navbera destan û romanên de maye, pênase dike. Bo agahiyên zêdetir bnr: Alan, Remezan, *Folklor û Roman*, Peywend, 2013.

2. BEŞA DUYEM: JIYAN, HUNER Ê BERHEMÊN MEHMED UZUN

2.1. Jiyana Wî

Mehmed Uzun di sala 1953an de li siwêrega ku bi ser ruhayê ve ye ji dayik dibe. Birayê mezin yê sê kur û du keçan e. Bavê wî kurmanc, diya wî zaza ye lewre bi awayekî xwezayî di nava du zaraveyên kurdî de û bi wan re mezin dibe. Di heft saliya xwe de dest bi dibistanê dike. Xwendina xwe ya ewwîl û seretayî li vê navçeyê li gel malbata xwe dixwîne. Her di van salan de ji kurdî vediqete ta ku di 15-16 saliya xwe de nasnameya xwe ya kurdûnê nas bike. Di van salan de bo xwendina endazyariya metalurjiyê diçe enqereyê. Di 18 saliya xwe de yanî di sala 1971an de dikeve hepsa diyarbakirê (Uzun, 2009: 145) di hepsê de li gel 160 girtiyên polîtîk di du qawîşên ku her yek 80 kesî hildide, dimîne. Di hevpeyvîneke xwe de wiha dibêje bo wan rojan:

“Weke ku min got em hatibûn hepskirin û ji bilî ku em ji xwe re li wira rûnên, ti tiştê ku me karibûya bikira nîn bû. Aha li wira min kevneşopa vegotina devkî ya zimanê xwe, kurdî nas kir. Herwiha min derfeta xwendina berhemên edebiyata cîhanê, yên ku li tirkî hatine wergerandin dît. Mirov di hundir de zêde dixwîne, min jî wisa kir. Li wira, bi awayekî xwezayî her tiştê bi kurdî qedexe bû, lê belê hebû. Bawer im ji hêla Suriyeyê dihatin” (Uzun, 2009: 145).

Di sala 1974an de bi efuyê giştî ew jî tê berdan. Di sala 1976an bi hevalên xwe re kovareke bi navê *Rizgarî* (1976-?) ya ku bi tirkî-kurdî diweşe, ava dike. Di wê kovarê de weke redaktor dixebite. Helbest û nivîsên xwe yên ewwîl bi kurdî, di wê kovarê de çap dike. Her di heman salê de ji ber vê kovarê doz lê tê vekirin û qederê 6 mehan di girtîgehê de dimîne. Piştî ku tê berdan di sala 1977an de ji Tirkîyeyê direve û di ser Suriyeyê re weke penaber diçe Swêdê. 15 salan nikare vegere Tirkîyeyê û di serê salên 80yî de ji hemwelatiya Tirkîyeyê tê avêtin. Di sala 1992an de li gel ji 200î zêdetir rewşenbîrên kurd re hemwelatîtiya Tirkîyeyê werdigire dîsa (Uzun, 2009: 72).

Uzun di sala 1979an de dîsa li gel hevalên xwe yên ji *Rizgariyê*, kovareke siyasî-çandî bi navê *Rizgariya Kurdistan* (1979-1982, 11 hejmar) derdixe. Di vê kovarê de wekî edîtor xuya dibe û ji hejmara 10-11an ku bi hev re çapbûne xuya dibe ku bi helbestên xwe beşdariyê li vê kovarê dike. Li gorî Celal Uzun û İbrahim Güçlü, Uzun vê kovarê bi tena serê xwe derdixe. Di kovarê de kesên weke Mahmud Baksı û

Şerefxan Cizîrî dinivîsîn (Kaya, 2007: 85). Li gor ku Muhsin Kızılkaya di bîranînên xwe yê bi Mehmed Uzun re bi navê *Sen û Benê* çapkiriye de, ji nivîs û bîranînên Uzun yê çapnebûyî neqil dike di dawiya her hejmara vê kovarê de helbestek Uzun bi nasnava M. Ferzend Baran çap dibe. Herwiha diyar dibe ku çapkirina kovarê di sala 1982an de bi dawî dibe (2014: 250-251).

Di sala 1984an de romana wî ya ewwîl *Tu*, ji nav Weşanxaneyê Dengê Komalê derdikeve (Yusiv, 2011: 19).¹⁸ Di salên 1987-1988an de li parîsê dimîne û li zanîngeha Sorbonê beşa ziman û edebiyata firensî dixwîne. Li wira li ser sirgûnê û nivîskarên sirgûnbûyî lêkolînan dike. Mirov dikare nivîsa wî ya bi navê “Welatê Xerîbiyê: Bir Hüzündür Ayrılık” weke encama vê serdemê û lêkolînan bixwîne.

Di sala 1989an de bi Zozan Uzun a xizma xwe re dizewice. Ji wê zewacê di sala 1992an de jê re keçek çê dibe (Kızılkaya, 2014: Piştî ku qedexeyên li ser wî radibin, Uzun di sala 1992an de vedigere Tirkîyeyê û dikeve nava hewldanan da ku pirtûkên xwe li wira çap bike. Her di vê salê de Weşanxaneyê Dozê *Siya Evînê* li Stenbolê çap dike. Heke *Şivanê Kurmanca* ya Erebê Şemo ya ku bi wergera tirkî çap bibû, neyê hesab, ev romana ewwîl ya kurdî ye ku li Tirkîyê çap dibe. *Destpêka Edebiyata Kurdî* jî di heman salê de ji Weşanên Beybûnê, li enqereyê çap dibe.

Di salên 1980î de Uzun, ji bo romana *Siya Evînê* diçe Suriyeyê da ku keresteyan berhev bo romanê. Li wira Rewşen Bedirxanê¹⁹ nas dike, demekê li mala wê dimîne û bo romana xwe pê re hevpeyvînan dike, dengê wê di qasetan de qeyd dike. Uzun li wira hay ji bîranînên Mehmed Salih Bedirxanê²⁰ dibe ku di defterekê de bi tîpên erebî û bi tirkîya osmanî hatine nivîsîn. Bi alîkariya Rewşen Bedirxanê bîranînan li gel nîşeyên kêrhatî amade dike (Uzun, Bedirxan, 1998: 8-15). Nasîna wî ya bi Rewşen Bedirxanê re dê karîgeriyeke mezin li ser wî û berhemên wî yê din bike lew ji wê di derbarê mala Bedirxaniyan de hînî gelek tiştan dibe. Bedirxan gelek zanîn

¹⁸ Di derbarê sala çapkirina vê pirtûkê de tevlihevî heye lew hinek çavkanî sala çapkirina wê weke sala 1985, hinek 1986 nîşan didin. Bi alîkariya Pirtûkxaneyê Kurdî ya Stockholmê me xwe gihande çapa ewwîl ya vê romanê ku di kunyeya wê bo me diyar dibe ku pirtûk di sala 1984an de ji Weşanxaneyê Dengê Komalê çapbûye.

¹⁹ Rewşen Bedirxan (19?-1992) Keça Mehmed Salih Bedirxan û hevjîna Celadet Alî Bedirxan e.

²⁰ Mehmed Salih Bedirxan (?-1915), aktorekî girîng yê destpêka sedsala 20em yê kurdan. Di avakirina komeleya Hêvîyê de cih digre û di kovarên Rojî Kurd û Yekbûnê de di derbarê rewşa siyasî ya kurdan nivîsan dinivîse.

û belgeyên vê malbatê pê re parve dike ku paşê dê ji romanên wî yê bi navê *Bîra Qederê û Hawara Dicleyê* re bibûna bingeh.

Di sala 1993an de destana *Mirina Egîdekî* diweşîne. Ev berhem tekane berhema wî ya helbestê ye. Helbestên wî yê ku di kovar û rojnameyan de hatibûn weşandin weke pirtûk nayên çap kirin.²¹

Di sala 1995an de *Siya Evîne* jî bi handana Yaşar Kemal û bi wergera Muhsin Kızılkaya bi tirkî ji Weşanên Belgeyê çap dibe (Kızılkaya, 2014: 62-179). Ev romana wî ya ewwîl e ku li tirkî tê wergerandin.²² Dîsa di sala 1995an de ceribandîna wî yê bi tirkî bi navê *Nar Çiçekleri* ji Weşanên Belgeyê çap dibe. Ev pirtûka wî ya ewwîl e ku bi zimanê tirkî çap bûye. Piştî vê pirtûkê tirkî hêdî hêdî dibe zimanê ceribandîna yê Uzun.

Mehmed Uzun weke nivîskarekî kurd çî li Swêdê çî jî li Tirkiyeyê bi rewşenbîr û nivîskaran re têkiliyên baş datîne. Uzun van têkiliyan him bo edebiyata xwe him jî bo ku bi awayekî rewşa zimanê kurdî bide naskirin bi kar tîne. Di 11ê îlona sala 1999an de li Stenbolê, li gel gelek helbestkar, nivîskar, derhêner û rewşenbîrên cîhanî yê weke Adonis, Margaret Atwood, Ingmar Bergman, Costa Gavras, Günter Grass, Arthur Miller, Harold Pinter, Jose Saramago, Yaşar Kemal û Orhan Pamuk deklarasyonekê di derbarê naskirin û rêlibervekirina ziman, çand û nasnameya kurdî belav dike (Uzun, 2016: 41-46).²³

Cilda ewwîl ya romana *Hawara Dicleyê* jî di sala 2001ê de ji Weşanên Avestayê çap dibe. Di sala 2002an de cilda ewwîl ya *Hawara Dicleyê* bi wergera Muhsin Kızılkaya bi tirkî tê weşandin (Kızılkaya, 2014: 332). Pirtûka wî ya ceribandîna ya bi navê *Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler* jî her di heman

²¹ Helbestên xwe bi fikra ku rojekê wan çap bike di dosyayeke bi navê “Hêviya Şehîdan” berhev dike lê ev yek qet nabe “nesîb” Bo agahiyên zêdetir bnr. Kızılkaya, Muhsin, Sen û Ben, Weşanên Îthaki, İstanbul, 2014, r. 203.

²² Kızılkaya diyar dike ku wî serî li weşanxaneyên tirkî yê weke Metis, İletişim û Canê dide da ku pirtûka uzun jî wana yekê çap bibe lê her yek bi hincetekê naxwazin çap bikin. Weke mîna Erdal Öze berpirsariya weşanên canê jî ber ku “romaneke neteweperwer” e naxwaze wê çap bike. Bo agahiyên zêdetir bnr. Kızılkaya, Muhsin, Sen û Ben, Weşanên Îthaki, İstanbul, 2014, r. 139-157.

²³ Deklarasyon bi zimanekî vekirî û “soft” gazî dewleta Tirkiyeyê dike ku qedexeyê li ser perwerdehiya bi kurdî û nasnameya kurdî rake da ku di warê azadî, demokrasî û mafên mirovan de bigihê asta ewrupayê

salê tê çap kirin (Uzun, 2006: 1). Di sala 2003an de cilda duyem ya *Hawara Dicleyê* tê bi wergera wê ya tirkî re di heman demê de tê çapkirin (Alan, 2013: 204).

Piştî ku berhemên uzun li Tirkîyeyê bi kurdî û bi tirkî tîr çapkirin, bi hinceta sucê parçekirina dewletê û propagandaya rêxistinên terorî ve li dijî wî doz lê tîr vekirin. Di van dozan de pirtûkên wî tîr qedexekirin û berhevkin.

Di 15ê çileyê 2000î de li Diyarbekirê konferenseke bi serenava “Dil, Kimlik ve Edebiyatê (Ziman, Nasname û Edebiyat)” dide. Piştî vê çalakiya ku gel eleqeyê gelekî mezin nîşan didê bi biryara mehkemeyê 7 pirtûkên Uzun li Tirkîyeyê tîr qedexekirin, berhev kirin û hetta polîs belgeyekê bi pirtûkfroşan didin îmzekirin ku dê careke din ev pirtûkên Mehmed Uzun nefroşin (Kızılkaya, 2014: 241). Ji ber vê biryarê Yekitiya Ewropayê, Klubên Penê, Akademiya Swêdê û gelek sazî, dezgeh û nivîskarên navdar bertekên tund nîşan didin. Li ser vê yekê mehkeme biryara berhevkirina pirtûkan radike û dozê dispêre Devlet Güvenlik Mahkemesi (Dadgeha Ewlehiyê ya Dewletê) ya stembolê (Kızılkaya, 2014: 242).

Ji ber romana *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* û ji ber pirtûka wî ya ceribandinan, *Nar Çiçekleri* li Tirkîyeyê di sala 2001ê 5 doz lê tîr vekirin û ji hemû dozan beraet dike (Kaya, 2007: 333). Her ji ber heman sûcdarkirinan pirtûka wî ya *Bir Dil Yaratmak* tê qedexekirin û berhevkin (Kaya, 2007: 342). Ji ber van doz û qedexekirinên li ser pirtûk û fikrên Mehmed Uzun, serokê komîteya nobelê Kjell Espmark tê diyarbekirê û beşdarî doza Uzun dibe. Ji hêla hindê nivîskar, weşanger û hikûnasan ve komîteya piştgiriya bo Mehmed Uzun tê saz kirin (Kızılkaya, 2014: 316).

Li gel van doz û lêpîrsînan, Uzun bi têkoşîna xwe ya li dijî qedexe, astengî û bi edebiyata xwe hêjayî xelatên fikrî û edebî jî tîr dîtin. Mehmed Uzun di 23ê gulana 2001ê de xelata Azadiya Fikr û Ramanê ya Yekîtiya Weşangerên Tirkîyeyê werdigre. Di 30ê hezîranê de jî Enstutiya Kurdî ya Berlinê ji ber tevkeriyên wî yê bo romana kurdî xelatekê didê (Kaya, 2007: 303). Di dawiya heman salê de li Swêdê xelata Torgny Segerstedt distîne ku ew xelat bi navê qelemê azadiyê dihat naskirin (Kızılkaya, 2014: 319-321).

Di sala 2002an de Uzun ji ber tevkariyên wî yên bo jiyana çandî ya Swêdê, ji hêla Akademiya Swêdê ve bi xelata Stina-Erik Lundebergê tê xelatkrin.

Di sala 2005an de hikumeta Herêma Kurdistanê ji bo keda wî ya di ber, ziman, edebiyat û romana kurdî re xelata rumetê dide Uzun (Uzun, 2008: 77). Her di vê salê de xelata rumetê ya şaredariyên diyarbekirê werdigre.

Di sala 2005an de pirtûka wî ya bi navê *Küllerinden Doğan Dil ve Roman* ku ji hevpeyvînên wî pêk dihat û vegêrana wî ya bi navê *Ruhun Gökkuşağı* tê weşandin (Kaya, 2007: 2018). Divê were diyarkirin ku ev pirtûk tekane pirtûka Uzun ya honakî ye ku bi tirkî hatiye nivîsandin. Berhem, ne roman lê vegêraneke otobiyografîk e.

Di sala 2007an de pirtûka wî ya bi navê *Bir Romanın Hatıra Defteri* ku rojnivîskên pêvajoya nivîsandina romana *Hawara Dicleyê* bûn bi tirkî çap dibe. Ev pirtûk nîşan dide ku Uzun ne nivîskarekî li ser maseyê ye (Pariltı, 2007: 268). Di pirtûkê de lêkolîn, xwendin û geryana Uzun ya li cihên ku roman tê de derbas dibin, cih digre. Bi vî awayî xwîner hînî kitekitên awayê xebata nivîskar dibe, li hêleke din rojnivîsk xwendina romanê jî hêsantir dike. Rojnivîsk bi kurdî hatine nivîsîn lê kurdiya wê qet nayê çapkirin. Ev yek girîng e lew bi me dide diyar kirin ku bala Uzun hêdî hêdî diçe ser tirkî.

Mehmed Uzun piştî nexweşiyê giran di 11ê Cotmeha 2007an de li diyarbekirê diçe ber rehma xwedê. Piştî mirina wî, di sala 2008an de nivîs û hevpeyvînên wî yên neketine pirtûkan ji hêla Muhsin Kızılkaya ve tîn berhevkin û bi navê *Ölüm Meleğiyle Randevu* ji Weşanên İthakiyê çap dibe (Uzun, 2008: 7).

2.2.Hunera Wî

Weke nivîskar û romannûs Mehmed Uzun ta niha çî baş çî xerab gelekî hatiye nîqaşkirin. Têkiliya wî ya bi edebiyatê re rasterast dema dibe berpîrsê beşa edebî yê *Kovara Rizgarî* ku weşaneke siyasîbû, dest pê dike. Piştî ku ji neçarî weke penaber diçe Swêdê, xebatên Uzun yên edebî ciddîtir dibin, zêdetir û bi perspektîfeke nû nêzî edebiyatê dibe. Her di wê serdemê de biryar dide ku roman binivîse û xwe ji qada siyasî bi giştî bide qada edebî. Di sala 1984an de dema romana wî ya ewwîl *Tu* çap dibe, rexne û hindek caran êrîşên mezin lê tînin kirin. Paşê Uzun dê bi roman, ceribandin

û hevpeyvînên xwe jî bibe mijara nîqaşan ku ev nîqaş îro jî didomin. Em ê jî di vê beşa teza xwe de ku romanên Uzun mijara wê ye hewl bidin wêneyekî giştî yê hunermendiya Uzun diyar bikin.

Mehmed Uzun hê ji destpêka romannûsiya xwe ve weke nivîskarekî ku di hewldana lêgerîna ziman û vegotineke nû de ye dixûyê di edebiyata kurdî ya salên 1980 û 1990î de. Hevokên sade, kurt û nimîner taybetmendiyên sereke yên vegêranên Uzun in ku ev yek zimanê wî û şewaza wî nêzî zimanê vegotinên gelêrî dike. Tevî van hewldanên wî jî ji ber kêmbûna kevneşopeke edebî û keresteyên din ên zimanî, mirov di zimanê wî de rastî probleman tê. Ew bi xwe jî vê yekê wiha destnîşan dike: “Tew ez nikarim li metnên xwe yên destpêkê binerim. Gelekî qels in. Ew weke metnên tirkî ne yên ku bi kurdî hatine nivîsîn dixuyên. Tirkî gelekî serdest e. Bi honaka xwe, mantixa xwe û hevoksaziya xwe ve” (2009: 129). Uzun vê problemê bi alîkariya berhemên edebiyata klasîk û yên devkî ji holê radike an jî wan kêm dike:

Dema min biryar da ku romana modern binivîsim, zimanê min têrê nedikir. Ji bo gihîştina zimanekî edebî yê modern çar çavkanî hebû; kurdiya rojane ya ku bi devok û şewezarên xwe tê axaftin; berhemên edebiyata klasîk ya kurdî ku bi sedan sal berê, dengên taybet yên wekî Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyran afirandiye; bi taybet pirtûk, kovar û rojnameyên kurdî edebiyata nivîskî ku ji sedsalekê zêdetir li Suriye, Lûbnan û li kafkasan weşiyane û belkî ya herî girîng dengbêjên kurd in. Bêyî ku mirov xwe bigihîne van çavkaniyan, afirandina hunera romaneke modern a kurdî zehmet bû (2009: 33).

Xaleke din ya romannûsiya Uzun ku divê were destnîşan kirin jî putepêdana wî ya taybet ya bo kevneşopê ye. Uzun him di ceribandînan xwe û him jî di hevpeyvînên xwe de di mesela avakirina berhemên edebî de gelek caran balê dikişîne ser girîngiya kevneşopê. Ev yek bo yekî wekî wî ku zimanê wî hatiye qedexa kirin û derfetên pêşdebirina zimanê wî bi her awayî jî wî û ji civaka wî hatiye sitandin, tişteki jê neger e. Bi taybetî jî kevneşopa devkî:

Li gorî min, edebiyata kurdî ya nû û modern, dê li ser sitûnên bi neqş yên edebiyata devkî ya kurdî ku çavkaniyeke gelekî dewlemend e, bilind bibe. Edebiyat û zimanekî modern, dê bi xwespartina bihêz û bikok ya kevneşopekê were afirandin.

Modernbûn û pêgiriya kevneşopekê, ne li dijî hev lê hevtemamkerên hev in (2009: 261).

Di berdewama van gotinên xwe de Uzun jêgirtinê ji gotara navdar ya T. S. Eliot (1988-1965) ya bi navê *Gelenek ve Şair* (Kevneşop û Helbestkar) digre ku ev yek bo fêmkirina têgihiştina Uzunî ya bo kevneşopê girîng e. Ev meyla bo kevneşopê di romanên wî de jî xwe dide der. Romana wî ya bi navê *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* bo vê yekê nimûneya herî berbiçav e di vî warî de. Uzun di vê romanê de her wekî van gotinên xwe, vegêrana kevneşopî û ya modern nêzî hev dike, ji wan berhemeke nû û xweser diafirîne. Lew kevneşopa devkî ye ku bûye palpişt bo avakirin û xurtkirina zimanê wî yê romanê. Li gorî Bodur jî romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, ji nav romanên Uzun ya bi awayekî herî tîr kevneşopa devkî û epîk lê hatiye neqîşkirin û taybetmendiyên vê kevneşopê bi kevneşopa romanê hatine ba hev, ev roman, weke romana wî ya xwedî avahiyeke pir qat derdikeve (2009: 42).

Beriya rêwîtiya xwe ya romanê Uzun bi helbest û ceribandin û gotaran dest bi nivîskariya xwe dike. Di kovar û rojnameyên destpêka salên 1980yî yên weke *Kurdistan Press*, *Berbang*, *Armanc* û *Hêvîyê* de di van cureyan de berheman dinivîsîne, diweşîne. Helbestên wî gelek caran li ser hesreta welat, acizya ji xerîbiyê, evîn û bêrîkirin e ku ew helbest paşê dê di ti berhemên wî de jî xwe re cih negrin û di nava rupelên kovar û rojnameyan de bimînin. Divê were gotin ku Uzun ev berhemên xwe yên ewwil bi navê M. Ferzend Baran diweşîne. Ceribandin û gotarên wî jî li ser avakirina edebiyateke nû ya modern, rewşenbîrên kurd, edebiyata cîhanê û pîrçandîtiyê ne.

Mirov dikare romanên Mehmed Uzun li gor mijarên wan wiha bisenifîne:

1. Romanên otobiyoğrafîk: *Tu, Mirina Kalekî Rind*
2. Romanên dîrokî-biyoğrafîk: *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, *Siya Evînê*, *Bîra Qederê* û tevî ku rasterast diyar nake jî *Hawara Dîcleyê* ya ku li dor jiyana Mîr Bedirxan digere.

Li gor vê yekê bi tenê romana wî ya bi navê *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* derveyî senifandineke wiha dibe ku mijara wê ne dîrok û biyoğrafî lê şer û pevçûnên di navbera şervanên kurd û leşkerên tirkên ku bi awayekî alegorîk bêyî ku navê wan

were eşkere kirin hatiye nivîsîn. Tevî ku alegoriya romanê ewqasî ne girtî ye û ji navê lehengan û bûyeran û teswîrên mekanan baş diyar dibe ku welatê mezin çêl bi Tirkiyeyê û welatê biçûk jî çêl bi Kurdistanê dike (Aydoğan, 2014: 251).

Romana wî ya ewwîl *Tu* tevî ku romaneke otobîyografîk e jî lê teknîkên ku Uzun di vê romanê de bi kar tîne ew giranî û ciddiyeta romanên otobîyografîk sivik dike. Roman jê hela du vegêran bi du awayên ji hev cihê tê vegêran. 1. Vegêr bi lehengê romanê re bi cînavka kesane ya duyem tu yê diaxive û romanê wisa vedigêre. Di nivîsa paşekî ya romanê de Uzun diyar dike ku wî ev forma vegêranê bi îlham û tesîra romannûsê meksîkî Carlos Fuentesî ve di romana xwe de bi kar anîye. 2. Lehengê romanê bi xwe ku geh di girtîgehê de li gel mehkûmên din e û wîlo vedigêre, geh jî di hucreyekê de bi tena serê xwe vedigêre ku di beşên di hucreyê de vedigerê lehenga çîroka *Kêzaxatunê* weke lehengek xeyalî li ba wî ye û serpêhatiyên xwe yên zarokatiyê jê re vedigêre. Roman ji destpêkê heta dawiyê bi keresteyên çanda devkî ve tije ye ku ev yek dê paşê bibe yek ji taybetmendiyên herî berbiçav ya romannusiya Uzun. Herwiha buyerên ku tên vegêran jî beşek ji jiyana wî ya li girtîgehê ye ku di sala 1971ê de tê girtin li diyarbekirê bi İsmail Beşikçi, Musa Anter û Ferid Uzun re di heman girtîgehê de du salan dimîne (Uzun, 2015a: 222-231).

Bi vê romanê re taybetmendiyên romannusiya Uzun yên weke bikaranîna çanda devkî, dîroka kurdan, trajediya rewşenbîrên kurd û şêwaza vegêrana wî xwe diyar dike. Di pirtûka *Kürt Romanı Okuma Klavuzuyê* de bo Uzun û romana *Tuyê* de wiha tê gotin: *Tu* ya ku romana ewwîl ya Mehmed Uzun e, romana tenêtiyê, bêçaretîyê û bi awayekî trajîkomîk ya berxwedanê ye. *Tu* romana ewwîl ya Uzun e ku taybetmendiyên biyografîk sereke ye (Galip, Parıltı, 2010: 61). Li gel, çanda devkî û biyografiya Uzun, çavkaniyeke din a vê romanê nivîs û berhemên din ên Kovara Hawar, *Ronahî* û *Roja Nûyê* û nivîskarên wan yên weke Celadet Ali Bedirxan, Osman Sebrî û hwd. ne. Uzun vê yekê bi xwe di nivîseke xwe de eşkere dike ku vê kovarê û nivîskarên wê yên navborî beşdariyeke girîng li romanê kirin. Weke mînak piraniya metnên folklorîk û edebî yên di vê romanê de derbas dibin tev ew berhemên ku di kovarên navborî de hatine çapkirin. Herwiha lehengê bi navê Apo jî ku yek ji lehengên girîng yê vê romanê ye bi îlhamgirtina ji Osman Sebrîyê ku ew jî weke Apo tê naskirin, tê afirandin (Uzun, 2015a: 231-233).

Ev putepêdana Uzun ya bo çanda devkî, dengbêjî û dîroka nêz a kurdan dê di roman û berhemên wî yên derveyî romanê jî berdewam bike. Romana wî ya duyem *Mirina Kalekî Rind* jî her wekî ya ewwil hin taybetmendiyên biyografîk di nava xwe di hewîne lew lehengê romanê Serdar jî nivîskarekî ciwan e û her wekî Mehmed Uzun ew jî neçar dimîne ji welatê xwe bireve Suriyeyê û ji wira jî derbasî Swêdê dibe lê caran bo lêkolîna berhemên xwe tê Suriyeyê û bo xwe ji Kalê Rind destanên kurdî berhev dike û pê re di derbarê gelek tiştan de diaxive, li ser wan nîqaşan dike. Folklor di romanên wî yên weke *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dicleyê* de jî weke çavkaniya sereke xuya dibe ku vegêrên van her du romanên jî dengbêj in. Uzun di van romanên de her li gor vê tevdiqere ku zimanê van romanên bi taybetiyên zimanê gelêrî û hêmanên folklorê tije dike ku bîngeha vê xebatê jî her li ser vê yekê ye. Jixwe di hevpeyvîn û hindê nivîsên xwe de jî Uzun girîngiya kevneşopî devkî ango folklorê bo afirandina edebiyateke xurt diyar dike lê bi şerta ku baş li ser wan were xebitîn lew di navbera metna modern û ya devkî de cudahiya ciddî hene (Kaya, 2007: 40).

Romana *Mirina Kalekî Rind* di nivîskariya Uzun de vîrîjîr girîng e lew piştî vê romanê dê mijarên romanên Uzun kesayetên dîrokî yên kurdan bin ku Uzun dê bi dorê romana Memduh Selîm Begê Wanî, dengbêj Evdalê Zeynikê, Celadet Alî Bedirxan û Mîr Bedirxan binivîse. Romana wî ya bi navê *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* dikare were gotin ku tekane romana Uzun e ku zêde xwe nespîrtî kesayetên dîrokî û biyografiya nivîskêr. Lê belê di vê romanê de jî bi awayekî hindê stran û destana *Gilgamiş* tevî metnê dibin ku tesîra wan li ser romanê û lehengan diyar dibe. Roman bi epîgrafeke dirêj jî vê destanê dest pê dike (Uzun, 2010a: 6). Dîsa dema ku nivîskarê romanê û Kevok cara ewwil hev dibînin, di nava sohbetê de, Kevok, gotinê tîne ser vê destanê (Uzun, 2010a: 161-162). Paşê Kevok dema tevî şervanên welatê çiyê dibe, li wira hest pê dike ku ew axa ku destana *Gilgamiş* lê qewimiye ev ax e, bi gotineke din Kevok xwe weke *Gilgamişê* ku li ronahiyê digere dibîne. Lê belê dema ku dîl dikeve û piştî ku tîkiliyeke evînî di navbera wê û Baz de çêdibe, vê carê hewl dide ji welatê mezin bireve û bo vê yekê nameyekê jî nivîskêr re dişîne ku alîkariya wan bike. Di nameya xwe de bi rîstî jî vê destanê wiha dinivîse, “ez li rîya ronahiyê me. Min hewcedarî bi alîkariya we heye” (Uzun, 2010a: 361). Selim Temo di gotara xwe ya li ser vegêrên Uzun de, di mînakî Baz de diyar dike ku berevajî *Gilgamiş*, Baz, li cihê ku ronahiyê dibîne, wê wenda dike (Temo, 2007: 282). Lew Baz dimire, lê

Kevok beriya wî dimre ango her du bi hev re li ser sînorên ronahiya *Gilgamişî* têk diçin.

Haşim Ahmedzade di pirtûka xwe ya bi navê *Romana Kurdî û Nasnameyê* de di derbarê romana *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de mijarên welat û nasnameyê derdixe pêş û wiha dewam dike:

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de meseleya nasnameyê, ya herî navendî ye. Dema gelê “welatê çiya”, eşkere ye ku telmîhek ji bo Kurdistanê ye, ji bo parastina xwe şer dikin, artêşa “Welatê Mezin” jî ku bi awayekî alegorîk Tirkîyê refere dike, nasnameya wan înkâr dike û hemu tevgerên li dijî siyaseta fermî tepeser dike. Hizra ‘welat’ gelek caran tê refere kirin û hemû çîrok tijî evîn û hestên neteweyî yên ji bo welat in (2011: 73).

Divê were gotin ku bi romanên xwe yê bi vî rengî ku balê dikşîne ser bindestî û parçebuna welatê wan, Uzun karîgereyekê li ser netewsaziya kurdan jî dike lew edebiyat nexasim roman him zimanê wî neteweyî û him jî ji ber hêza xwe ya ku xwe digihîne girseyên mezin, roleke girîng dilîze di avakirina nasnameya neteweyî de. Girêdayî vê yekê, mirov rehetî dikare bibêje ku Mehmed Uzun bi hîlbijartina bûyerên girîng yên dîrokê û kesayetên sembol yên kurdan ve vê yekê bi zanetî dike. Bi vê yekê re Uzun hewl dide bîra kolektîf ya kurdan ku ji ber qedexeyê û zextên berdewam yên dewletê lawaz bibû an jî ser wê hatibû girtin, bivejîne û aktor û bûyerên vê bîrê bi rêya hunera romanê bîne rojeva kurdan.

Uzun di hevpeyvîneke xwe de di derbarê vê meselê de wiha dibêje: “Beriya me dîrokeke kevn heye. Zanîna vê dîrokê û şexsên wê me ji korahiyê xelas dike. Zanîna dîrokê nasnameya neteweyî ya mirovan xurt dike. Bi vî awayî mirov xurttir dibe û serkeftin pêkantiir dibe” (2009: 206). Uzun di heman hevpeyvînê de jî sedema nivîsandina romanên dîrokî wiha destnîşan dike: “Berî her tiştî, weke nivîskarekî dixwazim dîroka kurdan hîn bibim û bi rêya hunera xwe wê hînî xwendekaran bikim. Dîroka me ji me hatiye dizîn; dîroka me serûbin bûye û dîrokeke serobero, weke dîroka me pêşkêşî me bûye” (2009: 205). Nivîsandina romanên dîrokî li ser kesên wek Mehmed Selîm Beg, Celadet Alî Bedirxan, Evdalê Zeynikê û Mîr Bedirxan nîşanên şênber yên vê daxwaz û endîşeya xurtkirina nasnameya neteweyî ne. Ji bilî van

romanen em baş dizanin ku projeyên romanen yê Uzun li ser nivîsandina kesayetên edebî û dîrokî yê weke Melayê Bateyî û evîna Îhsan Nûrî Paşa û Yaşar Xanîma hevîna wî hebû. Uzun diyar dike ku romana li ser Îhsan Nûrî Paşa û Yaşar Xanimê dê bibe xeleka sêyemîn ya sêyîneyekê ku *Siya Evînê* û *Bîra Qederê* du xelekên pêşî bûn (Uzun, 2009: 97).

Li gel mijarên dîrokî yê girêdayî kurdan û welatê wan Uzun di gelek roman û nivîsên xwe de sirguniyê û çanda bi hevreyîyînê ango pirçandîtiyê jî dixê navenda vegêranên xwe ku ev her du mijar jî bi xurtî girêdayî serboriya Uzun bi xwe ne. Uzun nivîskarek e ku di sirgunê de dest bi berhemanîna xwe kiriye lewre bi awayekî jêner behsa êş, azar, derfet û tecrubeyên sirgunê û rewşenbîrên sirgûn dike. Romanên wî yê bi navê *Tu* û *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynîkê* ne tê de di hemû romanên de serlehengê vegêrê, her wekî Mehmed Uzun, bi awayekî diçe sirgunê, ev yek bi awayekî jî normal e lew serborî û tecrubeyên şexsî her dem dibin çavkanî bo afirandina berhemên hunerî. Ev yek hindêkî jî tercîha nivîskêr jî tê lew ew bi taybetî focusa xwe dide ser rewşenbîrên kurd yê hatine sirgûnkirin an jî ji neçarî wan bi xwe sirgûnbûnê hîlbijartine. Tam di derbarê vê yekê de Ekin Bodur li ser romanên Mehmed Uzun wiha dibêje:

Sirgun bo Uzun çavkaniyeke îlhamê ye. Bi rêya sirgunê çîrokên sirgunê yê ku dîroka wan a nêz bi xwe ye jî dike çîrok; bi xêra vê yekê rewşenbîrên hatine jîbîrkirin yê weke Memduh Selîm vedijîne, bajarê şamê yê ku bûye navendeke girîng ya sirgunê vedigêre. Rast e ku sirgun tê wateya jîbîrkirin û wendabûnê lê belê mirovên weke Memduh Selîm, Celadet Alî Bedîrxan, Uzun ku karîne sirgûnê bo xwe û çanda xwe veguherînin derfeteke nû, navber nedane xebatên xwe yê rewşenbîrî û her wekî ku em di mînakê Uzun de dibînin wan ev rewşa nû jî di çarçoveya vegêra netewî de jî nû ve hilberandine. Ev yek bîrbirina ku Saîd²⁴ behs jê dike bi xwe ye. Ji ber vê yekê, li gel kevneşopa sirgûnê, tecrubeya kurdan ya sirgûnê bi xwe û adresa vê sirgûna ku xebata rewşebîriyê ye, di nivîskariya Uzun de xaleke girîng ya palpiştê pêk tîne (2009: 58-59).

²⁴Mebest ji Said, Edward Said e ku ew bi xwe jî rewşenbîrekî sirgûnbûyî yê navdar e û li ser rewşa sirgûnê û rewşenbîrên sirgûn xebatên heja kiriye.

Sirgûna rewşenbîr û hunermendan bo poetîkaya Uzun ewqasî girîng e ku her hewl dide di romanên xwe yê dawî de bi awayekî mijara sirgûnê û rewşenbîrên sirgûnbûyî têxe nava vegêranên xwe. Dîsa di *Hawara Dîcleyê* de Dengbêj Biro piştî şikestina serhildana Mîr Bedirxan, bi malbatî weke dengbêjê wî, bi mîr re diçe sirgûnê. Ev yek bi xwîneran ecêb nayê lew hê ji destpêka romanê ve Biro him weke lehengê romanê him jî weke vegêrê romanê li ser sirgûnê û rewşa sirgûniyan fikrên xwe diyar dike. Di destpêka romanê de, hê ku Biro zarokeke ku meyla wî li ser gotin û pirtûkan e, carê diçe pirtûkxaneyê Mam Sefoyê şewirmendê Mîr Bedirxan, li wira bêtî ku ji wan fêma bike, li resmên di nava pirtûkên bi zimanên ermenî, latînî û yunaniya kevn hatine nivîsîn dinere. Mam Sefo bi kurtî jê re behsa nivîskar û mijarên wan pirtûkan dike ku di wan de behsa sirgûna ji welêt an jî bi mebesta şer, dîrketina ji welatê wan heye. Lewre her wekî ku dê di paşerojê de ew ê bibe sirgûnek ji wan, Biro kêfa xwe ji wan re tîne û li gor xwe ji resmên ku cihê sirgûnê û dîrîya wan nîşan dide, şîroveyan dike, hewl dide rewşa wan fêma bike.

Mijara pirçandîtiyê bo Uzun ewqasî girîng e ku hin caran rê li ber bilêvkirina navê welatê wî an jî welatê kurdên ku mijara romanên wî ne jî digre. Ev yek bi taybetî di roman û nivîsên wî yê dawî de diyar dibe. Di romanên weke *Hawara Dîcleyê* û *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirînê* de li şûna navên welatên rastîn yê weke Tîrkiye, Kurdistanê, navên herêmî û yê ku bi taybet pirçandîtiyê dinîmînin bi kar tîne ku Mezopotamya ye ev nav. Di romana *Hawara Dîcleyê* de li gel problemên kurdan behsa problema ermenî, asurî, suryanî, cihû u tirkmenan jî tê kirin. Vegêrê romanê Biroyê Dengbêj bi awayekî balkêş gelekî dişibe nivîskar Mehmed Uzun û weke nûnerê wî xuya dibe. Di vê romanê de diyar dibe ku Dengbêj Biro ji heft ol û civakên cuda yê Mezopotamyayê, heft ciwanan dixwaze da ku perwedehiya dengbêjiyê bide wan. Mebest ji vira jî hînkirina dengbêjiyê zêdetir nîşandana çanda bi hev re jiyînê ye ku Uzun di hevpeyvîn û ceribandînan xwe de jî her û her balê dikişîne ser girîngiya wan. Divê neyê jî bîr kirin ku jiyanî pirçandîtiyê ya li Swêdê ku piştî salên 80yî bû navendeke edebiyata modern ya kurdî, tesîreke bi vî rengî li Uzun dike. Uzun vê yekê di ceribandînan xwe yê di pirtûka *Nar Çiçekleri* de cih digrin bi dirêjahî vedigêre (1995: 80-88).

Li gel rexneyan careke din divê were gotin ku Uzun nivîskareke ku her li pey nûbûn û pêşketinê ye. Ji romana ewwîl ta ya dawiyê dema em li zimanê wî û li şêwaza wî dinerin ev yek baştir xuya dibe. Nebûna kevneşopeke pexşanê û romanê astengiyên herî dijwar in li pêşiya Uzun lê ew bi xebata xwe, bi lêkolînên xwe dişê tevî kêmasiyan zimanekî nû bo berhemên xwe saz bike. Herwiha ji ber ku endamekî neteweyeke bindest ku ji her tiştî mehrum e Uzun bi awayekî mecburî di romanên xwe de problemên çandî û siyasî yên milletê kurd bi rêya romanên biyografîk û dîrokî vedigêre. Paşê ev yek tevî ku bi problem e û di nava xwe de şaşiyên vedihewîne jî dê bibe sedem ku Uzun weke romannûsê modern yê milletê kurd were naskirin.

Li gel ku Uzun hay ji romannûsên beriya xwe û hevçerxên xwe heye û heta di pirtûkên xwe yên *Destpêka Edebiyata Kurdî* û *Antolojiya Edebiyata Kurdî* de behsa wan dike jî, dema di hevpeyvîn, bernamê û nivîsan de bo wî dibê: “Mehmed Uzun romana kurdî afirand”, Uzun vê şaşiyê sererast nake. Uzun bi xwe jî vê yekê di nivîs û hevpeyvînên xwe de diyar dike. Bo nimûne navê pirtûkeke wî ya ku bi tirkî çap bû *Bir Dil Yaratmak* ango afirandina zimanekî ye ku qesta wî jê afirandina zimanekî nû û edebî yê romanê ye. Ev yek bi taybet li Swêdê û Tirkiyeyê wiha tê zanîn ku bi wergerên berhemên wî yên bo tirkî û piştigiri an jî pesindayina Yaşar Kemalî ya bo romanên wî û weşandina wergerên romanên wî li Tirkiyeyê ye (Yusiv, 2011: 25-28).

Clemence Scalbert Yücel jî di pirtûka xwe ya bi navê *Kürt Edebiyatının Anatomisi* de vê yekê wiha diyar dike: Bi vî awayî Mehmed Uzun weke “Bavê Romana Kurdî” tê tesdîqkirin. Û di vê kêliyê de ji hêla hin kesên wek Yaşar Kemal yên gewre yên edebiyata tirkî tê piştigirî kirin. Yaşar Kemal di pêşgotina wergera tirkî ya *Siya Evîne* ya sala 1998an de wiha dinivîse: “Mehmed Uzun karekî ku ji texmînê zehmettir e weke peywîr hilgirtiye: bûna romannûsek kurd û heta bi qasî ku berhemên honak yên vî zimanî armancên mitewazîtir danîne pêşber xwe jî, di şêwaza xwe de bûna romannûsê ewwîl û rastîn ê kurd.” Li gor Yaşar Kemal, ev peywîr bi serkeftinê bi encam bûye (2018: 204).

İbrahim Seydo Aydoğan di “Romanên Mehmed Uzun: Avakirina Lehengan û Tevna Vegotinê” de vê yekê bi şiklekî din diyar dike:

Mehmed Uzun bi nivîskariya xwe ve rengekî nû û şewazake xweser anî edebiyata kurdî û romana kurdî populer kir. Em dikarin weha bibêjin ku wî bi berhemên xwe ve ji nû ve ruh da roman û wêjeya kurdî; lê belê van nîqaşên li derdora wî, rê bi temamî li ber nîqaşên wêjeyî jî digirt û nedihîşt ku mirov bi çavekî wêjeyî romanên wî binirxandana. Ji nivîsên pesindayînen vala û bê argument bigirin heta bi nivîsên bêînsaf, tişt nema ku li ser wî nehat gotin (2014: 247).

Her wekî Aydoğan amaje pê dike nîqaşên li ser Uzun gelek caran derveyî naveroka romanên wî ne û li ser hin ezberan in ku gelek caran di hewla îspatkirina wê yekê de ne ku Uzun ne romannusekî jêhatî yê romana kurdî ye. Lê belê hindê nivîs hene ku li gel van nîqaşan bala xwe didin naveroka romanên Uzun û qelsî û kêmasiyên zimanî û teknîkî yên romanên wî dinirxînin. Remezan Alan jî yek ji van nivîskar/rexnegiran e ku bala xwe dide romanên wî û wan ji hundir ve rexne dike, dinirxîne. Di gotara xwe ya bi navê “Romanek û Têkçûna Masumiyetekê” de bi xurtî li ser romana Uzun ya dawî, *Hawara Dicleyê* ku weke du cildan çap bû, hur dibe. Alan di gotara xwe de bereberê balê dikşîne ser zimanê vê romanê ku gelekî bi qisûr e:

Em gotinê zêde dirêj nekin: Bikaranîna gihînek, cînav û bêjeyên hemwate yên ku îro wek mînakên xerabebûna vegotinê tîr qebûlkirin û hizirîna bi qalibên zimanekî din ku nîşana neehliya ziman in, taybetiyên derbirîna Mehmed Uzun in. Di wan de mixabin îroniyeke Ulysseswarî nîne. Ji ber ku Uzun li ser çerxeke mîzahî, bi kurdî nalîze yan ji bo derkirina lehengekî, zimanekî wisan naafirîne. Ger wisan bikira dê me jî ev îfadeyên li jêr, wek parçeyên organîk ên metnê bidîta û der barê xwerûbûn û fesîhiya wan de tiştek negot (2013: 194-195).

Di berdwama van gotinan de Alan gelek mînakên ku angaşt wî piştrast dikin ji beşên cuda yên romana navborî neqil dike. Li gel hin tespîtên di cih de, Alan bi berawirdkirina Uzunî bi James Joyce re neheqiyê li Uzun dike. Lew hem saikên berhemdayîna wan hem jî paşxane/kevneşopa ku xwe dispêrinê gelekî ji hev cihê ye ku ev yek berawirdkirina wan ji hêla zimanî be jî zehmet dike. Her di vê peywendê de di pêvajoya nêz-xwendina berhemên Uzun yên bo vê tezê de em jî rastî gelek şasiyên zimanî yên Uzun hatin, li gel vê em rastî hindê biwêj û gotinên pêşiyên yên tirkî jî hatin ku wî ew motamot wergerandine kurdî û wisa bikaranîne.

Uzun di romanên xwe de ji tekrar û şayesandinên dirêj hez dike ku ev pûtepêdana bi şayesandinê ji nivîskarên serdema Uzunî zêdetir, di berhemên nivîskarên klasîk de xuya dibe. Bi taybet di romanên weke *Bîra Qederê*, *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* û *Hawara Dicleyê* de ev yek êdî ji asteke pêwîst derbas dibe. Bo nimûne di *Bîra Qederê* de ku li ser wêneyan avabûye, nivîskar di serê her beşê de ji wêneyekî Celadet Alî Bedirxan dest pê dike. Wêne tevî hemû naveroka wê dişayesîne û paşê derbasî vegêra bûyeran dibe. Di her du cildên *Hawara Dicleyê* de ev yek digihêje asta herî bilind lewre Alan di gotara xwe de bi awayekî mafdar dibêje ku Uzun romaneke ku ancax dikaribuya weke 150-170 rupelan bihata nivîsîn, bi şayesandin, tekrar, rengdêr û detayên ku tiştekî li romanê zêde nakin romana xwe werimandiye.²⁵ Herwiha Alan diyar dike ku *Hawara Dicleyê* romana herî lawaz ya Mehmed Uzun e (2013: 196).

Berevajî Alan, di pirtûka *Kürt Romanı Okuma Klavuzu* ya ku Özlem Galip û Abidin Pariltı bi hev re amadekirine de ev roman weke yek ji romanên herî girîng û mezin yên Uzun tê pêşkêş kirin (2010: 65). Divê were destnîşankirin ku hindek caran nivîs û gotarên li ser romanên Uzun, girêdayî ziman û nivîskarên wan xwedî naverokeke erênî an jî neyînî ne. Bo nimûne kesên wek Yaşar Kemal, Muhsin Kızılkaya, Abidin Pariltı, Şeyhmus Diken û hwd. ku qet nebe li ser berhemên Uzun bi tirkî nivîsan dinivîsînin û bi kêmanî di nava edebiyata tirkî de bi cih dibin di nivîsên xwe de zêde objektîf tevnagerin û her di hewldana pesindana berhemên Uzunî de dixuyên. Berevajî vê çend îstîsna ne tê de, gotar û nivîsên li ser Uzun yên bi kurdî zêdetir bala xwe didin vegêranên Uzun û li gel qelsî û kêmasiyan nixandînan xwe li wan dikin.

Fexriya Adsay jî di gotareke xwe ya li ser romanên dîrokî yên kurdî de romana *Hawara Dicleyê* û romana Jan Dost ya bi navê *3 Gav û 3 Darekê* berawird dike. Adsay di vê gotara xwe de balê dikêşe anakronîzma ku hema bêje di her beşa romanê de xwe dide der û diyar dike ku roman bi endîşeyên îroyîn hatiye nivîsîn. Ji hêla din û bi awayekî mafdar ve Adsay balê dikêşe ser naifbûna lehengên Mehmed Uzun yên weke

²⁵ Herçiqas R. Alan van gotinan bo cilda ewwî a *Hawara Dicleyê* ya ku di sala 2001ê de çap bû, dike jî bi awayekî rehet mirov dikare berpêş bike ku heman tişt di cilda duyem ya vê romanê de jî heye ku ew jî di sala 2003an de ji Weşanên Avestayê çap bû.

Biro, Mam Sefo, Armê, Migo û Gulîzerê ku li gor sedsala ku roman tê de derbas dibe ji heddê xwe zêde naif û bi tolerans in li hember fikr û baweriyên cuda (Adsay, 2014: 135-137).

Her wekî me jî li jor destnîşan kir, Adsay vê yekê bi tesîra Swêdê ya li ser Mehmed Uzun ve girêdide: Uzun, di vê romanê de rasterast van têgehan bi kar neyne jî, wî di neynika wekhevî, pirçandîti û bihevrebûna cudatîyan re ku bi taybetî di salên 1990an de ketine rojevê, civaka sed û heftê sal berê terîf kiriye. Dibe ku bandora salên jiyana wî ya li Swêdê tê de hebe ew der ku paytextê pirçandîtiyê ye. Di nav vê çanda siyasî û di bin siya nîqaşên demokrasiya nûjen de li dîrokê nêriye û civak û pêwendiyên civakî bi awayekî derî-zeman teswîr kiriye (2014: 137).

Ev fikrên ku Uzun di vê romanê de bi rêya lehengên xwe pêşkêş dike hê di salên 90î de di rojeva wî de ye lew dema mirov li pirtûka wî ya ceribandinan ku bi navê *Nar Çiçekleri* cara ewwil bi tirkî di sala 1995an de ji Weşanên Belgeyê çap bû, dinere, mirov dibîne ku Uzun li Swêdê van fikran nas dike. Di ceribandina xwe ya bi navê “Çokkültürlü Toplum”ê (Civaka Pirçandî) de li ser vê yekê disekine û diyar dike ku di demên ewwil de di têgiştina vê rewşa nû ya ku li hember çand û nasnameyên din bi tolerans e zehmetîyan dikşîne (1995: 82-83). Lew maf û derfetên ku li Tirkîyeyê bi dest wî û milletê wî nediket ango bi neheqî û tehdeyê ji wan hatibû sitendin, li wira hebû û ev yek gelekî normal dihat dîtin. Helbet ev yek tesîra xwe li ser Uzun dike ku Uzun paşê hem di romana *Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê* de û hem jî di *Hawara Dicleyê* de her û her balê bikêşe ser vê yekê.

Lehengên romanên Uzun bi gotina İbrahim Seydo Aydoğan gelekî naîf in. Her du romanên wî yên dawî ne tê de, di romanên wî de sînore lehengan diyarikirî ne û zû bi zû naguherin. Walter J. Ong ji bo lehengên romanên ewwil ku tesîra vegêranên devkî di xwe de dihawandin re dibêje “tîpên duz û giran” (2018: 178). Navlêkirineke bi vî rengî bo lehengên her pênc romanên ewwil yên Uzun jî derbasdar in. Lew ji destpêka romanên heta dawîya wan leheng çawa hatibin şayesandin, wiha berdewam dikin: Yan tim baş in yan jî tim xerab. Aydoğan girêdayî vê yekê taybet bo lehengê romana *Siya Evîne*, Memduh Selîm Beg û yê *Bîra Qederê*, Celadet Alî Bedirxan diyar dike ku Mehmed Uzun ji wan hezikirîye ku vê yekê rê li ber avakirina wan weke karakteran tesîreke neyînî kiriye: “Nivîskêr ji wan hezikirîye. Rastîbûna van lehengan

û hezkirina nivîskêr jî bivê nevê rê li ber avakirina lehengan girtiye û ji ber wê jî, bi tenê aliyên wan yên baş hatine vegotin” (2014: 256).

Li hêleke din bi giştî nebe jî Uzun di romanên xwe tîpolojiyeke rewşenbîr ya ku ew kêmasiya wê dikşîne diafirîne. Lehengên sereke yên romanên yên weke Kalê Rind, Memduh Selîm, Evdalê Zeynikê, Celadet Alî û Dengbêj Biro bi fikr û romanên xwe, bi pratîkên xwe teqabulî nasnameyeke rewşenbîrî ya demokrat, ji çandên din re vekirî û bi îktîdara xwe re xwedî mesafe ne. Uzun di *Bir Romanî Hattira Defteri* (*Deftera Bîranînan ya Romanekê*) de dibêje “Divê Biro alter-egoya rewşenbîrêkî modern be, eyn wekî Homeros, Ovidius, Vergilius, Xani, Hayyam. Lewre Biro hem dişibe wan, hem jî li ser rêya wan dimeşe” (2016a: 34). Girêdayî vê yekê di romanê Biro di axaftin û monologên xwe her bi awayekî balê dikşîne ser jiyan, berhem û fikrên van nivîskaran.

Uzun ji lehengên romanên xwe yê din jî hez dike û hewl dide wan ji xerabiyên biparêze. Kalê Rind yê lehengê romana *Mirina Kalekî Rind* bû û Evdalê Zeynikê, Tahar Xan, Gulê ku lehengên romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* bûn, ew leheng in ku Uzun ji wan hez dike û bi awayekî ku xwendekar jî ji wan hez bikin, wan ji xwe re mînak bigrin hatine afirandin. Di her du romanên dawî yên Uzun de êdî em nêzîkî lehengên rastîn tên ku hêza guherînê di wan de heye. Baz yek ji wan lehengan e di destpêk û heta ber bi dawiya romanê ve Baz weke serbazekî bêrehm xuya dibe lê piştî ku Kevokê dîl digrin hindekî jî bi tesîra Kevokê hêdî hêdî diguhere. Guherîna wî tê asteke wisa ku şerê li welatê çiyê rexne dike, ev yek dibe destpêka dawiya wî jî. Herwiha em di Kevokê de jî nîşaneyên qerekeran dibînin. Lew ew jî hema bêje weke Baz piştî dîlketinê diguhere, dibe yeka din.

Uzun di romanên xwe de herî zêde teknîka flashbackê bi kar tîne. Ji romana ewil Tu yê bigre heta bi *Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê*, vegêr çîroka xwe li ser demeke ne rast saz dike û car caran bi paş de vedigere. Romanên wekî *Bîra Qederê*, *Siya Evîne* û *Hawara Dîcleyê* jî bi teknîka flashbackê hatine nivîsîn. Taybetmendiya hevpar ya van romanên ewil û ku hemû jî ji dawî destpê dikin ku lehengê sereke mirî ye an jî weke Biroyê Dengbêj ku leheng û vegêrê *Hawara Dîcleyê* ye, pîr bûne. Aydoğan di gotara xwe de di derbarê vê yekê de wiha dibêje:

Romanên Mehmed Uzun bi du gavan dest pê dikin. Gava yekem piştî bi dawîbûyîna bûyeran e. Vebêjerê romanê ku bi piranî nivîskar bi xwe ye, li ser wan bûyeran lêkolînan dike û carinan jî weke Biroyê dengbêj (Hawara Dîcleyê), ev lêkolîn bi forma bîrê û bi rêya lehengekî ve behsa bûyeran dike. Perdeya vegotinê bi sazîkirina vê hêla romannivîsiya wî vedibe û bi dû re vedigere nava bûyerên romanê. Bi vî awayî, hemû bûyerên romanê weke flashback²⁶ tên ravekirin ku forma bîrê ji ber vê sedemê girîng e (2014: 249).

Li gel flashbackê teknîka ku Uzun herî zêde bi kar tîne teknîka metafictionê ye ku hê di romana xwe ya ewwîl *Tuyê* jî cih divê vê teknîkê. Li gorî vê teknîkê, nivîskar bi awayekî bi xwîner dide zanîn ku metna dest wî de roman e. Herwiha bi vê yekê re xwîner jî tevî metna xwe dike û atmosfereke listîkî saz dike. Di romana *Tuyê* de Mehmed Uzun vê teknîkê wiha bi kar tîne: “Li vê derê, bi dû xelasbûn romana te parantezek divê” (2015a: 219). Bi vê hevokê vegêr/nivîskar ji lehengê xwe re diyar dike ku ev romanek e û va romana te diqede ango pê re bi awayê ku karê xwe eşkere bike diaxive. Di romana ku li ser du awayên vegêranê avabûye de di beşekê de vegêr bi leheng re diaxive, serboriya wî jê re vedigêre, di beşa din de vê carê leheng bi kêzê re diaxive û jê re bîranînên xwe vedigere. Di beşên ku vegêr bi leheng re diaxive de dîsa metafiction li dar e. Di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, di beşa Gotina min de ku wek prologê ye, vegêrê bi navê Ehmedê Fermanê Kîkî ye diyar dike ku Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Alî Bedirxan daxwaza nivîsandina çîroka Evdalê Zeynikê ji wî kirine û va ewê rojêke jiyana wî vegêre an jî binivîse (Uzun, 2018a: 14-17). Bi vî awayî nivîskar eşkere dike ku metna li ber me xwîneran metneke honakî ye. Di nava vegêranê de jî em bi awayekî din dengê vegêr dibihîzin ku berê xwe dide xwîneran û dibêje: “Xwendevanên bîhnfireh û bisebr, niha wext hat... em ê, îcar, bên cem Meyro” (Uzun, 2018a: 89) ku ev jî awayekî bikaranînê vê teknîkê ye. Herwiha divê bê gotin ev yek taybetmendiyeke vegêrana devkî ye ku Uzun kirasekî nû lê kiriye.

Di romana *Bîra Qederê* de, di beşa ewwîl de em dibînin ku Celadet Alî Bedirxan dest bi nivîsandina romaneke bi navê *Bîra Qederê* kiriye lê ji ber mirina wî

²⁶ Li gorî Eleştiri Terimleri Sözlüğü flasback cureyeke anakronîkê ye, li gorî vê ev term bo wan berhemên ku çîrokekê vedigêrin de bi awayê ku herka bûyeran xera bike nivîskar carna demê bi paş de tîne an jî ji dawîya bûyeran ve dest vegêrana xwe dike (Huyugüzel, 2018: 39-40)

ew nehatiye nivîsîn û hevjinê Bedirxan, Ruşen Xanim difikire ku kî dê vê romanê temam bike. Pişt re di fotograf lê yê romana *Bîra Qederê* de, vegêr him behsa romana *Bîra Qederê* dike û him jî wê vedigêre. Li hêleke din, li gel vegêrê eslî yê vê romanê, vegêrek din jî heye ku ew Celadet Alî Bedirxan bixwe ye û cihê ku vegêrê yekem an jî Mehmed Uzun vala dihele, kêr vedigêre, temam dike, pê re diaxive: “Nivîskarê *Bîra Qederê*, herwekî ku tu dizanî, kitekit û detay ji bo afirîn û avakirinê gelekî girîng in” (Uzun, 2016b: 23). Bi vî awayî nivîskar, mafê axaftinê dide lehengê xwe û romana xwe bi wî re, bi alîkariya wî vedigêre.

Uzun di romana *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de jî wekî nivîskar di romanê de xuya dibe û xwîneran ji pêvajoya nivîsîna romanê haydar dike: “Ez, vebêjê vê romanê, li ser nivîsîna vê romanê fikirîm” (2010a: 358). Her wekî vê nivîskar hema di her beşê de dengê xwe digihîne xwîneran û bi wan dide zanîn ku ev romanek e. Ji bilî vê bi awayekî fîzîkî jî di romanê de diyar dibe ku xwe weke nivîskarê *Tarîxa Evîneke Keserkûr* bi Kevoka ku lehenga romanê ye, dide nas kirin (Uzun, 2010a: 152). Navê romana wî *Siya Evînê* ya Uzun tîne bîra mirov ku romana wî ya ewil e ku li tirkî hatiye wergerandin. Her wekî ku diyar dibe Uzun teknîka metafictionê bi çend awayên ji hev cuda bi kar tîne û vegêrana xwe dewlemend dike.

2.3. Berhemên Wî

2.3.1. Romanên Wî

Tu, Weşanên Dengê Komal, Stockholm, 1984; ç. 3. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2015.

Mirina Kalekî Rind, Weşanxana Orfeus, Stockholm, 1987; ç. 4. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2015.

Siya Evînê, Weşanxana Orfeus, Stockholm, 1989; ç. 5. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2018.

Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, Weşanxana Orfeus, Stockholm, 1991; ç. 4. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2018.

Bîra Qederê, Weşanên Sara, Stockholm, 1995; ç. 4. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2016.

Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Weşanên Avestayê, 1998; ç. 2. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2010.

Hawara Dîcleyê-1, Weşanên Avestayê, İstanbul, 2001.

Hawara Dîcleyê-2, Weşanên Avestayê, İstanbul, 2003; ç. 3. Weke cildekê, Weşanên Îthaki, İstanbul, 2016.

2.3.2. Ceribandin û Hevpeyvînên Wî

1. Hêz û Bedewiya Pênûsê, Weşanên Nûdem, Stockhol, 1993. Ev pirtûk ji ceribandin û hevpeyvînên Mehmed Uzun yê li ser çand, huner, siyaset û edebiyatê ku di kovar û rojnameyên cuda de hatine weşandin pêk tê. Ev pirtûka ceribandinan pirtûka wî ya ewwîl û ya dawî ye ku bi kurdî hatiye nivîsîn. Weke li jêr jî dê xuya bibe piştî vê pirtûkê Uzun ceribandinên xwe bi tirkî dinivîsîne. Di pirtûkê de 21 ceribandin û 6 hevpeyvîn hene.

2. Nar Çiçekleri, Weşanên Belge, İstanbul, 1995. Ji ceribandinên Uzun yê li ser pirçandîtî, yê din û sirgûniyê pêk tê. Di pirtûkê de 9 ceribandin cih digre. Ceribandin li ser pirçandîtî, sirgûn, rewşenbîrî û demokrasî û diyaloga di navbera

komên dijber de ye. Nivîs di navbera salên 1992-1995an de di kovar û platformên cuda cuda hatine weşandin.²⁷

3. Dengbejlerim, Weşanên Belge, İstanbul, 1998; ç. 10. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2017. Ji ceribandînan li ser dengbêjan û hunera dengbêjiyê pêk tê. Pirtûk ji prolog û dawîyeke bê sernav û 5 beşên bê sernav pêk tê ku her beşek di derbarê dengbêjekî de ye. Dengbêjên ku di vira de cih digrin ev in: Apê Qado, Evdalê Zeynikê, Alihan, Rifatê Darê, Ehmedê Fermanê Kîkî. Di vê pirtûkê mirov têkiliya Mehmed Uzun ya bi dengbêjî û folklorê re ji nêztir dibîne.

4. Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler, Gendaş, İstanbul 2002; ç. 10. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2018. Pirtûk ji ceribandînan û deklarasyonên ku Uzun îmze avêtîyê pêk tê. Di pirtûkê de 12 ceribandînan û 2 metnên deklarasyonê cih digrin. Ceribandînan di derbarê roman, hêza vegêranê, azadî, demokrasî, diyarbekir û rabirdû û çandên qedîm de ne û di navbera salên 1999-2002n de di rojname, kovar û civînên cuda cuda de hatine weşandin/pêşkêşkirin.

5. Ölüm Meleğiyle Randevu, Weşanên Îthaki, İstanbul, 2008. Ev pirtûk ji ceribandînan, axaftin û hevpeyvînan Uzun yê ku neketine pirtûkên wî ji hêla Muhsin Kızılkaya ve hatine berhevkirin û çapkirin. Pirtûk ji 15 nivîs û ji 3 hevpeyvînan pêk tê. Metnên di vê pirtûkê de bi giştî di derbarê demokrasî, azadî, hêza edebiyatê û hinek hunermend û nivîskarên kurd de ye.

2.3.3. Hevpeyvînan Wî

Ziman û Roman, Weşanên Nûjen, İstanbul, 1996.²⁸

Bir Dil Yaratmak, Weşanên Belge, İstanbul, 1997; ç. 8. Weşanên Îthaki, İstanbul, 2009.

Küllerinden Doğan Dil ve Roman, Weşanên Îthaki, İstanbul, 2005.

²⁷ Nivîsa dawî ya bi sernavê “Yaşar Kemal” di şeva xelat stendina Yaşar Kemalî ya Azadiya Ramanê-Monismanîe yê di 1997an de li Zanîngeha Uppsalayê tê pêşkêşkirin û di çapa duyem ya vê pirtûkê de tê weşandin.

²⁸ Ji ber ku çapa vê pirtûkê li piyasê tune bû, me nekarî wê bi dest bixin.

2.3.4. Lêkolîn û Antolojiyên Wî

Destpêka Edebiyata Kurdî, Weşanên Beybûn, İstanbul, 1992.

Antolojiya Edebiyata Kurdî, du cild, Weşangeriya Tûm Zamanlar, İstanbul, 1995.²⁹

Varlden Î Sverige (Hemû Dinya li Swêdê ye), Antolojî, li gel M. Grive, Stockholm, 1995³⁰

2.3.5. Berhemên Wî yên Din

Zimanê Çiya, wergera şanoya Harold Pinter, Weşanên Xanî & Bateyî, Stockholm, 1990.

Mirina Egîdekî, destan/helbest, 1993; ç. 2. Weşanên Ronahî, İstanbul, 2013.

Defter-i A'malim: Mehmed Salih Bedir-Han'ın Anıları, amd. Bi Rewşen Bedir-Han re, Weşanên Belge, İstanbul, 1998.

Ruhun Gökkuşığı, vegêran, Weşanên Îthaki, İstanbul, 2005.

Bir Romanın Hatıra Defteri, rojnivîsk, Weşanên Îthaki, 2007.

²⁹ Çapa duyem ya vê pirtûkê û wergera wê bi awayekî kinkirî weke cildekê ji weşanên ithakiyê derdikeve.

³⁰ Ev pirtûk bi swêdî ye û li tirkîyeyê nehatiye çapkirin. Antolojî ji metnên nivîskarên biyan yê li Swêdê dijîn û berhemê didin pêk tê.

3. BEŞA SÊYEM: DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE HÊMANÊN FOLKLORÊ

3.1. Edebiyata Gelerî

Beşeke mezin ya folklorê ye ku zêdetir ji berhemên devkî yên ku xwediyên wan nediyar in û bi awayekî devkî belavbûne, pêk tê. Ev berhemên ha xwedî şêwazên taybet û estetîkeke wisa bûn ku bi van taybetmendiyan xwe di nava gel de dihatin hezkirin û ji nifşekî bo nifşên din dihatin veguhastin. Berhemên edebiyata gelêrî yên wek kilam, çîrok û destan bi taybet di wan şevên ku wek şevbûhêrk dihate binavkirin li odeyan gundan an jî axa û serokeşîran bi tevlibûyina mirovan ve ji hêla dengbêj û çîrokbêjên pispor ve dihatin vegotin. Ev yek hem bi awayekî endamên civakê nêzî hev dikir û hem jî bîra wan a civakî zindî dihişt.

Edebiyata gelêrî çavkaniyeke jêner ya Mehmed Uzun e. Uzun ji romana xwe ya ewil ta ya dawiyê bi awayekî romanên xwe dispêre berhemên edebiyata gelêrî. Ev spartin hin caran weke romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* jinûvenivîsandina wan pêk tê. Hin caran jî Uzun wan bo xurtkirina zimanê romanê û lehengên xwe bi kar tîne. Di destpêka romannûsiya xwe de Uzun li qelsiya zimanê xwe diwarqile û ji bo kêmkirin an jî jîholêrakirina vê qelsiyê berê xwe dide berhemên edebiyata devkî. Girêdayî vê yekê Uzun, berhemên edebiyata gelêrî di nava romanên xwe de bi zanetî bi kar tîne. Dema vê dike kêman caran metna resen diguherîne. Di *Tuyê* de hin beşên ku ji destana *Memê Alan* hatine wergirtin hinekî diguherîne. Li hêleke din di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de hinek kilamên Evdal li gor peywenda romanê diguherîne.

Li gel jêgirtinên ji metnên heyî yên edebiyata gelêrî Uzun, bi xwe jî, li gor pêdiviya lehengên xwe kilam û stranan diafirîne. Ev afirandin di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de li gor kevneşopa edebiyata gelêrî ye û gelek taybetmendiyan wê diafirîne. Lê berevajî vê romanê di romana *Hawara Dicleyê* de li gel çend afirandinên kevneşopî, hindek kilam û stranên ku Dengbêj Biro afirandiye, dûr in ji kevneşopê, ew bêhtir di rengê helbestên modern de ne.

Di navbera lehengên romanên û berhemên edebiyata gelêrî yên ku di romanên de derbas dibin hevterîbiyek heye. Ango Uzun wan berheman li gor tecrube, xislet, perwerdehî û derdora ku tê de mezin bûne, dixê nav axaftina lehengan. Bo nimûne dengbêjên ku di romanên de derbas dibin li gor şertên dengbêjiyê di warê kilam, stran,

gotinên pêşiyên û biwêjan de tije ne û axaftinên xwe her bi wan dixemilînin. Di romana *Tuyê* de kalikê lehengê sereke û lehengê bi navê Apo li gor emr, tecrube û zanînen xwe hakimê berhemên devkî ne û di axaftinên wan de ev yek bi awayekî xurt xwe nîşan dide.

3.1.1. Şevbuhêrk

Di lêkolînen li ser folklorê kurdî û dengbêjiyê de lêkolîner gelek caran rastî peyva şevbuhêrkê tên ku bi fonksiyana xwe û wateya xwe bo belavbûn û nasîna edebiyata gelêrî gelekî girîng e. Şevbuhêrk bi wateya xwe ya ewwîl şeva ku tê buhurîn an jî ew tiştên ku şev pê derbas dibe. Di çanda kurdî de ji bo ew şevên ku gundî, cîran û nas û dost li hev dicivîyan û di wê şeve de her kesî li gor zanîn û têgihiştina xwe ji koma runiştî re stran, çîrok, meselok û hwd. digotin şevbuhêrkê tên gotin.

Di van şevan de mirov li maleke diyar, piştî şîvê kom dibin û bi vegotina destan, çîrok, stranan didome. Di şevbuhêrkan de ne tenê berhemên devkî dihatin gotin, herwiha kesên dihatin şevbuhêrkê li odê carna listikên zarokan jî dîlistin an jî govend jî dihat girtin. Mehmed Uzun ê ku di romanên xwe de cihekî taybet dide folklorê û wê dike yek ji çavkaniyên herî xurt ê romannusiya xwe, di romana xwe ya *Hawara Dicleyê* de bûyeran di 7 şevbuhêrkan de ji devê Dengbêj Biro yê ku di heman demê de lehengê sereke yê romanê ye vedigêre:

Dengê min, yanî dengê Biro ku hûnê îşev bibihîzin, denge însanekî jibîrbûyî ye ku di wextê xwe de denge însanên jibîrbûyî bû.

We xwest ez ê jî bejim. Birînen min îro jî derman bûne, min mewîjên xwe xwarine, ava xwe vexwariye. Tasa mewîjê û tasa avê li kêleka min, kevirê min ê spî yê teyrê tawis li stuyê min, tizbiya belek a not û neh libî ya kehrîbarê di destê min de ye. (2016c: 35-36).

Di vîra de dengbêj Biro berî dest bi vegerana xwe bike behsa xwe û rewşa odê dike ku xwîner ji vîra hînî awayê şevbuhêrkan û tevger û amadekariyên bo wê hatine kirin dibe. Bo dengbêjê ku li şevbuhêrkê wê ji guhdar û bîneran re hindek pêşkêşiyên bike av, mewîj an jî şerbet û tiştên bi vî rengî ku carê qirka xwe şil û devê xwe şêrîn

bike li kêleka wî ye û berî destpê bike temiyên li beşdaran dike da motivasyona wî xera nebe.

Di vê beşê de dê hêmanên folklorê ku bi piraniya wan hêmanên folklorê kurdî ne werin tespîtîkirin, senifandin û li gor zanista folklor û peywendên xwe yê di romanê de werin analîzkirin.

3.1.2. Awirek li ser Dengbêj û Dengbêjiyê

Di nava her neteweyî form û kevneşopiyên taybet yê muzîkê hene ku bi sedsalan tesîrê li endamên civaka xwe dikin. Di nava kurdan de ev kevneşopîya muzîkê ya taybet dengbêjî ye ku ev li ser hîmê wê li ser deng û gotinan û teşedana wan jî hela îcrakerên wê ye. Lê belê di derbarê dengbêjî û sînorên de we fikrên dijber hene ku ev yek jî ber kêmbûna xebatên li ser vê qadê ye. Herwiha ev bi nebûna çavkaniyên kevn ên nivîskî re jî peywendîdar e. Di vê beşê de dê bi kurtî li ser dengbêjî û dengbêjan were sekinîn û pişt re awayê bikaranîna wê ya di romanên Mehmed Uzun de were destnîşankirin.

Muzîka kurdî beşeke girîng a çanda kurdî ye û dengbêjî jî bêguman girîngtirîn binbeşa muzîk û çanda kurdî ye ku îro jî em tesîra wê ya mezin li ser muzîka kurdî dibînin. Lewra bîra herî kûr bîra dengbêjiyê ye ku jî sedsalan ve kûrtir û tijetir dibe û rê li ber kurdan dixê, bîra wan a civakî zindî dihêle (Aslan, 2019: 27). Li gor vê yekê taybetmendiya herî eyan a muzîkê ew e bi awayekî xurt bîra kolektîf diparêze û bi rêya îcrakerên xwe vê bîrê tevî guherîn û lêzedikirinan vediguhezîne bo nîfşên din. Lewre dikare were gotin ku dengbêjî di heman demê de arşîva civakê ye jî ku tê de berberîya eşîran, şerê li dij neyaran, kêfweşî û keserên mezin ên civakê tê de bi awayekî estetîk tê parastin.

Necat Keskin ê li ser dengbêjiyê û çanda devkî lêkolînan dike dengbêjiyê wiha pênase dike:

Dengbêjî di nav civaka kurdan de wek formeke veguhastinê cihekî sereke digire û îro jî hela kurdan ve bêhtir wek formeke [netewî] tê nîrxandin. Dengbêj kî ye? Çi dike? Dengbêj ew kese ku bi dengê xwe rih û can dide serpêhatiyên berê, û wan

serpêhatiyan careke din bi dengê xwe û carinan jî bi alîkariya bilûra xwe di hafîzeyê çandî ya gel de zindî dike (2016: 51-66).

Li gor Keskin dengbêjî di nav kurdan de wek formeke netewî tê dîtin ku ev yek bi lêkolîn û girîngîpêdanên van salên dawîn ên bi dengbêjiyê re girêdayî ye piçekî.

Dengbêj îcrakarê muzîka dengbêjiyê ye. Mijarên sereke yên berhemên dengbêjan evîn, şer, mirin, feqîrî û hwd. şer û pevçûnên di navbera kurdan û milletên din de qewimîne jî mijarên sereke yên kilamên dengbêjan in. Dengbêj van bûyerên trajîk bi şewazeke edebî ya xurt wekî destanan vedibêjin. Kilamên bi vî rengî gelek caran zêde dirêj in û bo xebatên dîroka devkî jî keresteyên gelekî girîng didin lêkolîneran. Dengbêj xwedî hafîzeyê gelekî xurt bûn û dikarîbûn bi awayekî jixweber kilam û stranan çêkin. Ji ber van taybetmendiyan xwe di nava civakê de xwedî cihekî taybet bûn.

Lêkolîner Zeynep Yaş di hevpeyvîna ku Mahmud Beğik pê re kiriye, di derbarê peyva dengbêj wiha dibêje: “Yê ku gotinên herî baş dibêje, dengê herî baş derdixe, hafîzaya wî/wê fireh, yê ku bûyerê dikare baş şirove bike û bikaribe bixê zargotinê, peyvê bike kelam, kelamê bike kilam, nefes bide gotinê û rihek bide kilamê, ew dengbêj e” (2013: 28).

Li gor M. Emin Aslan, dengbêj ew kes e yê destan, çîrok û meseleyên bihîstine, bandor li wî kirine yan jî bûyerên rasterast jiyanê û çavdêriya wan kiriye li gorî şewaza xwe û li gorî meqamekê carinan bi çîrokî carinan tenê wekî kilam, tenê bi dengê xwe û hin caran jî digel amûrekê vedibêje. Ew hostayê deng, newa û muzîkê ye. Hişê wî hingî bi hêze bi sedan destan û çîrok tê de ne û hindek ji wan bi roj û saetan bi dawî nabin (2019: 29).

Di dewrên mîrekiyên kurdan de her mîrek, xwediyê dengbêjekî bû çiku prestîja mîran bi kilamên ku dengbêjan li ser wan derdixist zêdetir dibû. Lê belê hemû dengbêj ne li dîwanxaneyên mîran bûn. Dengbêjên serokeşîr û axayan jî hebûn û yên ku ne girêdayî ti kesî bûn û gund bi gund digeriyan û muzîka xwe îcra dikirin jî hebûn. Dengbêjan vê yekê bo debara xwe jî dikirin. Dengbêjan muzîka xwe di dawetan de jî

îcra dikirin, di kilam û stranên dengbêjên wek Evdalê Zeynikê, Reso, Şakiro û hwd. de jî em rastî berhemên bi vî rengî jî tên.

Di nava asûrî û ermeniyên de jî em rastî dengbêjan tên ku berhemên xwe bi kurmancî afirandine. Wek mînak lêkolîner Mehmed Gültekin di pêşgotina pirtûka xwe Zargotina Kurdên Serhedê de behsa vê yeke dike û navê çend dengbêjên bi eslê xwe ermen in lê bi kurmancî hunera dengbêjiyê îcra kirine dide (Gültekin, 2013: 24-25).

Di hemû romanên Mehmed Uzun de dengbêj û dengbêj cihekî taybet digre û hewl dide sêdê ji awayê wan ê vegêranê û zimanê wan bigre. Di romanên Uzun yê *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dicleyê* de lehengên sereke û vegêrên romanên dengbêjin.

Hê di romana Uzun ya ewil *Tuyê* de bala wî ya li ser folklor û dengbêjiyê xwe bi xurtî dide der. Di destpêka romanê de lehengê ku di heman demê de vegerê romanê ye dema bi tenê di zindanekê de dimîne bi *Kêzaxatuna* ku lehenga fabilekê ye re diaxive, jê re behsa dengbêjan dike:

Bele... rîspiyên bajêr, heyînan bajêr bûn. Bajar bi wan ve dibû bajar. Gelek tişt di serê wan re derbas bûbûn. Wan çendî rojên xweş û nexweş dîtibûn û bi xwe tarî bûn. Piraniya wan dengbêj û çîrokbêj bûn. Eger hin nivîskar li wir, li nik wan hebûna, gelek tişt ê îro li ronahiyê buna. Hin stranên wan bi rojan diajotin. Di şevên dirêj ên zivistanê de, wan xort û zarok li dora xwe dicivandin, destên xwe didan ber guhên xwe û distran. Ji Memê Alan ta Delalê Beriyê, her cûra stran di tûrikên wan de hebûn (2015a: 16-17)

Weke di vîra de xuya dibe Uzun bi rêya romanê şayesindeneke biçûk di derbarê dengbêjan de dide û hin taybetmendiyê wan nişan pêşkêşî xwendevanan dike. Di cihên din ê romanê de vegêr êşkere dike ku bavê wî jî bi dengbêjiyê dizane, gelekî xweş li bilûrê dixê û destana Memê Alan bi bilûrê û bi devkî baş dizane û carna taybet bo wî vedigêre:

Bavê min, radibû bilûrek dadixist, vedigêriya cihê xwe û rûdinişt, bîskeke bilûr difirkand. Pêçiyên xwe li ser direqisand, dengê zelal û nerm dikir û çavên xwe digirt, pê re diçû. Ji me tu kesî deng dernediket. Oda runiştinê bi dengê bilûrê tijî dibû. Paşê

hêdî hêdî wî çavên xwe vedikirin, bêyî ku serê xwe bilivîne, li me, li odê dinihêrî; em bêsebr li benda stranê bûn û dîsan hêdî hêdî, mîna ku mirov cira xwe ji nazdarekê re xweş bike, bilûr datanî ser çokên xwe û dest bi stranê dikir.

Bajarê mixribê bajarekî mezin û pir giran e.

Li ser heft çiyar e (2015a: 67).

3.1.3.1. Ehmedê Fermanê Kîkî

Ehmedê Fermanê Kîkî dengbêjekî navdar ê sedsala 20an e ku zêdetir bi berhemên xwe yê bi alîkariya Celadet Alî Bedirxan û Kamiran Alî Bedirxan ve di kovarên wek *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* de dihatin belavkirin, tê nasîn. Di rupelên van her du kovaran de mirov rastî gelek berhemên folklorê kurdî tê ku di binê wan de wiha hatiye nivîsîn: ji devê Ehmedê Fermanê Kîkî.

Mehmed Uzunê ku ji bo keresteyên romanên xwe gelek caran sûd ji kovarên wek *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* digre di nav rupelên van kovaran de hay ji dengbêj Kîkî dibe. Pişt re di derbarê wî de lêkolînan dike. Ev xebat pişt re di romana wî ya duyem de derdikeve pêşber xwendevanan. Romana li ser rojeke Evdalê Zeynikê hatiye nivîsîn ku di wê rojê de vegêr hemû jiyana Evdal vedigêre. Vegêrê vê romanê jî dengbêjekî din ê navdar, Ehmedê Fermanê Kîkî ye. Di beşa ewwil a romanê, Gotina min de Ehmedê Ferman behsa xwe dike, di derbarê xwe de hindêk agahiyan dide, bi vî awayî xwîneran bo vegêra xwe amade dike:

Navê min Ehmed e. Ehmedê Ferman. Ehmedê Kîkî. Yanî Ehmed navê min e. Ferman hem paşnav hem jî siûda min e. Kîkî jî ji navê Kîkan tê, navê eşîra min e. Hin navên min ên din jî hene; dengbêjê kovarê, stranvanê Hawarê û hwd...

Heta carina ji bo min weha jî tê gotin; “dengbêjê me yê delal, kalemêrê Kîkan, roniya çavan, îxtiyarê cîvatan, berdevkê maqûl û axan û berdilê ciwan û xortan...” (...) Belê, rast e; ez dengbêj û stranvan im. Ji stran, kilam, çîrok, mesele, serpêhatî û gotinan pê ve, ez bi kêrî tu tiştî nayê. Gotin jîna min e (Uzun, 2018a: 9).

Pişt re diyar dike Celadet û Kamuran jê xwestine ku ew çîroka Evdalê Zeynikê binivîse. Di destpêkê de qebl nake, lê pişt re ji ber bergerîna wan a zêde dest bi nivîsandina çîroka Evdal dike. Tevî ku ev berhem pala xwe dide edebiyata gelêrî jî ev

yek awayê nivîsîna mesnewiyên edebiyata klasik tîne bîra mirov. Lewre helbestkar di destpêka mesnewiyê de, di beşa sebeba nivîsînê de diyar dike ku li civînekê hevalan ji min xwestiye ku ez berhemeke wisa binivîsim. Di destpêka vê romanê de jî dema em bala xwe didin gotinên Kîkî ev yek tê hişê mirov:

Lê niha serê min xistine teşqeleyekê. Ew tişteki ji min dixwazin ku ne îşê aqilan e. Heye ku we ji niha ve fahm kiriye ku ew ji min çî dixwazin... Ew ji min dixwazin ku ez qala Evdalê Zeynikê bikim. Ew ji min dixwazin ku ez çîroka pîrê dengbêjên kurdan Evdalê Zeynikê bibêjim. Ew dixwazin ku ez çîrokê tevî her kit-kitê bibêjim. Û hûn dizanin, wekî din ew çî dixwazin? Belê, ew dixwazin ku ez çîrokê binivîsim û bavê stran û gotinên kurdî Evdalê Zeynikê ji nû ve vejînim! . . .

Ez evdalê Xwedê û vejandina Evdalê Zeynikê (Uzun, 2018a: 14)!

Tiştê balkêş ew e ku Uzun vê yekê di romaneke modern û bi vegêrekî klasik yê folklorê dike. Lewre dikare were gotin ku Uzun di avakirina vegêran û vegêrên xwe de him pala xwe dide kevneşopa gelêrî û nivîskî him jî têkiliya wan bi îro re, bi teknîkên edebiyata modern re çêbike ango vegêrana modern û ya kevneşopî bigihîne hevdu.

Fermanê Kîkîyê vegêrê vê romanê, di dema vegêrana çîroka Evdal de carna vegêranê dibirre û bala xwîneran dikşîne ser dengê xwe ku gelek caran vê yekê bi alîkariya cînavka pirjimar ya kesê sêyem dike. Di heman demê ev yek romanê û zimanê wê nêzikî zimanê çîrok, serpêhatî û destanan jî dike. Wisa xuya dibe ku Mehmed Uzun bo awayê vegêranê li ser ziman û vegêranên gelêrî dixebite:

Em ê niha, hindekî li çîroka xwe vebin û Evdal li ser çiyayê Sîpanê bihêlin û werin cem bermaliya wî Gulê û serpêhatiya evîna navdar a Evdal û Gulê (Uzun: 2018a: 27).

Di vîra de taybetiyeke din a edebiyata gelêrî jî heye ku wek dengbêjekî mezin Ehmedê Ferman di çîrokê cih nedayê nedibû, di çîrokên gelêrî de dema cihê bûyerê diguhere û behs tê ser lehengekî din ê çîrokê an jî çîrok derbasî merhaleyek din dibe hin gotinên qalib tîne bikaranîn ku ev di folklorê de wek formelên derbasbûnê tîne binavkirin. Formelên derbasbûnê gelek caran wihane: “Niha em ê evîna Evdal û Gulê

li vir bihêlin û werin cem.... “ (Uzun, 2018a: 35). Uzun an jî vegêrê romanê Ehmedê Ferman formelên bi vî rengî di temamê romanê bi kar tîne ku ev yek gelekî li konteksta çîrok û zimanê wê tê.

Di hin cihan de dengê vegêr an jî mudaxeleya Ehmedê Ferman ji astekê pêwîst derbas dibe û wek wan romanên sedsala 19em di derbarê hindek tiştan de agahiyan dide û dibe sedema qutbûnekê. Di vê romanê de jî di beşa ewwîl a piştî nivroyê de dema Evdalê Zeynikê ji şagirtên xwe re destana Xecê û Siyabend an jî bi gotina vegêrê romanê, serpêhatiya Xecê û Siyabend vedigêre, di cihekî de Ehmedê Ferman pêwîst dibîne ku daxilî metnê bibe û di derbarê gotina devkî, gotina nivîskî û dengbêjiya Evdalê Zeynikê de fikrên xwe parve dike. divê were gotin ku di heman demê de ev taybetmendiya qutkirina çîrokê û ravekiriva hin meseleyan çîrokbêjan e jî: “Xwendevanên ezîz, bi vî awayî, Evdal serpêhatiya Siyabend û Xecê bi dawî anî. Herwekî hûn pê dizanin, gotina devkî û gotina nivîskî bi hev namînin. Gotina devkî jîn e, gotina nivîskî siya jînê ye” (2018a: 58).

Ji hêleke din ve Ehmedê Ferman ji ber dengbêjiya xwe û şiyana xwe ya gotina bi aheng zimanê romanê bi giştî nêzî zimanê vegêran û helbesta gelêrî dike. Di romanê de ev yek bi awayekî gelekî vekirî diyar dibe. Bi taybetî jî di axaftinên Evdal û Gulê de xwîner vê yeke baştir dibinin. Vegêrê romanê ji ber ku ev her du leheng di heman demê de du dengbêj in û roman li dor jiyan û serpêhatiya wan hatiye hunandin, zêdetir li ser wan sekinî ye û her cure gotinên wan nêzî zimanê helbesta gelêrî kiriye ku mirov dikare bibêje di vê yekê de mubalaxeyek heye. Dema Evdal, malbata û xwe û nas dost û şagirtên wî li sere çiyayê sîpanê bi şev li dor agir runiştine Evdal ji wan re di derbarê korbûna xwe de hestên xwe dibêje ku zimanê wî, ahenga gotinên wî zêde ye û bi qafiye ne ku mirov wan li biniya hev binivîse wê bişibin gotinên kilamekê:

-Gelî guhdaran... şevê kirasê xwe yê reş avêtiye ser me. Agirê li ber me kirasê şevê dişewitîne. Hûn bîr bi tiştan dibîne û dizanîne, gava meriv nikare bi roniya çavan bibîne, hingê meriv dijî bi daxwaz, xwezî û hesretane. Dîtina hilatina tavê hesreta min e. Lê, şevê ez dîl girtime, li ber çavên min her û her şev e. (2018a: 87).

Ji bilî vê romanê Ehmedê Ferman di romana *Bîra Qederê* de jî cih digre, di vê romanê weke dengbêjê Celadet Alî Bedirxan xuya dibe. Celadet ji devê wê stran,

serpêhatî, çîrok û hwd. derbasî nivîsê dike û di wan *Kovara Hawarê* de çap dike (Uzun, 2016b: 253-254). Kîkî di vê romanê de li gel berhemên xwe, bi bilûra xwe jî xuya dibe ku Celadet gelekî di bin tesîra jenandina wî dibe û helbestekê bi navê “Bilûra min” dinivîse (2016b: 274-278).

3.1.3.2. Evdalê Zeynikê

Evdalê Zeynikê yek ji wan dengbêjên herî mezin û herî navdar e di nav kurdan de ku li gor xebatên lêkolîneran di sedsala 19 û sere sedsala 20an de jiyaye. Ji ber ku di belgeyên nivîskî de em rastî navê wî nayên xebatên li ser wî bêhtir pala xwe didin hevpeyvînên ku bi dengbêjên din û endamên malbata wî re hatine kirin. Herwiha kilamên ku wek aidê Evdal tên hesêb jî di derbarê jiyana wî de agahiyên balkêş dihewînin.

Ahmet Aras di gotara xwe bi navê *Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê* de bo wî wiha dibêje:

Di dengbêjiya Serhedê da Evdalê Zeynikê fenomeneke pirr muhîm e. Ew di dengbêjiya kurdî da tradisyoneke nû derxistiye. Hemû dengbêjên Serhedê bûne domdarê vê tradisyonê. Evdalê Zeynikê ne tenê şair-dengbêj bûye, ew di eynî wextê da destanbêj bûye. Ewî hem destanên kurdan ên kevin li gor qayde meqamên xwe girtine, hem jî bi xwe kilamên destankî derxistine, ew kilamên destankî me hildabûn pirtûkê (Aras, 2017).

Alaqeya Mehmed Uzun ya bo Evdalê Zeynikê re vedigere sala 197an, dema di girtîgehê de ye cara ewwil navê wî dibihîze. Lê li gor ku di pirtûka xwe ya *Dengbêjlerim (Dengbêjên min)* de diyar dike, bi saya Yaşar Kemal û balkişandina wî li ser Evdalê Zeynikê, uzun zêdetir bala xwe dide ser wî (2017: 41-43). Paşê Uzun lêkolînan li ser wî dike da ku romanekê li ser binivîse. Lê belê wekî ew bi xwe jî diyar dike, Evdal ji nû ve diafirîne û romanê jî di atmosfere dîrokî lê dema wê ne diyar de saz dike.

Mehmed Uzun vê romanê li ser çanda dengbêjî- çîrokbêjiyê ava dike (Uzun, 2009:259), li gor derfetên wê teşe dide leheng û bûyeran. Wisa dixuyê ku çavkaniyên bingehîn ên vê romanê tenê vegotinên gelêrî ne. Serpêhatî û efsaneyên li ser

dengbêjiya wî di nava dengbêjên kurd de gelekî berbelav in, di dema amadekirina vê romanê de Uzun bi awayekî xwe gihandiye wan. Herwiha di gelek kilamên Evdal de em rastî biyografiya wî tên ku ev jî bûne çavkanî bo vê romanê.

Uzun, ji hemû klam, gotegot, efsane û serpêhatiyên Evdal çîrokeke nû derdixe û wê bi derfetên folklorê yên wek çîrok, serpêhatî û destanan bo xwîneran vedigêre. Dîsa di gelek cihên romanê de Uzun li gor konteksta çîrokê hindek klamên evdal rasterast wekî awayê wan ê di nava dengbêjan de bikartîne, di hin cihan de jî wê piçekî diguherîne. Wek mînak li gor xebatên li ser Evdalê Zeynikê hatine kirin û herwiha li gor kilameke wî tê zanîn ku evdal dengbêjê Sürmeli Mehmed Paşaye lê Uzun vê yekê diguhere û Evdal dike dengbêjê mîrekî kurd ê bi navê Tahar Xan û kilama Evdal bi guherînên biçûk ji nû ve dinivîse:

Ez Evdalê Zeynikê me,

Şaîrê dinê,

Şalûrê erdê me,

Ez dengbêjê Tahar Xanê kurdî me (Uzun, 2018a: 65)

Uzun, di romanê de Evdal tenê ne wek dengbêjekî lê herwiha wî wek aqilmend û mamosteyekî jî nişan dide. Piştî mirina Tahar Xan û şerê li welêt tesîreke xerab li ser Evdal dike û demeke dirêj kilam û stranan nastirê lê pişt re bi dîtina xewnekê û şîroveya jina wî Gulê ya li ser wê ew biryar dide ku dibistaneke li ser dengbêjiyê ava bike:

Hingê bîhna Evdal hindekî vebû, heşê wê hate serê wî. Ew mij û dumana ku bi ser mala Evdal girtibû, belav bû. Hilm û bîhna xortanî û şênahiyê li malê belav bû... Evdal bi kêf û daxwazî, bi karê xwe rabû. Wî dest pê kir û xort hînî adet, qayide, rê û ûsilên dengbêjiyê kir. Evdal dersen ziman û edebiyata kurdî jî dida û şaîr û nivîskarên kurd ên sedsalên 11-12-13-14-15-16-17-18an bi şagirtan dida nasîn û şîr û eseren şaîr û nivîskaran dixwendin. (Uzun, 2018a: 82).

Bi vî awayî Uzun portreya dengbêjekî mezin û zêdetir nêzî serdema îro nîşanî xwendekaran dide ku ev yek bo romanê dibe kêmasî. Lew awayê nêzîkbûna Uzun bo mijara hînkirina dengbêjî û edebiyata klasîk a kurdî anakronîk e û encama fikrên Mehmed Uzun bi xwe ye. Wekî ku Huyugüzel diyar dike nivîskar hin deman bi zanetî

anakronîzmê dikin (2018:40). Uzun jî vê yekê bi zanetî dike û Evdal bi taybetmendiyên derveyî dewra wî dixemilîne, weke modeleke dengbêjan pêşkêşî xwîneran dike.

Di romanê de herwiha leca Evdalê Zeynikê bi dengbêjekî bi navê Şêx Silê re jî cih digre ku kilamên wan ji hela Uzun an jî vegêr Ehmedê Ferman ve bi awayekî ku jinûve hatibin nivîsîn derbas dibe:

Guhdarên xwedî sebir, mixabin, gotinên me yên xav bi têra salixdana wî lecî nakin, lê lec bi dile hazir û guhdaran bû. Evdal weha digot,

Dengê min bilûr e, zimanê min qelem e,
Heval û dostên min aşiq û dengbêjên vê dinê ne,
Ez ê îşev bibêjime, welle bibêjime,
Heta kurê kuran jî rabe, vê şevê bi bîr bîne...
Şêx Silê jî, pêşî, bi bilûrê deng dida Evdal û paşê, bi gotinê, bersîv didayê,
Evdal e, dengbêjekî navdar e,
Rihana ber devê geliyan e, di wexta xwe de hêşîn kiriye, şax avêtiye,
Niha kalekî bi çu û gopalan e, sewta wî dernayê, denge wî ketiye,
Hûn jê re bibêjin, de bila ew xwe bide aliyan e (Uzun, 2018a: 69-70).

Piştî vê leca ku çar rojan dewam dike û di wektekî wisa de ye ku Evdal nexweş e, lê belê ji bo ku peyv neyê ser wî bi Şêx Silê re dikeve lecê û encamê de nexweşiya wî zorê lê dike, ev yek dibe sebeb ku Evdal ji her du çavên xwe kor bibe. Ev yek di romanê de bi vî awayî derbas dibe:

Ew tiştê ku herkes li bendê bû, qewimî; ava reş bi çavên Evdal de hat. Dengbêjî hunermendî ye. Hunermendî jî ked, taqet û quwet e. Piştî pêveçûna çar rojan, Evdalê reben û nexweş, bi temamî, ji taqet û quwetê ket. Dinya li ber çavên wî reş bû, meclis bû zîndan, çirûskên agirê tifikê bûn xalên tarî (Uzun, 2018a: 71).

Piştî koraniya xwe Evdal vedikişe hundirê xwe û dev ji dengbêjiya Tahar Xan berdide. Tevî ku Tahar Xan û nas dostên wî li ber Evdal digerin da dev jê bernede lê ew cihê xwe ji Şêx Silê re dihêle û hew diçe dîwana Tahar Xan. Di demeke wisa de Temoyê kurê Evdal li derve qulingekî birîndar, baskşikestî dibîne û tîne malê. Evdal

rewşa baskê quling û çavên xwe dişibîne hev lew ji ber van sedeman her du jî ji hevalên xwe man e. Evdal û Gulê li quling xwedî derdikevin, hevaltiya Evdal û quling jî wisa dest pê dike ku paşê Evdal kilaman li ser wî çê dike û wî ji ba xwe venaqetîne, diçe kû dere wî bi xwe re dibe. Di romanê kilama ku Evdal davêje ser qulingê bi vî awayî derbas dibe:

Qulingo, perhêşîno,
Rabe başkan li hev de, sere çengan pê re bihejîno,
Xwe bi hekîm û toxtorên dinyayê tev bigihîno,
Hekîm û toxtoran li min bicivîno,
Her du çavên min kor in, tu sa bike (Uzun, 2018a: 46)

Di beşa dawî ya romanê de muzîcezeyek ku ancax mirov di destan û çîrokan lê rast were çê dibe. Bi hêla xwe ve jî roman xwe dispêre çanda gelêr û taybetmendiyên çîrokan. Evdal ji gulê dixwaze ku ew wî bibin sere çiyayê sîpanê da li wira bistirê hindekî. Dema tîr serê çiya çavên Evdal ji nişkê ve dibinin. Vegêrê roman an jî serpêhatiyê Ehmedê Ferman vê yekê li gor çîrokên li şevbuhêrkan wiha vedigêre:

Guhdar û xwendevanên delal, ew ecêba ku niha mesela çîroka me ye, ew ecêba giran, hingê, li wê dere, li spêdê çiyayê Sîpanê Xelatê qewimî; şereşa Evdal winda bû, perda tarîtiyê qelişî, bextê reş lê qulipî... (Uzun, 2018a: 148)

Piştî vebûna çavên Evdal, baskê şikestî yê Qulingê jî dicebire û dest bi firîna xwe dike:

Lê bele, hê tiştine hebûn... Ecêba giran, bi tenê, bi ronahiya royê û bi vebûna çavên Evdal nediqediya. Qulingê jî dest pê kiribû û xwe dilivand. Wî pihêt, pir pihêt, dida bask û perwazan (...) Quling difiriya. Qulingê dida perwazan. Baskên qulingê cebirîbûn. Qulingê dixwend û difiriya û Evdal jî, bi çavan, lê dinihêrî...(Uzun, 2018a: 148)

Evdal di romanê de weke dengbêjeke klasîk ku di nav tîkiliya patronajê de derbas dibe û li hêleke din bi fikrên xwe, bi pratîkên xwe jî wan dîr dikeve ku ev yek di peywenda romanê de normal e. Vegêranên di derbarê Evdal de û bi giştî çanda dengbêjiya çavkaniyên Uzun in. Li gor vê yekê Uzun him di şexsê Evdal de û him jî

peywenda romanê de kevneşopê û modernîzmê nêzî hev dike, ji wan digihêje sentezeke nû.

3.1.3.3. Gulê

Dengbêjeke din ku di romanê de tê dîtin Gulê ye. Li gor gelek kesan Gulê dengbêja ewwil a jin e ku di dîwanan de kilam gotiye. Di hindek kilamên Evdalê Zeynikê de navê wê derbas dibe, herwiha di kilameke din de tê dîtin ku Evdal û Gulê avêtine ber hev, bi hev re ketine lecê. Ji kilaman diyar dibe ku Gulê bi eslê xwe ermen e. Ahmed Aras jî di gotara xwe ya li ser dengbêjiya serhedê de vê yeke dibêje: “Beriya Evdal Gula Fille dengbêja wî bûye. Gulê bi eslê xwe ermenî bûye û qîza keşîşekî ermenîyan bûye” (Aras, 2017). Ji ber ku di gelek gundan de kurd û ermen bi hev re dijîyan dengbêj û stranbêjên ermen hebûn ku bi kurmancî jî distran û diçûn dawetên hevdu.

Lê di mesela yekembûna Gulê de hin şaşîti hene çiku ew ne dengbêja ewwil a jin e. Di sedsala hijdehan de dengbêjeke din a jin hebû ku kêma kes di xebatên xwe cih dide ku ew dengbêja jin bi navê Pêro tê naskirin. Ahmed Aras di gotara xwe ya li jor me jêgirtin kiribû hindek agahiyan di derbarê Pêroya dengbêj de dide:

Dengbêja Rizayê Xalid (Serokê Emerya) Pêroya Têxutê bûye. Di salên 1960î da camêrekî biemir ji min ra qala Pêro kiribû. Li gor gotina camêr, Pêro bi husnê xwe va nerind bûye, rûyê wê bi xurî bûne. Ewî digot wexta ku Pêro distra, xêlî diavête ser serê xwe ku di nezera guhdaran da xweşiya kilama wê neteribe. Ew camêr ji hêla Melezgirê bû û şerê Kejik baş dihate bîra wî. Li ser Kejik Emerya û Şewêşya şer kirine û gelek mêr ji hev kuştine. Ew şer bi texmîn di sala 1890 yan jî di 1891 da bûye. Rizayê Xalid, birayê wî Fetullah û Eshed çûne Kejik, li wir bi şewêşyan ra şer kirine û kilama “Dêran” li ser wî şerî hatiye gotin. Wî camêrî got “Piştî şer, her du seriyan cinazên xwe li erebeyên ga kiribûn û dibirin, Pêro bi kêleka ereba cinazeyên Emerya ketibû kilaman digot” (Aras, 2017).

Herwiha di pirtûka Zargotina Kurdan ya Celîlê Celîl û Ordîxanê Celîl bi hev re amade kirine de di beşa dawî ya ji nîşeyên li ser çavkaniyên ew berhemên folklorîk de amadekarên pirtûkê di nîşeyekê cih didin Pêroyê û cih didin du kilamên ku aidê wê ne (2013: 415-417).

Wisa diyar dibe ku ji bilî Gulê hindek dengbêjên din ên jin hene lê ji bilî Pêroyê navê ti kesî nemaye. Gulê di romanê de wek keçeke fileh û bi destgirtî derbas dibe. Evdal wê di daweta lawê mîrê bajarê Xamûrê de dibîne. Li wira weke lehengên destan û çîrokan di dîtina ewwîl de dîl dikeve Gulê ya ku sergovenda dawetê bû. Evdal pişt re bi bavê Gulê re ku keşîş bû dibe dost da ku nêzîkî Gulê bibe. Bav û diya Gulê bi evîna Evdal dihesin lê biryara dawî ji Gulê ya destgirtî re dihêlin. Şevê li mala bavê Gulê, Evdal kilamekê davêje ser Gulê û bi bersiva Gulê ya bi kilamê re leca wan dest pê dike:

Evdal çavên min reş e, bela ne,

Min rojê heft caran bi kilê siphanê kil dane,

Lê heft dengbêjê mîna te, ji bom in jinên xwe berdane (Uzun, 2018a: 33).

Evdal bi bersiva xwe de evîna xwe dîsa eşkere dike lê li hember vê, bersiva Gulê wek berê ye:

Evdal, mehrûmo, ji erde mîrê te Tahar Xanê heta vira,

Xwîna sor neqitî ser kevîran,

De tu were ji min re beje “xwişkê”,

Ez bejim, “lo, bira... (Uzun, 2018a: 34)”

Di temamê romanê de Gulê wek jinek serbest, jixwebawer, fama û birehm xuya dibe. Dema Evdal bi Şêx Silê re dikeve lecê, Şêx Silê dibîne ku Evdal nexweş e loma naxwaze bi wî re têkeve lecê. Li şûna wî rica dike ku bi Gulê re têkeve lecê, lê belê Evdal bi vê yekê aciz dibe û qebul nake daxwaza wî. Gulê jî bi xwe nikare û bi awayê kilamkî bersiva Şêx Silê dide ku ev yeka han xwebaweriya wê û asta wê ya dengbêjiyê carek din diyar dike:

Şêx Silê, ez Gulê me, ji jin û xatunan hîn zêde me. Navê min Gulê ye, lê tu ji xwe re bibîne tevdîr û reye. Ez ê vî dane êvarê stran bavêjime ser teye. Ez Gulê me, gula Xamûrê me, kevaniya Evdalê lawê Zeynê me, diya Temo, dengbêja dîwanan, serkara jinên welatê me (Uzun, 2018a: 71).

Tevî ku Gulê dengbêjeke eyan e di dema xwe de û ji wê leca wê ya bi Evdal re çend parçe kilamên wê mabin jî Uzun piştî ku Gulê bi Evdal re dizewice hindekî ji dengbêjiya wê dibire. Ji bilî wê bersiva wê ya bo Şêx Silê di romanê dengê dengbêjiya

Gulê nayê bihîstin. Tenê dema ku bi Evdal re diaxive tê dîtin ku di gotinên wê de aheng û gotinên lihevhatî yên bi qafiye hene, ji vê pê ve Gula dengbêj wek dayikek, jinek û hevaleke dilsoz ya Evdalê Zeynikê xuya dibe.

3.1.3.4. Şêx Silê

Dengbêjêke din ê di romanê de cih digre jî Şêx Silê ye. Weke piraniya dengbêjên di vê romanê de derbas dibin di derbarê Şêx Silê de jî kêr agahî hene. Ahmed Aras di gotara xwe di derheqê wî de van agahiyan dide:

Di eynî demê da dengbêjê Tarxanê Qeleneyê Şêx Silê bûye. Bi wasita Evdalê Zeynikê em ji Şêx Silê haydar in. Ev di sale 1950 da bi Evdal ra ketiye lejê û dest li ber Evdal danîye. Qelene erdê Îranê ye û li ber sînore Romê da ye, ji ber wê yekê li ser Serhedê tê qebûlîkirin. Tarxanê Qeleneyê ji “Torinan ê Mala Şêro” bûye û pismamê Kor Husên Paşa ye (Aras, 2017).

Wisa xuyaye Şêx Silê dengbêjê begekî ye lê belê ji bilî leca wî ya bi Evdal re di derbarê kilamên wî de pir kêr tişt gihaye roja îro. Li gor Ordîxanê C. û Celîlê C. ew ji Diyarbekirê ye (2013: 415). Lê belê Celîl di derbarê çavkaniya vê yekê de ti tiştî nabêjin.

Di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de jî navê Şêx Silê zêde derbas nabe. Rojekê bi karwanekê re tê bajarê Tahar Xan. Vegêr diyar dike ku ew ne dengbêjê beg û mîran e lê dengbêjê rêvinge û karwanan e, ango dengbêjekî gerok e. Tahar Xan dema dibêze ku dengbêjekî yeman hatiye bajêr, gazî wî dike da were meclîsa wî. Li meclîsa ku Evdal jî lê ye, xelkên li wira runiştî bi awayekî gotinê tînin ser dengbêjiya Şêx Silê. Tahar Xan deng li Şêx Silê dike da ku çend stranan ji wan re bêje. Li ser daxwaza Xan, Şêx Silê ev kilama li jêr pêşkêşî cimaetê û Tahar Xan dike:

Li der rehma baranê ye,

Li hundir rehma Tahar Xanê kurdan e,

Deşt û zozanên Tahar Xanê di nav berf û pûkê de ne,

Ez rebenê Xwedê, Şêx Silê zimanxweş hatime ser sifra mezin, meclîsa girane (2018a: 67).

Piştî ku çavên wî kor dibin û Evdal dev ji dengbêjiya Tahar Xan berdide û di heman wextê ji Xan dixwaze ku li şûna wî, Şêx Silê bibe dengbêjê Xan. Rojekê dema Tahar Xan û Şêx Silê diçin serdana Evdal, li wira destê Evdal radimûse û bi zimanekî nêzî kilamên dengbêjan wiha jê re dibêje:

Evdalê Zeynikê ye, pîrê me dengbêj û stranvanan e. Eger çewtî û qusûrekî min hebe, ez benî me, li min megire. Tu yî, dengbêjê xelkê, dengê welatê me û em hemû telebe û şagirtên te. Ez Şêx Silê me, li ser ders û şopa te. Bila derd û xem ji te dûr bine. Li min eyan e; li pey zivistanê bihar e, li pey tariya şeve ronahiya sibê ye (2018a: 75).

Di romanê de behsa hindek dengbêjên din jî tê kirin ku em ji romanê fêhm dikin ew lehengên honakî ne. Lê ji bilî Biroyê Dengbêj, vegêr navê dengbêjên din ên di hin cihên romanê de bi tenê wek hevalên Evdal derbas dibin, nade. Di derbarê Biroyê Dengbêj de jî kêmtir tişt hene, vegêr dema behsa Bengîyê ku lehengekî romanê ye, dike pê re bi vî awayî behsa wî, Biro jî dike:

Bavê wî Biro dengbêjekî baş, merivekî dilpak bû. Piştî mirina diya Bengîn, bavê wî nezewicîbû. Ew ji eşîreke koçer bûn û wekî eşîra xwe, ew jî bi awayekî koçerî dijiyan. Bihar û havînan wan berê xwe didan quntarên çîyan, deşt û zozanan û payîz û zivistanan jî wan xwe dispartin gund û bajaran.

Biroyê Dengbêj dostê Evdal bû. Wan salê carekê-du caran hevûdu didîtin, hal û hewalê hev dipirsîn û bi hev re stran digotin (2018a: 97-98).

3.1.3.5. Dengbêj Biro

Dengbêj Biro, leheng û vegêrê romana *Hawara Dicleyê* ye. Romana ku ji 7 şevbuhêrkan pêk hatiye ji devê Dengbêj Biro ji heft xortên ji heft bawerî û neteweyên cuda pêk tên re tê vegêran. Roman di derbarê Mîr Bedirxan de ye lê belê nivîskar di nav re li ser nakokiyên neteweyî û olî yên kurdan û milletên din ên Mezopotamyayê disekine û bi lehengên xwe dide nîqaşê. Dengbêj Biroyê leheng û vegêrê vê romana dîrokî ye di heman demê lehengekî honakî yê Uzun e lewre dengbêjiya wî jî û fikren wî yên li ser dengbêjiyê xîtabî sedsala ku roman tê de derbas dibe nake.

Roman bi beşek bi navê *Qendîl* destpê dike ku ev beş wek pêşgotinê ye, Biro di vê beşê de ji guhdarên xwe re li ser jibîrbûyîyan û dengê wan agahîyan dide. Ev beş

dikare wek prova û amadekariya vegêrê jî bê dîtin çiku vegêr di vê beşê de bi saya dengê jîbîrbûyîyan û nîqaşa li ser bîr û jîbîrkinê hindek agahiyên di derbarê xwe û vegêra xwe dide ku ew hemû di beşên pêş de bi berfirehî tên vegêran:

Berî ku hûn bipirsin, ez bibêjim we ka jîbîrbûyî kî ne.

Jîbîrbûyî, ez im; Biro, Biroyê Dengbêj, yan jî em bibêjin, Biroyê Êzîdî, yan jî Biroyê Kor, yan jî Biroyê Dirêj.

Jîbîrbûyî, Mîr e. Mîrê Cizîra Botan, serekê Ezîzan, an jî Mîrê serhildana kurdî, yan jî Mîrê nefîkirî, yan jî Bavê Têlî, Têliyê kor ku hevalê min e (2016c: 13-14).

Bi vî awayî vegêr dema behsa lehengan dike, di nav re hindek agahiyên biçûk an jî hindek ‘spoiler’ an di derbarê serpêhatiyên wan de dide û guhdarên xwe bo serpêhatiya jîbîrbûyîna amade dike. Ev awayê vegêranê dike ku xwîner di pêvajoya xwendinê li hember bûyeran şaş nemînin lew hê destpêkê de nivîskar bi dayîna spoileran destpêk û encama çîrokê li ber guhê xwîneran dixe.

Di şevbûhêrka yekê de Biro şayesandina halê xwe û mekana ku lê ne dide, bi vê yekê re xwîner hînî awayê runîştana dengbêjan û şevbûhêrkan jî dibe:

We xwest, ez ê jî bibêjim. Birînen min îro jî derman bûne, min mewîjên xwe xwarine, ava xwe vexwariye. Tasa mewîjê û tasa avê li kêleka min, kevirê min ê spî yê teyrê tawis li stûyê min, tizbiya belek a not û neh libî ya kehrîbarê di destê min de ye. Çavekî min girtî, yek vekirî, dilê min bi liyan, merema min niha êdî kelam e (2016c: 35-36).

Biro hê di zaroktiya xwe di roja ewwil a ku roman pê dest pê dike, roja newrozê ye ku di heman de demê ew roj roja ku Mîr Bedîrxan li ser textê mîrekiyê rudinê, li mala Mam Sefo, li nav hevalên xwe bi awayekî jixweber, wek dengbêj û stranbêjên klasîk stranekê li hev tîne:

Newroz e, Newroz e

Xweş roj e, pîroz e

Dinya geş e, bihar e

Dilê min germ e, dîlan e (Uzun, 2016c: 52)

Lê belê bi demê re fikr û bala Biro ji ser vî awayê dengbêjiyê dihere awayekî din ê dengbêjiyê ku li serdema roman tê de derbas dibe nayê. Biro dişibe ew hunermendên sed sala Uzun tê de jiyaye ku pêdiviya wan bi patronajê tune û debara xwe bi album û xebatên xwe yên din ên hunerî dikan. Herwiha awayê hizirîn û nêzîkbûna Biro ya li ser dengbêjî û gotina devkî jî ji hizir û bîrên denbêjekî zêdetir dişibin yên romannusekî ku ew Mehmed Uzun bi xwe ye. Di şevbûhêrka duyem de di binbeşa *Dengê Gotina Nivîskî* û *Dengê Gotina Devkî* de Biro di derbarê van her du mijaran de bi kurtî fikren xwe dibêje, wan berawird dike. Di romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de jî vegêrê romanê, roman qut dike û hindek agahiyan dide xwîner û guhdaran ku ew taybetmendiyeke dengbêjên Uzun e: “Dengê gotina nivîskî û dengê gotina devkî ji hevûdu gelekî cuda ne. Di dengê gotina nivîskî de ku li ser kaxizên bêruh û bêcan ên spî û zer in, gotin heye, deng nîn e, di dengê gotina devkî de ku bi tenê di bîr û heşê însên de ye, deng heye, gotin nîn e” (2016c: 93).

Helbet analîzeke wisa ya li ser çanda devkî û çanda nivîskî bo dengbêjên klasîk zehmet e lê di romanê de Uzun bo rê li ber vê yeke bigre Biro dişîne medereseyê. Di medreseyê de him edebiyata klasîk a kurdî him jî ya farisî û gelek berhemên din dixwîne ku ew yek tesîra xwe li ser dengbêjiya wî dikan. Ji aliyekî din ve jî ew gelek caran diçe pirtûkxaneyê Mam Sefo ku ji pirtûkên bi zimanê erebî, farisî, kurdî, latînî, frensî, ermenî û hwd. pêk hatiye û bêtir ku bi latînî bizanibe li resmên wan pirtûkan dinere û hewl dide bi vî awayî ji nivîsa li ser wan fêr bike. Lê belê problemeke din derdikeve ku di wê serdemê de ne pêkan e dengbêjek weke Biro rabe û bi vî awayî dengbêjiyê bike. Lê di weke di van gotinên wî yên li jêr jî xuya dibe wek ew edebiyatvanên serdemeke 100-150 sal piştî xwe diaxive:

Di gotina edebî de ne lez û bez divê, ne jî endîşeyên rojane, ne henek û qeşmeriyên ku civatan, bi qasî bîskekê, em bibêjin bi qasîbihûrandina şevêkê, didin kenandin û paşê ji bîr dibin, ne jî mebestên qezencên mal û milken dinyê. Gotina edebî ku bi hûnandin, şêwe û ahenga xwe li pey nemiriyê ye, ne gotinên wakanûserekî ne, ne jî yên berdevkên kêf û henekan, fort û pesnan in. Ji gotina edebî re wext divê, guhdarên min, mîna sebra we, sebir divê, arzuya dil û ruh, meraqa his û mêjî û nermahî û germahiya wîcdanê divê (2016c: 636).

Li gor van gotinan dengbêj divê bi sebir be ji bo afirandinê û bêyî ku şelafîya ti kesî bike li ser mijara xwe hûr bibe, bixebite û di encamê de berhemeke xweser ya ku dê wî bigihîne nemiriyê biafirîne. Di temamê romanê de jî tê dîtin ku dengbêj hema bêje weke van gotinên xwe yên li jor ji guhdarên xwe re dibêje tevdigere. Li ser berhema xwe kûr dibe, bala xwe dide awayê vegotinê û bi ti awayî ne pesnê ti kesî dide ne jî dibe qeşmer an jî şellafê ti kesî. Ev yek dema piştî şikestina serhildana Mîr Bedirxan, mîr, malbata xwe û xebatkarên mîr bi keştiyekê diçin sirgûnê baştir diyar dibe. Biro jî di keştiyê de ye lê ew nizane bê ka Estera xanima wî jî bi xanimên mîr re hatiye keştiyê an na. Di wira de eskerekî osmanî bi navê Aşîk Biro gazî wî dike, dema diçe dibîne ku Ruşen xanima jina Mîr Bedirxan gazî wî kiriye, Rûşen Xanim jê re bi kurtî diyar dike ku wan ew wek dengbêjê mîr nîşan dane da ku ew û Ester karibin li ba wan bimînin. Piştî vê yekê Biro bi awayekî matmayî û hindekî aciz xwebixwe wiha dibêje:

Ez, ne dengbêj, lê girtîyê qesra mîr, niha, di demeke zahf zîz de, ji nişka ve, bûbûm dengbêjê mîr; ez, dengbêjê ku di esasê xwe hîç ne dengbêj bûm, hîç çu carê li meydan, meclîs û dîwanan nestrabûm û navekî mezin li konekî wêran kiribû, her tim ji dengbêjên mîr, axa, beg û şêxan dûr sekinîbûm û gotin û stranên wan ne mîna gotinên hunera edebî, lê pesnên xwedîyan didît, li ser riya welatê xerîbiyê, di nav keştiyeke sirgûnê ku ji axa dengbêjan zahf bi dûr ketibû de, bûbû xwedî nîşaneke resmî; dengbêj (2016c: 560).

Di romanê de em rastî kilameke Biro tên ku hema bêje di temamê romanê ew derbas dibe û bêyî ku kilam biqede roman bi dawî tê. Kilameke ku bi salan Dengbêj Biro li ser dixebite. Dema mirov li kilamê dinere, tê dîtin ku ew ji kilamekê zêdetir dişibe helbesteke modern ku bi îfade û hêmayên cuda û bi rastiyên kurt, bi tekrarkirinên zêde hatiye afirandin. Kilama ku navê xwe ji çemê dicileyê distîne wiha dest pê dike:

Dicle me ez,

Dengê dicileyê,

Li dûr, li welatê xerîbiyê nalînek

Nalînek ku di bin germahiya taveke xerîb,

Şewqa ster û heyveke xerîb de (2016c: 718).

Lê ev kilam an jî stran bi ti awayî temam nabe û her car bi awayekî din di dawiya beşên romanê derdikeve pêşber xwendevanan. Bo nimûne ev stran, piştî ku mîr têk diçe û ji Keleha Dêrgulê ya ku tê de asê mabû, bo teslîm bibe derdikeve, Dengbêj Biro, dîsa Strana Dîcleyê distirê ku bi vî awayî ye:

Oxir be, welatê şikestî, ehle şikestî, oxir be.

Oxir be ji we re, ji me re, ji min re.

Germ bû, qîjeqîja havînê, hawara dil bû.

Em ketin rê, heyama herî xirab a heyaman bû.

Dinya dişewitî, welat dişewitî (2016c: 539).

Ev strana ku di beşên cuda yên romanê de bi awayên cuda derdikevin pêşber me di heman demê de navê xwe jî dide romanê: *Hawara Dîcleyê*. Ango ew stran di heman demê de hawara Çemê Dîcleyê ye ku şahidi li temamê dîroka Mezopotamya û guherînên wê kiriye. Lew li gor Dengbêj Biro, Mezopotamya ne tenê warê kurdan lê di heman demê de ew warê ermen, keldan, suryan, êzîdî, ereb û turkmenan e jî ji ber vê yekê Uzun an jî vegêrê romanê Biro tim çelê vê taybetmendiya Mezopotamyayê dike; pirçandîtî. Biro piştî gera bi Migo re ku li ser xeta Çemê Dîcleyê li bajarên mezin û ên kevn ên Mezopotamyayê digere, bi îlham û hînbûnên nû yê vê geryanê Strana Dîcleyê bi vî awayî derdikeve pêşber xwîneran:

Dengê strana dîcleyê bêguman bêyî dengê çemê Firatê, cêwiya Dîcleyê, nayê bihîstin. Herdu çem, her du deng hevûdu temam dîkin û jê dengêkî tînin pê; dengê qedera Mezopotamyayê.

Mezopotamya me ez

Rehên min av û çem

Heyata min pevçûn, mijarên min xwîn

Lê zimanê min bedewî, gotina min ebedî

Hertim, ji gotina her şaîr û waqanûserî bêtir

Wextek li ser lêvên Gilgameş, li qiraxên çem (2016c; 208-209)

Di vira de tişta ji axaftina Mezopotamyayê zêdetir, zanîna Biro ya li ser Gilgameş e lew li gor kronolojiya romanê Biro û hevalên xwe di destpêka salên 1840î

de derdikevin gera xwe ku wê deme hê destana Gilgamêşî hê nehatibû keşfkirin. Tevî ku Uzun vê yekê bi awayekî din hînî Biro dike jî ev problemek e mezin e û ne li gora romanê û estetîka romanê ye. Li gor me pirsgirêka mezin a romanên dîrokî yên Mehmed Uzun ew e ku Uzun di hemû romanên de bîr û baweriya xwe ya serdema ew tê de ye bi awayekî hêsan dispêre ser lehengên xwe û wan wek rewşenbîrên sedsala we nîşan dide. Di vê romanê de jî vê yekê dîsa dispêre dengbêjekî û romana xwe qels dike.

3.1.3.6. Apê Xelef

Di romanê de ji bilî Biro gelek dengbêjên din jî hene ku diçin dîwana mîr û began, ji wan re distirên û pesnê wan didin lê belê Biro ji ber ku ji wan û awayê îcrakirina hunera wan heznake bi ti awayê navê ti dengbêjî nade. Tenê wek dengbêj ji bilî Biro em bi Apê Xelef dizanin ku Biro ji ber du sedeman navê wî hildide, yek ji bo ku Apê Xelef ew mezin kiriye û bavtî jê re kiriye, ya duyem jî ew e ku Apê Xelef di hunera dengbêjiyê de jî bavê Biro ye ango biro bi stran, destan û çîrokên ku Apê Xelef di biçûktiya wî de jê re digot bala wî diçe ser dengbêjiyê û hînî stran û destanan dibe. Divê were gotin ku Apê Xelef ne dengbêjê ti mîr û axa û began e, ew şivan e lê di di ber şivantiya xwe re her wekî gelek şivanan dengbêjiya wî jî heye.

Di destpêka romanê de Biro di derbarê Apê Xelef û bêtî ku ew jê re navekî lê deyne dengbêjî û stranbêjiya wî de wiha dibêje:

Apê Xelef ku bi eslê xwe pêşî Êzîdî, paşê misilman û şixulê wî jî şivanî bû, bi celebên dengê xwe û bi bilûra xwe ya şeş helqeyî ku jê celebên bêhejmar ên dangan derdixat, dikete her qalibî. Ew hem hosteyê dangan bû, hem jî hosteyê lêxistina bilûrê. Mîna dengê wî, bilûra wî jî di xizmeta, pêşî însanan û paşê jî heywanan de bû (2016c: 39-40).

Dema ji ber ku riayetî fermana mîr nekir û keldanek di mala xwe de veşart Biro tê cezekirin û dikeve hepse, piştî hewldana Mam Sefo, Êzdînşêr û Têlî, Biro ji hepsê derdixin û wî tînin zindana Qesra Birca Belek. Biro dema di zindanê de ye rewşa xwe dişibîne rewşa lehengê destana Memê Alan, Mem û him zindanîbûna xwe û him jî ya Mem berawird dike, di nav re behsa destanê dike, jê hin parçeyan dide û behsa zaroktiya xwe dike ku Apê Xelef ew destan çawa hînî wî kiriye:

Di zaroktiya min de, çaxa Apê Xelef li mala me ya xirbe, serpêhatiya keserkûr a Mem û Zînê, mîna stran ji min re digot û min jî, da ku ez destanê hîn bim, bi dengê xwe yê xeşîm, lê vedigerand, bêguman ne min û ne jî kesekî din dizanîbû ku ew zindana destanê dê rojekê bibûya warê min jî. Berî niha bi qasî umrekî, dîsan li vê malê, dîsan di şeveke weh ya deng, gotin, stran û destanan de Apê Xelef jana Memê Alan weha dianî zimên:

Mem di zîndanê de ma sê rojane.

Ne kesî jê re av dibir û ne jî didanê parîk nane.

Ne nivîn hebû, ne jî parçekî textane (2016c: 442)...

3.1.4. Destan

Bi wateya xwe ya folklorê peyva destanê ji bo vegêranên gelêrî yên bi piranî helbestkî, dirêj û mijarên wan lehengî ne ku carna di encama bûyerên rastîn ên di nava gel de hatine afirîn û hin deman paşê ji hela nivîskar/helestkarekî bi awayekî sererastkirî derbasî nivîsêbûne tê bi kar anîn. Taybetmendiyeke din a destanê jî ew e ku destanê bi bûyerên xwe û bi nirx û motîfên neteweyî yên tê de tesir li ser endamên wî neteweyî kiribe û bi giştî nav wan de berbelav be.

Folklornas Pertev Naili Boratav di xebateke xwe de li ser têkiliya di navbera destan û dîrokê de weha dibêje:

Destan ew berhemên neteweyan e yên ku di beriya serdemên nivîsê de çêbûne û pêşketin e. di wan serdeman de agahiyên di derbarê afirîn, veguherîn, xweda û hindek heyînên derasayî de, herwiha agahiyên raborî yên civakan jî destanan didan. Bi vî awayî mijarên wan di du telpan de kom dibin: 1) Mijarên kozmogonî û mîtolojiyê: afirandina gerdûnê û heyînên ruerdê; xweda, heyînên xwedayî (kesên ku ji pevgihîştina mirovan çêbûne) û afirîdeyên weke dêw, ziya ku hêzên xerab yên şeytanî teşe daye wan; şerê wan ê di navbera hev de an jî şer û têkiliyê wan ê bi mirovan re. 2) Bûyerên girîng yên rabirbûya mirovan, şerên serokên mezin yên li dijî dijminên hundir û derve, hewldanên wan ên gihandina civakê bo jiyanenek rehetir (1995: 36).

Li gor Boratav bo derketina destanê ewwîlî pêdivî bi bûyereke mezin a dîrokî heye, ev bûyer pişt re bi tesîra xwe li nav gel belav dibe û vediguhere berhemeke devkî

ku di encama belavbûnê de ketiye şiklekî edebî û bi pirranî ji hêla dengbêj û çîrokbêjan bi lêzêdekirinan ji awayê xwe yê ewwil dûr ketiye. Di heman demê gel ji destanê hînî bûyer û tevger, çand û usulên civakî/neteweyî dibin.

Li gor Hikmettin Attî yê ku teza xwe ya masterê li ser destana Memê Alan nivîsîye:

Destan cureyeke gelekî girîng a folklora miletan e. Ew cureyeke wilo ye ku, hemî civakê eleqedar dike. Çunkî ne wekî çîrok û efsaneyan bi erdnîgariyeke teng bisînorkirî ye. Eger ku navê destanê li berhemeke zargotinî hatibe kirin, ev tê wê wateyê ku ew kêr zêde ji aliyê piraniya gel ve tê zanîn. Her çend mumkun e ku, li her deverê welat hin guhertoyên wê yên cuda hebin jî, bi piranî bi nav û naveroka xwe ya aşkera, li her derî tê zanîn (2013: 11).

Li gor Attî ferqa mezin destanê ji çîrok û efsaneyan ew e destan xwedî sînoreke berfireh e û bi guhertinên biçûk dikare li her devera welat were dîtin. Ango destan ji ber taybetmendiya xwe ya neteweyî di nava gel de zêde tê hebandin û belavbûna wê li gor vegêranên din zêdetir e.

Mehmed Şirin Filiz di derbarê destanê de wiha dibêje; “Destan ji cureyên edebiyata devkî ye û bi piranî temayên qehremanî mijarên sereke yên destanê ne. Destan bi piranî bi awayekî menzûm tê nivîsandin, lê carna wek pexşan jî tên nivîsandin. Car caran jî hem menzûm hem jî bi pexşan tene nivîsandin” (2014: 21). Wek mînak di hindek wariantên destana Dimdimê de destan hem wek pexşan hem jî wek helbest ango menzûm tê pêşkêşkirin. Bi heman şiklî di destana Memê Alan de jî ev taybetmendî heye. Mirov dikare bibêje ku destanên ku ji hela nivîskar an jî helbestkarên eyan ve hatine nivîsîn bi pirranî menzûm in lê yên ji nava gel, bêyî guherînên nû ji hela folklornasan ve hatine berhev kirin gelek caran hem mensûr û hem jî pexşan in. Destana farisan *Şahnameya* ku ji hela Fîrdewsî hatiye nivîsîn bi giştî menzûm e, herwiha destana *Aeneias* ya Vergiliusê romayî jî bi giştî menzûm e. Lê wek li jor jî hatiye diyarkirin hindek destanên kurdan yên wekî *Memê Alan* û *Dimdimê* bi piranî beşên menzûm û pexşan tevlihev in.

Folklornas Necat Keskin di pirtûka xwe ya bi navê *Folklor û Edebiyata Gelêrî* de di derbarê terma destanê de balê dikêşe ser têkiliyên destanê yên di navbera efsane û mîtan. Li gor Keskin, destan cureyek ji vegotinên gelêrî ye ku hem motîfên mitolojîk û hem jî yên efsanewî di nava xwe de vedihewîne. Wek cureyên din rûdana destanan jî têkildarî pêdiviyên civakî û çandî ye û belkî ji wan cureyên din bêhtir hest û ramanên gelekî an jî civakekê vedihewînin lewra ji aliye teşeyê ve ji vegotinên gelêrî yên din yên wek mît, efsaneyan cuda be jî, bêhtir bi naveroka xwe derdikeve pêş û ji ber vê yekê jî wek cureyek vegotinên gelêrî tê nirxandin (2019: 177-178).

M. Öcal Oğuz di nivîsa xwe ya bi navê *Destan Tanımı ve Eski Türk Destanları (Pênaseya Destanê û Destanên Kevn yên Tirkî)* de piştî ku ji hindek zimanên biyanî wate û pênaseya peyvên ku ji bo peyva destanê tên bi kar anîn dide, bi alîkariya wan pênaseyan digihêje vê pênasayê:

Li gor ku ji term û pênaseyan tê fêhm kirin bi derbirîna xwe ya tirkî “destan”, ew berhema edebî ye ya ku di çarçoveya vegotineke prîmîtîf û populer çê dibe û serpêhatiyên rastîn an jî honakî yên derasa û mitolojîk yên lehengan bi zimanê helbest an jî stranan û bi pîranî bi enstrûmanekê vedigêrin, yên anonim an jî yên ji hela helbestkarekî ku navê wî hatiye jibîr kirin hatine afirandin lê bêtir ku helbestkar bi hest û emelên xwe tê de hebe derdikeve pêşber me (2004: 6).

Oğuz berevajî nivîskarên li jor bêtir ku têkiliya destanê bi bûyerên mezin ên dîrok û neteweyî deyne bale dikêşe ser awayê îcrakirin û afirîna destanê.

Piştî van pênase û nîqaşan divê were gotin ku pênaseyeke hevpar ya destanê zehmet e, her lêkolînerê bale dikêşe ser taybetmendiyeke din a destanê ku wê taybetmendiyeke dixê navenda pênaseya xwe ku ev yek rê li ber fêhmeke hevpar ya destanê digre. Li gor van fikran mirov dikare bibêje ku destan, vegotineke gelêrî ye ku îlhama xwe ji bûyerên rasteqîn yên dîrokî yên wek şer digre ku ji hela kesekî diyar an jî nediyar ve hatiye afirîn û piştî belavbûnê hindek motif û taybetmendiyan vegêranên din ên gelêrî girtiye nava xwe.

Li gor lêkolînerên ku li ser folklor kurdan û bi taybetî li ser destanên kurdan berhem dane, destanên kurdan ev in; *Memê Alan, Dimdim, Siyabend û Xecê, Derwêşê*

Evdî û Ristemê Zal. Ev destan bi giştî di nava kurdan de berbelav in û bi naverok û forma xwe li gor van pênaseyên jor yên destanan e.

Mehmed Uzun ji romana xwe ya ewwil heta ya dawî, ji ceribandinên xwe heta lêkolînên xwe bale dikêşe ser folklorê kurdî bi taybetî jî dengbêjî, çîrok û destanên kurdan. Di romanên xwe de cih dide destana *Memê Alan* û *Siyabend û Xecê*. Di vê beşê de dê li ser awayê bi kar anîna wan were sekinin. Herwiha dê hewl were dayîn ku wariantên Uzun di romanên xwe de bi kar aniye û yê ku ji hela folklorê nêşan ve hatine berhevkirin werin berawird kirin. Ev yek bo têgihiştina romannûsiya Uzun girîng e û di heman demê de wê were dîtin bê ka Uzun ew destanên han bi bêtir guhartinan an jî bi awayê jinûvenivîna bi kar aniye an na.

3.1.4.1. Destana Memê Alan

Li gor lêkolînan destana herî dirêj û ya di nav kurdan de herî berbelav, destana *Memê Alan* e. Vê destanê îlham daye gelek helbestkar û nivîskarên kurd jî ku encamê de mesnewî, roman û şanoyên ku îlhama xwe ji wê sitendine hatine nivîsîn.

Hikmettin Attî di teza xwe ya li ser destana *Memê Alan* de, di derbarê vê yekê de wiha dibêje:

Destana *Memê Alan* û *Mem û Zîna* Ehmedê Xanî, hem di nava wêjeya nûjen de hem jî bi demên dirêj di nava wêjeya gel de bi rengekî pir aktîf bandor li ser nivîskar û dengbêjan herwiha li ser civakê bi xwe kirine. Wekî ku em ê di dirêjahiya vê lêkolînê de jî bibînin, taybetmendiyeke girîng ya destanên wiha ev e ku; ew ji ber ku ne di nava erdnîgariyeke fireh de, li her herêma ku ew millet lê dijî tên zanîn, bi rengekî pir xwezayî ji her herêm û çandên herêmî hin hemanên dirûvî û vegotinî girtine nava xwe û wilo hatine heya dewra me. (2013: 1).

Mehmed Uzun di romana *Tuyê* de bi behsa girîngiya destana *Memê Alan* dike û di çend cihan de hin perçeyên destanê bi xwendekaran re parve dike. Lehengê romanê carê gotinê tîne ser vê destanê û behsa bîranînên xwe yê bi wê re dike. Dema bi tenê di zindanê de ye, bo sebra xwe bîne bi Kêzaxatun a ku lehengeke fêlê ye re diaxive;

Tu pê dizanî, ka ji çîrokan, kîjan çîrok bêtir diçû xweşa min? Tu divê pê bizanibî kêzê. Eger tu kêzeke kurd bî, divê tu texmîn bikî.

Bele, weke her kurdekî kêfa min ji, *Memê Alan* re dihat. Ya kêzê, *Memê Alan* (2015a: 65).

Nivîskar vegêr piştî ku bi vî awayî hezkirina xwe ya bo destana Memê Alan diyar dike di du cihan de jiberxwe ji destanê ji kêzê re çar beşan dixwîne. Vegêr vê destanê di biçûkaniya xwe de ji bavê xwe hîn dibe ku bavê wî di îcrakirina bilûrê bi vê destanê re şarezaye. Di romanê de beşa destpêka vê destanê piştî şayesandina odê û guhdaran ji hêla bavê vegêr ve tê îcrakirin:

Li ser heft çiyar e

Li ser sê sed û şêst û şeş wilayetan e

Li ser sê sed û şêst û şeş deriyan e

Her derik li ser sê sed û şeş wilayetan e

Her wilayetek li ser sê sed û şêst û şeş muduriyatan e (2015a: 67-68).

Dema mirov bala xwe dide vê destpêkê eşkere dibe ku Uzun waryanta Roger Lescot ya ku di salên sihî de ji nav kurdên Suriyeyê, ji deve Dengbêj Mişo berhevkiyê, bikaraniye (2013: 9). Lê belê Uzun hindek peyvên di metna orjînal de derbas dibe ku bi awayekî ji tirkî û erebî hatine girtin, li gor telafuza rast ya kurmancî diguherîne, li şûna peyvên tirkî û erebî yên kurmancî bikartîne. Wek mînak di waryanta Lescot de peyva ‘qapî’ derbas dibe lê Uzun dema wê derbasî berhema xwe dike, li şûnê peyva ‘derî’ bi kar tîne. Bi heman şêweyî li şûna peyva ‘ezîm’ ya erebî ji peyva ‘mezin’ a kurmancî bi kar tîne.

Di heman demê de vegêr vê carê ji destanê beşeke din dixwîne, beşa lîstina kişikê ya Mîr û Mem:

Mem lîzvanekî zor bû, lê Mîr pê nedizanî

Meme Mîr herwekî biçûna navê hevdû gerandin

Temaşegeran zanî xurt e, Memê Alan

Mîr Êzîn nikare hilîne bar û berberî

Bi rim û gurz û şeşperi, Mem kete nav eskerên Mîr (2015a: 70).

Ev beş jî her wekî beşa din dîsa ji waryana Lescot tê girtin lê bêyî guherînan. Xuyaye Uzun di vira de pêwîstî bi guherandina peyvên nû û kurdîtir nedîtîye. Jixwe ev beş li gor beşa destpêkê sade û siviktir e. piştî vê beşa kurt vegêr bi ti awayî behsa vê destanî an jî li gor gotina wî vê çîrokê nake.

Piştî romana *Tuyê Uzun* careke din em di romana wî ya dawîn *Hawara Dîcleyê* de rastî destana *Memê Alan* tên. Di beşa şevbûhêrk pênc, di binbeşa dengê zindana Memê Alan de leheng û vegêrê romanê Biroyê dengbêj ji ber ku riayetî fermaneke mîrekiyê nake, dikeve girtîgehê ji wira jî bi hewldanên hevalên wî yên xwedî desthilat wî tînin zindana kelehê. Biro dema dikeve zîndanê yek ser behsê tîne ser destana *Memê Alan* ku beşek ji vê destanê ji ber ku *Mem* dikeve zîndanê li wira derbas dibe. Biro piştî ku di derbarê destanê de hindêk agahiyan dide rewşa xwe û ya *Memê Alan* ku her du jî bi awayekî neheq ketine vê zîndanê. Biro ji destanê beşeke biçûk neqil dike:

Memê gote Ewan, kuro, here stewlê, çend mû ji dêl û bijiyên min Boz bîne, çend mûyên sere min jî pê girêde, ez ê ji vir ve biçim, saetekê ez dimînim bêhiş.

Beko nemerdî nekir, mûyên Boz anîn, çendek jî ji sere Memê rakirin.

Mû li hev badan, kirin benekî zirav û tenik.

Tilî û pêçiyên Mem pê girêdan. (2016c: 441-442).

Wekî mînakên din ên vê destanê ku di romana *Tuyê* de hatine bikaranîn, mînakên di vê romanê de jî dîsa ji waryana Roger Lescot e. Uzun bêyî guherîn û lêzêdekirinan beşa helbestî bi heman awayî wergirtiye.

3.1.4.2. Destana Siyabend û Xecê

Destana *Siyabend û Xecê* yek ji destanên herî berbelav e di nav kurdan de. Destana ku niha jî ji hêla dengbêjên kurd ve tê gotin bi pirranî menzûm û pexşan tevlihev e. Destanbi pirranî weke destaneke evînî tê zanîn lê hêla wê ya qehremanî jî heye ku Siyabend pehlewana qehremanekî navdar e û di heman demê zordareke ku gelek caran neheqiyê li mirovên derdora xwe dike. Gelek varyantên vê destanê hene ku ji wan ya herî kevn ya Mele Mehmûdê Bazidî ye. Lê varyanta Bazidî ji varyanteke tekuz zêdetir dişibe kurteya destanê ya pexşankî ku di nava çil çîrokên pexşan de cih daye wê. Bazidî di dawîya varyanta xwe de çêl trajediya vê destanê dike û diyar dike

ku kurd di meclîsan de bi awayê strankî lê guhdar dîkin, di ber re digrîn û ji bo *Siyabend û Xecê* duayan dîkin.

Ji ber rewşa kurdî ya li Tirkîyê kêr xebat li ser vê destanê hatine kirin. Du xebatê girîng hene ku yek ji wan tez e, ya din jî gotar e lê belê her du xebat jî li ser motîfsaziya vê destanê sekinîne û di derbarê derketin û paşxaneyê ya destanê de hema bêje ti tiştî nabêjin. Destan li herêma Serhedê derbas dibe lê ji navê Siyabendê Silivî û Zor Temir paşayê ku di weryanta Bazîdî de derbas dibe xuya dibe ku destan di encama têkiliyên koçerên herêma Riha, Silîva û Serhedê derketiye holê. Hindek motif û bûyerên vê destanê balkêş in û ev wê ji destanê zêdetir dişibînin çîrokên gelêrî û carna çîrokan bi xwe jî. Wek mînak temaya zilma ap û amojnê zêdetir di çîrokên gelêrî yên kurdî de tê dîtin.

Mehmed Uzun di romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de cih dide vê destanê. Di romanê de, Evdalê Zeynikê destana Siyabend û Xecê bi dirêjahiya hefteyekê ji şagirtên xwe re vedigêre. Yek ji sedema bikaranîna vê destanê ew e ku beşek girîng û finala destanê li çiyayê sîpanê derbas dibe ku lehengê romanê Evdalê Zeynikê jî li vê herêmê ye û gelek caran xwe li Çiyayê Sîpanê digire. Lê di heman de demê destan di derbarê dîrok û çanda kurdan de agahiyên girîng jî di nava xwe de dihewîne. Ev yek ji devê Evdal wiha tê vegêran:

-Şagirtino, xortên çelengino... destana Xecê û Siyabendê li ber dile min pir ezîz e. Ew mîna lehiyekê diherike. Ew avahiya milletê me, rê û rêçên tarîxa me ye. Di nav vê destanê de, meriv millet û insanê kurd baş dibîne. Adetên me û rabûn û runiştina welêt tê de baş dixuyin... (2018a: 52).

Uzun beşên pexşan yên vê destanê ji nû ve bi zimanekî sivik û sade dinivîse lê belê bi texmîna me beşên stran ji çavkaniyeke din hatiye girtin ku me nekarî xwe bigihînin varyanta ku ji vê beşê re bûye bîngeh. Dibe ku Uzun ew bi xwe ji dengbêjekî herêma xwe an jî cihekî din bihîstibe û beşên wê yên stran bo romana xwe bikaranî be. Lew beşên stran yên di vê varyantê de derbas dibin naşibin afirandina nivîskarekî hevçax. Ziman, form û awayê bikaranîna peyvên li gor vegêra gelêrî ne. Uzun di hevpeyvîneke xwe de di derbarê vê yekê de wiha dibêje:

Ji mêj ve bû ku min dixwest romaneke destanî, bi zimane destane binivîsim. Mebest û armanca min bi vê romane ev bû; min dixwest hin bûyer û lehengan li dora mefhûmen mîna, evîn, insaniyet, hîsên insanî, biratiya miletan, serdestî û bindestî, hez û quweta stran û hûnere, dostî û îxanet. . . bicivînim. Pêşî min haziriyên xwe li ser destana "Siyabend û Xece" kirin. Min gelek celebên gotina vê destanê civandin û li gelek dengbêjan, nemaze yen Suriye, guhdarî kirin (1993: 79).

Di berdewamiya van gotinên li jor de Uzun eşkere dike ku wî nekariye ji bin barê destaneke wisa rabe. Pişt re Uzun biryara xwe diguherîne, vê carê ew bi zimanekî nêzî yê dengbêjan serpêhatiya Evdalê Zeynikê dike roman û balkêş e tê de cih dide destana Siyabend û Xecê ya ku nekari wê wek destan/romaneke binivîse. Li hêleke din Uzun di pirtûka xwe ya bi navê Dengbêjlerim de diyar dike ku wî destanên wek Filîtê Quto, Zembîlfroş, Derwêşê Evdî, Hemdîn û Şemdîn li Surîyîyê ji dengbêj Rifetê Darî berhev kiriye. Uzun di vê gera xwe de ji heman dengbêjî heft varyantên cuda yên destana Siyabend û Xecê jî berhev dike ku Darî wan bi heft miqamên cuda jê re vedigêre (2017: 87). Lê ji ber ku metnên van varyantan li ba me nîne em nikarin bibêjin ku varyanta ku Uzun di romanê de bi kar aniye ji filan varyanta Darî hatiye wergirtin.

Piştî ku Siyabend ji hêla pezkoviyekî ve di zinar tê werkirin û j ber çeqema ku di piştî wî radibe li jor aliqî dimîne, Xecê diçe ji heft gundan werîs û zilaman berhev dike ku alîkariya Siyabend bikin. Lê dikin nakin werîs nagihêje Siyabend, li ser vê yekê gundî belav dibin, Xecê bi tena serê xwe li ser zinar dimîne û bi awayê stranê gazî Siyabend dike:

“Ho, ho, ho, lo... Siyabendo, qiloçên pezkûvî pir biçûk in, Siyabendê min berdaye bin Sîpanê Xelatê, ser kema belalûkê. Tev bi rehma Xwedê bû, ji gunehên evd û însanan bû, ji hev qetandiye deste zava û bûkê (2018a: 56). ”

Dema destan diqede jî Evdalê Zeynikê formelege dawî ya bi pirranî di dawiya çîrokan de tê gotin dibêje:

Ez bi xêr, hûn bi silamet,

Gotina min çû deştê,

Dê û bavê hazir û guhdaran çûn bihûştê (2018a: 58).

Ev xeletiyê eyan e û heke dengbêj an jî destanbêjên ecemî nebin zehmet e mirov di dawîya destanekê de rastî hêmaneke bingeîn ya çîrokê were. Xuyaye Uzun ji bo ku têkiliya xwe ya bi folklorê re zêdetir nişan bide serî li rêyeke wisa dide. Li gor me sedemeke din jî ew e ku Uzun bi vê yekê re dixwaze hin taybetmendiyan vegêrana gelêrî bi rêya romanê hînî xwendevanên xwe yên kurd bike.

3.1.5. Çîrokên Gelêrî

Çîrokên gelêrî an jî bi navê xwe yê din serpêhatî bi kurtî cureyeke vegotinên gelêrî ye ku bi awayê pexşan û stranê bi hev re tê vegêran. Li gorî Pertev Nail Boratav çîrokên gelêrî cureyekî nû û orjînal in ku gelek taybetmendiyan destanan bi xwe de digrin. Lew destanbêji qels dibe ku ev encama şert û mercên civakî ye û li ^şuna wê ev cureya nû derketiye holê (2002: 46). Li gorî Alptekin çîrokên gelêrî xwedî bingeheke helbest-pexşan in. Ev taybetmendî di cureyan din nayê dîtin. Beşa vegêrî û şayesandinan pexşan, beşên ku hestên mirov tev radikin jî bi helbestî tên vegêran. Li gor wî, vegêr, dikare di beşên pexşanî de guherîn û lêzêdekirinan bike bes di beşên helbestî de zû bi zû nikare guherînan bike (1997: 10).

Li gor Hikmettin Attı çîroka gelêrî, di zargotinê de cureyeke taybet e û hem bi destanê re hem jî bi çîrokê re têkiliyeke wê ya xurt heye. Bêguman ji bo berhemên gelêrî, tesbîtkirina dîrokeke diyar gelekî zehmet e. Lê dema ku em li taybetmendiyan vê cureyê dinihêrin, em dibînin ku, ew piştî destanan an jî piştî vegotina destanî derketine û heya sedsala dawîn jî hebûna xwe domandine (2013: 16). Tespîta Attı balkêş e lewre berhevokên folklorê kurdî ku piraniya wan ji hêla biyaniyan ve hatine kirin tê dîtin ku hindêk ji wan vegotinên di dîrokeke nêz de hatine afirandin. Wek mînak serpêhatiya Osê Zerî û Mîrê Bedlîsê di berhevoka Albert Socin û Eugen Prym de ya ku di salên 1887an de çap bûye cih digre. Di wê pirtûkê de serpêhatiya Osê hê bi tenê wek stran tê gotin û zêde ne dirêj e lê belê piştî sedsalî dema em li hin varyantên wê dinêrin tê dîtin ku ew berhem ji straneke epîk veguherîye ser çîrokeke gelêrî ku him pexşan û him jî stran di nav de ye û li gor varyanta ewwîl gelekî dirêj e (Aslan, 2019: 135-149).

Ev yek bo serpêhatiya *Şemîgê Bêdiran* jî derbas dibe. Di heman pirtûka Socin û Prym de ev serpêhatî bi tenê wek stran heye lê dema îro em li du varyantên wê yên

ku ji hêla Îkram İşler ve hatiye berhevkerin dinêrîn em dibînin ku di dirêjahiya sed salî de ev stran veguheriya û bûye serpêhatiyê gelêrî (İşler, 1998: 57-90). Bêguman ji ber nebûna çavkaniyên kevntir mirov nikare bi awayekî rêkûpêktir dîroka serpêhatiyên bişopîne. Di naveroka wan de mirov ji hin detay û navê lehengan serdema ku buyer tê de derbas bûye texmîn dike.

Necat Keskin bo vê cureyê navê hikayeya gelêrî bi kar tîne û wiha didomîne:

Mînakên vê cureya vegotinên gelêrî di nav edebiyata gelêrî ya kurdî, tirkî û ya derdorê de jî dikare bê dîtin. Herwiha mînakên bi vî rengî di edebiyata gelêrî ya ewropî de jî tê dîtin. Aucassin et Nicolette (Aucassin û Nicolet) a fransî dikare wek mînakeke vê cureyê bê nîşankirin. Ev “hikaye” di sedsala 13mîn de derbasî nivîsê bûye û nivîskarê wê ne diyar e. wek teşe vegotineke tekêl e ku di nav de hem beşên helbestkî hem jî beşên pexşankî hene (2019: 191).

Taybetmendiya vê cureyê ev e ku li gor cureyên din ên wek mît û destanê derengtir derketiya holê û bi awayê pexşan û helbestkî tê vegêran. Lê hindek çîrokên gelêrî hene ku bi giştî wek stran an jî helbest tê vegêran, ev yek wê dişibîne destanê lê belê hindek jî hene ku bi tenê wek pexşan tên gotin an jî beşên helbestkî ya ji hêla vegêr hatiye derxistin an jî bi demê re ji bîr bûye.

Mehmed Uzun di romana xwe ya bi navê *Siya Evînê* de cih dide serpêhatiya Cembeliyê Hekarî û Binevşa Narîn bes vegêrê romanê jî û lehengê romanê Memduh Selîm Beg jî ji bo vê cureyê bi taybet destan dibêjin. Wek mînak di beşeke romanê de Memduh Selîm Beg dema bi Ferîha re diaxive bi vî awayî jê re behsa vê serpêhatiyê dike. Lê li pey gotina Memduh Selîm vê carê vegêr peyva destanê teger dike, di nav re hindek agahiyên din jî dide:

“Binevşa Narîn û strana Binevşa Narînê. Ez nizamim çima, lê ew hat bîra min. . . Hezar heyf. . . kurdiya min, yanê zimane min'e zikmakî ewçend ne xurt e. Zimane min'e xwendin û nivîsînê tirkî ye. Lê digel vê yekê, ez hê jî bi çend stran û dastanên kurdî dizanim. Dapîra min ew fêrî min kiribûn. Yek ji wan jî 'Binevşa Narîn û Cembeliyê Hekkarê' bû. . . ” Mem û Zîn, Siyamend û Xecê, Binevşa Narîn û Cernbeliyê Hekkarê. . . Dastanên ku Memduh Selîm Beg pê dizane. (2018b: 115).

Ev serpêhatî ne bi giştî lê di beşên cuda yên romanê de derdive pêşber xwendevana. Wek mînak Memduh Selîm Beg piştî ku bi kurtî behsa vê serpêhatiyê dike û pê ve, ji serpêhatiyê beşeke strankî ji Ferîhayê re distrê:

Binevşê ban dîkir, dîgo 'Şivano, serê bi qurbano, emrê mi bi heyrano, dilê min, dilekî dibê ye çequeyse galgal û gotinê te ji min re gotin, xeberê te timam min efû kirin, min avêtin binê qonderê ye. ' Binevşê go 'Şivano, madam tuê li cim Cembeliyê Hekkarê nîvan bû, tu werî ji min re basa Cembeliyê Hekkarê bike, ji min re çêtir î ji mal û mulkê dinyê ye, hesretî xirab e, bela bi min re nerî diyarê rehmetê axê gorê ye; derdê Cembeliyê Hekkarê li min ketiye, ez ne dimirim û ne dimînim pê ye (2018b: 116).

Di beşeke din ya romanê de Memduh Selîm Beg bi xwe li zozanan, li ba dengbêjekî li vê serpêhatiyê guhdar dike. Herwiha ji dengbêj tika dike ku hindekî hêdî beje da ew baştir fêr dike. Beşa ewwîl a vê serpêhatiyê di romanê de wiha ye:

Cembeliyê Hekkarê hebû, li çiyayê Hekkêr bû, reîsê hezar û pênc sed xortê herdemlawîn bû. Pir axakî baş bû; du jinê wî hebûn bi kêrî şîxolê malê û mêvana nedihatin. Aşîq Hemo hebû, ew jî stranvanê Cembelî bû, hema xortekî spehî bû Aşîq Hemo, kêf ji Cembelî re dîkir (2018b: 159).

Ji şêwe taybetmendiyên zimanê wê xuyaye ku ev serpêhatî ji deve dengbêjên herêma Mêrdîn an jî Binxetê hatiye girtin. Herwiha di varyantên serpêhatiya Cembeliyê Hekarî û Binevşa Narîn yên dengbêjên van herêman de em rastî bi aşîq an jî dengbêjekî bi navê Hemo tên. Wisa xuyaye Uzunê ku nedikarî vegere tirkîyê yan bi awayekî xwe gihandiye banta dengbêjekî ku ev serpêhatî tê de ye an jî di çûn û hatinên xwe yên bo suriyê de wî bi xwe ji dengbêjekî berhevkerîye. Uzun di hevpeyvîneke xwe de diyar dike ku wî ji dengbêjên kurd ên li Suriyeyê hin destan berhevkerîye. Li hêleke din bi awayekî tesîra vê destanê li ser Ferîhayê çê dibe, Ferîha jî weke Binevşê ji neçarî bi zilamekî kal re dizewice û nagihê hezkirîyê xwe.

Di romana wî ya duyem, Mirina Kalekî Rind de Serdarê ku ji neçarî ji Tirkîyeyê di ser Suriyeyê re direve Siwêdê, car caran tê Suriyeyê, gundekî kurdan û li wira ji devê Kalê Rind hindêk destanan berhev dike.

3.1.6. Çîrok

Yek ji cureyên herî berbelav yê vegêranê gelêrî jî çîrok e ku li gor beşên din zêdetir bala lêkolîneran dikşîne. Lew bi awayekî modern xebatên folklorê bi berhevkirina çîrokan destpêkir ku li Elmanyayê Birayên Grîmm serkêşiya vê yekê kirin û piştî wan xebatên berhevkarî û lêkolînî li ser çîrokan zêdetir bûn.

Bi wateya xwe ya herî berbelav çîrok ew vegêranê gelêrî ne ku xwe dispêrin honakekê û zêdetir bi şev tî vegêran ku lehengên gelek caran kesên derasayî, cihê ku bûyer lê derbas dibe jî mekanên xeyalî ne. Saîm Sakaoglu di vê derbarê de wiha dibêje: “Lê belê çîrok cureyekî edebîyata gelêriye ku ji bo şabûn û perwerdekirina zarokan derketine holê. Yê derîyê cîhana çîrokan vekirine dizanin; çîrokên me yê wisa hene, ji ber girîftbûna wan fêmkirina zarokan ne hêsan e” (1999: 2). Divê were diyarkirin ku çîrok ne tenê bo zarokan lê bo mezinan jî tî vegêran. Bes cureya çîrokan ya ku weke fabl tê zanîn taybet bo zarokan tê gotin gelek caran

Li gor Necat Keskin, çîrok, cureyek ji vegotinên gelêrî ne ku bi piranî pexşan in; di nava sedsalan de din ava gel de hatine gotin; bi awayekî devkî ji nifşekê bo yê din hatine veguhastin; din av vê vegotinê de kes û rûdanên derasayî hene; destpêk û dawiya wan bi qalibgotinan diqede û bi têgehên dem û cih ve (mekan) ne girêdayî ne. Piranî ji rastiye dûr in û xeyalî an jî çêkirî ne (2019: 206-207).

Nivîskar, lêkolîner Rohat Alakom di pirtûka xwe ya *Di Folklorê Kurdî de Serdestiya Jinan* de çîrokan wiha pêase dike: “Çîrok beşeke folklorê ye, nivîskarên wan ne kivş in, gel bixwe ev afirandine” (2013: 12). Alakom balê dikêşe ser kollektîfbûna çîrokan ku piştî afrindina ewwîl an jî vegêrana ewwîl ya ji hêla kesekî ve, çîrok bi devkî belav dibin û bi demê re ew afrîner ji bîr dibe. Her ji ber vê yekê taybetmendiya herî diyar ya çîrokan anonîmbûna wan e.

Folklornas Remezan Pertew di pirtûka xwe ya bi navê *Zarok û Çîrok* de balê dikşîne ser derasayîbûna wan û çîrokan bi vî awayî pêase dike: “Çîrok cureyek ji vegotinên gelêrî ne ku tê de cih didin serborî û lehengên derasayî û mîjara wan xeyalî û bi devkî belavbûne” (2009: 85).

Hikmettin Attî balê dikêşe ser gerokbûna çîrokan: “Çîrok ne berhemên dem û devereke diyar in lê ew her dem û li her derê tîr afirandin. Herwiha ji erdnîgariya ku jê derketine dertên û dûre li her derê belav dibin” (2013: 14). Ev yek gelekî girîng e lew dema mirov bala xwe dide xebatên li ser çîrokan hatine kirin, diyar dibe ku çîrokek him di nava çanda ku jê derketiye û him jî di nava gelên cînar de belav dibe. Lewre mirov rastî gelek varyantên cuda yên çîrokekê tê ku ev girêdayî çand û vegêrên wê ne.

Mehmed Uzun di romanên xwe de li gel hindek formel û motîfên çîrokan, cih dide hindek çîrokên kurdî jî. Di romana Mehmed Uzun ya ewil de em rastî sê çîrokan tîr ku du heb ji wan li ser mîrên cizîra botan in û ji Kovara Hawarê hatine girtin. Çîroka sêyem çîroka kêzaxatûnê ye ku bi cureya fêlê ya ku gelek caran lehengê wan heywan in û ji bo pend û şîretdayînê tîr vegêran. Di vê romanê de kêzaxatûna lehenga fêlê ji hêmaneke folklorîk wêdetir weke şexsekê xuya dibe ku lehengê romanê, di beşên ku di hicreyê de derbas dibin, pê re diaxive, jê re behsa bîranîn û serpêhatiyên xwe yên zarokatiyê, hestên xwe yên wê kêliya di hicreyê de û bajarê diyarbekirê dike:

Ya kêzê... ez, qehreman û qumandarê dapîra xwe ku min bi sedan cih û warên şeytan û fesadan tar û mar kiriye, lê îro, ez di nava Diyarbekira xopan de, ketime bin qeyd û zincîrên wan ên kûr û tarî. Ya kêzê, îro roj, roja şeytan û fesadan e. Ne ya me ye (2015a: 65).

Herwiha girêdayî vegêrana vê çîrokê, di destpêka gelek beşên ku Kêzaxatûn tê de ye nivîskar/vegêr an jî leheng formelên cuda cuda yên destpêkên çîrokan jî neqil dike:

Rojek hebû ji rojan

Rehmet li zar û zêçên belengazên wan rojan

Tifû, tifû şeytan û fesadên wan rojan

Ev çîrok ne min, lê jiyane belengazên wan rojan (2015a: 59-60).

Di hin beşan de em dibînin ku lehengê romanê yê ku tenê ye û di bin êşkenceyên mezin re derbas dibe stranan jî ji kêzaxatûnê re distirê. Bi saya hebûna xeyalî ya kêzaxatûnê leheng xwe bi jiyane digre:

Kêza Xatûn, kêza delal... de raweste, ez ji te re hêdî hêdî stranekê bistrêm.
Hêdî hêdî, raweste, :

Diyarbekir bi dikan e
Yar yar yar eman
Ser hev gul û rihan e
Nîna nîna ey hawar (2015a: 97).

Kêzê di temamê ew beşên ku leheng di hicreyê de ye, roleke girîng dilîze ku bi saya wê leheng vedigere zarokatiya xwe, êş û azarên xwe yên êşkenceyê ji bîr dike. Herwiha bi rêya behskirina diyarbekirê bo Kêzê re jî nivîskar bergehê romana xwe fireh dike. Bi gotineke din kêzxatun derfetên vegêrana Uzun fireh dike. Bi vê re Uzun bi lehengê xwe di derbarê çanda çîrokbêjiyê û taybetmendiyên wê de jî agahiyan dide. Bikaranîna formelên cur bi cur yên destpêkên çîrokan nimûneyên hêja ne di vê mijarê de.

Her du çîrokên din ên ku di vê romanê de derbas dibin, ji hêla lehengê bi navê Apo ji lehengê romanê re tên vegêran. Navê çîroka ewwîl ya ku Apo vedigêre, Mîr Miheme û Nêriyên wî ye. Tevî ku Uzun ev çîrok ji Kovara Hawarê wergirtiye jî, dema mirov li zimanê wê dinere, diyar dibe ku Uzun destkarî di zimanê wê de kiriye ango zimanê wê nêzî zimanê romana xwe kiriye. Lê belê du beşên strankî yên çîrokê bêtî destkarî veguhaztiye:

Ezê li geliya fekirim, bi hawar e,
Terqîn hatibû, nizanim, şexşane ye, berwêç an helqedar e
Efno kuştin, hejale bavê gîskan bi sê derban birîndar e... (2015a: 142-143).

Çîroka din a ya di vê romanê de derbas dibe dîsa ji hêla Apo ve bo lehengê romanê tê vegêran ku navê çîrokê Mîrê Botan û Siltanê Osmaniyan e:

Carekê Siltanê Osmaniyan, Mîrê Botan dixwaze Stembolê. Rîspîkî Mîr heye, ew jî pê re diçe. Dema ew digihên Stembolê, Rîspî ji Mîr re dibêje, “Ez benî, sibehê, ez ê cilên te wergirim bibim Mîr. Tu jî cilên min wergire bibe Rîspî. Ma em ji ku dizanin siltan çima banî te kiriye? ... (2015a: 152).

Di dewama çîrokê de em hîn dibin ku rîspyê mîr ê bi kincên mîr diçe ba siltanê osmanî, venagere, bi vî awayî mîr bi xêra rîspiyê xwe ji mirinê xelas dibe û vedigere cizîra botan. Helbet ev çîrokên ku apo dibêjin bo şîretê ne ku ev taybetmendiyeke bingehîn ya çîrokan e. Di derbarê peyam an jî şîreta li pişt vê çîrokê jî apo wiha dibêje:

Me ji fesadiyê, pexîliyê û fitneyê jî pir kişandiye xorto. Em gelekî saf in. bi dostên xwe re dost, bi dijminên xwe re jî dîsan dost in. Em zû dixapin. Hûn divê li hember fitne û fesadan haydar bin. Xwe ji wan biparêzin, wekî wan nekin û bi wan nexapin (2015a: 153).

Apo ji bo çîrokên xwe sê peyvên cuda bi kar tîne. Bi vî awayî xwîner sê navên cuda yên cureyekî edebiyata gelêrî hîn dibe: çîrok, mesele, serpêhatî.

Di romana *Bîra Qederê* de jî em rastî çîrokekê tên. Li gel vê lehengên romanê di hin cihan de diyar dîkin ku bi çîrokan mezin bûne. An jî vegêr lehengan bi hindê lehengên çîrokan ve dişibîne. Di vê romanê de Uzun dema behsa zarokatiya celadet alî bedirxan û mala ku ew lê mezinbûye tên, behsa amojna sitîyê dike û wê weke dengbêj û çîrokbêj dide nasandin, lê ji vê zêdetir ew weke kana edebiyata gelêrî û çanda kurdî ye jî:

Hemû zarokên malbatê ku li Stembolê tên dinê, ji ber destê Amojna Sitî derbas dibin. Amojna Sitî kûpa gotinên kurdî ye, gencîneya stran, dîlan, çîrok, çîrçîrok, methelok û mamikên kurdan e. Ew şahida tarîxa malbatê û serpêhatiya Mîr Bedirxan e. Ew rû û zimanê adet û ûsilên kurdî ye. Ew dengbêj û çîrokbêj e (2016b: 55).

Çîrok û stranên ku Amojna Sitî ji zarokan re vedigêre, di heman demê de têkiliya wan a bi welatê bav û kalên wan re jî xurt dike û bi awayekî dike ku bîra wan her bi bîranîn û berhemên çanda welatê wan ve zindî bimîne. Lewre Celadet dema behsa zarokatiya xwe balê dikêşe ser vê hêla çanda çîrokbêjiyê:

Mala ku bi stran, çîrok, serpêhatî û gotinên Amojna Sitî diqulipî ser qesra Birca Belek a welatê bav û kalên min...(2016b: 56).

Wekî tê dizanîn gelek caran çîrokbêjên baş jin in lewre di romana *Tuyê* de jî lehengê romanê çîroka *Kêzaxatûnê* her tim ji dapîra xwe guhdar dike ango di vê romanê

de jî dapîreke çîrokbêj heye (2015a: 60). Celadet û birayên xwe jî bi çîrokên Amojna Sitî mezin dibin. Li gel vê Celadet diyar dike ku ew bi çîrokên Mîr Mihemedê Hekarî û La Fontaine radiketin (Uzun, 2016b: 27). Ango çîrokên mîr mihemed bi deng ji amojna sitî dibihîzin û çîrokên la fontaine jî ji ser kaxizê dixwînin.

Tekane çîroka di vê romanê de çîrokeke kurt e li ser Hz. Mihemed û ji hêla kalekî, rîhdirêj û bejnzirav tê vegêran. Herwiha metneke din jî beriya vê çîrokê bi navê çîroka Xelîl Axa ji hêla Muslîm Axa tê vegêran bes ew ne çîrok lê pêkenokeke erotîk e (2016b: 355-356).

3.1.7. Efsane

Cureyekî din ê vegêranên edebiyata gelêrî jî efsane ye ku em di romanên Mehmed Uzun de rastî çend nimûneyan jê tînin. beriya em derbasî efsaneyên ku di romanên Uzun de cih digrin pêwîst e em berê xwe bidin pênase û taybetmendiyan efsaneyê.

Li gorî Pertev Nail Boratav taybetmendiya sereke ya efsaneyê ewe ku mijara baweriyê ye; tiştên ku ew vedigêre rast û weke qewimînên rastîn tînin qebul kirin. Bi vê taybetmendiya xwe, efsane ji çîrokê vediqete, nêzî çîrok û destanê dibe. Taybetmendiyeke wê ya din jî ewe ku ew bi zimanê du yê axaftinê, û bêyî xema her cure şêwazê, vegêraneke kurt e ya ku cih nade qalibên amade (1995: 98). Li gor vê jî hêla naveroka xwe dişibe çîrok û destanan.

Pênaseya Sedat Veyis Örnek ya efsaneyê balkêş e lew wê li şûna mîtê jî bi kar tîne: Peyva efsaneyê ji farisî ketiye zimanê me. Mythos di zimanê zanistê de bo efsaneyê tê bikaranîn ku ji yewnanî hatiye. Wateya wê gotin, çîrok e. Ji dîsîplîna ku efsaneyê hildigire nava xwe mîtolojî tê gotin ku efsaneyan bi şêweyeke sistematîk dinirxîne (1995: 190).

Necat Keskin jî di xebata xwe de di peywenda Kawayê Hesinkar de têkiliya efsaneyan bi mîtan re çê dike: Têkiliya vê cureyê bi mîtan re gelek e û gelek caran ji dêvla hevdû ve jî tînin bikaranîn. Kawayê Hesinkar jî aliyekî ve efsane ye û di heman demê de jî ji bo nasnameya “netewî” ya kurdan jî mîtoseke bingeîn e (2019: 167).

Em di romanên Mehmed Uzun de rastî du mînakên efsaneyê tên. Mînaka ewwîl di romana *Tuyê de ye û di derbarê avabûna bajarê diyarbekirê de ye*. Beşek ji vê efsaneya ku lehengê romanê di peywenda qalkirina dîrok û bajarê diyarbekirê de agahiyên xwe bi kêzaxatûnê re parve dike, wiha ye:

Li gora gotinan, di destpêka tarîxa kevînar de ji her aliyekî Kurdistanê hînk kes ji warên xwe derketine û ketine pey tiştêkî. Hindek li pey malê vê dinê, hindek li pey edaleta vê dinê, hindek li pey rindî û xweşî, hindek li pey neyar û dijminên xwe bûne. Û wan piştî rêwîtiyeke pir dirêj ku çiyayên asê û avên pêldayî li dû xwe berdane, di deşta Diyarbekrê de gihane hevûdû. Ew ecêbmayî mane, wan ji hevûdû fêhm nekirine. Rê, armanc, daxwaz, edet, rabûn û rûniştina wan ji hevûdû cihê bûye. Di vê deşta zêrîn de wan bi salan bi hev re şer kirine û pev çûne. Paşê rojekê rîspîkî pir zana, alim û serwext derdikeve û ji şervanan re dibêje... (2015a: 102)

Di berdeewama efsaneyê de rîspî, şîretan li hemû hêlan dike, wan li hev tîne û paşê ew hemû mirov bi hev re bajêr ava dîkin. Li gor Pertev Naili Boratav çar cureyên efsaneyan hene ku ev in:

1. Efsaneyên afirînê
2. Efsaneyên dîrokî
3. Efsaneyên di derbarê hêz, heyîn û kesên derasayî de
4. Efsaneyên olî (1995: 100).

Li gor vê pênaseyê efsaneya ku di romanê de derbas dibe dikeve nava efsaneyên dîrokî. Lew ev efsaneya ku di romanê de derbas dibe di derbarê avabûna bajarê Diyarbekirê de ye.

Efsaneya duyem di romana *Hawara Dîcleyê* de cih digre. Ji ber ku metnê efsaneyê kurt e, em ê li vir cih bidin temamê wê:

Keştiya Nebî Nûh ku li gora gotinan, li gopikên çiyayê Cûdî veniştibû û heyameke nû raxistibû ber însaiyetê, zarok, bav û bavikên ku ji piştî Nebî Nûh ketibûn û bajarên ku ewana ava kiribûn; Babîl, Ere, Akkad, Kalne, Aşûr, Kalah, Resenî, Nînova, Riha, Nîsêbîn, Cîzîr, ev yekên hanê hemû Mezopotamya û axa wê bû (2016c: 280-281).

Ev efsaneya ku Dengbêj Biro bi şewaza xwe ya taybet vedigêre, taybetmendiya cureya efsaneyên dîrokî û ya olî bi hev re di xwe de dihevine. Ji bilî van mînakên hêjayî gotinê ye ku Mehmed Uzun di romana xwe ya bi navê *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de sîd ji gelek gotegot û efsaneyên ku li ser Evdalê Zeynikê tên gotin wergirtiye.

3.1.8. Pêkenok

Cureyeke din a vegêranên gelêrî jî pêkenok e ku em di romana *Bîra Qederê* de rastî nimûneyeke wê tên.

Necat Keskin pênaseya pêkenokê wiha dide: “Pêkenok, di nav vegotinên gelêrî de binbeşek e çîrokan e ku pîrs û pîrsgirêkên ku di jiyana rojane de tên dîtin, ji bo rehet kirin û kêfxweşkirina rewşê, bi awayekî kenokî û rexneyê tîne ziman” (2019: 237). Di pêkenokan de armanc kenandina mirovan bi rêya qisûr, çewtî û nakokiyên mirovan û jiyana rojane bi hevokên kurt û sade tên vegêran. Her wekî ku Keskin jî balê dikişîne ser pêkenok cureyekî çîrokan e. Bi kurdî li gel ku peyvên weke galte, laqirdî, meseşe, meselok, qelîbotk (Keskin, 2019: 236) werin bi kar anîn jî di romana Uzun ya bi navê *Bîra Qederê* de lehengê bi navê Muslîm Axa bi mebesta vegêrana “çîroka Xelîl Axa” pêkenoka xwe vedigêre:

-Mîrê min, eger te îzîn hebe, ez ê ji cemetê re çîroka Xelîl Axa bêjim, Muslîm Axa ji Celadet Beg dipirse.

-Hûn dîzanin, Xelîl Axa elimiye ku xizmetkara wî, Xaltiya Zînê, her dem aliyê wî bike û bi misînê dest û lingên wî bişo... belê, Xaltiya Zînê aliyê Xelîl Axa dike. Rojekê... Xelîl Axa... ewê xwe... yanî qamişê xwe rep dike... û banî Zînê dike, dibêje, “Zînê, de were, aliyê min. ” Dema Zînê dere ba wî, ew ewê xwe... yanî ewê xwe yê rep derdixe û dibêje, “Zînê, de were, carekê jî vê rebenê ha bişo... ma tu vî jî carekê bişoyî, kevir ê bibare (2016b: 355-356)!”

Her wekî vê pêkenokê, beşeke mezin ya pêkenokan xwedî naverokeke mistehcen in. Boratav di xebata xwe de diyar dike ku pêkenok her ji ber vê taybetmendiya xwe gelek caran çap nebûne. Herwiha jî ber vê hêla xwe pêkenok

zêdetir di nava zilamê gîhiştî de tîn vegêran (1995: 86). Di romanê de jî Muslîm Axa pêkenoka xwe ji cimetê rê vedigêre ku hemû jî zilam in.

3.1.9. Kilam

Kilam cureyekî helbesta gelêrî ne ku zêdetir weke berhemên dengbêjan û edebiyata dengbêjiyê tîne qebul kirin. Kilam helbestên dirêj in yên ku gelek caran xwe dispêrin bûyerên rastîn lewre mirov di kilaman de rastî taybetmendiyeke vegêranîyê tê. Ev yek kilaman ji hêlekê ve nêzî destanan û ji hêlekê ve jî nêzî çîrokên gelêrî dike lê ji ber ku bûyera dibe mijara kilamê kurt e û weke wan bi dirêjahî nayê vegêran ji wan cuda dibe. Herwiha ji ber mijar, şêwaz û dirêjbûna xwe jî stranan cuda dibe. Lew stran xwedî vegotîneke lîrik û kurt in lê di kilaman de taybetmendiyên epîkê li pêştir e, herwiha lîrizma kilamê jî tîrtir û dirêjtir e ji ya stranan.

Li gor Yıldız û Taşkın kilam, cûreyekî edebî û teşeyekî nezmî yê edebiyata gelêrî ya kurdî-kurmancî ye, anonîm e û di nav piraniya bendên wan de neqeret/dîsgotin heye. Mirov dikare kilaman jî, ji kevintirîn cûreyê helbesta gelêrî bihesibîne (2018: 25). Li gor Aslan, kilam wek formeke bingeîn ya muzîka kurdî ye. Ji aliyê hindek kurdan ve wek navê hemû/gelek formên muzîka kurdî tê bikaranîn (2019: 38).

Canser Kardaş di xebata xwe ya doktorayê de di derbarê kilamê de van agahiyan dide:

Kilam li hin herêman ji bo kevneşopa dengbêjiyê û hemû berhemên devkî weke binavkirinek giştî tê bi kar anîn li hin herêman jî bo çîrokên bistran ev term tê bi kar anîn. Herwiha kilam xwedî taybetmendiyeke teatral e û dengbêj beriya ku kilama xwe bistirê di derbarê çîroka kilamê de bi kurtî agahiyan dide (2013: 148).

Di derbarê taybetmendiyên kilaman de Yıldız û Taşkın dibêjin:

Kilamên dengbêjan, bi piranî xwedî hin form û teşeyên hunerî ne. Yekeyên nezmî yên kilaman, carinan ji pênc, an ji şeş rêzan, carinan jî ji zêdetir rêzan pêk tînin. Ji ber vê bêtîstiqariya hejmara komên rêzan, dabeşkirina wan li cûreyên edebî zehmet dibe. Yek caran, dirûvê hin bendên kilaman, daye metnên pexşanî jî, ango meriv dibêje qey metin, êdî ji teşeyê helbestê derketiye; ketiye delavê metnekî mensûr (2018: 25).

Yek ji taybetmendiyên kilaman jî eve ku di wan de diyalog hene û lehengên wan bi kilamkî bi hev re diaxivin, bersiva hev didin. Ev taybetmendî kilamê nêzî vegêranên wekî destan û çîrokên gelêrî dike.

Kilam di derbarê gelek mijaran de tên gotin, hindek mijarên berbelav yê kilaman ev in, şer, şer bi cûreyên xwe dibin mijara kilaman, şerên navxweyî an jî eşîrî û şerên li dijî neteweyên din, evîn, mirin, tebîet. Weke mînak kilamên *Besrayê* û *Seyitxanê Kerr* yê Şakiro di derbarê şerê ku li dijî neteweyên din de ye lê kilama *Seîdo* ku ew jî ya Şakiro ya di derbarê şerê eşîrî an jî şerê navxweyî de ye. Yildiz û Taşkin di xebat xwe de mijarên kilaman wiha diyar dikin: “Kilamên zarokan, kilamên evînê, kilamên qaremanî û şeran, kilamên şînê, kilamên li ser leşkeriyê, kilamên kar û barên malê, kilamên rexnegirtinê û kilamên dawetê” (2018: 25).

Yaşar Kaplan di gotara xwe ya di derbarê stranên herêma hekarî nivîsîye, diyar dike ku li vê herêmê peyva lawjeyê li ji bo kilamê tê bi kar anîn:

Herçendî hindek deveran Lawje wekî strana dînî bête zanîn jî li devera Hekaryan, Bahdînan û piranîya Botan wekî me li jorî behskirî ne strana dînî ye. Herêma serhedê vî birrê stranê wekî kilam bi nav diket. Lê belê di esasê xwe de kilama serhedê û lawjeya Hekarê, Bahdînan û Botan heman tişt e (2015: 162).

Di romanên Mehmed Uzun de gelek caran bo kilamê peyva stranê tê bi kar anîn, di romanê de hemû dengbêj stranan distrên, stran tê gotin û hwd. Lê dema em di romanê de li hindek nimûneyên berhemên ku weke stran tên binavkirin dinêrin, eşkere dibe ku ew kilam in. Uzun peyva stranê di wateyeke gelek fireh de û li û şûna gelek berhemên edebiyata devkî yê wekî dûrik, payîzok û kilaman bi kar tîne.

Di gelek romanên Mehmed Uzun de ji ber hebûna dengbêjan ku di du romanan de vegêr dengbêj bi xwe ne, mirov rastî gelek kilamên dengbêjan tên ku tesîra wan li ser şewaza romanê û naveroka romanê jî bi xurtî diyar dibe. Lew vegêr van kilaman di peywendêke şexsî-civakî de daxilî metnê dikin. Ji vê hêla xwe ve romanên Uzun yê bi navên *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dîcleyê* balkêş in. Di van romanên de gelek kilamên dengbêjan derbas dibin ku hindek ji wan berhemên edebiyata dengbêjan bi xwe ne hindek ji wan jî afirandinên Mehmed Uzun in ku di

romanê de bi navê kilam cih digrin. Ev yek bi taybet di romana hawara dîcleyê de wiha ye. Lew navê romanê bi xwe jî navê kilama ku dengbêj Biroyê leheng û vegêrê romanê ye ku di temamê jiyana xwe ya dengbêjiyê de hewl dide biafirîne lê dike nake, naqede û her car bi şêwe û gotinên nû di beşên cuda cuda de xuya dibe.

Di romana Uzun ya ewwil *Tuyê* de lehengê romanê di hîcreya ku bi tenê tê de ye ji Kêzhatûnê re beşekê ji kilama delalê beriyê dixwîne:

Haylo dilo! . . .

Rabe berê xwe bidin welatê kurdistanê

Herin diyarbekira xopan, kortagidiyan

Ez ê vê sibehê herim, kevirkê rakim, ji bedena hepsa xwîniyan

Ez ê wî kevirî têxim navbena xwe û ber vî dilî

(2015a: 96).

Di heman romanê de parçe kilamek din jî derbas dibe ku di hepsê de tê bîra leheng û ji hêla girtiyên din ên hepisxanan ve piçekî hatine guhertin tevî orjînalê xwe, derbas dibe. Romanê de vegêr, vê kilamê û awayê wê yê guhartî wiha neqil dike:

Hindekan jî stranên kevn ên li ser evîn û hesretê li gora rewşa girtîxanê guhertibûn. Yek ji wan ku li wir, li ser cihê pismamê te, dihat bîra te, strana Hesenîko bû. Stran li gora rewşê hatibû guhertin. Di stranê de ev herdu rê,

Ez delîla Hesen, siwarê hespê me, ha hespê me

Ez rebena bavê Kerem, apê Xanimê, girtiya keleha Bazîdê me

bûbûn,

Ez delaliya girtiyê mêrxas, siwarê hespê egîda me,

Ha siwarê hespê egîda me,

Ez rebena bavê şêran, apê xanimê, girtiyê zindana Diyarbekrê me (2015a: 129-130).

Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, romaneke li dor efsane, çîrok û kilamên dengbêjê Evdalê Zeynikê hatiye nivîsîn. Vegêrê romanê dengbêjekî din ê navdar Ehmedê Fermanê Kîkî ye lewre bi giştî him zimanê romanê nêzî vegêranên devkî û dengbêjan e him jî ji ber dengbêjên ku di romanê de cih girtine, vegêr girêdayî van

xalan di vegêrana xwe de gelek kilamên dengbêjan bi kar tîne. Ango mijar û lehengên hatî hilbijartin vê yekê li ser nivîskar an jî vegêrê romanê bi awayekî xwezayî ferz dikin.

Di romanê de li gel Evdalê Zeynikê du dengbêjên din jî tevî kilamên xwe diyar dibin: Dengbêj Gulê û Şêx Silê. Ji ber ku ne pêkan e em hemû kilamên ku di metnê de derbas dibin neqil bikin, emê di vira de cih bidin du parçe kilamên ji leca Evdalê Zeynikê û gulê raberî we bikin:

Gulê, tu were, em herin mala me ye,
Ji te re daynim, bahlîf-doşegê çi dare ye,
Her kî xelkê got, “îkrama Gulê ji te re çi ye?”
Gulê li bin gotin û qisên Evdal nedima û hema lê vedigerand,
Evdal çavê min reş e, bela ne,
Min rojê heft caran bi kilê sibhanê kil dane, (2018a: 33).

Di romana *Siya Evînê* de beşek ji kilamekê derbas dibe ku vegêrê romanê heçku beşek ji çîroka gelêrî ya bi navê *Cembeliyê Hekarî û Binefşa Narîn* be behsa wê dike. Li gel îhtîmala ku ev metn di wê çîroka gelêrî de derbas bibe jî, herwiha ew weke varyanta beşeke kilama Dengbêj Şakiro ya bi navê Wey Dil xuya dibe. Li hêleke din çavkaniya wê jî gotineke pêşiya ye. Kilam girêdayî serpêhatiya nexweş ya Memduh Selîm Beg û Ferîhayê bi kar tê. Metna kilamê wiha ye:

Bila mêrê meriya bi dilê meriya be, bila nan hebe û dew tune be, bila xwarina meriya garisê bi gilgil be; bila lehêfa meriya ezmanê bilind be; bila doşega meriya ji erdê şil be; bila belîfa meriya ji kevir be; bila tûrê parsê tim li mil be; bila binê tûrê meriya bi qul be; bila cihê meriya ne li vir be, li sînore Ecem û gêwir be; bila mêrê meriya ne bi dilê meriya be, bila sibê heya êvarê ne kar be, ne şixûl be, xwarin û libas pir be; dilê meriya tim bi kul be (2018b: 193). ”

Di romana *Bîra Qederê* de jî em rastî kilamekê tên ku Celadet Alî Bedirxan wê ji devê dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî dinivîse da ku di kovara *Hawarê* de biweşîne. Vegê bi vî awayî dengbêj Kîkî dide nasandin û vê kilama li jêr neqil dike:

Ehmedê Fermanê Kîkî, dengbêjê navdar û dewrandîtî, xwediyê dengê mîna qedîfe, çavên xwe digire, serê xwe, bi hêdîka, dihejîne û dibêje; Dilo lo! . . . Vê sibekê xelkê min î delal çû welatê xerîbîyê... Kesek li mala me tu nîn e, w'ezê sebra dilê xwe pê bînim... Derdê dilê min pir in, şevê kanûna şevine dirêj in... Ez ê rabim lêwîk li dergûş xînim... Ji derdê dilê xwe re rebenê, bilorînim, bilorînim, bilorînim (2016b: 254).

Li gel ku romana *Hawara Dîcleyê* ji hêla dengbêj Biro tê vegêran, ji bilî kilamên dengbêj Biro ku qet naşibin kilamên kilasîk yên dengbêjan, bi tenê du parçe kilam derbas dibin. Ji ber ku li jor me behsa kilamên ku aidê dengbêj biro ne, kiribû, em ê di vira de tenê cih bidin wan her du kilaman. Kilama pêşî, li odeyeke Birca Belek, li meclîsa dengbêjan ji hêla dengbêjekî ve tê gotin bes vegêr di derbarê dengbêj û kilama wî de ti agahiyê nade:

Xurmîn dikeve toq û benîyan
Şewq û şemala vê xezalê davêje çol û çîyan
Davêje ser deryayê li ser pişta gamasiyan... (2016c: 270).

Kilama duyem ya di vê romanê de derbas dibe, dîsa ji devê Biro tê neqilkirin ku li ser serhildana Yezdînşer ya ku li dijî dewleta osmanî hatibû li dar xistin ve ji hêla dengbêjan ve hatiye afirandin:

Heylo Mîro, Yezdînşêro, şêrê zirav,
Li me tê emir, emirê hukimatê,
Ferman, fermana dewletê,
Dengê top û qumberên wan romiyan giran in, li pey me tê (2016c: 678)

3.1.10. Stran

Ji nav cureyên helbesta gelêrî ya herî berbelav û ji hêla cureyan ve dewlemend stran e. Stran bi hêza xwe ya ragihandina hestan ve jî ji cureyên din cuda dibin. Îfadeyên hêmayî û lîrîzma di wan de di asteke bilind de ye û ev yek dike ku ew zêdetir werin îcrakirin. Li gorî Yaşar Kaplan:

Peyva “stran” ji gotina “stirîn”ê têt. Stirîn ji bo gotinên bi rîtm û selîqe tene gotin. Dema em dibêjin stran em heman demî de behsê; lawje, lawik, şeşbendî, narînk,

serê zava, miqam, kilam, peste, heyranok, payîzok, berîte, dîlok, dûrik, zêmar, laylayê, serîlêk, delêl, medîhe, qewlêrk û hwd. dikin (2015: 159).

Li gora Cegerxwîn stran, bê kêşane lê tenê bi dawî ye. “Herwekû hin peyvên wê dirêj, hin jî pir kin in. ji lewra gelek caran dengbêj van kurtebeytan naçare hê hê yan lo lo û lê lê bi serve cem xwe datînin” (1988: 111).

Stran berhemên kurt in û gelek caran bi amûrekê û bi gotinên sivik tên îcra kirin. Ji îcrakarên wê re stranvan an jî stranbêj tê gotin. Gelek cureyên stranan hene, hin ji wan di xebata Necat Keskin de cih digrin: Stranên govendan, stranên kar, stranên bi demê ve girêdayî, stranên zarokan, stranên şînê/zêmar, dûrik/qewlêrk (2019: 269-279). Di nava her cureyê van stranan de hindêk cure stranên din jî hene ku navên ên taybet hene.

Di romanên Mehmed Uzun de mirov rastî cureyên stranan yên wekî stranên dawetê an jî dîlok, stranên evînê, stranên bêriyê, dûrik û hwd. tên. Di hemû romanên de stran di nava peywendekê de û girêdayî, rewş, bîranîn û mijarekê de derbas dibin. Stranên ku derbas dibin piraniya caran weke bend, çarîn an jî parçeyekê derbas dibin û em di romanên de rastî temamê metnê wan û navê cureyên wan nayên.

Di *Tuyê* de leheng dema behsa bîranîneke xwe ya zaroktiyê ya bi kalikê xwe re vedigêre, straneke dawetê ya ku wê demê kalikê wî jê re straye bi bîr tîne û ji *Kêzhatûnê* re bendekê dixwîne:

Masîko per beleko... yar yeman!

Vê avê şeylo meko... dost yeman!

Dost rind e, ji xew rameko... yar yeman!

Dost rind e, ji xew rameko... dost yeman (2015a: 168)!

Di heman romanê de dema vegêr dîsa behsa zaroktiya xwe dike, vê carê straneka şivanan ya ku di bêriyê de ji dîsa hêla şivanan ve tê strîn neqil dike û navê cureya wê jî tevî du bendên wê diyar dike:

Gundo bêrî, bêrî, bêrî!

Gundo ber xopano bêrî!

Gewram rind e, pez da bêrî,
Gundo ber xopano, bêrî!
Bi qoziyên çava l'min dinêrî (2015a: 175-176).

Di romana uzun ya bi navê *Siya Evînê* de dema ku lehengê romanê Memduh Selîm Beg li kolanên Antaqiyayê bi cih dibe û li bajêr digere, dengên hindek jinan tevî vegêranê dibin ku di nav de diaxivin û behsa qeşengî û çêyiya wî dikin. Ji nav wan yek wiha dibêje û stranekê neqil dike:

“Ermenekî kal ku dengbêj bû û bi kurdî jî dizanîbû, li ser merivên weha, straneke weha digot:

“Mêro, mêro, bejnziravo
Xweziya min bi dilê teyo,
Rûgeşo, rûşêrîno,
Dilên keçên xama pê re yo...(2018b: 38)”

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de fonksiyona stranan zêdetir e lew ew tesîreke mein li ser ruhiyeta karakteran jî dikin. Di romanê de li gel sê metnên stranan ku diyar e ji hêla nivîskarê romanê ve li gor pêwîstiyên bûyer û lehengan hatine afirandin, gelek caran stran dibe mijara fikirîn û bîranînan.

Strana ewwîl ya di romanê de di trêne de ji hêla gelê welatê çiyayan yên ku ji welatên xwe tên sirgûnkirin tê strîn. Stran li ser trêne ye ya ku wan ji wan welatên wan diqetîne, tevî xemgînî û êşên wan, ew dibin cihê dûr:

“Trêno, malkambaxo, ho trêno, riya te ber bi kû ye, lo trêno...” (...) “azar û êşa dilê mino, trêno, stûxwarî û rebeniya mino, trêno, de bibêje, ez ketime bextê te, bibêje...(2010a: 70)”

Dema ku Baz li welatê çiyayan li dijî şervanên welatê çiyê derdikeve operasyonê, bi şev li benda dema rast dimînin da ku êrîş bikin. Di wê maweyê de heyv li jor dibiriqe ku ew dîmen Baz, dibe rojên wî yê li sêwîxaneyê. Strana wî ya ku di wê heyamê de dihat strîn tê bîra wî:

Di wan şevên heyveronê de, Baz straneke weha ku cêriyên malê li hev anîbûn digot; heyveronê heyveronê, teyr û tilûr, kîwroşk û simore li daristanan li govendê, bi ronahiya te ya delalê heyveronê (2010a: 134).

Straneke din a ku di vê romanê de cih digre, li serê çiyê, ji hêla şervanekî tê strîn ku li ser hevalên wî yên di şer de mirine û welat û erdnîgariya welatê wan de ye. Dema em bala xwe didin gotinên stranê, baş xuya dibe ku ew ji stranekê zêdetir dişibe helbesteke modern ya destanî ku hatiye bestekirin:

Tu hey ax, hey zinar, hey çiya, ew dibêje, ji bîr meke, kesên ku ji bo te, di şer de, hatin kuştin, bi guleyên xedar ketin erdê ji bîr meke, hejmara wan bêhejmar, yek bi yek di hişê me de, navê wan li ser dilê me, ji bîr meke, bi bîr bîne, bi navê wan bang li wan bike, bi evîna xwe wan bihebîne, (2010a: 209-210)

Di çend cihên din de Kevok dema li bîranînên xwe difikire, stranên ku diya wê zaroktiyê de jê re distran tê bîra wê ku yek ji wan stranan jî strana ez kevok im e. Li hêlêke din Bazê ku kevokê li mala xwe vedişêre, rojekê dema tê mal dengê kevoka ku stranekê bi zimanê xwe distrê dibihîze û li ser zimanê gelê Welatê Çiya dikeve nava fikran. Stran û zimanê stranê yê ku Baz ji bilî çend peyvan ti tiştî ji wan fêhm nake tesîreke erênî li ser baz dike û di derbarê stranê de pirsan ji kevokê dike (2010a: 299-304).

Di *Hawara Dîcleyê* de em rastî gelek metnên stranan tên ku hin ji wan yên dawetan e û evîni ne hindêk jî li ser mijarên şer û serhildanan e. Hê destpêka romanê de dengbêj Biroyê vegêrê romanê straneke li ser cizîrê ya ku Apê Xelef distirê neqil dike:

Çûme Cizîrê, Cizîra Botan

Şalûl û bilbil hev bûne cotan

Wele wê rindê dilê min sotan

Wele wê kewê dilê min sotan (2016c: 41)

Straneke din ya ku di romanê de derbas dibe jî ya Dengbêj Biro ye ku di zaroktiya xwe de li ser newrozê bi awayekî jixweber afirandiye. Stran bi forma çarînê ye û bi qafiye û pîvana heceyê ye:

Newroz e, Newroz e
Xweş roj e, pîroz e
Dinya geş e, bihar e
Dilê min germ e, dîlan e... (2016c: 52)

Her wekî dengbêj Biro, Apê Xelef ê ku şivanê mîr e û bi xwe dengbêje jî li ser roja ku bedirxan dibe mîr, di cih de stranekê davêje ser mîrê nû:

Mîro, mîrê mino,
Bejnziravo, aqiltemamo,
Çelengo, rûgeşo,
Li roja xweş hukimdar

Her çiqas min strana Apê Xelef çu carê nebihîstibû û welê dixuya ku wî, dîsan, mîna her carê, gotin li gora mercên ku em tê de bûn, li hev anîbûn (Uzun, 2016c: 71).

Bi wî awayî Uzun balê dikşîne ser taybetmendiya karakterîstîk ya dengbêj û stranbêjan ku di cih de dikarin stran û kilaman biafirînin. Dengbêj Biro di dereke din ya romanê de li ser Ester a keça keldanî ya ku ji hekariyê ye, stranekê jixweber diafirîne ku ta wê demê Biro ne ester dîtiye ne jî dengê wê bihîstiye. Bi tenê bav û birê esterê ku kelekvan in, di nava sohbetê behsa wê û deng û bedewiya dîkin ku ev bala Biro dikşîne:

Esterê, lê Esterê
Zarşêrînê, lê keçê
Bilbila welatê Hekarê
Esterê, lê Esterê...(2016c: 196)

Di romanê de dengbêj û stranbêjên ji herêmên cuda yên kurdan tên û dîsa bi minasebeta newrozêli meclîsa mîr bedirxan kom dibin, her dengbêjek an jî stranbêjek berhemên xwe yên ji repertuara herêma xwe pêşkêş dîkin. Vegêrê romanê Biro jî weke dengbêjekî tevî meclîsê dibe û piştî ku mîr tê, bi handana Mam Sefo ew jî strana dengê dîcleyê distirê. Di vira de em ê cih bidin mînaka stranekê ji Beriya Mêrdînê:

Ser bi zêrê û diran sedefê...

Di nava serê wê de çil û şeş kezî ne

Tiliyên xwe ji mûm û şimayê birîne (2016c: 268-276).

Mînaka dawî ya vê beşê straneke şerî ye ku li ser serhildana Mîr Bedirxan ji hêla dengbêjan ve hatiye afirandin:

Yek dibêjne Bedir Xan,

Xwudanê qewmê giran

Cab da mîrê êzidiyan

Dêrgulê kire dîwan... (2016c: 550)

3.1.11. Zûgotinok

Zûgotinok cureyek e ku zêdetir di çanda zarokan de cih digre. Hêla zarokatî ya di mijar û avahiyên zûgotinokan de nîşaneyekê ve diyardeyê ye. Li gel vê yekê di gelek rewşan de, bo nimûne di hindek stranên aşiqan de, di çîrokan de û di axaftinên kenokî yên rasterast weke “zûgotinok” tên bi nav kirin de em dibînin ku mirovên mezin jî serî li vê rêya vegêriya bi helbestê didin (Boratav, 1995: 134).

Li gor Keskin zûgotinok, ji peyv û gotinên bipîvan pêk tînin û di nav wan de hunerên vegotinê yên wek secî (serweya di pexşanê de), alîterasyon (dubarekirina deng), asonans (dubarekirina tîpên bideng) û dîsgotina peyvên cih digrin (2019: 283). Taybetmendiya sereke ya vê cureyê nebûna mijareke wê ya bingehîn e (Boratav, 1995: 134).

Li gor Öztürk: Zûgotinok, ji deng û gotinên şaşker ên biserwa pêk tînin û ji aliyê ahenga hundirîn ve helbest, ji aliyê teşeya derveyî ve jî di dîmena pêxşanê de ye. Zûgotinok, ji aliyê naverokê ve bi gelemperî ji ramanên hevnegirtî pêk tînin û herwiha bêhtir weke cureyekê edebiyata zarokan jî tê pejirandin (2016: 26).

Zûgotinok yek ji hemanên edebiyata gelêrî ne. Ji bo rewaniya zimên, ji bo hişyarî û baldariya dafikên zimên, ji bo kêf û coşa lîstîk û çîrok û xebroşkan, tînin gotin. Lîstîk bi wan dest pê dîkin, mak bi wan tînin diyarkirin, çîrok û xebroşk gelek caran bi wan dest pê dîkin û bi wan diqedin (Kurdo, 2017: 5). Weke ku ji pênaseyan tê fêhm kirin, zûgotinok cureyekê ku zêdetir girêdayî zarok û lîstîkên wan e.

Di nava romanên Mehmed Uzun de, tenê di tuyê de em rastî nimûneyeke vê cureyê hatin ku lehengê romanê di hîcreya xwe de bo ku laş û mejiyê wî hereket bike, ji xwe re bernameyekê amade dike ku tê gotina stran, çîrok, mijûlî, têderxistinok, metelok û hwd. cureyên edebiyata gelêrî te de cih digrin. Divê were gotin ku vegêr/leheng bo cureya zûgotinokê navê mijûliyê bi kar tîne:

Çel çûk û çel maçûk û çel çelî li vî rexê avê,
Û çel çûk û çel maçûk û çel çelî wî rexê avê,
Her çel çûk û çel maçûk û çel çelîyên vê rexê avê gotin;
Ma hûn çend çûk û çend maçûk û çend çelî ne li wî rexê avê (2015a: 199-200)?

3.1.12. Mamik

Cureyekî din ê edebiyata gelêrî jî mamik e. Li gor Keskin, “Mamik di kurdî de wek tiştanok, metelok, têderxistinok, hellêne, çewçe jî tên binavkirin. Ji bo mamikan di îngîlîzî de riddle, di tirkî de jî bilmece tê bikaranîn. Mamik ji peyvên qalîbgirtî û lihevhatî pêk tên û li ser pîrsekê bi metaforan hatine honandin” (2019: 292). Herwiha mamik di lîstîk û perwerdehiya zarokan de jî tên bikaranîn û weke cureyekî bo wan tên zanîn.

Di romana *Tuyê* de her wekî li jor hate destnîşan kirin lehengê romanê, bo xwe hin cureyên edebiyata gelêrî vedigêre ku yek ji wan jî mamik e û leheng wê wekî têderxistinok bi nav dike. Leheng weke lîstîkê û weke ku kesek din jî li hember wî hebe mamikan dipirse û bersiva wan dide. Di vira de em ê ji wan cih bidin çend mînakên:

Te piştî xwe deriyê zîndanê û weke ku yek li hember te rûniştî ye, bi dengekî hindek berz pîrsî,

“-Berhev dikî barî ga ye / Datînî erdê weke çiya ye” Ew çî ye?

Îcar tu derbazî hember bûyî û dîsan weke ku yek li benda bersiva te sekinî ye, te wisan bersiv da.

-Ew kon e.

Îcar ez ê tiştêkî zor bipîrsim de bibêje.

“Sêsed û şêst û pênc reşêle, diwanzdeh ga û du çêlek / Nêvî reş, nêvî belek”
Ew çi ye?

Belê gelek dijiwar bû lê ez vê jî dizanim, sal, diwanzdeh meh û rojên salê ne
(2015a: 203-204).

3.1.13. Gotinên Qalibî

3.1.13.1. Gotinên Pêşîyan

Gotinên pêşîyan cureye herî zêde bi jiyana rojane re têkildar e. Bo bikaranînan wan weke cureyên pêdivî bi hin dem û hestan nîne. Di nava axaftinê de bo mînakdayîn an jî serwextkirinê ji hêla axêver ve dikevin nava axaftinê. Li gor Keskin:

Gotinên pêşîyan, ew gotinên qalibgirtî ne ku di nav demên dûr û dirêj de heta bi roja me hatine û rewş û têkiliyên civakê bi me didin nasîn. Wek cureyên din ên edebiyata gelêrî bi demê re afrînerê wan ji bîr bûye û loma di nav gel de bi awayekî anonîm û kolektîf hatine gotin û veguhastin (2019: 297).

Li gorî Öztürk, gotinên pêşîyan, texlîdeke ji wêjeya gelêrî ye ku, serborî, tecrîbe û rabirdûya civakan bi awayekî zargotinê û bi bandor rave dike. Gotinên pêşîyan; raman û hestên rayagiştî, nexşerêya helwesta jiyana neteweyî, rengvedana zanist û çanda gel, paşxaneyê daneheva civakî û hilberînên binehişa kolektîfî ye (2015: 321). Gotinên pêşîyan gelek caran bo xurtkirina fikrekê tî bi kar anîn. Ji ber ku encamên tecrubeyên civakê ne di wan de mirov rastî kodên civakî jî tê. Herwiha gotinên pêşîyan bo dersdayîn û şîretkirinê jî girîng in û di civakê de bi vê rola xwe cih digrin.

Öztürk di derbarê taybetmendiyên gotinên pêşîyan de wiha dibêje:

Gotinên pêşîyan, bi kurtî û bi puxtedarî tî avakirin. Her çend awarteyên wê hebin jî, bi piranî ji hevokê yan ji du hevokan pêk tî. Ji bilî van gelek taybetmendiyên wan ên din jî hene. Ravekirina ramanê gel ên hevpar, xwedîbûna nîrxdarazên neteweyî, helwestên misoger, vegotinên xwerû, dîdaktîkbûn û hwd. hin taybetmendiyên din ên gotinên pêşîyan in (2015: 322).

Li gel kurtbûna xwe, di gotinên pêşiyên de rîtm û aheng jî heye ku ev yek jiberkirina wan hêsan dike.

Di hemû romanên Mehmed Uzun de gotinên pêşiyên bi awayekî derbas dibin. Bikaranîna gotinên pêşiyên di hindek romanên de gelekî zêde dibe, di hindekan de jî gelekî kêr dibe ku ev yek girêdayî vegêr, leheng, mijar û serdema ku roman tê de derbas dibe, diguhere. Bo nimûne di romanên weke *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* û *Hawara Dicleyê* de rêjeya bi kar anîna gotinên pêşiyên zêde ye lew roman bi awayekî di demên premodern yê dîroka kurdan de derbas dibin, civak nexwendî, gundî ye û di nava çandê devkî de dijî. Li hêlêke din vegêrên van romanên dengbêj in û hakimê çanda devkî ne, lewre bi awayekî xwezayî dema diaxivin, tesîra gotinên xwe bi gotinên pêşiyên zêdetir dikan. Helbet di romanên bi vî rengî de li gel hemanên din ên edebiyata gelêrî, gotinên pêşiyên jî dê zêde be. Li hêla din di romanên weke *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirînê* û *Siya Evînê* de ku piraniya bûyeran li bajaran û di nava komeke xwende û bi çanda nivîsê re eleqedar derbas dibe, rêjeya gotinên pêşiyên bi awayekî normal kêr dibe.

Alaqeyeke taybet ya Mehmed Uzun bo gotinên pêşiyên heye lew ew di pirtûka xwe ya ceribandinan *Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler* de ceribandinekê li ser gotinên pêşiyên dinivîse û tê de wiha dibêje: “Gotinên pêşiyên yê kurdî, him bo dîroka kurdan, bo jiyana wan a civakî û mentalîteya wan neynikeke nedîtî ye him jî bircên keleha berxwedan a kurdan in. Gotinên pêşiyên yê kurdî bo xwe bigihînin van rojan gelekî li ber xwe dan” (2018c: 55-56).

Di heman nivîsê de Uzun diyar dike ku ew li gor bernameyekê gotinên pêşiyên di hindek romanên xwe de bi kar tîne, di hinên din de jî bi awayekî rasthatinî wan li romanê direşîne (2018c: 56). Di romanên *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, *Bîra Qederê* û *Hawara Dicleyê* de gotinên pêşiyên di îfadekirina neykbûna kurdan de tên bikaranîn. Uzun di beşa 10em ya *Bîra Qederê* de gotineke pêşiyên adapteyî têkçûna kurdan dike û weke epîgraf bi kar tîne: Aş çûye; kurd li çeqçeqokê dipirsin (2016b: 217).

Di *Hawara Dicleyê* de Mam Sefo bo hevnegirtina kurdan gotineke pêşiyên bi kar tîne: “Destiyê bivir ne ji darê be, darê nabire” (2016c: 519). Varyanteke heman

gotinê di *Rojeke ji Rojên Evdalê Zeynikê* de di peywenda zilma Egîd Begê ya li ser kurdan de tê bi kar anîn: “Kurê darê ji darê nebe, zewala darê nîne” (2018a: 116).

Di romana *Tuyê* de leheng dema dikeve girtîgehê, dikeve beşa girtiyên siyasî ku pismamê wî yê bi çend salan jê mestir jî tê de ye. Di girtîgeha ku gelek kesên emirdirêj û ji hêla zanîna berhemên devkî ve tije hene ku pismamê lehengê romanê ji wan gotinên pêşyan berhev dike û wan li gor alfabeyê rêz dike. Pismamê leheng, vê yekê weke karekî neteweyî dibîne ku pêwîst e nîşê wan xebatên bi vî rengî bikin. Uzun bi gotinên vî lehengê re balê dîkşîne ser folklorê û girîngiya berhevkirina wê. Di romanê de li şûna peyva gotina pêşyan peyva metelokê tê bi kar anîn. Çend mînakên ji wê xebatê wiha ne:

Alîkî şîn e, alîkî sayî ye
Aqilê kêrî riya xwar dixê ber hevalê xwe
Aqil li serîyan e ne li bejnan e.
Şixul çek e
Li paşîla xwe ke
Te hewce tê, derî lê veke... (2015a: 130-131).

Hawara Dicleyê di warê bikaranîna gotinên pêşyan de romana herî dewlemend ya Mehmed Uzun e. Li gor tespîta me di vê romanê nêzîkî sed gotinên pêşyan hatiye bi kar anîn ku hindêk ji wan çend caran, di çend beşên cuda de derbas dibin. Uzun jî pirtûka xwe ya bi navê *Bir Romanın Hatıra Defteri* de ku ji rojnivîskên ku di pêvajoya nivîsandina vê romanê de nivîsiye pêk tê, wiha diyar dike ku wî listeyeke gotinên pêşyan amade kiriye da ku di romanê de bi kar bîne, ew liste qediyaye û pêdivî ye listeyek din amade bike. Lew gotinên pêşyan gelekî li şêwaza Biro tên (2016a: 137). Wisa dixuyê ku Uzun keresteyên folklorê yên ku dê di roman xwe de bi kar bîne ji berê de berhev dike û bi zanetî li cihên pêwîst, di nava peywendekê de bi kar tîne. Hin ji wan gotinên pêşyan yên romana *Hawara Dicleyê* ev in:

Sî û sê çîrokên hirçê hene, hemû jî li ser hirmiyê ne (2016c: 121).

Aqilê sivik, barê giran e (2016c: 166).

Gotina xweş bihara dilan e (2016c: 184).

Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê nîne (2016c: 245).

Axîna vî destî ji destê din re namîne (2016c: 245).

Bêyî şêx û pîr mere dîwana mîr (2016c: 268).

Xwedê çiya dibîne û berfê lê dibarîne (2016c: 338).

Serê du beranan di beroşekê de nakele (2016c: 454).

Li gel van gotinên pêşyan yên kurdî em di romanê Uzun de rastî hindek gotinên pêşiyên yên tirkî jî tên ku Uzun ew rasterast wergerandine kurdî û bi kar aniyê. Li jêrê em ê cih bidin van gotinên pêşyan û orjînalên wan ên tirkî:

Kor dixwest çavekî, Xweda didayê du çav (2016c: 413): Körün istediği bir göz, allah verdi iki göz.

Hûn çi biçînin, hûn ê wî biçînin (2016c: 425): Ne ekersen onu biçersin.

Agir, cihê ku dikeviyê, dişewitîne (2010: 353): Ateş düştüğü yeri yakar.

3.1.13.2. Biwêj

Biwêj cureyeke edebiyata gelêrî ye ku peyvên qalibgirtî pêk tên. Bi tena serê wateyekê diyar nakin lê di nava hevokê de peyama axêver xurt dikin. taybetmendiyên ziman û çanda ku tê hatine afirandin di xwe de dihevin û wan mihafeze dikin. Bo nimûne hindek peyv hene ku tenê weke qalib di biwêjan de mane.

Ev peyvên ku bi demê re qalib û teşe girtine di zimanê kurdî de jî gelekî tên bikaranîn û bi vî qalibgirtîbûn û bikaranîna xwe wek cureyekê di nav edebiyata gelêrî ya kurdî de cih digirin. Biwêj, gotinên qalibgirtî ne ku ji peyvên ku bi demê re ji wateyên xwe yên rasteqîn dûr ketine û hatine cem hev û ji bo teswîrkirina rewş an jî têgehekê wateyên nû hilgirtine ser xwe, pêk tên (Keskin, 2019: 306-307).

Dilawer Zeraq di pirtûka xwe ya bi navê *Ferhenga Biwêjan* de pênase û taybetmendiyên biwêjan wiha dide:

Biwêj hêman û dînamîkên herî girîng û bibandor ên zîmanekî ne. Ji bo diyarkirin û têgihîstandina têgehan, bi mantiq û qalibên arizî yê wî zîmanî hatine dîtin û afirandin. Ji aliyê wate, wesf û çawanîyê ve xweserî xwe ne; zêdetir ne di wateya ku pêşî tê fêmkirin, di wateyeke din de tên bikaranîn (2005: 7).

Di romanên Mehmed Uzun de em rastî gelek biwêjan tên ku beşdariyê li zîman, şêwaz û peyamên romanên wî dîkin. Uzun di pirtûka xwe ya bi navê *Bir Romanın Hatıra Defteri* de diyar dike ku ew ji bo biwêjen ku di vê romanê de bi kar bîne sûdê ji listeya kovara kurmanciyê werdigre (2016a: 137). Biwêj di romanên de bi awayekî xwezayî di nava hevokan de derbas dibin û axaftin û şayesandinan dewlemend dîkin. Hindek biwêjen ku di romanên de derbas dibin ev in:

Lotik dan xwe (2015a: 10).

Dil xweşkirin (2015a: 146).

Berê xwe dan oxirê, piştî xwe dan felekê (2015b: 9).

Li ber xwe ketin (2015b: 54).

Hiş ji serî çûn (2015b: 58).

Zik li xwe kir def (2018b: 120).

Xwelî li serê te be (2018b: 34).

Dinya li wan hate xezebê (2018a: 54).

Deriyê dilê xwe vekirin (2018a: 65).

Dê weledê xwe avêtiye (2016b: 71).

Dev avêtin (2016b: 260).

Kevir li ser kevir nehiştin (2016c: 300).

Hişk û ter tev de şewitîn (2016c: 302)

Her wekî gotinên pêşîyan mirov di romanên Uzun de rastî biwêjên ku ji tirkî hatine wergerandin jî tê:

Ji çavan ramûsîn (2018b: 79): Gözlerinden öpmek.

Çavên xwe revandin (2016b: 203): Gözlerini kaçırmak.

Mîna topa nûrê (2016b: 282): Nur topu gibi.

3.1.13.3. Dia û Nifir

Dia û nifir du hêmanên bingehîn yên jiyana civakî ne ku ji gotinên qalibî pêk tên ku her wekî cureyên din ên edebiyata gelêrî encama tecrubeyên salên dirêj in û ji ber ku xwediyê wan ne diyar in, berhemên kollektîf in. Dia û nifir di derbarê awayê fikirîn, motîvasyon û têkilîdanîna civakan fikir didin mirov lewre bo fêmkirina civakan di nava xwe de daneyên girîng dihevin bo lêkolînê olî û sosyolojîk. Lê ew herwiha keresteyên zimanî ne jî û bo edebiyatvanan jî dibin keresteyên berhemên edebî.

Dia, ew gotinên qalibî ne ku ji bo qencî û başiya mirovan tên gotin û di forma daxwazkirinê de ne ku ev daxwaz bi pirranî ji xwedê û carna jî ji pêxember û ewliya an jî qencên xwedê tên kirin. Romanên Mehmed Uzun ji hêla bikaranîna diayan gelekî dewlemend e lew ew rengên civakê ne û di her qada jiyana civakî ya kurdan de cih digre. Em li jêr cih didin çend heban ji wan:

Xwedê bila te ji xirabî û nexweşîyan star bike (2015a: 25).

Belekên çavên te bila her bi ken bin (2015a: 25).

Xwedê we rûreş û riswa neke (2015a: 147).

Xwedê bi te re be (2015b: 74).

Rehma xwedê lê be (2015b: 112).

Xwedê umrê wî dirêj bike (2018b: 39).

Xwedê mirazê wî bîne cih (2018b: 39).

Xwedê merivan ji bêtarên giran star bike (2018b: 178).

Bila tava royê û germiya tîrêjên wê ji ser serê we kême nebe (2018a: 53).

Xwedayo, tu li gûnehê Tavbanê û Bengîne mêze bikî, ti wan ji siûda Siyabend û Xecê star bikî. Ew xort û evîndar in, gulên nûbişkovî ne, haya wan ji xirabî û kirêtiyan tune, wan nekî pariyê xirab û kirêtan (2018a: 60).

Xwedayo, vê nûra pak ku li ser rûyê keç û xortên me ye, ji ser me û welatê me kême meke (2018a: 104).

Xwedê star bike (2016b: 34).

Xwedêyo umrekî dirêj bide wî (Uzun, 2010: 222).

Yezdanê dilovan keçikê ji xewê vegerîne (2016c: 306).

Nifir jî her wekî diayan gotinên qalibî ne ku berevajî diayan bo nebaşî û xerabî were serê hin mirovan tîne gotin ku di wan de jî dawaz dîsa ji xwedê, pêxember û ewliyayan tê kirin. Me got qalibî bes mirov dikare di wê kêliyê de dia an jî nifirên derqalibî jî bike. lew ev her du cure jî tîkildarî rewşa mirovî ya wê kêliyê tîne bikaranîn. Hindek nifirên ku Mehmed Uzun di romanên xwe de bi kar tîne ev in:

Xwedê dû û dûmana ocaxa we bibire (2015a: 25).

Qafilqeda li wan bikeve (2015a: 48).

Xwedê bela xwe bide te qeder (2010: 168).

Malşewitiyo, tu bî, tu ji çavê din jî bibî, tu muhtacê garisê gilgîlî bî (2016c: 234).

Ava reş bi çavê te yê sax de jî were, pîsê heram (2016c: 237)!

Tu biçî, tu neyê malşewitiyo! Taya mirinê bi te keve (2016c: 466).

3.1.13.4. Dijûn

“Di jiyana rojane de çî ji ber bêhtengiya ji mirovan çî jî ji ber sedemên curbecur mirov hindek gotinên qalibî yê mistehcen bi kar tînin ku ji wan re bi kurdî, dijûn, sixêf û çêr tê gotin. dijûn yek ji cureyên edebiyata gelêrî tê hesab kirin” (Keskin,

2019: 314) û ji ber çendîn sedeman tên bi kar anîn. Dijûn di romanên Mehmed Uzun de cih digrin. Bi taybet di romanên *Tu û Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê* de em rastî wan tên ku bi pirranî ji hêla leşker û serbazên dewletê ve tên bi kar anîn.

Di romana *Tuyê* de dema leheng tê girtin, polîs û berpirsyarên qerekol û girtîgehê dijûnan ji wî û girtiyên din re didin. Uzun bi vê yekê bi awayekî ruyê hişk yê desthilata wê serdemê jî nîşanî xwîneran dide. Hindek dijûnên di tuyê derbas dibin ev in:

Vî segbavî pir wexta me girt (2015a: 57), ha ji we re segbavekî din (2015a: 85), zû, wan dêqehpan ji cemsê peya bikin (2015a: 180), lawê keran, kurê keran (2015a: 210).

Di *Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê* de rêjeya dijûnan zêdetir dibe. Bazê ku serbaz e gelekî dijûnan dide, piraniya dijûnên wî bo jina wî îu mader a dostika wî ye. Hindek dijûnên ku di vê romanê de derbas dibin ev in:

Ker, keça keran, ker, kurê kerê (2010: 94), jina qebraxa, qehb keça qehban, qehbika hemû bajêr, bênamûs (2010: 168), jina teresbav (2010: 173), dêqehb (2010: 174), teres, lawê teresan (2010: 188), segbav, seg, lawê segan, bênamûs, lawê bênamûsan (2010: 189).

Di *Hawara Dîcleyê* de hindek be jî dijûn hene ku ev dijûn zêdetir di rengên dijayetiya dînî de ne û zayendperest in her wekî dijûnên di romanên din de. Dijûnên ku di vê romanê de derbas dibin ev in:

Kafir, kurê kafiran, qaltax, qehpik, qehpikeke nastûr, pîrhevokeke cihû (2016c: 400-402).

3.1.13.5. Navnûçik/Leqeb

Her civak li gora çanda xwe û taybetmendiyên zimanê navên mirovan kurt dike an jî li gor taybetmendiyên mirovan yên ruhî û bedenî navan li wan dikin ku jê re navnûçik leqeb tê gotin. Di kurdî de jî awayê çêkirina navnûçikan bi awayê kurtkirina navan û li gor taybetmendiyên kesan yên ruhî û bedenî tê çêkirin.

Di romanên Mehmed Uzun de em rastî gelek navnûçikan tên ku ev di zimanê romanê de samimiyetekê çê dike û zimanê romanê jî nêzî zimanê rojane dike.

Di romana *Mirina Kalekî Rind* de em navê lehengê sereke nizanin lê vegêrê romanê bi navê Kalo behsa wî dike ku ji ber emrê wî yê mezin wî ev nav lê kiriye (2015b: 54). Di romana *Siya Evînê* de jî Memduh Selîm Beg navnûçikan li dê û bavê Ferîhayê dike. Ji ber simbelê bavê wê yê gurr, li ba xwe jê re dibêje monseieur simbel û ji ber girsî û meziniya diya wê jî, ji diya wê re dibêje gakuviya mader (2018b: 103).

Di romana *Bîra Qederê* de jî navê Celadet ji hêla dapîra wî Rûşen Xanimê ve weke Ceco tê kurt kirin (2016b: 35). Herwiha xoşewîsta Celadet, Canan jî jê re dibêje Ceco. Di heman romanê de navê Kamiran Alî Bedirxanê birayê Celadet jî weke Kamo tê kurtkirin.

Navnûçik û kurtkirina navan herî zêde di romana Uzun ya dawî, *Hawara Dicleyê* de derbas dibe. Vegêrê romanê dengbêj Biro hema bêje navê her kesî kurt dike an jî navnûçikan li wan dike. Biro navên biyanî jî li gor awayê kurtkirina navên kurmançî kurt dike û wan dişibîne navên kurmançî. Bo nimûne navê Ksenefonê ku nivîskarê pirûka *Vegera Dehhezaran* e weke Keso ku kurt dike (2016c: 749). Di romanê de navê şewirmendê mîr, Stephan Manolgiyan weke Mam Sefo, yê kurê wî Migirdîç weke Migo û yê keça wî Armenuhî jî weke Armê tê kurt kirin. Biro vê yekê bi hezkirina ehlê Cizîrê ya hezkirina kurtkirina navan rave dike (2016c: 48-49).

Di heman romanê de gelek navnûçik jî hene ku hin ji wan ev in. Navnûçikê Hemeyê, Fîstûj e. navnûçikê Kemaleddînê hevalê hemê jî, Kemaleddînê Circirok e (2016c: 164). Navnûçikê Migo jî weke hûro derbas dibe, ku ji ber qelewiya wî lê hatiye kirin.

3.1.13.6. Jimareyên Formel

Di çand û baweriyên her millîetî de hindek jimareyên formel hene ku bi awayekî di jiyana wan a rojane û afirandinên wan de cih digrin. Di edebiyata gelêrî ya kurdan de û di baweriyê wan de jî hindek jimareyên formel yên ku her tên dubarekirin heye. Jimareyên 3, 7, 9 hindek ji van in.

Em di her du romanên Mehmed Uzun, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê û Hawara Dicleyê* de ku bi taybetî pala we didin ser folklor û edebiyata gelêrî ya kurdan rastî ev jimareyên formel tên ku nivîskar bi taybetî û zanetî wan bi kar tîne.

3.13.6.1. Jimareya Sê

Jimareya sê di çand û folklorê kurdî de gelekî girîng e. Bo nimûne dengbêjên kurdan bi sê dangan kilamên xwe dixwînin. Dawetên kurdan sê roj û sê şevan dewam dike. Di çîrokên *Mîrze Mihemed* û hindek çîrokên din de sê kurên padîşah heye. Bo bidestxistina daxwaz an jî pêkanîna armancekê di çîrokan de leheng sê caran tên îmtîhan kirin û hwd.

Di romana *Mirina Kalekî Rind* de Serdar, sê hefteyan li gundê ku Kalo lê niştecih e, dimîne (2015b: 97). Di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, daweta Evdalê Zeynikê û gulê sê roj û sê şevan dewam dike (2018a: 34). Piştî korbûna Evdalê Zeynikê bi sê salan Tahar Xan wefat dike (2018a: 76). Evdal di cihekî vê romanê de ji mêvanên xwe re diyar dike ku li ba kurdan mêvandarî sê roj e û piştî sê rojan mêvan jî dibe xwediyê malê û gotina xwe dibêje (2018a: 111).

Di romana *Hawara Dicleyê* de dengbêj Biro, weke Parîsê mîtolojiya yunanî di navbera sê jinan, Armê, Gulîzerê û Esterê de dimîne û di dawiyê de esterê bo xwe hildibijêre (2016c: 120). Di heman romanê de biro kevîrê xwe yê tawîsê melek, sê caran radimûse û bi stûyê esterê ve dike (2016c: 621).

2.13.6.2. Jimareya Heft

Jimareya heftê jî di çand û folklorê kurdî de xwedî cihekî girîng e. Di strana *Memê û Eyşê* de Memê 7 salan leşkeriyê dike. Di destana *Siyabend û Xecê* de 7 birayên Xecê hene û hwd.

Uzun di romana *Hawara Dicleyê* de girîngiyêke taybet dide jimareya heftê. Vê yekê jî di pirtûka xwe ya bi navê *Küllerinden Doğan Dil ve Romanê* ya ku ji hevpeyvînên wî pêk hatiye wiha dibêje: min roman li ser heft şevbuhêrkan ava kir. Sedema vê yekê jî, ewe ku li gorî baweriyê êzdiyan xwedê dinyayê di heft rojan de diafirîne (2016d: 209).

Di romanê de jî dengbêj Biro sedema bi kar anîna jimareya heftê bi vî awayî rave dike:

Heft jimara miqedes e, ku me hemûyan li hev tîne, li axa Mezopotamyayê ku qulipiye ser axa xezebê ya kîn û nefretê, mîna îbrahîm pêxember ku navê min Biro jê tê, hemû dîn, îman, bawerî û însanan digihîne hevûdu. Li gora qewlê yêzidiyan Xwedavendê rehman dinya di heft rojan de, bi heft melean afirand. Di tewratê de jî weha ye; Xweda dinyayê di heft rojan de diafirîne. Dara heyatê xwedî heft şaxan û her şaxekê jî xwedî heft pelan e (2016c: 747).

Dengbêj Biro serpêhatiya xwe ji heft xortên ji netew û baweriyên cuda ne, vedigêre. Di romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, Evdal, destana *Siyabend û Xecê* di heft rojan de ji şagirtên xwe re vedigêre (2018a: 53). Di varyanta vê destana ku Evdal vedigêre, dema Siyabend di kendal de wer dibe, Xecê bo ku Siyabend xelas bike, werisê heft gundan tîne (2018a: 56). Evdal heft salan kor dimîne (2018a: 87). Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de nivîskar, livîne trêne dişibîne livîna şahmaraneke heft qat binê erdê (2010: 58). Dîsa di heman romanê de heft kes Baz û Kevokê dibin derveyî bajêr da ku wan bikûjin (2010: 20).

Ji bilî van hejmaran mirov rastî hindek hejmarên din ên formel tê ku ev in: Di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, piştî zewaca Evdal û Gulê bi neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqeyan Temo tê dinê (2018a: 37). Hêjayî gotinê ye ku ev formel bi vî awayî di destana *Memê Alan* de derbas dibe ku xuyaye Uzun ev ji wê wergirtiye. Romana Evdal piştî newrozê bi 40 rojî dest pê dike (2018a: 21). Di *Hawara Dicleyê* de, qesra Mîr Bedirxan, Birca Belek ji sê sed û heftê û pênc odeyan pêk tên. Kurê Mîr Bedirxan, Têlîyê ku hevalê Biro ye xwedî tizbiyeke nod û neh libî ye (2016c: 496).

Di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de dema ku Evdal mirina Taxar Xan dibihîze; -Axx felekê, xayinê axxx... te ev jî bi serê me de anî, dibêje û paşê çil şev û çil rojan qet naaxive (2018a: 77). Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de vegêr bo milletê welatê çiyê dibêje ku ew, ji heft, ji heftê û heft bavan û vir ve, ew xwediyê wan diyan bûn (2010: 32).

3.2. Hêmanên Çanda Civakî

3.2.1. Adet

Edebiyat xwe dispêre çanda zimanê ew milletê ku pê hatiye nivîsîn lewre di berhemên edebî yê milletekî de li gel taybetiyên zimanî û hêmanên din ên çandî, mirov rastî adetên wan ên ji milletên din cihê ne jî tê. Ev yek di romanên de zêdetir diyar dibe, romannûs dema çîroka xwe vedigêre pê re adet, bawerî û taybetmendiyên din ên wê civakê jî tevî berhema xwe dike. Ev yek him romanê dewlemend dike him jî bo naskirina wê civakê daneyan dide xwîner û lêkolîneran.

Di romanên Mehmed Uzun de jî, gelek adetên civaka kurdan cih digre. Di vê beşê de em ê cih bidin hindek adetên ku di romanên de derbas dibe.

Sunet: Di romana *Tuyê* de leheng behsa sinetkirina xwe û kirîvê xwe dike ku kirîvê wî piştî suneta wî weke diyarî karîkekê dide wî (2015a: 165).

Av Rijandina Li Pey Rêwiyan: Li ba kurdan adeta av rijandina li pey rêwiyan heye. Dema kesek diçe cihekî dûr, malîyên wî an jî hezkerên wî şerbîkek av li ser rê, li pey wî dirijîne ku ev tê wateya daxwaza bi saxî û selameti çûn û hatinê. Di romana *Tuyê* de dema polîs leheng ji malê dibin diya wî, tevî baraneke xurt dibare jî satilek av li pey wî dirijîne. Li gor leheng diya wî, dixwest ku kirêtî, jarî, ketin, û şerpezeyî jê dûr û rastî, spehîti, ronahî û qencî hevalên wî bin (2015a: 56).

Mêvanperwerî: Yek ji adetên ku di romanên Uzun derbas dibe, mêvanperwerî ye. Di romana *Mirina Kalekî Rind* de, dema peyv tê ser mêvanperweriyê gundiyek wiha dibêje:

Mêvanbûn, mêvan ezimandin, xwedan mêvanî ji bo me tiştên pir muhîm in. em gelek ehemiyet didin van tiştan. Tu dizanî... li ser vê yekê gelek stran û destanên me jî hene. Ew stran û destanên ku behsa mîr û serekeşîrên mêvanperwer dîkin. Mîr û serekeşîrên ku –ji bo ku mêvanên xwe nedin destê dijmin- xwe didin kuştin (2015b: 56).

Her girêdayî vê yekê, di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de dema ku bengîn û meyro ji ber egîd begê xwe diavêjin bextê êzîdiyên şengalê, ew bo ku

mêvanên xwe nedin dest, li dijî egîd beg şer dikan (2018a: 119-126). Di heman romanê de Evdal diyar dike ku li ba kurdan mêvandarî sê roj e û di nava sê rojan de ti pirs ji mêvanan nayê kirin (2018a: 111).

Kezî Kurrkirin: Adetek kevn ya kurdan e ku dema di malekê de hindê dimrin, jinên malê keziyên xwe kurr dikan û kincên reş li xwe dikan. Di *Hawara Dicleyê* de ji Rûşen Xanima jina Mîr Bedirxan, ji ber têkçûna serhildana Mîr Bedirxan, keziyên xwe kurr dike û kincên reş li xwe dike (2016c: 559).

Darê Şînê: Di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, Evdal bi minasebeta şîna Bengîn û Meyro behsa adeta darê şînê dike: “Li welatê me adet e, di destana *Memê Alan* de lê bûye, şîn bi darê şînê heye. Darê şînê dixemile û xelk li şînê rûdinê. Loma, de xwe bilezînine, dar jêbikine, bi rengên kesk, sor û zer û rengê reş bixemilînine” (2018a: 145).

Navlêkirin: Li ba kurdan adeteke wiha heye ku dema zarokek çê dibe, nas û xizmên malbata ku xwedê zarokek daye wan, xelatan bi zarokan vedikin. Ev xelat carna zêr in, carna jî kinc an jî ber û hwd. in. Di romana *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de dema kurekî Evdal çêdibe, meclîsa Tahar Xan zêr û xelatan bi lawik vedike û tahr xan weke mezînekî navê Temo lê dike (2018a: 39).

3.2.2. Reml

Reml an jî fal hêmaneke baweriyê ye û bi hin şêweyên xwe di nava civakê de cih digre. Mehmed Uzun di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de cih dide nimûneyeke remlê li nav gelê welatê çiyê:

Çi divê? Ew dîsan li hev rûdinin, bi hev dişêwirin, li hev guhdarî dikan. Remildarê wan remil davêje, “ez teyr û tûr û hehecîkên ku îsal zû hatine, dibînim” remildar dibêje, “kewroşkên avis dibînim, teyrên eylo li ser çiyayên bilind dibînim... Dinya di dîlanê de ye, ji ber giya, gul û kulîlkên rengîn, ji ber bêhnên xweş, دنیا har bûye. Evçend xweşî, evçend bedewî, evçend spehîtî... na, na, bextê me tu carî evçend çê, evçend rind nebûye... na, em divê bi tevdir bin” (2010: 44-45).

Şîroveya remildara wan rast derdikeve û piştî remlê bi çend mehan, bafîrok tên û çiyayên wan bombebaran dikan.

3.2.3. Mîmarî

Mehmed Uzun di romanên xwe teswîrên avahiyên jî dide xwendevanan. Qesr, xanî, keleh avahiyên sereke ne yên ku di romanên de derbas dibe. Uzun hinekan jî wan bi hurgilî teswîr dike, hinek jî wan jî tenê weke nav derbas dibin. Di romana *Tuyê de xaniyê* ku leheng bi malbata xwe re tê de dijî wiha bi dirêjahî tê teswîr kirin:

Mala we maleke kevnar, yadîgara bav û kalan, stariya eşîra we bû. Deriyê derva yê malê mezin bû, ji darê berûyê pihê çêbûbû. Deriyên din yên hundir, hemû ji darê gezûyê bûn. Dîwarên xaniyê we bi kevirên reş û bi heriya kakirî ve hatibû jenîn. Banê xênî ji heriyê bû. Di ser dîwaran re bi bihûstek an bi du bihûstan ji hev dûr, beştên spîndaran dirêj kiribûn û bi mirdiyaqan ve neqeba beştan dagirtibûn û bi qasî piyekî ax berdabûn ser (2015: 46-47).

Di romana *Mirina Kalekî Rind* de lehengê romanê Serdar, mala şivên wiha teswîr dike:

Xaniyê şivên ne tu xanî bû; dîwarên wî bi kevirên reş ên granîd hatibû lêkirin, lê belê, bi xeşîmî. Xanî wisan dixuya ku meriv digot qey, ew hildiweiya. Ban bi heriya kakirî ve hatibû dagirtin. Ev ban, banê herî basîd ê wê deverê bû; di ser dîwaran re bi çend bostan ji hev dûr, beştinên darên dirêj seranser dirêj kiribûn û bi nirdiyaqan ve navbera beştan dagirtibûn û bi qasî piyekî ax berdabûn ser (2015: 22).

Di romana sêyem, *Siya Evînê* de em dîsa rastî şayesandina xaniyekî tên:

Di nav xaniyekî yekçavî û tarî de peyvên germ û dilsoz. Xaniyekî bi kevirên reş lêbûyî. Xaniyekî sade. Na, ne sade, belengaz. Tê de doşegine pûştijî, bahlifîn li ser (2018: 144).

Di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, Evdal û xelk li çiyayê sîpanê li konan dimînin (2018: 51). Karwana ku şêx silê pê re ye “li xaneke bajêr bi cih dibe” (2018: 66). Tahar Xan xwedî qonax e (2018: 66). Di romanê de Evdal dibistanekê bo perwerdehiya dengbêjî û edebiyat û zimanê kurdî ava dike. Li kêleka wê jî bo ku şagird lê bimînin du xaniyan ava dike (2018: 81-82).

Avahiyên di romana *Bîra Qederê* de cih digrin zêdetir û cûdatir in ji yên romanên din. Lew roman li gelek bajar û mekanên cuda derbas dibe. Di romanê de

ewwilî em rastî qesrekê tîn li derdora wê xanî hene (2016: 18). Qonaxa Bedrî Paşa sê qatî ye û li gor mîmariya osmaniyên hatiye lêkirin (2016: 19). Li Büyükkadayê du havîngehên en malbata Bedirxaniyan hene (2016: 45). Celadet û hevalên xwe bo konferansekê diçin salona tiyatroyeke mezin (2016: 102). Celadet û Kamuran, tevî çar hevalên xwe li Otel Belvuyê şivê dixwin (2016: 105). Qedrî û Ekrem Cemîlpaşa û Celadet li maleke du qatî, li qatê jor, li oda mêvanan rûdinên (2016: 231). Piştî ku Celadet dikeve bîrê, wî dibin nexweşxaneyê (2016: 389).

Di romana *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirînê* de gelê welatê çiyê ji tîrsa leşkerên welatê mezin di şikeftan de bi cih dibin (2010: 38-39). “Xaniyên xirbe yên gund dixuyên” (2010: 131). Xaniyekê ku baz ketiyê ji du odeyan pêk tê (2010: 141). Bi qasî şêst nivîskar, siyasetmedar, parêzer, parlamenter, rojnameger û dîplomat, li balyozxaneyê bo şivê dicivin (2010: 150). Paşê nivîskar û çend kesên din diçin barê û der otelê re derbas dibin (2010: 150-151). Baz û zabîte simbelqît hevdu li kafeteryayekê dibînin (2010: 186). Kevok û Baz cara ewil hev du li garnîzonê, li jêzemîna ku cihê zindan û şîşkencexaneyê ye, dibînin (2010: 260). Di vê romanê de trêna û çiya ji weke mekanên ku hin bûyer lê derbas dibin xuya dibin. Lew şer li çiya diqewime û Baz û Kevok bi trênan direvin. Herwiha Baz cara ewil di trêna ku gelê welatê çiyê bar dike, dest bi karê xwe dike.

Romana *Hawara Dicleyê* weke romanên din en dawî, ji hêla mekan û mîmariyê ve dewlemend e. Mala Apê Xelef ji sê odeyan û axûrek dirêj ya li kêleka malê pêk tê (2016: 40). Mala Mam Sefo ya ku li ber devê çemê dicleyê ye, ji malekê zêdetir dişibe qesrekê û ji gelek ode, mitbax, pirtûkxane, meclîs, şaneşîn û hwd. pêk tê ku Biro wê dişibîne qesrekê ji qesrên Harun Reşîd (2016: 48). Birca Belek a ku qesra Mîr Bedirxan e, ji bilî zindan, xan û mizgeftê ji 360 odeyan pêk tê (2016:69-70). Di gera xwe ya bexdayê de Biro diçe perestgeha êzdiyan û xanên ku li her bajarî hene. Li cihekî romanê Biro wiha behsa xanekê dike:

Xana El Ortman ku me dotira rojê, bi ronahiya çavan bedewî û xweşiyên wê dîtî, ez dikarim bibêjim, tevî jûrên razanê, banê spehî, aşxana fireh, mêvanxana bi kursiyên nizm ku bi benê kendirê ristî raxistî bûn, dîwana bi sedir û doşegên neqîşandî lihevhatî, hewşa fireh a çarkoşe, eywana bilind û axurê bêser û ber, xana herî xweş, baş û kevn a hemû Mezopotamyayê bû (2016: 202-203).

Medrese, dêr, xan, seray, qesr, zindan, heps, pirtûkxane avahiyên sereke ne di vê romanê de. Ji bilî van mekanan di vê romanê û di romanên din ên Uzun de em rastî gelek mekanan tên ku, Uzun carna bi dirêjahî teswîra wan dike û wan dide nasîn, carna jî bi tenê navê wan dibêje û dihêle.

3.2.4. Cil û Berg

Di romên Mehmed Uzun de em rastî cil û bergên ku mirov di jiyana rojane û rojên taybet de li xwe dikin tên. Hin ji wan cil û bergan yên kevneşopî ne, hin ji wan jî yên serdema modern in. Cil û bergên ku di romanên de derbas dibin ev in:

Wê jî hiriya xwe bi teşiyê dirêsand û paşê jî bi şîşikan dest bi hûnandina gore, lepik û cilan dikir. (...) Belê, belê laçekên wê her bi neqş bûn. (...) Xeftanên wê jî her rengîn bûn (Uzun, 2015:62).

Tiştên ku lê bûn gelekî basîd bûn; kirasekî spî û dirêj û şal û şepikekî fireh (Uzun, 2015:32).

Ew paltoyê xwe ji xwe dike û davê ser keçikê (Uzun, 2018: 30).

Vekirina pakêtê. Tê de kinc. Reş û xêzkirî. Çakêt, pantolon û êleg. (...). Du gomlegên spî û çar qirawatên hevrişîmî. (...) Tê de cotek pêlav. Cotek pêlavên çermîn û reş. Pêlav dibiriqin (Uzun, 2018: 75).

Li serê kiras û şalên dirêj û spî hebûn (Uzun, 2018: 23).

Herçî êzîdî ne,

Cilspî ne

Hemû cenetî ne

Belê, cil, kinc û libasên wan spî bûn û e nîşana paqijî û rindiya wan bû (Uzun, 2018: 120).

Kincekî nû û reş, bi gotina fransîzan kostumek ku diyar e, ji destê terziyên yekta derketiye, lê ye. Qirawateke xweş a hewrişîmî û bi nixtik, mîna her gavî kincsn

û gomlega spî xweş li hev tîne. Yêlegê wî ku perçeyekî ji kincan e, bi şeş qumçikan e û qumçik hemû, heta sîngê, girtî ne (Uzun, 2016: 13).

Kincên ku wan li xwe kirine, nû ne û ji kincên siwar, rêwî, nêçîrvan û seyidvanên îngilizan in. Çakêtên herduyan jî, ji navtengê, bi kemerekê hatine şidandin. Pantolon ji jor fireh, ber bi delingan teng in (Uzun, 2016: 133).

Kincên ku li ser wan in, kincên heyama Xoybûnê ne; kincên çekdaran. Li ser milê Qedrî Beg çaketek heye. Wî çaket li xwe nekiriye, lê avêtiye ser milên xwe. Celadet û Ekrem Beg bi tena qutik in. (...) Kincên her du pismaman, Qedrî û Ekrem Began, bi şal û şepikan dişibin. Şal û şepikên ku di lec, pêvçûn û şeran de kincên herî baş in. Qutikên wan jî, ji qutikê bêtir bi kiras dişibin û heta qirikê, bi qumçikan girtî ne. (...) lê yên Qedrî û Ekrem Began bi kolozek û şarekê li dor pêçayî girtî ne (Uzun, 2016: 218).

Em cil û bergên Baz ên şevê bînin bîra xwe; şalekî fireh û delingteng, kirasekî pîdirêj û fireh, şepikekî fireh, goreyên rîs û coteke pêlavên qehîm ên ji bo kevir û kepiran. Yanî cil û bergên belengazên Welatê Çiyan (Uzun, 2010: 191).

Li ser Maderê kirasekî tenik ê şevê heye (Uzun, 2010: 319).

Fîstanekî dirêj û rengîn ê keten li Kevokê ye. Di lingên wê de jî cotek pêlavên sivik ên sporê hene (Uzun, 2010: 347).

Sê serekên cihuyan bi kumên xwe yên biçûk û reş ên û bi rîhên xwe yên gelekî dirêj; şêxên êzidiyan bi libasên xwe yê spî û por, rîh û simbelên xwe yên dirên ên nûranî; şêxên ereban bi galabî û egalên xwe yên rengîn (Uzun, 2016: 72).

Sê texlîd şal û şepikên min hebûn; ji Cizîra Botan, welatê Hekaran û welatê Behdînan ku ne bi hiriya binşe, lê bi hiriya serbist binefşî, semayî û xezalî bûn (Uzun, 2016: 351).

Hemeyê ku ji cil û bergên nû û rengîn hez dikirin, niha di nav kirasekî spî û dirêj ê yêzidiyan de bû; ne şal û şepikên rengîn mabûn, ne jî pişt, koloz û kirasên risandî û hevrişîmî. Li ser serê wî kumekî basîd ê reş, tevî destmalekî reş ku li dora kum hatibû piçikandin, hebû, kirasê wî yê dirêj û spî ku heta sîngê vekirîbû, bi

qemberbesteke sor ku li pişta wî bû, hatibû birîn û cibeyekî riziwayî yê reş jî li ser milên wî bû (Uzun, 2016: 667-668).

Weke ku xuya dibe cil û bergên di romanên Uzun de cih digrin heta radeyekê rengîn in. Kes û komên ku di romanên de derbas dibin girêdayî, çand, bawerî û perwerdehiya xwe cilan li xwe dikin. Herwiha diyar dibe ku Uzun di warê behskirina cil û bergan de zêdetir girîngiya xwe dide mêran ku ev yek hinekî ji ber zêdebûna lehengên mêran e. Li hêleke din, di romanên wî yên destpêkê de taswîr û danasînên cil û bergan pir kêr e lê di her sê romanên dawî de Uzun zêdetir bala xwe dide wan.

3.2.5. Amûrên Muzîkê

Muzîk şaxeke girîng ya hunerê ye û çanda her neteweyî de xwedî cihek taybet digre. Lew muzîk awayekî xweifadekirinê ya mirovan e ku xîtabî ruhê wan dike. Di romanên Mehmed Uzun de cihekî taybet yê muzîkê heye, dengbêjên ku di romanên de cih digrin berî her tiştî muzîkjen in û berhemên wan li gel ku di nava edebiyata gelêrî de tên hesab, herwiha ew beşeke muzîka kurdan in jî. Di muzîka kurdî de amûrên muzîkê yên weke bilûr, saz û erbane û hwd. di romanên Mehmed Uzun de derbas dibin.

3.2.5.1. Bilûr

“Yek ji amûrên herî kevin ên muzîka mezopotamya û cîhanê ye ya di muzîka kurdan de jî ciheke wê ya girîng heye. Bêhtir ji darên req tê çêkirin û di civaka kurdan de herî zêde wek enstrumana şivanan tê zanîn” (Aslan, 2019: 24).

Mehmed Uzun di romanên xwe de girîngiyeke taybet dide bilûrê û di gelek romanên xwe de behsa wê dike bi awayekî. Gelek caran Uzun, bilûrê di peywenda şevbûhêrkan de bi bîr tîne ku ji hêla dengbêj û hunermendên pispor ve tê jenandin.

Di romana *Tuyê* de lehengê romanê behsa zarokatiya xwe ya bi dengê bilûra bavê wî û kalkê wî derbas bûye dike. Herwiha diyar dike ku bavê baş li bilûrê dixist:

Di aliyekî dîwarê odê de du bilûr, di aliyekî de jî du tîfîngên nêçîrê çepast daxistî bûn. Bilûrên bavê min ji dûr ve dibiriqî. Bavê min ew wekî çavên xwe diparastin, wekî me, li wan dinihêrî. Bilûr, yek ji kalikê wî û yek jî, ji kalikê min jê re mabûn. Her meh ew rûdinişt bi saetan bilûrên xwe paqij dikirin, bi behîvan

dibiriqandin. Nayê bîra min ku bilûr ji kîjan daran bûn u çend qul li serê hebûn. Lê ew pîr spehî bûn. Rengê wan, rengê qahweyî bûn. Destên bavê min bi hunermendî li ser qulên bilûrê direqisîn (2015a: 67).

Bavê leheng bi jenandina bilûrê re destana Memê Alan ji kurê xwe re vedigêre.

Di romana *Mirina Kalekî Rind* de, Kalê Rind bilûrvan e û gelek zanînên wî li ser bilûran hene. Kalê rind hezkirina xwe ya bo bilûrê wiha diyar dike: “Ez jî kêfa xwe ji blûra xwe re tînim û dixwazim her pişt a wê mist bidim. Ez dixwazim tevî bilûra xwe vegerim wan wext, dewr û dewranên ku êdî li pey me mane” (2015b: 37-389. Kalê Rind di derbarê bilûran de jî agahiyan dide, herwiha di romanê de behsa stranek bi navê dengê bilûrê jî derbas dibe ku Kalo dibêje li derdora qerejdax û botanê navdar e (2015b: 60-61).

Di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de, Evdal di xewna xwe de dibîne ku li dîwanê, li gel diya xwe Zeynê, Tahar Xan, Gulê, bavê Bengîn û gelek dengbêj û stranbêjên din, dixwazin ku Evdal bo wan bistrê. Şêx Silê jî li wira ye û li bilûrê dixê da ku Evdal strana xwe bistrê (2018a: 80-81).

Di *Bîra Qederê* de Dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî destana *Memê Alan* him bi bilûrê lê dixê û him jî carê navberê dide û distrê. Celadet Alî Bedirxan jî bi îlhama dengê bilûrê helbestekê li ser bilûrê dinivîsîne:

Mîrê derketî, gerînendeyê kovara Hawar'ê, guhê wî li ser dengê nerm ê bilûrê, pênûs di destan de, li ser kaxizê spî dinivîse; Bilûra min a şîrîn / Tu di sariya sibehê / Û di hingûra êvarê de/ Hevalê bêhevalan, / Destbirayê şivan û dilketiyan î. / Dengê te, / Hêstirên dilên xemgîran (2016b: 273-274).

Di *Hawara Dîcleyê* de bi minasebeta roje ku mîr bedirxan tê ser textê mîrektiya cizîra botanê, bilûrvanên ku ji şal û şapikên wan diyar e ku ji herêmên cuda yên mîrektiye ne, tevî bilûrêb xwe tên qesra mîr. Apê Xelef jî bi dengê bilûrê stranekê li ser Mîr Bedirxan distirê (2016c: 71).

3.2.5.2. Erbane

Amûreke muzîkê ye ku bi taybetî di nava terîqetan de berbelav e. Mehmet Emin Aslan di derbarê erbaneyê de van agahiyê li jêr dide:

Erbane, amûreke aîdê Mezopotamyayê ye û li seranserê Kurdistanê çî di ayîn û zîkrên dînî de çî di muzîka gelêrî de û çî li kêleka dengbêjan dikare were dîtin. Du cure erbane hene. Di herduyan de jî çerm li ser tareke darî tê vekêşan û girêdan lê cudahiya wan ew e ya di yekê de zingil bi tarê ve tê kirin û di yekê de jî xişxişkên gilover ên zincîrê bi tarê ve têne kirin (2019: 25).

Wekî ku Aslan jî diyar dike erbane, amûreke muzîkê ye ku di ayîn û zîkrên dînî de tê bi kar anîn. Di romana *Hawara Dîcleyê* de jî, Mehmed Uzun dema behsa êzîdiyan dike balê dikşîne ser erbaneyê ku di jiyana wan de û di muzîka wan de cihekî girîng yê bilûr û erbaneyê heye: bilûr û erbana sade, li heyata wan a sade û li gotina wan a sade dihat (2016c: 180-181).

Ji bilî van her du amûrên sereke, amûrên muzîkê yên weke def, tembûr û keman jî bi awayekî di romanên de derbas dibin. Bo nimûne di romana *Siya Evînê* de Ferîha, li kemanê dixê, Memduh Selîm Beg gelekî ji dengê kemanê hez dike û di derbarê kemanê de xwedî gelek agahiyan e (2018b: 45-47).

3.2.6. Zewac

Zewac di gelek çandan de xwedî cihekî girîng e û di vegêranên edebî de jî em rastî wê tên. Di romanên Mehmed Uzun de zewac bi kêmî be jî derbas dibe. Lehengên romanên Uzun gelek caran bi kesên ji netewe û baweriyên cuda re dizewicin. Bi vê hêla xwe ve romanên Uzun balê dikşîne ser têkiliyên di navbera çand, ol û neteweyên cuda.

Di romana *Siya Evînê* de Memduh Selîm Beg bi keçeke çerkez, Ferîhayê re destgirtî dibe (2018: 53). Bes ev yek ji ber karên siyasî yên Memduh Selîm Beg naçe serî û paşê Ferîha bi yekî ereb ê Urdînê re dizewice (2018: 175-176). Memduh Selîm Beg di dawîya emrê xwe de bi jineke çerkez a bi navê Wîldan re dizewice. Di romanê de behsa merasim û awayê zewacê derbas nabe (2018: 212).

Di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de begê xamûrê Evdal vedixwîne daweta kurê xwe. Evdal li wira Gulê di govendê dibîne û dil dikevê. Ligel ku Gulê xirîstiyane û bi destgirtî ye jî Evdal dev jê naqere û di dawiya dawî da wê û malbata wê bo zewacê qanih dike. Daweta wan sê roj, sê şevan dewam dike (2018: 30-34).

Di heman romanê de Evdal û Gulê, zarheliyên xwe Meyro û Bengî jî dikin destgirtî ku Meyro jî weke Gulê xirîstiyane û ermen e û Bengîn, kurd û misliman e:

Bi vî awayî Evdal û Gulê, Bengîn û Meyro kirin destgirtî û kincên nû li wan kirin û ji çavên wan maç kirin. Şeveke xweş a havînê, ew li meydana gund civiyan û şêrînahiya Bengîn û Meyro xwarin. Gelek heval û dostên Evdal jî hatibûn. Wan û sagirtên Evdal het sibê stran gotin, govend girtin û qesta felekê kirin (2018: 105-106).

Di romana *Bîra Qederê* de Celadet Ali Bedirxan bi dotmama xwe Rûşen Xanimê re dizewice (2016: 289). Bes daweteke kevneşopî ji wan re nayê kirin.

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de Baz bi keça keça zabîte ku ew xwedî kiriye re dizewice. Zewaca wan li saloneke taybet, ligel orkestrayeke mezin û adetên dawetên modern e (2010: 88-89).

Di Hawara Dicleyê de Dengbêj Biro bi Estera ku keldan e bi alîkariya keşeyekî xirîstiyane û melayekî misilman li qesra Cemîlpaşazadeyan dizewice (2016: 484-485). Herwiha di vê romanê de Mîr Bedirxan jî bi Rûşen xanima êzîdî re dizewice.

Uzun di romanên xwe bêtir ku amadekarî û adetên pêvajoya zewacê bike cih dide zewacê. Lehengên Uzun bi pirranî bi kesên ji çand, ol û neteweyên cuda re dizewicin.

3.2.7. Cejn

Di romanên Mehmed Uzun de du cejn, cejna newrozê û cejna şêşims ya êzîdiyan derbas dibe. Newroz di romanên de weke cejneke neteweyî derbas dibe. Di romana *Tuyê* de em dibînin ku newroz qedexeyê lê belê dîsa jî tê pîrozkirin:

We cejnên xwe yên netewî nedikaribû pîroz bikira. Ew qedexeyê bûn. Lê dîsa jî di her 21'ê adarê de agirê Kawayê hesinker li ser bircên keleha we geş dibû. Di gel ferman, qedexeyê û parastina yekîtiyê û tevahiya komara serbilind, dîsan jî agirên Newrozê li ser bajarê we diçûrûsîn (2015a: 20).

Di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de jî newroz derbas dibe. Hevoka ewwîl ya romanê bi vî awayê balê dikşîne ser newrozê: “Wê rojê her tiştî bi misteke ronahî û bi dengekî zelal dest pê kir. Roj, rojekê ji rojên Xwedê bû û ji ser Newroza biharê, 21’ê adarê, 40 roj derbas bibû” (2018a: 21). Du sê rupel piştî vê destpêkê em hîn dibin ku Evdal, di roja “Newroza şêrîn” de berê xwe dide çiyayê sîpanê xelatê û demeke dirêj li wira dimîne (2018a: 24).

Uzun di *Hawara Dîcleyê* de zêdetir li ser newrozê disekine û çalakiyên newrozê zêdetir teswîr dike. Mîr Bedirxan, di roja newrozê de dibe mîr. Biro wiha behsa newrozê dike:

Herkesî, bi rûyekî ken hevûdu pîroz dikir, mezin diçûn rûyê hev, zarok diçûn destê mezinan, kal û pîr diçûn eniya zarokan. Herçî dildarên ku nû bi taya evînê ketibûn, diyar e, nikaribûn herin rûyê hev, lê wan jî, di wê roja Newrozê de ku herwiha roja evîndaran bû, ji ber derî û penceran, eywan, û hewşan, bi livîna lêvan, kenê rûyan, nêrîna çavan û xeyalên bi heyecan hevûdu hembêz dikirin. Dua dihatin xwendin, xaç derdiketin, stran dihatin gotin (2016a: 65).

Biro piştî teswîrên newrozê, gotinê tîne ser Ehmedê Xanî û ji *Mem û Zîna* wî du malikên newrozê neqil dike:

Roja ku dibûye îd û newroz,
Tazîmê ji bo dema dilefroz,
Sehra û çîmen dikirine mesken,
Beyda û dûmen dikirine gulşen (2016a: 65).

Uzun di dereke din a ya vê romanê de, piştî gelek salan, dîsa behsa newrozê dike. Mam Sefo, ji Biro re dibêje ku piştî çend rojên din newroz e û dixwaze ku Biro tevî şîva li Birca Belekê ku li gel giregirên welêt tê xwarin bibe û herwiha tevî şevbûherka dengbêjan bibe. Dengbêj Biro diyar dike ku bi minasebeta newrozê, li cizîra botan sê roj û sê şevan millet, dixwîn, vedixwîn û kêf dikin. Li hêleke din bo xatirê vê rojê zarokên misilmanan tîne sinet kirin, dawet û dîlan li dar dikevin (2016a: 268).

Cejneke din a ya ku di *Hawara Dicleyê* de derbas dibe jî cejna şêşims e, cejneke olî ya êzîdiyan e. Biroyê ku pêşiyên wî êzdî bûn dema diçe laleşê ziyaret dike, êzîdîtiyê baştir nas dike. Biro demeke dirêj li laleşê, li ba êzdiyan dimîne û wiha behsa cejna Şêşims û qewlê Şêşims dike: rojî û cejna êzdiyan li dar bû û wan ê di dilê dînê êzidiyan de cejna xwe pîroz bikira. Hema çi bigire hemûyan qewlê ku xortan ji bo min gotibûn, digotin û ber bi kûrahiyê çiyê diçûn;

Ji derencê heta derincê,

Şêşims e xwidanê ferecê

Dest û damanê Şêşims radimîsim dewsa kabê, ciyê hecê... (2016a: 176-177)

3.2.8. Navên Stêrkan

Mehmed Uzun di romanên xwe navên komên stêrkan bi awayê ku di gel de tên bikaranîn, bi kar tîne. Ji bilî romana *Siya Evînê*, ti fonksiyona stêrkan nîne û bi tenê weke nav derbas dibin. Di *Siya Evînê* de stêrk wiha derbas dibin:

Asman hê jî tijî stêrk in. Stêrka Kerwankujê, ji rojhilatê, li Memduh Selîm Beg dinihêre. Stêrkên Leyl û Mecnûn, yek ji rojava, ya din li rojhilatê, li Memduh Selîm Beg dinihêrin. Ew jî liwan dinihêre û dikene. Kenekî kin û kurt. Di kenê kurt de xem û keser dixuyê. “Ma Leyl û Mecnûn, ma ev stêrkên ku bi rengê zêrîn dibiriqin, dê tu carî negihên hevûdu?” Ew li stêrkan dinihêre û difikire (2018: 26-27).

Li gor baweriya kurdan, Leyla û Mecnûn piştî ku li dinyayê nagihêjin hev û dimrin, her yek dibe stêrkek û bi şev li ezmên xuya dibin. Ev her du stêrk di romanê de bi awayekî ku bêsiûdiya evîndaran bînin bîra mirov derbas dibin û bi evîna Memduh Selîm Begê û Ferîhayê re jî eleqedar in lew ew jî nagihêjin hev. Di cihekî romanê de Memdûh Selîm, Kemal Fevzîyî dişibîne stêrkekê: “Wekî stêrka Kerwankuj ronî, wekî ava Firatê zelal û xurt (2018: 109).”

Di cihekî din ê romanê de Uzun navên stêrka Leyla û Mecnûnê bi awayê ku me li jor behs kir, bi kar tîne:

Stêrk dilîzin. Tirmê Mexilan, ew heft stêrkên mezin û ronî asman dineqîşînin. Stêrka Qurux li bilindahiyên Agiriyê mezin dibişire. Û Leyl û Mecnûn, ew herdu stêrkên stûxwar jî li hev dinihêrin. Yek li rojhilat, ya din li rojava.

Cembeliyê Hekarî û Binevşa Narîn. Leyl û Mecnûn...

“Xwedêyo. Çima ev eziyet? Ma ev stêrên stûxwar ê tu carê negihên hevûdu (2018:160)?”

Di romana *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de tenê di cihekî de stêrkek derbas dibe: “Stêrik hê neçûbûn va. Stêrka sibê Gelawêj diçirûsî (2018: 21).” Di *Bîra Qederê* de Celadet, Şehrîbanê dişibîne stêrka Gelawêj û stêrka Kerwankujê (2016: 97). Di heman romanê de ev stêrk wiha derbas dibin: “Stêrkên Kerwankuj û Qurux hê neçûna ava, ji pencerê, hê roniya wan dixuyê (2016: 253).”

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de, li welatê çiyê, Baz, beriya ku dekeve operasyonê bi şev, li ezmanê sayî dinihêre û van stêrkan dibîne:

Baz serê xwe radike û li esmên dinihêre. Stêr, komên stêran li wir, mîna neqşên xaliçeyêke bi destan risandî, hilawestî ne. Kerwankuj diçirise, Leyl û Mejnûn, ji hevdû gelekî dûr, li hevdu dinihêrin. Gelawêj, sereka stêran, rêbera şivan, gavan, nêçîrvan, rêwindayî, keleş û mêrkujan, bi şewqeke zêrîn, rawestayê. Komika Sêwiyan li milê rojhilatê xwe dilivînin. Dîwana Eshaban ku li gora hejmartina Baz diwanzdeh stêr in, hêdî hêdî, ji rojhilatê ber bi rojava ve derin (2010: 1349).

Di romana *Hawara Dîcleyê* de dengbêj Biro, stêrkan tevî nav û hinek taybetmendiyan wan wiha dide:

Komika Sêwiyan ku mîna siwarên şevê ji rojhilatê hiltên, Tirmê Mexilan, ev heft stêrên xweşik ku bi hev re neqşeke zêrîn di sînga asimên de dihûnin, Leyl û Mecnûn ku hertim yek li rojhilatê, ya din li rojavayê diçirûsin, Çerx û Felek ku di gewriya asimên de rêzeke gewger tînin pê, Dûpişk ku bi dûpişkan dişibe û hertim li rojhilatê ye, Pîr û Mizên ku mîna tavê ji rojhilatê serî hildidin û li rojavayê dihelin, Kerwankuj ku piştî nivê şevan dixurice û Qurux ku di destê sibehan de li rojhilatê diyar dibe, ev stêr hemû (...) (2016: 80).

Di cihekî din ê romanê Biro xeyalên mirovan dişibîne stêrka Gelawêjê (2016: 163).

3.2.9. Xwarin

Di romanên Mehmed Uzun de gelek navên gelek xwarinan jî derbas dibin. Uzun gelek caran navê xwarinan dide û kêman caran jî behsa tiştên ku dikevin wê xwarinê dike. Em ê li vira cih bidin hindekan ji wan:

“Savar, nokên xaşandî” (2015a: 132), “cacix” (2018b: 27). “Wî kerem kir ev xwarinên ser masê hazir kirin. Mesela ev meze, xwarineke navdar a ermenan e. navê wê topik e. ew ji noka çêdibe û jê re hostetî û wext divê. Bi kêmanî sê roj” (2018b: 131).

Ji danê sibê ve ye ku Amojna Sitî li mitbaxê rûniştiye û xwarinan hazir dike. xwarinên vê êvarê, yên wê ne; sê celeb kutilk, kutilkê mêlakê, yê bi dew û yê bi kulindê zer. Du celeb xwarinên bi goşt; singûsîr, merga mêlakê. Du celeb savar; savara tûzikê û ya kerengan. Du celeb jî şînahî; birinêşîr û tîllok (2016b: 60).

Di romana *Bîra Qederê* de carna nivîskar bo xwarinên kurdan, peyva xwarinên welêt bi kar tîne:

Amojna Sitî ku êdî bi zehmetî digere, heta bi zehmetî xwe dilivîne, ji bo law û neviyên xwe, vê êvarê, nanê tîrê pijandiye û xwarinên welêt yên Cizîra Botanê, çêkirine. Bîhneke ecêb xweş ji xwarinên singûsîr, pelezîz, eprax û epraxê sîran difûre.

-Epraxê sîran bidin pîran. Epraxê birincan bidin law û gencan (2016b: 90). Di vê romanê de em rastî navên hindek xwarinên tirkî jî tên:

Pêşî ji wan re zeytinyağlı kereviz dolması hat, paşê karîdes güveç. Niha jî ew di nav tebaxên zîvhêlî de şîva êvarê Teşrîfat-i Naim Efendi siğir külbastisi kağıtta tevî çiroz salata dixwin. Ya Celadet, şîrinahiyeke kevn a osmanî fistikli hünkar muhallebîsî, kuru kayisiezmesiyle, di nav teyîfîkeke neqîşkirî de, li hêviya wî ye (2016b: 105-108).

Di romanê de bo Celadet şîvên bav û kalan tê çêkirin: “Kutilkên mêlakê, savara kerengê, kipe, helise, metfinî” (2016b: 224-225).

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de gundî van xwarinan ji Baz re tînin: “Nanê sêlê, penêr, goştê qelî, hindek sebze” (2010: 127). “Şervan jî nan û şorbeya bi îsot dixwin” (2010: 232).

Di romana *Hawara Dîcleyê* de jî navên gelek warinan derbas dibin: “Me firavîna xwe ya dereng ku ji tîkegoşt, savar û mehîrê hatibû pê” (2016c: 177). “Taştê hazir bû, çend celeb penêr, şîr, mast, nanê germ ê sêlê, hêk, to, nivîşk, çend celeb sebzeyên teze. Mam Sefo gote min kurê min, eve penêrê pûngê ji deverê Hekaran e, eve penêrê sîrik ji deverên Wanê ye, bixwe” (2016c: 226). Ester, ji xwarinan herî zêde ji gulûla welatê Hekaran hez dike (2016c: 382). Di dereke din ya romanê de Uzun diyar dike ku gulûla Hekaran, ji rîz, mast û rûnê nivîşk çê dibe (2016c: 398). Eskerên osmanî şêrînahiyên weke xoşaf û helawê dixwin (2016c: 547).

3.2.10. Ajal

Hema bêje di hemû romanên Mehmed Uzun de ajal cih digrin. Di hindek cihan de Uzun bi dirêjahî behsa wan dike, di hindek cihan de jî hema tenê navê wan rêz dike. Hindek ajalên ku di romana de derbas dibin kedî kirî ne, hindek jî kovî ne. Herwiha hindek ajal taybet in bo hin lehengên romanên lewre xwediyê wan navên taybet li wan dikan.

Di romana *Tuyê* de lehengek ajal heye; kêzaxatûn, tevî ku lehengeke çîrokekê ye lê dîsa jî di romanê de cih digre, wekî ji navê wê diyar e, kêzik e. Ajalên ku di vê romanê de derbas dibin ev in: Hesp, ker, bergîr, qantir (2015a: 15), dîkên bajêr (2015a:41), berx, kahrik, bilbil, hesp, kewa gozel (2015a: 99).

Di *Tuyê* de lehengê bi navê Apo, çîrokeke Mîr Miheme ji lehengê romanê re vedigêre, li gor çîrokê, rojekê di nêçîrê de du kahrikan digrin û ji mîr re tînin, mîr navê yekê dike Efnî û navê yê din jî dike Hajale (2015a: 142). Leheng di cihekî romanê de, dema behsa bîranînên xwe dike navê gelek masiyên çemê firatê jî dijmêre:

Zarokên din jî masî di nav xwe de parve dikirin. Mîna van masiyên ku niha tên bîra min; cewr, ferxewr, şebot, mak, marmasî, naqor, sêlexwer, heşînok, devhesp, birek, hefrî, kavcal, kurkirik, meretest, cobir jî dibûn hevalên zarokên din. Carina dema zarok ji hevalên xwe hêrs dibûn, hingê beq û req jî ji xwe re heval hildibijartin (2015a:

172). Kirivê leheng, karikekê diyarî wî dike ku leheng navê wê dike Bênav (2015a: 173). Mîh, bizin, berx, beran, nêrî çend ajalên din in ku di romanê de derbas dibin.

Di *Mirina Kalekî Rind* de ajalên wekî masî, ker, seg, mirîşk, pez, hehecîk, pisîk û çivîk derbas dibin. Di *Siya Evînê* de ajalên wekî kew, kevok, teyrê baz, pisîk û masî derbas dibin. Herwiha, Memdûh Selîm Beg, Ferîhayê, dişibîne xezalan û gelek caran bi navê Xezalê behsa wê dike (Uzun, 2018b: 49).

Di *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* de em rastî hindek ajalan tên ku di romanê de û di vegêranên di nava romanê de xwedî fonksiyon in û bi hebûna wan vegêran şax didin, aksiyona wan zêde dibe. Bo nimûne di destana siyabend û xecê ya ku Evdalê Zeynikê vedigêre de, siyabend hewl dide pezkûviyekî nêrî bikuje, çima ku xecê ew şibandiye siyabend. Siyabend, pezkovî birîndar dike, tam dike ku li ser kendê serê wî jê ke, pezkovî bi qiloçê xwe poşekê li siyabend dixê û wî ji kendal wer dike ku paşê xecê dibîne ku nikare Siyabend xelas bike, ew jî xwe davêje û her du dimrin. Bi vî awayî ajal dikeve nava vegêrê û berê wê vediguherîne trajediyekê ku dibe mijara destan û stranan (2018a: 54-58).

Di heman romanê de ajalek din jî heye ku ne tenê wek ajaleke jî rêzê lê belê weke lehengekê xuya dibe heye: Quling. Quling, bi awayekî brîndar, baskşikestî ji hêla kurê Evdal, Temo ve tê dîtin, temo wê tîne malê. Evdal û Gulê wî xwedî dikin û li ba xwe dihêlin ku paşê quling dibe hevalê Evdal, lew Evdal kor e û quling baskşikestî ye, vê yekê kiriye ku her du jî ji hevalên xwe bimînin. Hatina qulingê hêzê dide Evdal da ku jinûve li ser stranên xwe bixebite û li dengbêjiyê vebe. Herwiha Evdal stran/klameke bi vî rengî jî davêje ser qulingê:

Herdu baskên şikestîno,
Baskên xwe bi çavên min ve bicebirîno,
Şalûl û bilbil li halê me dixwîno... (2018a: 44-46).

Qedera Evdal û qulingê ewqasî bi hev ve tê girêdan ku başbûna wan ji korbûn û nefirînê ve bi hev re çê dibe. Rojekê li serê sîpanê, ewwilî çavê Evdal vedibe, ronahiyê dibîne, piştî wê di demeke kurt de jî baskên qulingê baş dibin û dest bi firîn

û xwendina xwe dike (2018a: 148). Ajalên din ên di vê romanê de derbas dibin ev in: teyron elo, baz, hesp, kew û xezal.

Di romana *Bîra Qederê* de du tajiyan Celadet Alî Bedirxanê lehengê romanê, bi navê Şengê û Bêlenê heye ku ji bo nêçîrê ne û kurdên Çiyayên Kurmênc ew diyarî wî kirine (2016b: 303-304). Ji bilî van jî navên gelek ajalan derbas dibe ku nivîslkar tenê navê wan rêz dike. Hindek ji wan ajalan ev in: Hesp, teyrê baz, xezal, şêr, piling, seg, rûwî, wawîk, bûm, kund, sipir, qijik, kew, pez, mirîşk, dîk, legleg, hehecîk, bet.

Di romana *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de ji ajalan balinde li pêş in ku li gor taybetmendiyên lehengan, nivîskar navê balindeyan li her du lehengên sereke dike: “Baz û Kevok. Baz; teyrê nêçîrê. Kevok; çivîka nêçîrê” (2010: 272). Baz serbazekî dewletê yê bijare ye û piraniya operasyonên li dijî şervanên welatê çiyê bi rê ve dibe ango derdikeve nêçîra wan. Kevok jî herwiha keçeke ku dibe şervan û paşê ji hêla baz ve tê nêçîr kirin. Alegoriyeke bi vî rengî di temamê romanê de xuya dibe ku welatê mezin Tirkiye ye û Bazê nêçîrvan e û welatê çiya jî Kurdistan e û Kevoka ku tê nêçîr kirin e. Ajalên din ên di vê romanê de vihan digrin ev in: Hesp, ker, hêstir, seg, tajî, wawîk, kîvroşk, teyrê eylo, mar, çivîk, pez, kew, kevok, şêr, piling, hirç, gur, başoke, sêmir, şalûr, bilbil, sivorî.

Di *Hawara Dîcleyê* de kuçikek bi navê Gurzo heye ku xwediyê wê Apê Yaqûbê keldan e. Dengbêj Biro wiha behsa Gurzo dike:

Ez divê ji we re behsa Gurzo ku ji heft bavên însanan jî baqiltir bû, bikim. Gurzo ji bavikeke giregir, heta însan dikare bibêje tirtire, ji bavikê navdar ê kulabî yê şemoyî, dihat, min esaleta Gurzo ku gelekî mezin û bi pazû bû û hertim boça xwe, mîna aleke vekişandî, ber bi jor rep dikir, di wê keleberbanga sibê, di ava har a Dîcleyê de dît (2016c: 163).

Dema ku Biro, Heme, Kemaleddîn û Migo noqî avê dibin Gurzo heme û kemaleddîn xelas dike, van dikşîne kêleka çem (2016c: 164). Dema ku biro diçe Esterê ji qetlîama keldanan xelas bike, gurzo dîsa derdikeve pêşber me û alîkariya Biro dike, bi Biro re tê het cizîrê û li ba wî dimîne. Piştî ku Gulîzerê giliyê Biro li ba mîrektiyê dike, lew ew li dijî fermana mîr derketiye û keçeke keldan di mala xwe de veşartiyê,

leşkerên mîr tîn Esterê dibin û Gurzo jî dikujin ku Biro gelekî li ber dikeve (2016c: 423-424).

Ji bilî Gurzo di vê romanê de em rastî ajalekî din tîn ku teyrê Tawis e û li gor baweriya Êzidiyan milyaketa herî mezin e. Li laleşê di kevîrek sedef ku li ser lê şiklê Melekê Tawis heye wekî diyarî didin Biro. Di cihekî de Biro di wiha behsa melekê tawis dike: Ecel nîn e, fermana melekê Ezraîl, bi qewlê Êzidiyan Melekê Tawis, ku bi haletên kuştinê tê, heye (2016c: 21). Di cihekî din de biro diyar dike ku Heme, çîrokên Melekê Tawis ji ber kiriye (2016c: 684-685).

Ajalên din ên din ku di vê romanê de derbas dibin ev in: Hesp, pez, seg, wawîk, kund, gur, dûpişk, mar, marîjok, xezal, moz, mêş, legleg, quling, flamîngo, keftar, bilbil, şalûr, hehecîk, teyrê helo.

3.2.11. Riwêk

Di romanên Mehmed Uzun de em rastî gelek navên riwêkan yên cureyên dar, kulîlk û giya tîn. Gelek caran di romanên de ti fonksiyona wan nîne. Li gor vê yekê Uzun, ji ber xema qeydikirna navê wan û nîşandana zanîna vegêr û lehengên xwe navê riwêkan li gor xwe rêz dike.

Di *Tuyê* de kalikê leheng navê giyayên xwarbar û nexwarbar yek bi yek jê re dibêje:

Çavreşê min, baş li van binêre. Ev hemû giyayên xwarbar in. yanê tîn xwarinê, yên meriv dikare bixwe. Van binase, ji van metirse, navê vê tolik e, ev giyayê kerengê ye, navên van herdûyan kariyê belek û kariyê kelehê ne, ev tûzmazk e, ev tolik, ev soryaz, ev sîrmak, ev sîrik, ev tîrşok, ev pung, ev selmik, ev rişwat, ev gulmêw, ev. . Wisan yek bi yek wî ew nîşanî min didan û navê wan digotin.

Navên giyayên nexwarbaran û kulîlkan jî her wisa car bi car ji min re dihejmartin, giyareş, nefel, kelik, ket, çever, zîrçik, giyayê keran, kelemper, karîş, firêz, sorik, hêro... û... (2015a: 168-169).

Di cihekî din ew bixwe navên dara rêz dike: Darên li der û dora seyrangêhê mazû, berû, spîndar, zergoz, gwîz, çinar, tu bizo û ben bûn (2015a: 172-173).

Di *Mirina Kalekî Rind* de, Kalê Rind diyar dike ku bilûra wî ji çiqilê şaxên dareke bi navê Kevûk çê dibe (2015b: 60). Gundî li gor wesiyeta Kalo, piştî ku Kalo wefat dike, wî li binê darê vedişêrin û gora Kalo dibe ziyaret ku jin û keç tî paçên rengîn bi şaxên darê ve girê didin û daxwazan ji Kalo dîkin (2015b: 110-111).

Di *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* de gundî, zarokên ermen ji ber zilma osmaniyan di nav daristanekê de vedişêrin (2018a: 92).

Di *Bîra Qederê* de nivîskar diyar dike ku girava büyükadayê girava kulîlkan e: büyükada girava kulîlkan e. sal donzdeh meh girav bi rengên gul, binevş, şîlan, sosin, nîlufer, sosin, nêrgiz, berbiro, gulale û beybûnê dixemile (2016b: 46).

Di *Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê* de cureyên kulîlkan yê weke hilale, sosin û gul hene (2010: 46). Şervanê welatê çiyê di cihekî bi dar, devî û giya tijî re derbas dibin (2010: 223).

ENCAM Û NIRXANDIN

Folklor û edebiyat weke du qadên ji hev cuda lê gelekî nêzî hev û bi hev re di nava danûstandineke xurt de, tên zanîn. Lew li gor gelek lêkolîner û nivîskarên van qadan di destpêkê de edebiyat folklor bixwe bû. Ango edebiyat ji folklorê dizê, cureyên edebiyatê yên wekî roman û şano bi cureyên edebiyata gelêrî yên weke epîk, mît, çîrok, stran û hwd. re xizm in û wan ji van cureyan gelek tişt wergirtine. Bi derbasbûna demê û xurtbûn û belavbûna nivîsê re tesîrên edebiyata devkî û çanda kollektîf li ser berhemên edebî kêr dibin. Takekesî û behremendiya afrîner, her di vê serdemê de dibe hêza sereke ya afrandina berhemên edebî lê belê dîsa jî edebiyata devkî, di warê ziman, bûyer û vegêriyê de beşdariyê li edebiyatê dike.

Di prosesa netewesaziyê de nivîskar û helbestkarên romantîk yên bêriya serdemên saf û zêrîn yên welatê xwe dikin, berê xwe didin mît, destan û efsaneyên gelêrî ku ji hêla bajariyan ve kêr dihatin dîtin û li ser wan berhemên nû yên rê li ber sazkirina neteweyekî saf vedikirin, diafirînin. Di vê serdemê de folklor bi xemên civakî û neteweyî tevî edebiyatê dibe û roleke girîng digre di warê avakirina edebiyatên neteweyî de. Di berhemên destpêkê yên edebiyata kurdî ya modern de jî mirov rastî van xeman tê ku berhemên folklorîk di vî warî de ji wan re dibe rêxweşker. Mehmed Uzun ê ku bi romanên xwe bû mijara vê tezê yek ji wan nivîskaran e ku di berhemên xwe de gelekî cih dide hêmanên folklorîk.

Mehmed Uzun yek ji romannûsên herî navdar û çalak yê edebiyata kurdî ye. Di qadên cur bi cur de gelek berhemên dide ku hindek ji wan dibin sedema nîqaşan û ew nîqaş ta niha jî bi awayekî didomin. Mehmed Uzun di dawiya salên 1970an de di nav komên siyasî de dest bi nivîsandina helbestan dike. Heta salên destpêka 1980yî edebiyat û siyasî bi hev re dimeşin di jiyana Uzun de. Lê her di van salan de biryar dide ku bi tenê di qada edebî de berhemên bide. Ji bo pêkanîna vê yekê xwendin û lêkolînan dike lew zimanê wî qels e û tesîra tirkî li ser wî zimanê wî serdest e. Uzun bo têkbirina vê kêmasiyê berê xwe dide folklorê û çî bi rêya xebatên berê hatine kirin çî jî bi berhemên ku wî bi xwe berhevkiirîye, zimanê xwe û paşxaneyê xwe ya çandî civakî zexm dike.

Uzun li sirgûnê di warê lêkolîn, ceribandin û romannûsiyê de gelek berheman dide ku di piraniya van berheman de bala wî bi taybet li ser folklorê û girîngiya folklorê ye. Temayên sereke yên roman û ceribandînan Uzun, dîroka kurdan, sirgûniya rewşenbîrên kurd, pirrçandîtî û zilm/neheqiya li ser millet û olên din e. Uzun bi berpirsyariyên rewşenbîrêkî nêzî van mijaran dibe ku ev yek taybetmendiya herî cudaker ya wî ye. Lewre li gor Uzun, divê edebiyat angaje be û li hêla hejar û bindestan, li dijî serdest û zaliman be.

Uzun di romanên xwe de cih dide gelek hêmanên folklorê lew li gora wî zimanekî wekî kurdî yê ku li Tirkiyeyê hatiye qedexekirin û derfeta pêşveçûnê nedîtiye, mecbûr e bi rêya zimanê berhemên gelêrî xwe nû bike û berhemên modern yên edebî li ser wî hîmî bilind bibe. Lew ji bo afirandina edebiyateke xurt ya modern kevneşopa gelêrî û hebe ya nivîskî du çavkaniyên jêneger e. Di berhemên Uzun de tesîra van her du çavkaniyan jî eşkere ye. Berhemên nivîskarên kovara Hawarê, him di warê zimanê nivîsê de him jî di warê avakirina karakter û çîrokan de xwedî roleke girîng in. Folklorê kurdî jî bi cureyên xwe yên weke dengbêjî, destan, çîrokên gelêrî, çîrok, kilam, stran û gotinên pêşyan beşdariyeke mezin dikin di hemû qadên romanên de.

Awayê sudwergirtina folklorê li gor romanên diguhere. Di romana xwe ya ewwîl de Uzun de bi hewla nîşandana dewlemendiya folklorê kurdî û balkişandina ser girîngiya berhevkirina folklorê, cih dide gelek hêmanên folklorîk û hetta bi lehengekî xwe dide gotin ku pêwîst e ciwan vî karê neteweyî bigrin ser milên xwe. Ev balkişandina girîngiya bo berhevkirin û qeydkirin folklorê di romana xwe ya duyem ya bi navê *Mirina Kalekî Rind* de jî didomîne. Leheng di cihekî de dîsa balê dikşîne ser vê meselê û destanên kurdî ji Kalê Rind berhev dike.

Di romana sêyem, *Siya Evînê* de êdî em dibînin ku berhemên folklorîk beşdariyê li avakirina karakterên romanê dikin. Di vê romanê de nivîskar him di nava metna xwe de her balê dikşîne ser çîroka gelêrî ya bi navê *Cembeliyê Hekarî û Binefşa Narîn*, him jî ji hêla din ve lehenga jin ya vê romanê dişibîne *Binefşa Narîn* lew her du jî nagihên mirazê xwe û her du jî ji neçarî bi zîlamên bi emir, ji xwe mezintir re dizewicin an jî tî zewicandin.

Romana Uzun ya çarem, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê* di warê bi kar anîn û sûd wergirtina ji folklorê de romana wî ya herî dewlemend e. Uzun di vê romanê de çîrok, efsane û kilamên li ser dengbêj Evdalê Zeynikê berhev dike û ji wan romaneke ku him pala xwe dide bizavên hevçax yê weke postmodernîzm him jî vegêranên gelêrî, di formeke modern de pêşkêşî xwîneran dike. Di romanê de ev berhemên folklorîk bi teknîka jinûvenivîsandinan pêk tên hindek caran. Lew li gor têgihiştina Uzun nabe ku folklor an jî berhemên edebiyata gelêrî rasterast têkevin nav berhemên edebî. Pêwîste ew di nav peywendêke nû û cuda de werin bikaranîn. Li gel efsane û kilam û çîrokên li ser Evdal, Uzun di vê romanê de ji taybetmendiyan vegêrana dengbêjan û motîfên çîrokbêjiyê jî sûd werdigre. Herwiha zimanê vê romanê bi gotinên pêşyan, biwêj, şibandinên folklorîk ve dixemilîne û bi vî awayî wê nêzîkî berhemên kevneşopa devkî dike.

Bîra Qederê li gel ku rasterast tesîreke vegêranên folklorîk di xwe nahewîne jî, em tê de rastî gelek nimûneyên folklorê yê weke xwarin, gotinên pêşyan, dia, nifir, biwêj, çîrok, pêkenok tên ku di nava beşên romanê de bi carna awayekî belawela û carna jî li gor pêwistiyan bi cih bûne. Her wekî her du romanên ewwil di vê romanê de jî nivîskar bi rêya lehengê xwe dîsa balê dikşîne ser girîngiya berhevkirina berhemên folklorîk. Di vê romanê de jî dengbêjek cih digre ku kana folklorê û bi taybet jî kana edebiyata devkî ye. Celadet Alî Bedirxanê lehengê romanê jî ji devê wî dengbêjî stran û kilaman berhev dike.

Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê bi epîgrafeke dirêj ji destana *Gilgamişê* dest pê dike û di romanê de çend caran çî leheng çî jî vegêrê romanê çêl bi serpêhatiya *Gilgamişê* ku şerê tarîtiyê dikir, dike. Kevok û Bazê lehengên romanê jî li gor xwe şerê tarîtiyê dîkin lê di encamê de têk diçin. Di vê romanê de rêjeya bikaranîna hêmanên folklorîk bi berawird romanên din asta herî jêr de ye. Lew lehengên sereke yê romanê bajarî ne û beşeke girîng ya romanê jî li bajaran derbas dibe.

Hawara Dîcleyê romana dawî ya Uzun e. Ev roman pala xwe dide folklor û dîrokê bi hev re. Vegêrê romanê dengbêj Biro ye û roman di heft şevbûhêrkan de tê vegêran ku ev yek di romannusiya Uzun de teqabûlî serdemeke nû dike lew digel şevbûhêrkan, Uzun berhemeke dengbêjî ku di tevahiya romanê de weke leitmotif bi şêweyên cuda cuda derbas dibe, diafirîne. *Strana Dîcleyê* an jî *Hawara Dîcleyê* ew

kilam e ku dengbêj Biro di temamê romanê de di hewla afirandina wê de dixuyê. Li gel vê yekê Uzun gelek berhemên folklorîk yên weke stran, kilam, efsane, cejn, gotinên pêşîyan û hwd. bi kar tîne.

Bi giştî folklor û çanda devkî hêleke girîng ya nivîskarî û romannûsiya Uzun nîşan didin. Bi xebata li ser van qadan Uzun xwe digihîne zimanekî zelal, sivik û bi hêmanên civakî xemilandî. Ji hêleke din ve Uzun, bo nivîskariyeke xurt, mecbur e berê xwe bide kevneşopa çanda devkî ji ber ku li ber wî ti alternatîf nîne. Bi vê hişmendiye Uzun weke lêkolînerekî derdikeve qadê, berhemên devkî berhev dike, wan disenifîne û pişt re nava peywendekê pêwîst de daxilî metnên xwe dike. Lewre Uzun bi berhemên xwe dibe mîna keke balkêş di warê sûdwegirtina ji kelepura devkî. Hêmanên sereke yên folklorê di romanên Uzun de destan, çîrok, efsane, kilam, stran, gotinên pêşîyan û biwêj in ku rêjeya bikaranîna wan ji romanekê bo romaneke din diguhere. Uzun bi bikaranîna van hêmanan, di heman demê de rastiya civaka xwe ya çanda devkî bi xurtî dijî û diparêze jî bi rêya nivîsê raberî xwîneran dike.

Bikaranîna zêde ya folklorê dibe sedema qelsiya berhemên Uzun jî, bo nimûne teswîrên bêhed yên folklorîk, lehengên duz û yekalî, naîfbûn û îdealîzekirina lehengan, nîşaneyên vê yekê ne. Di berhemên *Siya Evînê*, *Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê*, *Bîra Qederê* û *Hawara Dicleyê* de lehengsaziya Uzun ji ber tesîra lehengsaziya folklorîk ya yekalî qels dimîne û ev yek rê li ber xurtbûna romanên digre.

Di vê xebatê de kêmasiya herî mezin di edebiyata kurdî de nebûna xebatên xurt û zanistî li ser mijara tîkiliya folklor û edebiyatê, awayê sûdwegirtin û bi kar anîna folklorê di berhemên modern ên edebî de bû. Herwiha xebatên heyî yên bi heman mijarê ve jî ji hêla çarçoveya teorîk û nîqaşên li ser mijarê jî qels bûn. Lewre ev tez bi awayekî hewl dide ku bibe çavkaniyeke biçûk di vî warê de.

ÇAVKANÎ

Ahmedzade, H. (2004). *Ulus ve Roman* (Wer. A. Z. Gündoğan). İstanbul: Weşanên Peri.

Adsay, F. (2014). Daxwaz û Endîşeyên Îroyîn di Romanên Dîrokî de: Xwendineke Muqayeseyî li ser Hawara Dîcleyê û 3 Gav û 3 Darek. Dnd. *Tîr û Armanc* (Amd. E. Öpengin, R. Alan). İstanbul: Weşanên Peywend.

Ahmedzade, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname* (Wer. F. Adsay). İstanbul: Weşanên Avesta.

ALAKOM, R. (2013). *Di Folklorê Kurdî de Serdestiya Jinan*. İstanbul: Weşanên Avesta.

Alakom, R. (1991). *Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi*. İstanbul: Deng Yayınları.

Alan, R. (2013). *Bendname*. İstanbul: Weşanên Peywend.

Allison, C. (2007). *Yezidi Sözlü Kültürü*. (Wer. F. Adsay). İstanbul: Weşanên Avesta.

Alptekin, A. B. (1997). *Halk Hikâyelerinin Motif Yapısı*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Aras, A. (2018). *Şairê Kurda Yê Efsanewî: Evdalê Zeynikê*. İstanbul: Weşanên Nûbihar

Aras, A. (2017). *Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê*. Web:

<http://kovarabir.com/ahmed-aras-kilama-kurdi-u-denbejiya-serhede/> Ragihiştin 10. 04. 2020.

Aristoteles (2016). *Poetika*. İstanbul: Can Yayınları.

Aslan, M. E. (2019). *Hostayê Ribabê Miradê Kınê Ê Analîza Şerê Wî Yê Bi Navê Osê Zerî*. Wan: Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî).

- Attı, H. (2014). *Lêkolîneke Folklorî li ser Destana Mem û Zînê*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî).
- Attı, H. (2015). Li gorî Teoriyên Nûjen Rewşa Folklorê Kurdî. Dnd. *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*. (Amd. Ramazan Pertev). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Aydoğan, İ. S. (2014). *Guman 2: Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*. İstanbul: Weşanên Rupel.
- Bazîdî, M. M. (2010). *Camieya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* (Amd. Z. Avcı). İstanbul: Weşanên Lîs.
- Bedir-Han, M. S. (1998). *Defter-î Â'malîm: Mehmed Salih Bedir-Han'ın Anıları* (Amd. M. Uzun û R. Bedirhan) İstanbul: Belge Yayınları
- Berbir, H. (2007). *Ji Dengbêj Fadîlê Kufragî Destan û Çîrokên Kurdî*. İstanbul: Weşanên Enstutîya Kurdî ya Amedê.
- Boratav, P. N. (2000). *Halk Edebiyatı Dersleri*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.
- Boratav, P. N. (1995). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*. (Çapa Heftem). İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Boratav, P. N. (2002). *Halk Hikâyeleri ve Halk Hikayeciliği*. İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları.
- Boyîk, E. (2012). *Çanda Kurdên Sovyetê*. İstanbul: Weşanên Deng
- Beğik, M. (2013). *Dengbêj Resoyê Gopala*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê (Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî).
- Bodur, E. (2009). *Modern Kürt Romanında Bir Kurucu Yazar: Mehmed Uzun*. İstanbul: Zanîngeha İstanbul Bilgi, İstanbul Bilgi Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza Masterê ya Çapnebûyî).

- Casanova, P. (2009). *Dünya Edebiyatı Cumhuriyeti* (Wer. F. Deniztekin). İstanbul: Varlık Yayınları.
- Cegerxwîn (1988). *Folklor Kurdi*. Stockholm: Weşanên Roja Nû.
- Celalî, M. (2016). “Kurdekî Hezarfen Mela Mehmûdê Bazîdî.” *Nûbihar*. 134:26-31.
- Celîl, C. û Celîl, O. (2013). *Zargotina Kurdan I - II*. İstanbul: Weşanên Aram.
- Cindî, H. (2016). *Folklor Kurmancîyê*. (Tîpguhêz: Mîdya Têmûr û Dîdara Têmûr) İstanbul: Weşanên Lîs.
- Cindî, H. û Evdal, E. (2008). *Folklor Kurmanca*. (Tîpguhêz: Tosinê Reşîd) İstanbul: Weşanên Avesta.
- Çiftçi. T. (2019). *Adıyaman ve Çevresinde Halk İnançları Ve Halk Hekimliği*. Diyarbakır: Dicle Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî).
- Çamkara, A. (2010). “Modern Ulus Devletin Kuruluş ve Gelişme Sürecinde Folklor, Şiir ve Fakelore”. *Milli Folklor*. 88: 85-90.
- Çobanoğlu, Ö. (2005). *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Damrosch, D. (2016). *Dünya Edebiyatı Nasıl Okunmalı* (Wer. D. Çetinkasap). İstanbul: Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Dewrêş, H. (2014). “Di Hin Berhemên Kurdî de Şopên Çanda Devkî”. *Zarema*. 1: 60-69.
- Doskî, T. Î. (2018). “Kewgîriya Melayê Bateyî di Şi’reka Wî ya Nû da”. *Nûpelda*. 25: 26-28.
- Doskî, T. Î. (2020). *Baxê Îrem: Geşte li Nav Şi’ra Kurmancî ya Klasîk*. İstanbul: Weşanên Dara.
- Eagleton, T. (2019). *Kültür* (Wer. B. Göçer). İstanbul: Can Yayınları.

- Pehlivanoglu, E. (2007). "Ossiyanizm ve Beş Hececiler". *Milli Folklor*. 75: 5-10.
- Filiz, M. Ş. (2014). *Xebatek Li Ser Destana Derwêşê Evdî*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê (Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî).
- Goody, J. (2018). *Mit, Ritüel ve Söz* (Wer. D. Sezgi). İstanbul: Küre Yayınları.
- Gören, E. (2013). *Di Romanên Erebe Şemo De Folklorê Kurdî*. Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê (Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî).
- Gözdard, N. (1991). *Folklor Dünyasından*. İstanbul: Yargı Yayınları.
- Gültekin, M. (2013). *Zargotina Kurdên Serhedê*. İstanbul: Avesta Yayınları.
- Hekarî, E. R. (2017). *Memê Alan*. (Amd. R. Tovjîn). (Çapa Duyem). İstanbul: Weşanên Lîs.
- Hobsbawm, E. û Ranger, T. (2006). *Geleneğin İcadı* (Wer. M. M. Şahin). İstanbul: Agora Kitaplığı.
- Homeros (2014). *Odysseia* (Wer. A. Erhan ve A. Kadir). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.
- Huyugüzel, Ö. F. (2018). *Eleştiri Terimleri Sözlüğü*. İstanbul: Dergâh Yayınları.
- İlhan, M. E. (2018). *Kültürel Bellek: Sözlü Kültürden Yazılı Kültüre Hatırlama*. İstanbul: Doğu Batı Yayınları.
- İşler, İ. (1998). *Çîrokên Gelêrî û Destana Şemikê Bêdiran*. İstanbul: Weşanên Enstutîya Kurdî ya Stenbolê.
- Kardaş, C. (2013). *Dengbêjlik Geleneği Ve Âşık Edebiyatı İle Karşılaştırılması*. Elazığ: Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili Ve Edebiyatı Anabilim Dalı (Teza Doktorayê ya Çapnebûyî).

- Kaplan, Y. (2015). “Strana Kurdî (Kurmancî): Devera Hekariyan Wek Nimûne”. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. 1(2): 158-182.
- Kaplan, Y. (2019). *Beyt û Destanên Kurdî*. İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- Kaya, F. (2007). *Uzun Roman: Mehmed Uzun Portresi*. İstanbul: Alfa Yayınları.
- Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî*. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Kızılkaya, M. (2008). *Sen û Ben: Anılarla Mehmed Uzun’un Hayatı*. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Kurdo, M. (2017). *Zûgotinok*. İstanbul: Weşanên Wardoz.
- Kuusela, T. (2014). “In Search Of A National Epic”. *Approaching Religion*. 4(1): 25-36.
- Lescot, R. (2013). *Memê Alan*. (Çapa Sêyem). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Oinas, F. J. (2003) “Rusya’da Folklor Faaliyetleri” (Wer. U. Günay). *Milli Folklor*. 20: 3-13.
- Ong, W. J. (2007). *Sözlü Ve Yazılı Kültür* (Wer. S. P. Banon). İstanbul: Metis Yayınları
- Örnek, S. V. (1995). *100 Soruda İlkelerde Din, Büyü, Sanat, Efsane*. (Çapa Sêyem). İstanbul: Gerçek Yayınevi.
- Öztürk, M. (2015). “Vekolînek Derbarê Gotinên Pêşîyan ên Kurmancî De”. *Mukaddime*. 6 (2): 319-337.
- Öztürk, M. (2016). “Zûgotinok Di Edebiyata Kurdî Ya Gelêrî De”. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. 2 (2): 23-43.
- Parıltı, A. û Galip, Ö. (2010). *Kürt Romanı Okuma Kılavuzu*. İstanbul: Sel Yayınları.
- Parıltı, A. (2006). *Dengbêjler: Sözüün Yazgısı*. İstanbul: İthaki Yayınları.

- Pariltı, A. (2007). Üç Eseriyle Uzun, Uzun Yolların Yolcusu. Dnd. **Uzun Roman Mehmed Uzun Portresi** (Amd. F. Kaya). İstanbul: Alfa Yayınları.
- Pertev, R. (2009). **Zarok û Çîrok**. İstanbul: Weşanên Doz.
- Pertev, R. (2015). **Edebiyata Kurdî ya Gelêrî-1**. İstanbul: Weşanên Avesta.
- Pertev, R. (2018). **Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî**. İstanbul: Weşanên Avesta
- Propp, V. (1998). **Folklor, Toeri ve Tarih** (Wer. N. Hasgöl û T. Tanyel). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Raşidîrostamî, M. (2015). Di Salên 1970yî de li Başûrê Kurdistanê Şano. (Wer. F. Adsay). Dnd. **Dîroka Şanoya Kurdî** (Amd. Ç. Zêdo û Y. Akkuzu). İstanbul: Weşanên Peywend.
- Rimbaud, A. (2018). **Bîrqên Direxşan** (Wer. E. Sertem). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Sadinî, M. X. (2014). **Feqiyê Teyran: Jîyan, Berhem û Helbestên Wî**. İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- Sakaoğul, S. (1999). **Masal Araştırmaları**. Ankara: Akçağ Yayınları.
- Schulze, H. (2005). **Avrupa'da Ulus Devlet** (Wer. T. Binder). İstanbul: Literatür Yayınları.
- Sokolov, Y. (2009). **Folklor: Tarih ve Kuram** (Wer. Y. Özer). Ankara: Geleneksel Yayınları.
- Temo, S. (2007). Mehmed Uzun Romanlarında Anlatıcılar. Dnd. **Uzun Roman Mehmed Uzun Portresi** (Amd. F. Kaya). İstanbul: Alfa Yayınları.
- Thiese A.-M. (2018). Ulusal Kimlikler, Ulusaşırı Bir Paradigma. Dnd. **Milliyetçiliği Yeniden Düşünmek: Kuramlar Ve Uygulamalar**. (Amd. A. Dieckhoff û C. JaffreLOT (Wer. D. Çetinkasap). İstanbul: İletişim Yayınları.
- Uluçay, Ö. (2004). **Mehmed Uzun Kitabı**. İstanbul: Yom Yayınları.

- Ulugana, S. (2015). Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê. Dnd. **Edebiyata Kurdî ya Gelêrî**. (Amd. Ramazan Pertev). İstanbul: Weşanên Avesta.
- Uzun, M. (1993). **Hêz û Bedewiya Pênûsê**. Stockholm: Weşanên Nudem.
- Uzun, M. (1992). **Destpêka Edebiyata Kurdî**. Ankara: Weşanên Beybûn.
- Uzun, M. (2018b). **Siya Evînê**. (Çapa Pêncem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2009). **Bir Dil Yaratmak**. (Çapa Heştem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2017). **Dengbejlerim**. (Çapa Dehem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2016b). **Bîra Qederê**. (Çapa Çarem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2015b). **Mirina Kalekî Rind**. (Çapa Çarem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2008). **Ölüm Meleğiyle Randevu**. İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2015a). **Tu**. (Çapa Duyem) İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2018a). **Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê**. (Çapa Çarem) İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2010). **Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê**. (Çapa Duyem) İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2018c). **Zincirlenmiş Zamanlar Zincirlenmiş Sözcükler**. (Çapa Dehem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (2016c). **Hawara Dîcleyê**. (Çapa Sêyem) İstanbul: İthaki Yayınları.
- Uzun, M. (1998). **Nar Çiçekleri: Çokkültürlülük Üstüne Denemeler**. (Çapa Duyem) İstanbul: Belge Yayınları.
- Uzun, M. (2016a). **Bir Romanın Hatıra Defteri**. (Çapa Şeşem). İstanbul: İthaki Yayınları.

- Uzun, M. (2016d). *Küllerinden Doğan Dil ve Roman*. (Çapa Heftem). İstanbul: İthaki Yayınları.
- Ûsiv, F. (2011). *Hesretdefter Cilda 1em Helbest: 1955-1970*. (Amd. F. H. Cewarî). İstanbul: Weşanên Lîs
- Yıldırım, K., Pertev, R., Aslan, M. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları.
- Yıldız, A. (2015). *Qewlê Hespê Reş*. Mardin: Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî Yê Li Tirkîyeyê (Teza Lîsansa Bilind ya Çapnebûyî).
- Yıldız, A. û Taşkın, H. (2018). *Şakiro: Kewê Ribat*. İstanbul: Weşanên Nûbihar.
- Yusiv, H. (2011). *Romana Kurdî*. İstanbul: Weşanên Ronahî.
- Yücel, C. S. (2018). *Kürt Edebiyatının Anatomisi* (Wer. Y. der Garabedyan). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.
- Zeraq, D. (2005). *Deyimler Sözlüğü, Ferhenga Biwêjan*. İstanbul: Weşanên Enstutiya Kurdî Ya Stenbolê.

JÎNENÎGARÎ

Agahiyên Kesane

Paşnav, Nav : YAVUZ, Yahya
Aîdîyet : TC
Dîroka Zayînê û Cî : 01.03.1993/ Mardin
Telefon :
Faks :
E-mail : yehyaomeri@msn.com



Perwerdehî

Ast	Beşa Perwerdehiyê	Dîroka Derçûnê
Lîsansa Bilind	Çand û Zimanê Kurdî	2020
Lîsans	Mamostatiya Ziman û Wêjeya Tirkî	2017

Zanîngeh

Zanîngeha Van Yüzüncü Yılê

Zimanên Biyanî

Ingilîzî